# KOMUNAR

Gumankirina Ji Sosyalîzmê Gumankirina Ji Mirov û Ji Siberoja Mirov e

Hejmar: 2 Bihar 2023

Kovara Îdeolojîk-Teorîk

Akademiya Zanistên Civakî Ya Abdullah Ocalan

E-mail: kominarakademi@gmail.com

Whatsapp: +963984361750

# Naverok

PÊŞGOTİN......................................................................................................................(3)

LI ROJHILATA NAVÎN ŞERÊN MODERNÎTEYÊ Û ENCAMÊN MUHTEMEL...(4)

EZMÛNA DEH SALAN A ŞOREŞA ROJAVA........................................................(29)

BINGEHA ŞOREŞA ROJAVA FIKRÊN AZADIYÊ YE..........................................(49)

ŞOREŞA ROJAVA Û TEVGERA CIVAKA DEMOKRATÎK...................................(61)

SEDSALA 21'EMÎN WÊ BİBE SEDSALA JİNÊ.....................................................(75)

ABORIYA LI BAKUR-ROJHILATÊ SÛRÎ.................................................................(85)

HEYVANÊ CIVAKÎBÛNA NÛ; AKADEMIYÊN CIVAKA DEMOKRATÎK........(106)

Bİ ŞOREŞA ROJAVA RE DERİYÊ ŞOREŞA CÎHANÊ HAT VEKİRİN...............(132)

ROLA DÎROKÎ YA PÊŞENGİYÊ YA CİWANÊN KU Dİ ŞOREŞA ROJAVA DE MOHRA XWE Lİ SERKEFTİNÊ DANE.........................................................................(143)

ŞOREŞA ÇAND Û HUNERÊ YA ROJAVA............................................................(156)

## Pêşgotin

Em, hejmareke nû ya Kovara Komunarê digihînin we. Di vê jimarê de mijara me Şoreşa Rojava ye.

Di sala 2010'an de li Tûnisê destpêka pêla serhildana gelan dest pê kir û ev yek di Adara 2011'an de gihişt Sûrî. Ji destpêkê ve nediyar bû ku wê mesele ber bi ku ve biberide. Nedihat pêşbînîkirin ku wê rabûna girseyî heta ku derê ve biçe û li ku derê bisekine. Li welatên ku bihara Ereban tê re derbas bû rêveberî guherîn. Feqet li Sûrî bandora dihat payîn çênebû û rê li ber kûrbûna şerê navxweyî vekir. Li seranserî Sûrî şerê navxweyî kûr bû, bajar hilweşiyan, bi milyonan însan birîndar bûn û mirin. Bi qasî wan jî însan penaber bûn. Sûrî ber bi kaosekê ve hat dehfdan, di serî de êrîşên komên çete û bi taybet jî êrîşên dewleta Tirk, destwerdanên ji derve hatin kirin bû sebeb gelek xwîn ji Sûrî biçe. Bû sedem ku krîza li Sûrî kûrtir bibe û karesatên însanî zêdetir bibin. Pirsgirêkên siyasî, ekonomîk û ewlekariyê kûrtir bibin, bêîstiqrarî her çû zêdetir bû.

Li Rojava, li cihê Kurd dijîn, ev pêvajo gelekî bi endaze derbas bû. Piştî aloziyên navxweyî yên Sûrî dest pê kir bi salekê rewşa niha ya Rojava hêdî hêdî teşe girt. Di 18'ê Tîrmeha 2012'an de gelê Kobanê hêzên rejîmê ji bajar derxist û bajar kontrol kir. Piştî rojekê, di 19'ê Tîrmeha 2012'an de jî hemû erdnîgariya Rojava ji bin kontrola hêzên rejîmê hat derxistin. Ev rewşa êdî wekî Şoreşa Rojava hat bibîranîn.

Şoreşê deh salên xwe li pey xwe hişt û di sala xwe ya 11'an de ye. Ruxmî gelek êrîşên eskerî-siyasî yên navxweyî û derve, tevî ambargoyên herêmî û navneteweyî û şerê taybet ê sîstema kapîtalîzma kûrewî jî Şoreşa Rojava li ber xwe dide û li ser piyan e. Şoreşa Rojava ya ku bi pêşengiya Tevgera Azadiya Kurdistanê û li ser esasê pêkanîna fikrên Rêber Apo rabû û ji pergalên heyî cudatir bi rengê nûnertiya Şaristaniya Demokratîk meşiya di sala xwe ya 11'emîn de ye.

Rengê şoreşê çi bû, şoreşê çi ava kir, çi êrîş li ser şoreşê hatin, armancên ji van êrîşên cur bi cur çi bûn? Pêşketinên di şoreşê de çêbûne çi ne, ev pêşketin ji kîjan bingehan tên, çawa bi rê ve diçin, kêm û kurtasiyên wê çi ne? Şoreşê di milê siyasî, civakî, çandî, aborî, rêveberî, eskerî, tenduristî, perwerdeyê de çi anî, rewşa xwe çawa ye, ji vê wêdetir wê çi bike û çi dike? Di avakirina pergala Rêveberiya Xweser de xwe gihandiye kîjan merheleyê, wê ji niha û şûn de bikeve nava kîjan hewldanan, çima bi qasî ku tê xwestin avakirina şoreşê pêk nayê?

Ev pirs û gelek pirsên wekî van wê di nava vê hejmara me ya Kovara Komunarê de bên bersivandin. Em hêvîdar in ev jimara me wê hem di warê rabirdûyê de hem jî di warê siberojê de tevkariyeke mezin bike.

**Edîtorya Kurdî**

# LI ROJHILATA NAVÎN ŞERÊN MODERNÎTEYÊ Û ENCAMÊN MUHTEMEL

**Ya rastî, çanda modernîteya kapîtalîst, çanda hegemonîk a dused salên dawiyê ye. Divê mirov ne li bendê be ku çandeke di dused salên dawiyê de bûye navend, di demeke kin de çandeke sêsed hezar salî asîmîle bike.**

ABDULLAH OCALAN

Divê mirov li şerên dused salên dawî yên li Rojhilata Navîn rast serwext bibe. Beriya her tiştî divê mirov ji bîr neke ku şerê diqewime di çarçoveya hegemonya şaristaniyê de nîn e, di çarçoveya çandî de ye. Şerê dawî yê hegemonya şaristaniyê bi Ewrûpayê re ango bi Rojava re piştî Qanûnî Siltan Silêman ketiye pêvajoyekê di dawiyê de bi dilê Ewrûpayê bi encam dibe. Pêvajoya heta sedsala 19. hegemonya sîstema şaristaniya navendî li gorî kapîtalîzma Ewrûpaya Rojava bi encam bû. Hegemonya welatên Ewrûpayê bi sedsala 19. re bi awayekî fizîkî bar kirin herêmê û li hemberî wan hêzên li ber hegemonya desthilatdariyê rabin tine bûn,

hêzên civakî yên nedixwestin çanda modernîteya kapîtalîst qebûl bikin hebûn. Împaratoriyên Osmanî û Îranê weke hegemonyayên desthilatdariyê, ji wan nedihat bi welatên Ewrûpayê re şer bikin. Hewl didan li ser piyan bimînin. Ev jî bi hesabên erzan ên tewazunên desthilatdariyê dikirin. Lê çanda civakî, bi awayekî ji gelek herêmên mêtingeh ên li dinyayê cudatir, li şûna çanda modern a Ewrûpayê yekser qebûl bike, bi giranî li ber xwe dida. Ji ber vê hêza çandî bû ku herêm bi temamî nedibû mêtingeh. Nexasim Îslamiyet weke çanda serdest a ji rêûresmê, di vê demê de dibû kirdara çalak a berxwedanê. Li vir nuqteya divê mirov baş ji hev derxe ew e, Îslama li ber xwe dide, ne Îslama dewletparêz û desthilatgir e, Îslama çanda civakî ye. Tevgerên Îslamî yên siyasî hebûn, lê di berdêla berjewendiyên diyar de bi hêsanî xwe nêzî hevkartiyê dikirin. Îslama timî li ber xwe da û weke şîpeke har herikî, Îslama rêûresmî ya civakî bû. Ji ber vê, gelekî girîng e ku mirov Îslama desthilatgir a ji rêûresmê ya ji sedsala 19. ve li ser navê Îslamê heta roja me ya îro hat meşandin û Îslama civakparêz a ji rêûresmê ji hev derxe. Pirsa divê were kirin ev e, gelo şerê di navbera Îslama çandî û modernîteya kapîtalîst de şerekî bi çi awayî ye. Li gorî ku li naverastê şerê desthilatdariyê yê du hêzên hegemonîk tine ye, şer di navbera çanda modernîteya kapîtalîst û çanda Îslamî ya ji rêûresmê de ye. Bêhtir şerekî modernîteyan di warê civakî de heye. Dema li Rojhilata Navîn mesele çand be, divê mirov wê bi tenê bi Îslamê bi sînor neke. Pêwîst e ku mirov bi dînên din ên Brahîmî ango bi Cihûtî û Xiristiyantiyê jî temam bike, heta derdîn an li derveyî dînên yekxwedayî bandorên dînî yên Şaman-Pagan û laîk ên bi maske hebûna xwe dewam dikin tevlî vê bike û bi awayekî yekpare binirxîne. Qada ku çanda bingehîn a mirovatiya hemdem pêk aniye erdnîgariya Rojhilata Navîn e. Eger em çanda mirov a Homo Sapiens jî li vê zêde bikin, mirov dikare texmîn bike ku ji serdemên beriya dîrokê û heta bi sedsala 19. bi qasî sêsed hezar salî her tim herêma çanda bingehîn a mirovatî pê rabûye ev herêm e. Ya rastî, çanda modernîteya kapîtalîst, çanda hegemonîk a dused salên dawiyê ye. Divê mirov ne li bendê be ku çandeke di dused salên dawiyê de bûye navend, di demeke kin de çandeke sêsed hezar salî asîmîle bike. Berevajî divê mirov li bendê be ku şerê çandî wê demeke dirêj dewam bike û çanda xwecihî ya herêmê bi hêsanî wê teslîm nebe, heta wê xwe li şerê hegemonîk ê çandî rakişîne. Lewma şerên herêmî yên roja me ya îro gelekî zêde bûne, mirov dikare weke dema şerên hegemonîk ên çandî yên modernîteyê şîrove bike. Ji ber vê, gelekî girîng e ku mirov şerên li asta jor bi qada desthilatdariyê têne pênasekirin bi awayekî cuda şîrove bike. Lewma mirov rabe ji

vî alî ve şerên li Rojhilata Navîn di çarçoveyeke teng de bi paradîgmaya şerê neteweyî û çînî yê Rojavayî û bi şerên desthilatdarî û dewletê yên Îslama nerm a siyasî binirxîne, têrê nake. Bêguman ev aliyên şer hene. Şerên di vê çarçoveyê de bêhtir qadên desthilatdarî û dewletê eleqedar dikin. Lê rengê şeran ê ji van aliyên desthilatdariyê hemûyan dibihure heye û ev rengê şer girîng e. Jixwe şerên di çarçoveya desthilatdarî û dewletê de çiqasî berfireh bin û çiqasî demdirêj bin, xwedî wê hêzê nîn in ku derkevin derveyî desthilatdariya hegemonîk. Li beramberî vê, karekterê şerê di asta moderniteyê de cuda ye û xwediyê wî wesfî ye ku ji moderniteya serdest dibihure.

**1- Li Rojhilata Navîn Çarenûsa Moderniteya Kapîtalîst**

Li gorî gotina pêşiyan a “Her gîha li ser koka xwe hêşîn dibe” çarenûsa moderniteya kapîtalîst ku sîstema dawî ya şaristaniya navendî ye, tevî fikaran hemûyan, îhtîmaleke xurt e ku şerên li Rojhilata Navîn diyar bike. Tevî ku di roja me ya îro de moderniteya kapîtalîst serdest e jî kapîtalîzm bi eslê xwe di dîroka mirovatiyê de timî marjînal maye û weke jirêderketinê hatiye dîtin. Li dijî xeta sereke ya mirovatiyê ye. Ji diyalektîka gerdûnî ya xwezayê re jî çep dikeve, jê vediqete yan jî dijber e. Mezinbûna kapîtalîzmê di sedsala 16. de û avakirina wê ya hegemonya global hinekî jî dişibe ‘Çîroka Çil Heramiyan’. Cografya Rojavayê Ewrûpayê û çandên komên li wir gelekî ji çemê sereke yê şaristaniyê veqatiyabûn, şerên mezhebî yên cîhana Îslamiyet û Xiristiyantiyê, êrişên hilweşîner ên mîna Moxolan û cîhanên sergirtî yên xanedaniyên li Çînê dewam dikirin nebûna, kapîtalîzmê li Ewrûpaya Rojava nikarîbû firsend bidîta û gav biavêta hegemonyayê. Divê mirov ji bîr neke ku ev gavavêtina hegemonîk li ser xeteke mîna Amsterdam-Londonê li seriyê herî rojava yê ku lê sê cografyayên mezin digihîjin hev, li giravokekê (Girava Brîtanyayê) kesî nedipa pêk hat. Elîteke sermaye û desthilatdariyê ya piçûk ku mîna mişextî giravê hatibe kirin, ji bo ji aliyê împaratoriyên li parzemîna xwe neyên daqurtandin, ket nava şerekî manûnemanê û di vî şerî de bi ser ket. Vê elîtê di vî şerî de sê sîlehên mezin ên hatibûn nûkirin, pêk anîn. Ji sedsala 16. heta bi sedsala 19. û heta bi nîvê sedsala 20. ev hersê sîleh bi awayekî serketî hatin pêkanîn. Ev hersê sîleh jî sê hemanên bingehîn ên moderniteya kapîtalîst bûn. Ango meyla kara herî zêde ya sermayeyê ku her diçû dewamî dibû, birêxistinkirina desthilatdariyê weke netew-dewlet û îndustriyalîzma bi gavavêtina ji manîfakturê ber bi şoreşa pîşesaziyê ve dest pê kirîbû. Dinya ku di van dused salên dawiyê de bi van hersê hêmanan hat fetihkirin, bi rastî dinyayeke gelekî xerîb û veqetiyayî ye. Hemin ev ne sîstemeke xwedayî ya ji ezmên hatî ye û nabe jî. Em li vir behsa cîhana hêzeke hegemonîk

dikin ku di dîrokê de potansiyeleke jirêderketî û xweveşartî ye, di terk û qelşên pênc hezar salî yê sîstema şaristaniya navendî de, di dehlîzên wê yên bi dizî de timî weke gunehkar hatiye dîtin, ji aliyê mirovatiyê ve weke 'Çil Heramiyan' hukim lê hatiye birîn. Li Ewrûpayê xwe girt û global bû, ji ber ku hersê sîleh bi kar anîn kujer bûn. Bi awayekî îdeolojîk ji bo hukim li xweza û civakê bike cîhana zanistî pêk aniye, înkara polîtîkayê be jî cîhana netew-dewlet û cîhana îndustriyalîzm û kara herî zêde ya civak û hawîrdor daqurtandine, ava kiriye, di qonaxa dawî de jî bi temamî qedandin an jî îflasa civak, ferd û hawîrdorê îfade dike. Ji salên 1970'î ve kapîtalîzma fînansê ya mohra xwe li hegemonyayê xist bi temamî sîstemek e ku bi xweza û civakê re li hev nake. Bi hejmarên ferazî yan parçeyên kaxizan dilîzin û di rojekê de bi trîlyonan Dolarî bi dest dixin, bi herhalî ev têra xwe îspat dike ku ev sîstem, sîstemeke welê ye ku çil carî zêdetir ji 'Çil Heremiyan' heramîtir, dizektir û hovtir (kuştina fizîkî û manewî) e. Her kes pêxîrtengiya dawî weke pêxîrtengiya ji ber avabûn û struktureliya kapîtalîzmê dinirxîne. Ya rastî hewce nake ku mirov bibêje pêxîrtengiya dawî jî. Ji ber ku kapîtalîzm bi xwe pêxîrtengiya herî kujer a sîstema şaristaniyê ye ku dewamî û domdar bûye. Di pêncsed salên dawî yên hukimraniya xwe de bi şerên îmha û qirkirinê, bi talanên xeternak ên mêtingeriyê, bi mêtinkariya kedê, bi hilweşandina hawîrdorê û di encamê de bi qedandina ferd û civakê ya rê li ber vekir, xisletên xwe yên sereke bi zêdehî nîşan daye. Bi tenê bîlançoya şerên dawî yên sedsalê ji bîlançoyên şerên di dîroka tevahiya mirovatiyê de qatbiqat zêdetir e. Dema mirov van bîlançoyan li ber çavan bigire, mirov bi hêsanî dikare îddîa bike ku ev ne bi tenê karekterê sîstemê yê pêxîrtengiyê, lê belê karekterê wê yê kanserojen ê ji bo hawîrdor û civaka mirov jî nîşan dide. Ji ber ku ev xisletên sîstemê li navenda wê ya sereke û navenda wê ya global ji zû ve derketine holê, mirov dikare fêhm bike ka çima sîstem li navenda çanda dîrokî ya mirovatiyê li Rojhilata Navîn evqasî tengav dibe. Di sedsala dawî de rêxistiniya netew-dewletê ji bo rizgarkirina modernîteya kapîtalîst têrê nake. Gelekî eşkere derketiye holê ku li Rojhilata Navîn netew-dewleta mînîmalîst amûrê tehekumê yê modernîteya kapîtalîst e. Demekê li herêmê maneya walîtiyên Împaratoriya Romayê çi be, netew-dewletên roja me ya îro xwedî heman maneyê ne. Belkî jî rola wan a hevkartiyê ji ya waliyên Romayê bêhtir e, ji rêûresmên çandî yên herêmê dûr in, dema nêzîk jî dibin bi temamî di rewşeke nakok de ne. Hêmanên modernîteya kapîtalîst îndustriyalîzm û kara herî zêde, ne di wê rewşê de ne ku di çanda herêmê de karibin kûr bibin. Amûra wan a herî zêde bi kar tînin ango netew-

dewlet weke li gelemperiya dinyayê li herêmê jî bi lez diferike, diheze. Amûra wan netew-dewlet di warê dewamkirina pêxîrtengiya heyî de jî bi kêr nayê. Hebûna netew-dewletan her ku diçe pêxîrtengiya heyî kûrtir dike. Eger em rewşa dawî ya netew-dewletê li herêmê û li hemberî bûyerên muhtemel e ku biqewimin heyîna wê binirxînin, em ê karibin weha bibêjin:

A-Netew-dewletparêziya Ereb, ji zû ve ji aliyê gelên xwe ve jî bûne nakokiya sereke ya ji wan hêrs bibin. Ji wan, dewleta Iraqê weke ya herî bi hêz xuya dikir, di rewşa heyî de ew bûye goristana netew-dewletparêziyê. Li şûna netew-dewleta xira bûye ya nû nayê avakirin û heye ku dabeşî sê netew-dewletên nû bibe û ev jî wê ne ku pirsgirêkan çareser bike, berevajî wê bêhtir giran bike û şer jî wê bigihin asta qirkirinê. Netew-dewletparêziya Ereb-Şîî, Ereb-Sunnî û Kurd bi herhalî wê di sedsala 21'ê de li sahneyên herî xwînrij şahidiyê bikin. Dema mirov li rewşa heyî binêre û bi tevkujiya Helebçeyê ya di rabihuriya nêz de û tevkujiyên din ên mezhebî û etnîk hemûyan re bide ber hev, wê xeternakiya şerên netew-dewletparêziya siberojê baştir bê fêhmkirin. Niha û siberojek heye ku gelekî dişibe dewletên bajaran ên di dema Sumeran de hev tine dikirin. Ez bawer dikim ku wê ne şaş be, mirov bibêje, ji Fasê heta bi Yemenê, ji Sûdanê heta bi Sûriyê û heta heta bi Libnanê wê rewşa heyî ya netew-dewletên Ereb hemûyan di siberojeke nêz de ji Iraqê ne cuda be. Bi awayê xuya dike, li dijî Îsraîlê şer dikin, lê bi rastî û bi awayekî berbiçav di rewşeke hevkar de ne ku hebûna Îsraîlê li ser piyan digirin. Ango hebûna wan bi hegemonya Îsraîlê mumkîn dibe. Belkî herî zêde netew-dewlet yên Ereb hewcedarî Îsraîlê ne. Di cîhana Ereb de weke milletperestiya Îslama siyasî, ji milletperestiya laîk û dewleta wê ya netewe bêhtir bi problem e. Ev milletperestiya ku xwe disipêre îstîsmarkirina Îslama çandî bi tenê dikare bi rola tevgera faşîst a dereng rabe. Çawa ku bi mînaka El Qaîdeyê jî hat dîtin, ji rêxistineke provakasyonê ya ku netew-dewlet wê timî weke paravan bi kar tînin, wêdetir naçin û ev jî hatiye îspatkirin. Çi yên berê bin û çi jî yên ji nû ve dixwazin ava bikin bin, dewletparêziya netewe ya Ereb li ser jiyana civakî û li hemberî rêûresma Îslamî ji rola kefenfiroşiyê wêdetir bi roleke din ranabe, û wê nikaribe rabe jî. Hêmanên din ên kapîtalîzmê saziyên îndustriyalîzmê û kara herî zêde jî rewşa wan ji dewletparêziya netewe baştir nîn e. Îndustriyalîzm û kara ku xwe disipêrin petrolê û avakirina xaniyan çavkaniyên herî mezin ên bi problem ên paşerojê ne. Dema petrol biqede, bi hebûna bajarên mîna girêkan mezin dibin, dibe ku dema nêz a siberojê ji bo Ereban bibe mîna mehşereke bi rastî.

B-Netew-dewletokên Tirk bi şêweyên avabûna xwe ya mînîmalîst, çi ji aliyê DYE-YE ve bêne meşandin çi

ji aliyê Rûsyayê ve, wê ti carî nikaribin bi rola berê ya desthilatdarî û dewletên bi koka xwe Tirk rabin û wê ji statuya eyaleteke sîstema pêve ne, wêdetir nikaribin biçin. Jixwe li gorî pêdiviyên herêmî yên hegemonyayên kapîtalîst û sosyalîzma pêkhatî hatine koordînekirin. Ji bo barê rabihuriyê yê bûye asteng ji holê rakin û ji bo pêşî li serîrakirina gel bigirin hatine wezîfedarkirin. Mirov dema li nod sal rabihuriya wan binêre, mirov ê bi hêsanî karibe bibêje, bi vê rola xwe rabûne. Mîna ku ji bo rola Tirkan a di hezar salên dawî de pê rabûne berepaş bikin hatine erkdarkirin. Tevahiya wan jî xwe li rola mînîmalîzebûnê, xwe li nava xwe digirin. Mîna ku ti berpirsiyariya wan ji bo çanda herêmê û gelên wan tinebe tevdigerin, heta li hemberî hev jî bi roleke erênî ranabin. Ev rewşa wan bi zêhniyet û jiyana dewletparêz û milletperest a teng ku hînî wê bûne, têkildar e. Bi vî halê xwe yê heyî, ew nikarin bibin siya wê rabihuriya gelekî rexne dikin an jî carinan dilê xwe dibijîninê jî. Di paşeroja nêz de ew netew-dewlet e ku divê herî zêde reforme bibe. Lê di van demên dawiyê de modela weke senteza Îslama Tirk dixin sahneyê, ji reformê zêdetir weke pêdiviya sîstema hegemonîk a bi qereqoleke pêş bi gewde dibe. Ji aliyê naverokê ve xwe venaguherînin di lihevrekişandina wan li efendiyên wan de şensê wan kêm e ku para xwe bigirin. Mîna Ereban in, tev kom bibin jî bi qasî Îsraîlekê nakin û ji bilî girêdana bi hegemonya Îsraîlê ti şensê wan tine ye. Çawa ku heyîna wan bi şertên derketina holê ya Îsraîlê ve girêdayî bû, di dema xwe ya dawî de jî çarenûsa wan bi hebûna Îsraîlê diyar bibe. Lê eger ji qalibên jiyanê û zêhniyetên xwe yên heyî nebihurin. Hêmanên din ên modernîteya kapîtalîst di nava xwe de jî zêde hêviyê bi mirovan re çênakin. Li Komara Tirkiyê nexasim îndustriyalîzma li ser petrol, gaz û hinek madenan tevî turîzm, otomobîl û tekstîlê hatiye avakirin, ji niha ve erdên mirov li ser wan dimînin kiriye mîna goristanê. Kara herî zêde ya çavkorî ekolojî û çanda dîrokî ya tejaneya Firat-Dîcleyê tine dike û hewl dide aqûbeta gelê Kurd ê li vê qadê dimîne bike mîna ya gelên Ermenî û Suryanî. Netew-dewleta Tirk yeqîn dike ku bi qirkirina dawî ya Kurdan wê 'bi welat û milletê xwe yê yekparebûyî' heta hetayê weke netew-dewletekê bimîne. Eşkere ye ku modernîte û netew-dewletparêziya Tirk (eger paradîgma xwe neguhere) di paşeroja nêz de, di serî de gelên Kurd û Tirk, wê ji bo gelên herêmê û çandên civakî ji kefenfiroşî û gorkolanê wêdetir bi roleke din ranebe.

C-Rewşa Îranê û netew-dewletên din bêhtir bi pirsgirêk e. Jixwe netew-dewletparêziya Afganistan û Pakistanê bi awayekî xeternak ketine pêxîrtengiyê. Şerên sedsala dawî yên netew-dewletê belkî jî felaketeke ji bombeya atomê mezintir bi serê van gelan û çandan de aniye. Gelên

behsa wan têne kirin, bi komplo, hilweşîn û reşkujiyên ti carî di dîroka xwe de nedîtine rû bi rû dibin. Îran her kêlî dibe ku bi felaketa atomê re rû bi rû bibe. Çanda Îranê ji serî ve di serî de çanda netew-dewlet bi modernîteya kapîtalîst re pev diçe. Li dijî hêmanên têne ferzkirin hemûyan li ber xwe dide. Şîatiya weke diyardeyeke bêhtir herêmî û dîrokî tê ferzkirin, ji niha ve ji aliyê gelên Îranê ve hatiye fêhmkirin ku milletperestî ye, çêkirineke modernîteya kapîtalîst e, û bi vê maskeyê Şoreşa Îslamî ya Îranê tê pûçkirin, lewma li ber wê radibin. Bûyerên li Afganistan û Pakistanê diqewimin jî cuda nîn in. Tevî cambaziyên Hîzbullah, El Qaîde û Talîbanan jî ser rastiyê nayê girtin. Divê mirov ji bîr neke ku ev hersê saziyên bi maske jî ango Hîzbullah, El Qaîde û Talîban ji aliyê netew-dewletên xulam ve hatine damezrandin û niha jî li dijî efendiyên xwe yên hegemonîk DYE û Yekîtiya Ewrûpayê weke amûrên şantajê têne bikaranîn da ku ev netew-dewletên xulam karibin bêhtir parê bigirin. Ango ev amûrên tevkujî, reşkujî û komployan bi hev re ava kirine da ku pê hevdu terbiye bikin û ji bo para xwe bêhtir bikin li dijî hevdu bi kar tînin. Belkî jî di dîrokê de amûrên evqasî kirêt ên lîstikên komployan nehatine vedîtin. Bi van amûrên lîstikê yên komploger mîna bi darqîtik û pelê bilîzin, gel û çandên wan kuştin. Eşkere ye ku bi van amûran ne li Rojhilata Navîn êdî lingê sîstemê cih digirin, ne jî netew-dewletên hevkarên wê ne, diedilin û îfleh dibin. Nexasim Îran, rêûresma xwe ya dewletê ku gelekî kevn e, bi kar tîne û xwedêgiravî yeqîn dike ku wê bi modernîteya kapîtalîst karibe, ya rastî îmajeke wisa dide û li bendê ye ku ji aliyê sîstemê ve bê qebûlkirin. Bi vî awayî bikaranîna dîrokê, bi herhalî şêweyekî têkçûnê yê herî çavkorî ye. Tevlîhevkirina modernîteyê evqasî bi rêûresma dîrokî û rêûresmê jî evqasî bi modernîteyê re bi herhalî mirov bi tenê dikare bi 'xasûkiya Ecem' rave bike. Ji ber van sedeman, heye ku paşeroja nêz a Rojhilata Navîn di ser Îranê re bi gewde bibe û şikil bigire. Bi rastî Îran di navenda sereke ya guftûgoyên modernîteyê de ye. Milletperestiya Şîa çiqasî berevajî bike jî guftûgoya îdeolojîk û polîtîk a li ser modernîteyê her biçe wê mezin bibe û dewam bike. Gelên Îranê modernîteya kapîtalîst ji gelên din bêhtir nas dikin û bi biryar xuya dikin ku stûyê xwe li ber wê xwar nekin. Milletperestiya Şîa ya heyî çiqasî antî-Îsraîlî, antî-Emerîkanî û antî-Rojavayîtiya sexte bike bila bike, bi awayekî demdirêj gelên Îranê wê li modernîteya li gorî xwe bigerin û ew ê nikaribe pêşiyê li vê lêgerîna wan bigire. Heta bi DYE û Îsraîlê re li hev bike jî wê nikaribe vê helwesta xwe ya bi maske veşêre. Di çanda Îranê de gera li heqîqetê bi hêz e. Herweha li Îranê rêûresmeke jiyana komî ya bi qasî dîrokê kevin heye. Lewma di paşeroja nêz a Îranê de heye ku em şerekî rastî yê modernîteyê bibînin. Ya

rastî, Şoreşa Îslamî ya 1979'an şerekî moderniteyê bû, lê çeloxwarî kirin, ji rê derxistin. Gelên Îranê bi dersên ji vê şoreşê û demên dîrokê derxin, di paşeroja nêz de ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn bi şerên moderniteyê ku karibin rê li ber serdemeke nû vekin, bibin sedema bûyerên hêjayî dîroka xwe, hêjayî dîroka Rojhilata Navîn. Ji ber vê, guftûgoyên li ser moderniteya demokratîk û ezmûnên wê yên pratîk gelekî girîng in, û rênîşaner in.

**2- Di Pêxîrtengiya Rojhilata Navîn De Çareseriya Moderniteya Demokratîk**

Diyardeyên civakî nerm in. Di nava yên pir pêxîrtengî de jî timî îhtîmalên çareseriyê yên piralî hene. Pirs ew e, tesewirên çareserî xwe dispêrin wan têkiliya wan bi heqîqeta civakî re hene. Diyardeyên civakî mîna diyardeyeke fizîkî yan jî diyardeyeke kîmyawî bi qanûnan nayên pîvan û bi wan ve nayên girêdan. Ferdê xwedî heqîqet ji aliyê civaka xwe ve tê diyarkirin. Mirov nikare li ti ferd yan jî xwediyê heqîqetê serwext bibe heke mirov civakîbûna ew pêve girêdayî ji nedîtî ve were. Ji ber vê, her çiqasî sosyolojî zanista herî dereng bi pêş ketiye jî dîsa di serê wan zanistan de tê tim û tim pêdiviya xwe bi xurtkirin û gihiştinê dibîne. Mirov heta civakan fêhm neke, der barê pirsgirêkên wan de nikare xwe bigihîne çareseriyên para wan a heqîqetê zêde. Ji bo mirov pêxîrtengiyên civakî jî fêhm bike, hê bêhtir pêdivî bi têgihiştina civakan a heqîqetê heye. Di kêliyên pêxîrtengiyê de civak ji hev de dikevin ango di van kêliyan de heqîqetên wan vediguherin. Pêxîrtengî bi agahiyên berê yên der barê civakê de – û bi piranî ev agahî mîtolojîk, dînî û hozanî ne –ji hev nayê derxistin. Ji ber ku ji hev nayê derxistin, alternatîfên di çareseriyê de para wan zêde jî dernakevin holê. Di encamê de çiqasî heqîqetê bigire nava xwe wê ewqasî jî para çareseriyê diyar bike. Bi gotineke din, di çalakiya civakî de tişta serketinê diyar dike, hêza heqîqetê ya wî tiştî ye. Heqîqet bi xwe jî di diyardeya civakê de para hêzên jiyanê û maneya wan îfade dike. Îfadeyên para wan a heqîqetê zêde jî li gorî temsîla hêza jiyanê û maneya wê ya di nava diyardeya civakê de diyar dibe. Moderniteya kapîtalîst Rojhilata Navîn fetih kir û li gorî tehlîla dawî, ev ji serdestiya heqîqeta wê ya civakî li hemberî civakbûna Rojhilata Navîn e. Civaka Rojhilata Navîn li hemberî moderniteya kapîtalîst bûye civaka ji rêûresmê, lewma li hemberî heqîqetên moderniteyê êdî ti şensê nûnerên heqîqeta vê çandê yê serketinê pêkan nîn e. Bi kurtî, li hemberî heqîqeta Rojava heqîqeta Rojhilat lawaz bû û neçarî têkçûnê bû. Mirov nikare têkçûnê bike malê tevahiya civakê. Yên têk çûn xwediyên fermî yên heqîqetê bûn ango desthilatdar û dewletdar bûn. Ji ber ku heqîqeta serdest heqîqeta wan temsîl dikir. Têkçûn di tevahiya jêrsazî û jorsaziyên sîstema dewletê de bû.

Eger ên têkçûn di asta manûnemanê de li ber xwe nedin, temsîla heqîqeta nû êdî wê girêdayî hêza hegemonîk be. Ew êdî nikarin zêhniyeta civaka xwe û îradeya wê ya jiyanê diyar bikin. Ew êdî weke saziyên ajan û hevkarên hêzên hegemonîk di berdêla misogerkirina jiyana xwe de tenê dikarin xizmetê bikin û bi vê berpirsiyar in. Lê mîna gewdeyekî bêserî mayî gewdeyekî civakî li naverastê di cihê xwe de diperpite. Çawa ku me qala wê kir, bi vê perpitînê re yan wê birize, ji hev de bikeve di nava civakbûn û desthilatdariya nû ya modernîteyê de bihele tine bibe, yan jî wê ji ber karektera xwe ya nerm, bi gewdeyê xwe yê teslîm nabe wê bi zêhniyeteke azad xwe bigihîne biryara jiyaneke azad ango ji pêxîrtengiyê bi zêhniyeteke bêhtir azad derkeve û gav biavêje. Bêguman bi pêşengiya vê zêhniyeta nû gavavêtin, bi para heqîqeta wê ya nû ve girêdayî ye. Li şûna felsefe, huner, îdeolojî, zanist û hilberîna ekonomîk a fetha modernîteya kapîtalîst mumkin kiriye, zanist, felsefe, huner, îdeolojî û ekonomiyeke hilberînê ya nû wê serketina vê gavavêtinê diyar bike. Ev jî tê maneya modernîteyeke nû. Ji civakeke rêûresmê ya têkçûyî gavavêtina ber bi civakeke diçe serketinê ango bi modernîteyeke alternatîf a ji modernîteya kapîtalîst dibihure rizgarbûna ji pêxîrtengiyê bi awayekî serketî pêk tê. Civaka sosyalîzma pêkhatî bi sedema ku nikarîbû xwe bike modernîteyeke cuda ji hev de ket. Ji hersê hêmanên modernîteya kapîtalîst nebihurî. Jêbihurîn li aliyekî, kapîtalîzma burokratîk û hersê hêmanên wê zêde bi kar anîn. Di encamê de para heqîqetê ya avahiyên civakî yên ku wê çêkiribûn li hemberî para heqîqetê ya modernîteya kapîtalîst lîberal lawaz man, lewma têkçûn û ji hev de ketin. Li vir kapîtalîzma burokratîk li beramberî kapîtalîzma lîberal têk diçe. Kapîtalîzma burokratîk ne bi tenê nikarîbû xwe weke modernîteyeke cuda dîzayn bike, her wisa nikarîbû ji modernîteya kapîtalîst a lîberal bibihure û xwe weke modernîteyeke nû ya kapîtalîst pêk bîne. Tevgerên Îslamî yên dewletgir û desthilatgir ku mirov dikare wan weke tevgerên jirêderketî bi nav bike, bi para xwe ya heqîqetê ya paşvemayî ji sosyalîzma pêkhatî bêhtir îdeolojîk bûn, lê dîsa jî diyardeyên çeloxwarî bûn û ji têkçûnê rizgar nabin. Avahiyên civakî û îdeolojîk ên bêhtir li Misrê li Zanîngeha El Ezherê bi rêûresma Sunnî, li medreseyên li bajarê Qûmê yê Îranê bi rêûresma Şîa xwe modern nîşan didin, bi para xwe ya heqîqetê nêzî berniga modernîteya kapîtalîst a lîberal jî nabin. Tevî ewqasî hewldan û berxwedanên wan, li dijî Îsraîlê ku kakilê hegemonîk ê modernîteya kapîtalîst a Rojava ye, giş bibin yek jî dîsa dawiya wan bivênevê wê têkçûn be. Sedema vê jî ne sîlehên nukleer ên Îsraîlê ne û ne jî serdestiya wê ya teknolojîk e; li gorî tehlîla dawî, ji ber para wê ya heqîqetê

ye. Para heqîqetê ya Îsraîlê bi rêxistin kiriye, qatbiqat ji ya yên li hemberî wê zêdetir e. Her çiqasî mirov guman nake ku ew dixwazin xwe weke cîhaneke cuda nîşan bidin jî lê ji bo cîhaneke cuda kengî bi para xwe ya heqîqetê ji cîhana modern a kapîtalîzmê bihurîn hingê wê karibin îdea temsîlê ya jiyaneke ango modernîteyeke civakî ya para wê ya heqîqetê zêdetir bikin. Eger ev nebe, îdeaya modernîteyeke cuda ji îdeayeke pûç wêdetir naçe. Eger bibe jî wê bibe varyanteke rêûresmê ya maskeya modern daye ber rûyê xwe. Bi kurtî, rêûresma çandî ya Îslamî weke modernîteyeke cuda nîşandan, ji mijûliya qelpezanên ji berhemên kevin berhemên qelp çêdikirin û diforitin wê cuda nebe. Nexasim roja me ya îro îdeaya desthilatdariya fermî ya Îranê di warê modernîteyê de bi rewşa heyî ji qelpezaniyê wêdetir maneyeke xwe nîn e û şensê jiyanê nade. Modernîteya demokratîk a ku me di parêznameya Îmraliyê de hewl da guftûgo bikin, li ber rohniya van rexneyan em dikarin bêhtir rast pênase bikin. Serê pêşî divê rexneya modernîteya demokratîk a sosyalîzma pêkhatî rast were fêhmkirin. Ev rexne ne redkirina sosyalîzmê ye, ne jî qebûlkirina wê bi awayekî dogmatîk e. Weke ezmûnekê ji hev derdixe û heqîqeta wê ya modernîteyê ya antî-kapîtalîst bi awayekî cewherî qebûl dike. Bi awayekî teorîk û pratîk antî-modernîzma sosyalîzma pêkhatî dinirxîne, ji şaşiyên wê dibihure û rastiyên wê bi awayekî cewherî qebûl dike. Çanda ji rêûresmê ya Rojhilata Navîn bi awayekî zanistî analîz dike û heqîqeta di wê de weke çavkaniya herî girîng rojane dike. Modernîteya demokratîk bi tenê utopyayeke der bar paşerojê de nîn e. Pala xwe dide çandeke ji rêûresmê ya hezarê salan. Rastiya rojane ya vê çandê civaka heyî bi xwe ye. Ev civak çiqasî bêçare û bêçareserî hatibe hiştin jî dîsa rastiyek e. Ji ber ku rastî ye jî pareke wê ya girîng a heqîqetê heye. Analîzkirina wê, vê parê îfade bike. Divê mirov rêûresmê bi muhafezekariyê re tevlîhev neke. Muhafezekarî rêûresma civakê bi xwe nîn e; ya rastî, nûneriya rêûresma serdest e, ya ku li hemberî lîberalîzmê hewl dide xwe bigire û têkçûyî ye. Modernîteya demokratîk a pala xwe nede rêûresmê, mirov nikare weke modernîteya demokratîk behsa wê bike. Rêûresma civakî rastiya dîrokî ya modernîteya demokratîk e. Çawa ku civaka bêdîrok nabe, modernîteya demokratîk a bêdîrok jî nabe. Divê mirov rexneyên tevgerên ekolojîst û femînîst li modernîteya kapîtalîst girîng bibîne. Ekolojî jixwe weke zanista hawîrdorê ya bûye qurbana îndustriyalîzmê antî-kapîtalîst e; yek ji çavkaniyên bingehîn ên modernîteya demokratîk e ku dest jê nabe. Gavavêtina Femînîzmê tevî kêmûkurtiyên xwe hemûyan, bi qasî ku alîkariya heqîqeta jinê kiriye, hêja û bi nirx e. Modernîteya demokratîk bi xwe jî rastiya jinê analîz dike û xwe

dike heqîqet. Tevî vê yekê, ji bo ku rexneya femînîst û tevgera wê bike parçeyekî xwe yê dest jê nabe xwe nêzîkê wê dike. Belkî mirov bibêje parçe rast nîn e; jina azad weke kirdara sereke ya jiyanê tevlî sîstema xwe dike. Di çarçoveya şer û guftûgoyên modernîteyê de hêsan dibe ku mirov pêşbîniya çarenûsa modernîteya kapîtalîst di çanda Rojhilata Navîn de bike. Di tevahiya hewldanên me yên analîzê de xuya dibe ku ev çarenûs ê bi xwe diyar nebe. Kengî bi tesewira modernîteya alternatîf a îdeaya wê ya heqîqetê ji wê bi hêztir hebe wê karibe jê bibihure. Mirov vê jî bi rexneyên modernîteya demokratîk li hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst, bi rexneyên tevgerên femînîst, ekolojîst, çanda ji rêûresmê û sosyalîzma pêkhatî yên li wê kirin û nikarîbûn ji wê bibihurin, bikin yek û bi vî awayî mirov dikare hêza çareseriyê ya hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk nîşan bide. Mirov li gotinên di vê mijarê de hatine gotin hemûyan di çarçoveya rizgarbûna ji pêxîrtengiya civakî ya Rojhilata Navîn de bifikire, mirov ê karibe pêşbîniya çareseriya muhtemel bike.

a- Teoriya neteweya demokratîk hêmana sereke ya çareserker a modernîteya demokratîk e. Ji bilî teoriya neteweya demokratîk teoriyeke din nîn e li dijî teoriya netew-dewleta modernîteya kapîtalîst civaka mirovatiya gerdûnî mîna serjêkeran hûrhûrî kirî, civakê ji nû ve bigihîne hev û di nava azadiyê de li cem hev bigire. Teoriyên din ên civakî li hemberî pirsgirêkên roja me ya îro ji roleke marjînal pêve nikarin bi roleke din rabin û maneyekê îfade bikin. Teoriyên lîberal ên kapîtalîst, li şûna ku nexweşiyên kanserolojîk ên ku kapîtalîzmê li serê mirovatiyê dewamî kirine çareser bike û civakê bigihîne tenduristiya wê, bi tenê bi dayîna hinek dermanan temenê nexweşê kansêrî piçekî din dikarin dirêj bikin. Bi tevahî çareseriyên ev teorî pêşniyar dikin, pirsgirêkan mîna çiyan mezin dikin û bi vî awayî temenê modernîteya kapîtalîst hinekî din dirêj dikin. Bûyerên di sedsala dawî ya Rojhilata Navîn de diqewimin, vî hukmê em didin piştrast dikin. Civaka Rojhilata Navîn tevahiya dîrokê, heta beriya bi deh hezar salan di nava yekparebûneke çandî de jiyanek ava kir û di nava agirê Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, ev jiyan ji aliyê hêzên modernîteya kapîtalîst ve bi awayê qesabekî hat hûrkirin û ji înasafa cinawirên bi navê netew-dewlet re hat hiştin. Netew-dewlet bi awayekî herî berbiçav rewşa Levîethan îfade dikin ku di Pirtûka Pîroz de dewlet bi Levîethan re wekhev tê dîtin. Îcar ev netew-dewleta weke Levîathan tê dîtin bi derewên ji wan re polîtîka derve û hundir tê gotin rastiyan parçe dike û dadiqurtîne, ji vê jî wêdetir bi roleke din ranabe. Çanda civakî ya ketiye ser hev û ji aliyê dîrokî ve yekparebûneke

mezin îfade dike, dabeşî parçeyan dikin, li ser maseya înkar û îmhayê radixin û ji vê re jî civaka neteweyî ya modern dibêjin. Çanda dîrokî û civakî çiqasî parçe kirin û bi vî awayî înkar û îmha kirin, xwe ewqasî serketî hesibandin. Netew-dewletên bi rola qesabên modernîteya kapîtalîst rabûn, çiqasî karîbûn îmha û înkara rabihuriyê bikin û li şûnê saziyên ajan ên sîstemê û zêhniyetên oryantalîst serwer bikin, xwe li hemberî efendiyên xwe ewqasî serketî û bextewar hesibandin. Ji aliyê çanda Rojhilata Navîn ve di sedsala dawî de dabeşbûnên netew-dewletê û pêkanînên ji wan re polîtîka derve û hundir dihat gotin bi awayekî giştî tevgerên qirkirinê ne. Ji zêhniyetê heta bi cîhanên ekonomîk tişta hatiye kirin ew e, yekparebûna rastiyê hatiye parçekirin û xistine rewşekê ku hêmanên modernîteya kapîtalîst karibin wan bixwin û daqurtînin. Bi tenê ji bûyerên îro roj li Iraqê diqewimin em dikarin gelek tiştan hîn bibin û bi hêsanî em dikarin pê sedsala dawî binirxînin. Teoriya neteweya demokratîk, beriya her tiştî hûnandina cîhana zêhnî ya rawestandina bi vî şêwazê qesab parçekirin û gurandina yekparebûna çandî ye ango hûnandina cîhana zêhnî ya rawestandina netew-dewletê û ji nû ve destpêkirina yekparebûnê ye. Teoriya neteweya demokratîk hewl dide cîhana çandî ya Rojhilata Navîn li bin têgîna Yekîtiya Neteweya Demokratîk yekpare bike û weke prensîb vê li pêş digire û bi nirx dibîne. Cîhana me ya çandî tevahiya serdemên dîrokê yên di wan de hat avakirin, bi tevahiya cihêrengiya xwe yekpare bû; divê ew weke alternatîfa modernîteya kapîtalîst, li bin vê têgînê were yekparekirin. Em li sedsala dawî binêrin: Rewş her ber bi parçebûnê ve beridiye. Qewmê Ereb bi tenê dabeşî bîstûdu netew-dewletan nebûye; her yek ji wan weke pro-netew-dewlet misêwa dabeşî bi sedan zêhniyetên bi hev re nakok, rêxistin, eşîr û mezhebên bi hev re dijber bûye. Armanca felsefeya lîberal jî di çarçoveya mêtingeriyê de ev e. Ferdperestiya kapîtalîst ji bo civakê atomîze bike xwedî potansiyeleke bêdawî ye. Lewma teoriya neteweya demokratîk li ser riya diçe ji nû ve yekparebûna demokratîk û azad, yekparetiya bingehîn a prensîbî îfade dike. Ji ber ku me teoriya neteweya demokratîk di cildên din de analîz kiribû em ê li vir zêde li ser naveroka wê ranewestin. Bi kurtî, li gorî vê teoriyê ji bo netewebûyînê pêdivî bi têgihiştineke hişk a sînor nîn e, li heman mekanan û heta li bajaran neteweyên cuda di nava yekparebûnên cihêreng de dikarin xwe bi têgihiştina neteweyekî bi jorkomên neteweyan ava bikin. Bi vî awayî komên neteweyî yên mezin û komên neteweyî yên piçûk ên ji bo sînoran şer dikin wê tevî hindikayiyan karibin di nava yekparebûneke neteweyî de bi awayekî wekhev, azad

û demokratîk bimînin. Kengî bi tenê ev prensîb hat bicihanîn polîtîkayên sîstema hegemonîk ên ‘parçe bike-bi rêve bibe’ û ‘kîvroşk bazde, tajî bigire’ wê pûç bibin. Ev prensîb di warê bicihanîna aştiyê, wekheviyê û demokratîzekirinê de xwedî nirxekî ye, û kengî bi van aliyên xwe ve hat bicihanîn pêkanînên netew-dewletê yên gelac, şerûd, koleker, tebeqeker,despotîk û faşîst wê pûç bike, bi vî awayî jî wê di warê çareseriyê de rola xwe ya serdest îspat bike. Mirov bi tenê dikare bi zêhniyeta neteweya demokratîk milletperestiya netew-dewletê ya tekperest û mutleqker rawestîne. Ne bi tenê dabeşbûn û parçebûnên bêdawî yên Ereban, ji bo parçebûn û dabeşbûnên bi heman rengî yên Tirkan jî bêne rawestandin prensîb û teoriya herî di cih de ye. Ji Balkanan heta bi Qafqasan, ji Asya Navîn heta bi Rojhilata Navîn Tirkên li gelek deverên dinyayê bi awayekî dabeşbûyî, parçebûyî û çavkorî li pey xwedayê netew-dewletê diçin, li ser bingehê zêhniyetên metafizîk û pozîtîvîst ên oryantalîst pev diçin, dikevin qirika hev, lê karin bi teoriya neteweya demokratîk ji van bibihurin û li ser prensîbên wekhevî, azadî û demokrasiyê bigihîjin hev. Potansiyela Îranê heye her kêlî parçe û dabeş bibe, lewma netew-dewlet ji bo wê weke bombeyeke atomê ye ku di binê wê de hatiye danîn. Milletperestiya Şîa bi awayekî domdar dewletdariya netewe dijwartir dike û tevî cambaziyên wê yên modernîteyê hemûyan jî ev yek ê parçebûn û dabeşbûna Îranê ranewestîne, berevajî wê bêhtir bi lez bike. Teoriya neteweya demokratîk nexasim ji bo Îranê weke derman e ku divê rojane were bikaranîn. Çanda Îranê û gelê wê li dijî modernîteya kapîtalîst berxwedêr in, û bi tenê bi zêhniyeta neteweya demokratîk dikarin bigihîjin cîhana azadî, wekhevî û demokratîk a bi hesreta wê ne. Bi teoriya neteweya demokratîk Îran dikare reşkujî û komployên netew-dewletê yên bi hev didin şerkirin pûç bike û bigihîje aştiyeke bi rûmet. Di roja me ya îro de yek ji felaketên herî mezin di warê asêmayîna netew-dewletê de li ser xeta Afganistan-Pakistanê pêk tê. Her weha bi vê ve girêdayî pirsgirêka Keşmîrê jî bi temamî ji ber netew-dewletparêziyê ye. Pirsgirêkên Pakistan-Hindistanê, Pakistan-Bangladeşê ji ber heman zêhniyeta milletperest pêk hatine, hê jî pêk tên. Çareserî û aştiyên netew-dewletê li gorî xwezaya wê rê li ber şer û çaresernebûnê vedikin. Ev mînakên berbiçav jî vê rastiyê têra xwe rave dikin. Li Afganistanê xwestin modelên netew-dewletê yên hem komarger, hem monarşîk, hem jî sosyalîzma pêkhatî pêk bînin. Di encamê de civakeke Afganistanê ya jihevdeketî û nikare xwe dewam bike di nava şîddeta çavkorî ya ti prensîba wê nîn e û çavsorbûyî de heye. Ji bilî têgîn û teoriya neteweya demokratîk ti zêhniyet û îrade nîn e ku van koman

ji nû ve bi rêkûpêk bike û bigihîne azadî û jiyaneke demokratîk. Pirsgirêkên civakî heta bi awayekî zêhnî ji hev neyên derxistin, bi awayê avabûnê çareser nabin. Zêhniyeta neteweya demokratîk ji Asya Navîn heta bi Hindistanê ji bo gel û çandên gelekî cihêreng çarçoveya yekparebûnê ya herî baş pêk tîne. Jixwe gel û çandên li van mekanan tevahiya dîrokê li bin banên siyasî yên hevpar ên mîna konfederal û împaratoriyan mane, îdeal jî nebe, bi vî awayî hebûn û xweseriyên xwe karîbûne biparêzin. Milletperestî çi bi awayekî laîk û çi bi awayekî dînperestî bibe, heta zêhniyeta netew-dewlet dewam bike, bivênevê civak ê bêhtir ji hev de bikevin û li dijî hev şer bikin. Wê Îslamiyeta îddîa dikin ku gelekî pêve girêdayî ne jî weke îdeolojiyeke terorê pêşkêş dikin û bi vî awayî vê rêûresmê jî gelekî neyênî dikin. Yekîtiyên neteweyî yên demokratîk çi qasî ku ji bo Îranê, divê ewqasî ji bo van cografyayên berfireh pêşî herêmî û bi wê re di zikhev de li nava Rojhilata Navîn bêne pêkanîn. Netew-dewlet yên mîna Pakistanê ji niha ve gelekî ji hev de dikevin û alternatîfa vê ya herî di cih de projeyeke Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a li nava Rojhilata Navîn e. Têgîn û teoriya neteweya demokratîk ji bo rastiya kakila hegemonîk a netew-dewleta Îsraîlê jî bi roleke heyatî ya çareserker radibe. Ji bo paşerojê du rê li pêşiya Îsraîlê hene. Riya yekê, bi xeta xwe ya heyî ji bo hegemonya xwe dewam bike hingê wê timî şer bike û bibe împaratoriyeke herêmî. Çawa ku tê zanîn, ji Nîlê heta bi Firatê, heta jê jî wêdetir projeya Îsraîlê ya hegemonîk heye. Ev projeyek e ku piştî Împaratoriya Osmanî hatiye çêkirin. Her çiqasî di pêkanîna vê projeyê de gelekî gav hatibin avêtin jî di warê gihiştina wê ya armancê de hê jî kêm e. Di demên dawiyê de Îran derdikeve pêşiya wê û Îran jî bi heman awayî xwedî hesabên hegemonîk e, û ev dike ku di navbera wan de nexweşî û tengezarî çêbibe. Di navbera wê û Tirkiyê de jî nexweşiyek heye, lê nayê zanîn ka ev çiqasî ciddî ye. Di vê qonaxê de mirov dibîne ku wê pêvajoyeke bi şer a hegemonya herêmî pêk bê. Bivênevê ev pirsgirêkên ji ber netew-dewletê derdikevin holê wê mezintir bibin; hesabên hegemonîk ên li beramberî hev bi xwe rê li ber van pirsgirêkan vedikin. Ji bo Îsraîlê û gelên Cihû riya duyemîn ew e, ji nava çembera dijminan a her tim xurt dibe dikare derkeve, tevlî projeya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk bibe û li ser vî bingehî ji bo gavavêtinê dikare bibe xwedî însiyatîf. Sermayeya maddî û entelektuel a li pişta Îsraîlê ji bo projeya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk dikare bi roleke girîng rabe. Bi vî awayî hem dikare xwe weke neteweyeke demokratîk bêhtir têkûz bike, hem jî dikare vê li nava Rojhilata Navîn di çarçoveya yekîtiya neteweyî ya demokratîk de pêk bîne, û pê bigihîje wê aştî û ewlekariya

mayînde ya gelekî hewcedarî wê ye. Felaketên herî mezin ên netew-dewletê rê li ber wan vekiriye, li Rojhilata Navîn der barê wan gelan de ye ku hewl dan wan qir bikin. Gelên Helen, Ermenî, Suryanî û Kurd ên li Anatolya û Mezopotamyayê zû ketin xefika milletperestiyê, tevî ku temsîla çandên xwecihî yên herî kevin ên dîrokê dikirin jî ezmûnên dused salên dawî yên netew-dewletê ew anîn ber tesfiyeyê. Milletperestiya neteweya serwer a bi awayekî çavsorî hewl da di nava sînorên hişk de civaka neteweyî ya homojen biafirîne ji bo van gelan bi awayekî rastî veguherî felaketeke mezin. Eger têgihiştina neteweperestiyê ya modernîteya kapîtalîst nebûya, ev felaket jî wê pêk nehatana. Kapîtalîzmê elîta Tirkê Spî afirand. Mirov nikare li bernameyên afirandina neteweyên homojen ji pêdiviya daneheva sermayeyê serbixwe bifikire. Ji aliyê kategorîk ve yên ji qirkirinê divê berpirsiyar bêne dîtin Tirk nîn in, mîna li cem Elmanan, demekê yên ku li pey kapîtalîzma mîllî çûn komeke marjînal bûn. Di vê de, ne bi tenê para berpirsiyariyê ya milletperestên neteweya serwer e, di hişyarkirina cinawirê bi navê netew-dewlet de milletperestên neteweya bindest jî para wan a berpirsiyariyê heye. Li gorî ku careke din pêkan nîn e, yên hatine îmhakirin ji nû ve bêne vejandin, bi tenê zêhniyeta neteweya demokratîk dikare yên mayî bi awayê wan ên hindikayî li ser piyan bigire. Mînak dema xwestibûn netew-dewleta Tirkê Spî li Stenbolê ferz bikin, ji bo tevahiya çandên dîrokî yên li bajêr fermana mirinê hatibû dayîn an jî terqîna wan hatibû xwendin. Eger bi temamî tesfiyekariya çandê pêk bê hingê dawiyê wê Stenboleke yekçand bimîne û ew jî faşîzma çandî bi xwe ye, û ne tiştekî din e. Lê eger li Stenbolê zêhniyeta neteweya demokratîk pêk bê, hingê bi awayekî eşkere Stenbol ê di nava dewlemendiya çanda dîrokî de be. Mirov ji vî alî ve dikare li çandên Anatolya û Mezopotamyayê jî binêre. Bi tenê zêhniyeta neteweya demokratîk dikare tevahiya çandên dîrokî di nava aştî, wekhevî, azadî û demokrasiyê de li cem hev bigire. Her çand ê ji aliyekî ve xwe weke komeke neteweyî ya demokratîk ava bike, li aliyê din jî bi çandên din re ku di nava hev de ne, wê di asteke jor de bi yekîtiyeke neteweyî ya demokratîk bijî. Piştî ku ji têgihiştina neteweyî ya tekperest bihurîn wê bi xwe hewce nebînin ku hevdu bihelînin. Li şûna vê, çawa ku di dîrokê de bûye, wê di nava yekparebûna çandî de bi hev re bin. Eşkere ye ku êdî Ermenî, Helen û Suryanî wê nikaribin ji xwe re sînorên netew-dewletê xêz bikin û neçar in hebûna xwe dewam bikin, lewma alternatîfa herî di cih de zêhniyeta yekîtiya neteweyî ya demokratîk û avakirina xweseriya demokratîk e. Bi derengî be jî modernîteya demokratîk ji bo tevahiya gel û çandên di heman pêvajoyan re derbas bûne

penageheke zêhniyetê û xweseriya demokratîk jî modeleke ji nû ve bi gewdebûnê ye. Li herêmê mîrateya dewlemend bi tenê ji hebûnên etnîk û neteweyî pêk nayê. Dîn û mezheb jî komên li guhereke berfireh in. Mezheb û dîn bi şêweyên ji rêûresm û modern bi rengên nû yên digirin pirsgirêkeke ciddî ya temsîlê ne. Netew-dewletparêziyê beşeke mezin ji wan jî tesfiye kir. Lê ji ber ku netew-dewlet bi xwe diheze, ev mîrateyên dewlemend ên çanda dîrokî bi tenê dikarin xwe di çarçoveya têgîn û teoriyên neteweya demokratîk de îfade bikin. Hem ji ber têgihiştinên wan ên zêhniyetê hem jî ji ber şêweyên wan ên avabûnê, neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk ji bo wan modela herî di cih de ye. Li dijî felaketa bi navê netew-dewletê, ji bo tevahiya qadên bi heman rengî yên civaka dîrokî, civaka neteweyî ya demokratîk garantiya jiyana aştiyane, wekhevî, azadî û demokratîk e. Li Rojhilata Navîn netew-dewletparêziyê Kurd parçe kirin, li her parçeyî jî îmha û asîmîlasyonên cuda ferz kirin, lewma jî di vê tabloyê de rewşa Kurdan tam felaket e. Ne bi temamî dikarin bi fizîkî, ne jî dikarin bi çandî tesfiye bikin. Kurd mîna ruhberekî demeke dirêj li ber ruh dide, diperpite. Gelekî wisa ye ku hema bêje mîna wî li dinyayê tine ye. Ne bi tenê ji aliyê zêhnî ve seqet bûye, ji aliyê beden û gewde ve jî hatiye parçekirin. Ji aliyê civakî ve jî rê li ber şêwazekî jiyanê yê birîndar vekirine. Ne jiyana ji rêûresmê maye, ne jiyana modern heye. Jixwe heta dema dawiyê jî mafê tercîhê ji destê wî hatibû stendin. Bêguman ev rewş ji ber netew-dewletên modernîteya kapîtalîst avakirî derdiket holê. Hewldanên Kurdan ên ji bo netew-dewleteke bi ser neketibûn. Lewma avakirina Kurdan a netew-dewleteke bi berjewendiyên moderniteya kapîtalîst re li hev nekiribû û di vî warî de şensê wan nemeşiyabû. Roja me ya îro, netew-dewleta li Kurdistana Iraqê dixwazin pêk bînin, ji nêz ve bi hesabên hegemonîk ên moderniteya kapîtalîst ve girêdayî ye. Netew-dewleteke Kurd a mînîmalîst dibe ku bi kêra sîstemê bê. Tehlûkeya wê ev e: Dema sîstem bibêje “Li gorî berjewendiyên me nîn e” ji nû ve her kêlî dikare rê li ber tevkujî û qirkirinan veke. Min beşekî mezin ê parêznameya xwe ji diyardeya Kurd, pirsgirêka Kurd û çareseriya wê re veqetand. Rizgarbûna ji vê statuya xeternak an bêstatutiyê ku me bi kurtî ji nû ve da nasîn, eşkere ye ku bi tenê bi modela neteweya demokratîk dibe. Neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk weke zêhniyet û avabûn rê didin ku bêyî netew-dewletên heyî bêne hilweşandin, çawa ku li gelemperiya dinyayê jî tê dîtin, rêveberî bêne parvekirin û jiyana bi hev re pêk bê. Ji bo vê jî ya hewce rejîma destûra bingehîn a demokratîk e. ‘Komara Kurdistan a Serbixwe û Yekbûyî’ amentuya Kurdan e, û alternatîfa wê ‘Kurdistana

Konfederal a Demokratîk’ e. Di çarçoveya vê alternatîfê de destê xwe nade sînorên heyî, berevajî sînorên heyî weke sedema Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn qebûl dike. Di nava vê modelê de gelek komên çand û gelan dikarin xwe weke yekîtiyên federe bi rêxistin bikin. Li heman xwecihî, li heman bajarî, her cure komên etnîk, dînî, mezhebî û cinsî dikarin di nava aştî, wekhevî, azadî û demokrasiyê de bi hev re bimînin. Kurdistana Konfederal a Demokratîk her ku modela xwe ya neteweya demokratîk pêk bîne, wê her parçeyê wê bi civakên cîran re jî karibe bi hêsanî yekîtiyên bi heman rengî pêk bîne. Eger em bifikirin ku pêkhateyên bi heman rengî li Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê çêbûne, hingê eşkere ye ku Kurdistana Konfederal a Demokratîk kakilê Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn e. Herdu diyarde şensê wan heye di zikhev de pêk bên. Jixwe yekparebûna civakî û dîrokî ya Rojhilata Navîn jî vê ferz dike û li gorî vê ye. Li aliyê din, di van demên dawiyê de DYE dixwaze Projeya Rojhilata Navîn a Mezin bixe rojevê, lê ya rastî şensê vê projeyê zêde tine ye. Jixwe ev proje xwe dispêre netew-dewletê. Gelek projeyên bi heman rengî Rojhilata Navîn xistine nava tevlîheviyê. Projeya dawiyê jî rewşên rê li ber wan vekirine cuda nîn in. Heta mentiqê netew-dewletê neyê terikandin, ti proje nikare Rojhilata Navîn ji nava pêxîrtengiyên kûr û pirsgirêkan rizgar bike, ji şer û pevçûnan dûr bixe. Hem Yekîtiya Ereb û hem jî Rêxistina Konferansa Îslamî bi sedema ku bi heman mentiqê netew-dewletê seqet bûne, ti pirsgirêk çareser nekirine. Ji zêhniyet û şêweyê avabûnê yê heyî nebihurin şensê wan tine ti pirsgirêkê çareser bikin. Her weha li dijî DYE û hêza hegemon a xwecihî Îsraîlê hem Îran û hem jî Tirkiyê bi Hîzbûllah û El Qaîdeyê şerên serdestî û bandorzêdekirinê dimeşînin û ev pirsgirêkan bêhtir dikin ku nikaribin ji nav derkevin û ji vê jî wêdetir bi kêra tiştekî nayên. Hesabên wan ên ji bo para xwe zêde bikin, her kêlî dibe ku berevajî li wan vegerin. Bi tevahî van dekûdolabên berê û nû yên netew-dewletê Rojhilata Navîn xistin rewşeke darî çav. Bi navê “Em pirsgirêkan çareser dikin, em dîplomasiya sifir pirsgirêk dimeşînin” pirsgirêk bêhtir mezin bûne, ji navê nikarin derkevin û bûne mîna gulokeke lihevgeriyayî. Çawa ku me hewl da em nîşan bidin, ev rewşa Rojhilata Navîn eşkere ji ber netew-dewletê ye, û ji ber şêweyê avabûnê ye. Dîsa me bi heman awayî eşkere dabû xuyakirin ku ji bo derketina ji vê rewşa kaotîk, zêhniyeta neteweya demokratîk a modernîteya demokratîk û avahiya xweseriya demokratîk, paradîgma nû û modela herî di cih de ya wekhevîxwaz, azadîxwaz û demokratîk e. Modelek e ku riya aştî û ewlekariyeke mayînde nîşanî her kesî û her civakê dike.

b- Ekonomiya komun a demokratîk li hemberî meyla kara herî zêde ya kapîtalîzmê ku civak kiriye karker û koleyên bêkar, ji bo ji nû ve jiyaneke mirovane riya çareseriyê ye. Ekonomî diyardeyeke tevahiya dîrokê her tim bi awayekî komun hatiye pêkanîn. Ekonomiya bêyî komun nabe. Maneya peyva ekonomiyê bi xwe jî 'qanûna komuna malbatê' ye. Ango weke malbat karûbarên komunekê yên ji bo debarê ne. Şêwazê heyînê yê civakê bi tevahî bi awayê komunê ye. Di dîrokê de ekonomiyeke bi ferd destpêkirî tine ye. Dîrok û civak ekonomiya taybet nas nakin û bi kêmanî bi qasî netew-dewletê cinawirek e ku kapîtalîzmê afirandiye. Ekonomiya taybet tevahiya dîrokê timî bi 'dizekiyê' re wekhev hatiye dîtin û marjînal hatiye hiştin. Bi mezinbûna modernîteya kapîtalîst re weke kategoriyeke nû derketiye bazarê. Bi awayekî mîna mişkekî timî di binê erdê de mayî û bûye mîna pisîkeke derketiye rûyê erdê û ketiye nava bazaran. Di dîrokê de yên ji bo ekonomiya taybet an sermayeyê beziyane timî weke dizek hatine dîtin û kirine ku neyên dîtin. Bi mezinbûna hegemonya kapîtalîst re ev mişkên bûne pisîk li ser bazaran serweriya xwe pêk anîn û bi rastî ji bo civaka mirov bûn felaket. Bi tespîta gelekî di cih de ya dîroknas Braudel, kapîtalîzm ne ekonomî ye, yekdestdarî ye ku bi armanca karê li ser bazarê serweriya xwe çêkiriye. Çi kesayetên taybet bin, çi jî yekdestdariyên dewletê bin, yên li ser ekonomiyê serweriya xwe pêk anîn, pir baş serwext bûn ka çiqasî wê karibin komunê xira bikin ango rêxistiniya pêşî ya mirov a ji bo debarê têk bibin wê karibin dizekiya xwe bikin. Yekdestdariya taybet an yekdestdariya dewletê şêlandina ekonomiya komun e. Modernîteya kapîtalîst ji bo vê şêlandinê bike xwe dixe hezar û yek kiras û rengî û ev şêlandina wê hilweşandina bingehê komunê ango civakê ye. Bi tevahî nexweşî û krîzên ekonomîk bi jihevdeketin û hilweşîna ekonomiya komun a bingehê civakê dest pê dike. Dîroka kapîtalîzmê dîroka hilweşîna ekonomiya komunê ye. Encam ew e, felaketa herî mezin a civakî ya dîrokê pêk hatiye. Jihevdeketin û hilweşîna ekonomiyê, sedema rastî ya hilweşîn û jihevdeketina tevahiya qada civakî, exlaq û siyasetê ye. Jihevdeketina ekonomiyê, jihevdeketina civakî bi xwe ye. Di vê rewşê de li dawiyê bermahiyên bêkar, bêexlaq û bêpolîtîka dimînin. Yekdestdariya dewletdar û taybet a kapîtalîzmê ev e. Ji ber vê ye, di çarsed salên dawiyê de li tevahiya dinyayê, nexasim di serdema kapîtal fînansê ya roja me ya îro de pêxîrtengiya ji ber avabûnê derketiye asta herî jor û pêk tê, di salekê de çarsed mîlyon mirov bêkar hiştine. Jihevdeketina di civaka Rojhilata Navîn de bêhtir balkêş e. Jihevdeketina pêncî salên dawî yên jiyana komunê, rê li ber bêkarmayîna topyekûn vekiriye. Civaka Rojhilata

Navîn di ti dema dîrokê de evqasî ji hev de neketibû. Jixwe civaka Rojhilata Navîn hem ekonomiya komun pêşî pêk aniye, hem jî bi qonaxa hegemonîk a kapîtalîst li nava dinyayê jê re pêşengî kiriye. Pêxîrtengiya roja me ya îro ketiyê, bi têkçûna jiyana komun a ji sêsed hezar salî zêdetir bi aqlê xwe ava kirî re hevmane ye. Ji ber vê sedema dîrokî ye ku felaketeke topyekûn bi serê wê de tê. Encamên felaketa bi serê wê de tên, bi ti faleketa hov a di dîrokê de qewimiye mirov nikare bide ber hev. Ji ber ku di dema êrişên hov de jî jiyana komin her bingeh bû. Kes nedifikirî û kesî nedianî bîra xwe ku destê xwe bidiyê. Hovîtiya kapîtalîzmê cara pêşî bi mentiqê xwe yê herî îblîswarî aqil kir ku jiyana komun ji hev derxe û ji hev de bixe. Di vê de jî bi ser ket. Encamên vê serketina wê jî şerên çarsed salên dawiyê, talanên mêtingeriyê, ji kolekirina civakê bi awayekî klasîk xirabtir kolekirina civakê bi heqdestiyê û ji vê bêrehmtir jî bêkarhiştina civakê ye; bi vî awayî civak yekparebûna xwe ya exlaqî û polîtîk ji dest dide; dewrûber û hawîrdorê xira dike û tewazuna biyolojîk a dinyayê hildiweşîne; bin erdê vala dike, ser erdê qirêj û gemarî dike; ev jî felaket in ku bi serê avhewayê de tên. Eşkere ye ku ji bilî ekonomiya komunal a modernîteya demokratîk, tedbîreke din nîn e pêşî li encamên tehekumkar ên ekonomiya dewletdar û lîberal a modernîteya kapîtalîst bigire û ji heqê hilweşînên vê encamê derkeve. Divê mirov li ekonomiya komun weke vedîtin an doktrîneke nû nefikire. Ekonomiya komun planeke nû yan projeyek jî nîn e. Divê mirov wê weke şêwazekî heyînê yê civaka mirov an heqîqeta wê ya bêyî wê nabe fêhm bike. Eger civak dixwaze li ser piyan bimîne û hebûna xwe dewam bike, divê û neçar e ku ekonomiya kominê bike bingehê xwe. Dema ku mirov dibêje neçar e yan jî divê wisa be, belkî ev gotinên şert qanûneke hişk îfade dikin. Lê ji ber ku bêyî ekonomî nabe û ev ekonomî jî bêyî komun nabe, li vir şertê divê û neçar e di cih de ye. Ne tenê li Rojhilata Navîn, li tevahiya dinyayê, eger em dixwazin jiyana civakî dewam bikin, divê em ekonomiya komun bikin sereke. Ez sereke dibêjim, ji ber ku em kapîtalîzma taybet û kapîtalîzma dewletê mîna bi kêrekê bibirin nikarin qut bikin û biavêjin aliyekî. Mirov dikare weke berê wê marjînal bike û divê mirov komunê jî bike sereke. Civaka Rojhilata Navîn bi qasî Ewrûpayê û herêmên din ên dinyayê bi kapîtalîzmê re li hev nîn e. Ew qebûl nekiriye, wê xerîb dibîne û jê dûr disekine. Ji ber ku rehên wê yên komunê xurt in. Hêmana ekonomîk a komun a modernîteya demokratîk a pala xwe daye teknolojî û zanista serdemê ne ku bi tenê bi bandorên rizîner, hilweşîner û tarûmarker ên kapîtalîzmê re serî derdixe; ji bo jinûveavabûna tevahiya qadên civakî

bingehekî qehîm datîne. Lê kapîtalîzmê di sedsala dawî de ferd ewqasî aware, bêkar û antîcivakî kirine, ji bo mirov wan ji nû ve hînî ekonomiya komun bike pêdivî bi şoreşeke rastî ya civakî heye. Ferdperestiya lîberal bi qasî nexweşiya kansêrê bi tehlûke ye. Eger mirov wê bi girîngî derman bike dikare tevlî jiyana komun bike. Di vê de zêhniyet û perwerdeya exlaqî bi roleke girîng radibin. Lê dema ku mirov ber bi ekonomiya komunal ve gavê biavêje, divê mirov ji bîr neke ku ev bêyî siyaseta demokratîk nabe û pêwîst e ku mirov pir bi girîngî li vê serwext bibe û pêdiviyên wê bi cih bîne. Her weha nabe ku mirov aliyê wê yê exlaqî jî paşguh bike. Bi kurtî, ji bo jinûveavakirina ekonomiya komun pêdivî bi perwerdeyeke hişk a îdeolojîk, polîtîk û exlaqî heye. Dema em dibêjin ekonomiya komun, divê mirov bi tenê çend qadan tenê fêhm neke, ji qada cotkariyê heta bi pîşesaziyê, ji xizmetan heta bi zanist û zenaetan gelek qadan fêhm bike. Ekonomiya komun sîstemek e, bi qasî li gund tê bipêşxistin, li bajar jî tê bipêşxistin. Heta ekonomiya gund-cotkariyê ya modernîteya kapîtalîst ew tine kir dikare bibe alternatîfa ekonomiya bajêr a bûye kansêr û ev jî bi tenê li dora ekonomiya komun ava dibe. Ekonomiya komun a hemdem bi giranî ekonomiyeke gund-bajar e. Divê mirov ekonomiya gund-bajar şaş fêhm neke. Ev nayê wê maneyê mirov gund bike bajar û ne jî ji bajar veguhere gund. Divê mirov ekonomiya gund-bajar weke unîteya hemdem a civaka komunal fêhm bike. Hemin di dîrokê de meyla serdest bi karekterê gund-bajar bû. Gund û bajar bi awayekî nedurist ji hev veqetiyan û ev bi modernîteya kapîtalîst ve girêdayî ye. Tevahiya dîrokê di serî de li keviyên Firat, Dîcle, Nîl û Îndus-Pencabê, ekonomiyên li keviyên çeman giş komunal in. Jixwe ev ekonomiyên komunal in ku şaristanî mumkin kirin. Kapîtalîzmê bi meyla kara herî zêde bi polîtîkayên bendavakirinê, ne bi tenê ekonomiya bi gundan ve girêdayî hilweşand; erdên herî bi bereket, cureyên nebatan, cinsên heywanan û berhemên herî bedew ên arkeolojîk ên dinyayê daqurtand. Bi qasî îmhayên civakî îmhayên ekolojîk û arkeolojîk jî pêk anîn. Bi tenê ekonomiya komun a bi ser siyaseta demokratîk ve dikare pêşiyê li van hilweşînan hemûyan bigire. Îdeolojiyên şoreşger û polîtîkayên wan pir kêm behsa ekonomiya komun kirine. Nexasim sosyalîzma pêkhatî kapîtalîzma dewletê bi sosyalîzmê re wekhev kir û vê rê li ber felaketên mezin vekir. Ev nêzîkatiya sosyalîzma pêkatî bi qasî ku sosyalîzm rizand ekonomiya komunal jî ji fonksiyana wê ya rastî kir. Bi navê kolektîvîzmê desteka herî mezin bi kapîtalîzma dewletê daye kapîtalîzmê. Ekonomiya komun bi qasî ekonomiya taybet divê ekonomiya bi destê dewletê red bike,

ya rastî tehekuma ekonomîk qebûl neke. Nexasim divê yekdestdariya dewletê weke kolektîvîzma komun a riziyayî bibîne û di her şert û mercî de li dijî wê têbikoşe. Her weha divê mirov van xusûsan jî baş zanibe: Kapîtalîzm jî ber bi roja me ya îro di pêvajoyeke wisa de ye, bi awayekî xwe vediguherîne komunên kapîtalîst ên ji şîrketên malan pêkhatî û ji aliyê CEO'yên profesyonel (Chief Executive Officer) ve têne birêvebirin. Dixwaze vê pêvajoyê di her qadê de bimeşîne. Divê mirov vê weke xefikeke girîng a kapîtalîzma lîberal bibîne. Kapîtalîzma xwe weke sîstema holdîng xistiye qalibên komun, herî zêde bi vî awayê xwe dijminê ekonomiya komunal û civakê ye. Kapîtalîzm bi awayê xuya dike, her çiqasî îddîa bike ku ji şêweyên berê yên civakî bihuriye jî texsîr nake xwe bi awayên civaka qebîleyê bi rêxistin dike. Bi awayekî klantî û qebîletiya modern dimeşîne. Ji ber ku civakê li ser yekeyên civaka komunal ango klan û qebîleyan pêk tînin, mezin dibe. Lê modernîteya kapîtalîst xwe bi awayekî cewherî li ser înkara şikilgirtina civakî dihûne û pêk tîne. Dema xwe pêk tîne jî texsîr nake qalibên berê li gorî xwe difesilîne. Netew-dewletparêziyê, ji ber ku xwe li gorî yekdestdariyên kapîtalîst bi gewde kiriye, naxwaze ekonomiya komun nas bike. Ya rastî, ew jî weke yekdestdariyê dixwaze li ser wê serweriya xwe çêke. Netew-dewletgiriya li Rojhilata Navîn jiyana komunal ji hev belav dike û bi îdeaya çêkirina civaka homojen radibe. Jiyana komunal û civaka cemaet li pêşiya xwe weke asteng dibîne. Civaka îdeal a netew-dewletgiriyê girseyeke bêkêr e, ji tevahiya nasnameya dîrokî ya komun û cemaetê şuştî ye, bênasname û bêkesayet e, bûye civakeke kole mîna moriyan dixebite. Ya rastî, bi vî awayî ango civak bibe girseyeke bêkêr namîne, diqede. Fîlozofên mîna Nietzsche û Foucault dema gotin "Civak an mirov ji aliyê modernîteyê ve hat kuştin" dixwazin behsa vê rastiyê bikin. Kengî civaka bi kesayet, bi nasname û bi komun bê hilweşandin, civaka girse ya bêkêr a bênasname û bêkesayet çêdibe ku ev civak xweserî modernîteya kapîtalîst e, û tîpa welatî ya netew-dewletparêziyê ye. Rêûresmên naveroka xwe dîrokî ku di bingehê modernîteya demokratîk de ne, tev bi nirx in. Ji van ên sereke ekonomiyên piştgirî (zibare û palûte) û komunê bi rola yekeya bingehîn radibin. Ekonomiya komun yekeya bingehîn a neteweya demokratîk e. Çawa ku yekdestdariyên ekonomîk ên tehekumê yekeyên mêtinkariya ekonomîk ên bingehê netew-dewletê bin, yekeyên ekonomiya komun jî yekeyên jiyana ekonomîk ên bingehê neteweya demokratîk in. Neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk li ser ekonomiya komun mezin dibin. Em hewce nabînin ku naveroka ekonomiya komunê zêde rave bikin. Ji komuneke malbatê

bigirin heta bi neteweyeke demokratîk, li gorî pêdiviyê mirov dikare ji aliyê hejmarê ve zêde û ji aliyê naverokê ve bêhejmar yekeyan ava bike. Komunên fabrîqe û cotkariyê yên îdeal di serê van de tên. Dîsa komunên çûnûhatinê, tenduristiyê, perwerdeyê û kooperatîfên bi gelek armancan ji wan tîpên komunan in ku li pêş tên. Ya girîng ne ew e ku pêşî komun bêne diyarkirin, ya girîng ew e, li gorî pêdivî û kêrhatinê her cure yekeyên komunal bi hejmar û naverokeke di cih de bên avakirin û ti ferd bê komun neyê hiştin. Neteweya demokratîk ew netewe ye ku endamên xwe hemûyan bi komunan bi rêxistin û erkdar dike. Ferdê bê komun pêkan nîn e, û eger bibe jî ew nexweş ketiye û ketiye ber çerxa rizînê. Ferdên neteweya demokratîk, nexasim kadroyên wê yên avaker, wezîfeya wan a bingehîn ew e, ferdan hemûyan divê ji sedî sed bikin xebatkarên çalak ên yek an jî çend komunan. Di roja me ya îro de komên Rojhilata Navîn ji nava pêxîrtengiyên giran ên di navê de ne, di serî de bi komunên ekonomîk di her qadê de bi qasî ku bibin komun karin gavê biavêjin. Bêyî komunan gavavêtin nabe. Rêûresmên dîrokî û çandî kengî bi jiyana komunal di nava aktualîteyê de cih bigirin wê karibin hebûna xwe dewam bikin. Rêûresm nayê teqlîdkirin, lê mirov pişta xwe nede rêûresmê û xwe nespêrê jî nikare bijî. Lê rêûresm bi nirxên afirîner ên aktuel ku xwe nespêrin înkara rêûresmê û teqlîda wê, jiyana dîrokî-civakî digihîje maneya xwe ya rastî. Di vê de rêûresma komunal a ekonomîk bi rola sereke radibe. Komunên ekonomîk ji bo tevahiya welatan dibin. Ji bo pêşîgirtina li bêkarî û jihevdeketina civakê, gavavêtina dema xebata komunal divê. Nexasim bi zêhniyeta komun a xwenûkirî û li ser bingehê rêxistiniya wê vegera li gund û cotkariyê XEBATA ŞOREŞGERÎ ya herî hêja ye. Şoreşgeriya rastî ew e, mirov jiyana komunal a heyîna me ya dîrokî pêk tîne, di serî de li qada ekonomîk divê li qadên civakê hemûyan bi cih bîne. Çawa ku federalîzma demokratîk û xweseriya demokratîk rêxistinî û bi sazîbûna jiyana polîtîk a neteweya demokratîk e, yekîneyên ekonomîk ên komunal jî bi sazîbûn û rêxistiniya jiyana ekonomîk e. Federasyona Yekîneyên Ekonomîk komunal di asta xwecihî, neteweyî û herêmî de bingehê ekonomîk ê Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn îfade dike. Kakilê hêza hegemonîk Îsraîlê bi yekîneyên ekonomîk ên bi navê Kîbbutzê yekeyên gelekî dişibin ekonomiya komunal pêk anîne û ev jî serdestiya ekonomiya komunal îspat dike. Eger dixwazin ji hegemonyadariya netew-dewleta Îsraîlê bibihurin di qada ekonomîk de ji bilî gavavêtina ekonomiya komunal riyeke din nîn e. Her weha rizgarbûna ji hegemonya kapîtalîst û her cure mêtinkariya wê ya yekdestdariyê bi ekonomiya nû ya komunal a bingehê

maddî yê wekhevî, azadî û demokrasiyê ye, dibe. Li Kurdistanê rêûresmên ekonomîk ên komunal bi zor û zehmetî be jî hê hewl didin li ser piyan bimînin, lê ji ber ku netew-dewletê civak hilweşand pê re girseyên mezin ên bêkaran çêbûn, koletiya bi heqdesteke kêm pêk hat û mirov li ser erdên xwe bûn rêncber, lewma ji bo kesên bi van sedeman maneya jiyanê û rûmeta xwe ji dest dane, jiyana ekonomîk komunal a nûkirî riya bi tenê ya rizgariyê ye. Mirov roja me ya îro li ser van erdên dîrok û civak bi komunî pêk hat, bi tenê dikare bi endustriya ekolojîk û ekonomiya komunal a neteweya demokratîk û moderníteya demokratîk li dijî moderníteya kapîtalîst û netew-dewletparêziya wê, talana îndustriyalîzma wê û xebatên wê yên hilweşîner ên li pey kara herî zêde, şoreşa herî mezin pêk bîne. Bi vî awayî di nava civakeke wekhev, azad û demokratîk de mirov dikare qadan bike cihên ewle, bi rûmet, delal û aştiyane.

c-Sê hêmanên moderníteya demokratîk hene û yek ji van hêmanên sereke li dijî îndustriyalîzma kapîtalîst îndustriya ekolojîk e. Mirov dikare îndustriyalîzmê weha bide naskirin, kapîtalîzm teknîkê ji bo meyla xwe ya kara herî zêde bi awayekî bêsînor bi kar tîne. Meyla kara herî zêde çawa ku dewlet weke amûrê desthilatdariya herî zêde bi awayê netew-dewletê ji nû ve bi rêxistin kir, gurçûpêçiya teknîkê ya bi armanca kara herî zêde jî bi awayê îndustriyalîzmê bi rêxistin kir. Tehlûkeya bingehîn a îndustriyalîzmê ew e, civaka cîhanek wê ya zindî û bi his heye vediguherîne goristana amûrên mekanîk û civakê dike robot. Eger îndustriyalîzm neyê bisînorkirin, ti civak nikare cîhana xwe ya hestan bi awayekî durist dewam bike. Makînekirina civakê piştî qonaxeke diyar wê veguhere hilweşîna civakê. Aliyê kapîtalîzmê yê ji şer bêhtir bi tehlûke ew e, meyla wê heye îndustriyalîzmê timî herî mezin bike. Dinya ji niha ve bûye êsîrê amûrên ferazî û bajarên ji hawîrdorê qut. Îndustriyalîzm dike ku bajar mîna kansêrê zêde bibin. Bajar bûne cinawirên dinya me ya zindî dadiqurtînin. Bajarên şêniyên wan bi mîlyonan bi deh mîlyonan ti maneyek wan a civakî tine ye û bi ti awayî hewcedarî bi hebûna bajarên bi vî rengî tine ye, lewma bi awayekî kansêrwarî mezinbûna wan ji nexweşiyê bêhtir ti maneya xwe nîn e. Bi vê ve girêdayî, bi tenê qezayên rê li ber vedikin û mirina mirovan a di warê çûnûhatinê de ji niha ve ji bîlançoyên şeran bihuriye. Dîsa ji ber ku dengên nexweş derdixin, hewayê qirêj dikin û gewdeyê mirov têk dibin, ew êdî ji amûrên çûnûhatinê derketine. He rweha yek ji qada sereke ya îndustriyalîzmê amûrên ferazî, nivîskî û dîtînî ne ku têkiliya xwe bi heqîqetê re nemane û mirovatî hînî cîhaneke ferazî kirine. Ango kirine ku mirov bûne nexweşê wan û serê xwe ji ser wan ranakin. Girseyên ferdan

metropolan hilneweşiyabin jî ji ber xisletên hezar salan ên xirakirinê yên sîstema şaristaniya navendî û civaka neolîtîkê ya beriya wê, ji vî alî ve demeke dirêj bi hilweşînê re rû bi rû mane. Ji ber ku ji pênc hezar salan zêdetir ji şaristaniya navendî re dergûşî kiriye, hilweşîn gelekî di asta jor de pêk hatiye. Li vê cografyayê gelek qad bêdaristan hatin hiştin û ev gelekî bi awayekî berfireh hatiye meşandin. Ev herêma ku demekê buhişta nebat û heywanan bû, niha dibe cehennema wan. Herêm di rewşeke welê de ye ku herî zêde pêdiviya wê bi jiyana ekolojîk heye. Îndustriyeke bi temamî ekolojîk dikare herêmê ji nû ve bigihîne ew rewşa wê ya berdar û bi bereket. Xisleteke wisa ya pirsgirêkên civakî heye: Li kîjan deverê pirsgirêk giran bûbin, li wir riyên çareseriyê jî ewqasî gihiştine, stewiyane. Mirov nikare li pirsgirêkên bêçareserî bifikire. Şert û mercên zeman û mekan ên lê pirsgirêk diberidin, şertên çareseriyê jî bi xwe re hildigirin. Mîna li gelemperiya dinyayê, li Rojhilata Navîn jî prensîba çareseriya ekolojîk, bi kêmanî bi qasî şoreşên siyasî girîngiya xwe ya çareseriyê çêbûye. Di vê mijarê de jî Îsraîl mînakên serketî pêşkêş dike. Serdestiya xwe ya zanistî û teknolojîk di îndustriya ekolojîk de bi kar tîne û li çolan çarçoveya jiyaneke cennetwarî pêk tîne. Li tevahiya welatên herêmê bi ekonomiya komun re îndustriyên ekolojîk ên werin bikaranîn, wê avabûna civakê bi awayekî azad, ên têkiliya xwe ji civakê û heqîqetê qut, atomîzebûna civakê îfade dikin. Îndustriya amûrên şer û girseyên jihevdeketî û ji civakbûnê derketî, ji zû ve gihiştine wê astê ku ji her alî ve civakê daqurtînin. Mirov weke ruhberekî bi hawîrdora xwe heye, tevî gelek ruhberên li dewrûbera xwe – nebat û daristan jî di nava vê de ne –ji aliyê îndustriyalîzmê ve di çarçoveyeke ekolojîk de tê daqurtandin. Bêguman li dijî teknîkên îndustriyalîzmê yên bûne amûrên hilweşandinê û modernîteya kapîtalîst a rê li ber wê vedike, nêzîkatiya modernîteya demokratîk bi temamî ekolojîk e. Îndustriya ne ekolojîk, bi kêmanî bi qasî kapîtalîzmê û netew-dewletê amûrê hilweşandina civakê ye. Hêmanên modernîteya demokratîk neteweya demokratîk û ekonomiya kominal ji bo bêne bicihanîn, bêguman nikarin ji teknîk û îndustiryê bêpar bimînin. Berevajî ev li ser modernîteyê û hêmanên wê ferz dike ku pêşketina zanist û teknolojiyê di îndustriyê de bi kar bînin. Maneya rastî ya îndustriyê ji bo civakê di vir de derdikeve holê. Îndustrî di nava yekparebûnê de çiqasî bi kêra civakê, xurtbûna wê ya exlaqî û polîtîk, pêşketina wê ya demokratîk û ekonomîk bê, ewqasî hêja ye. Bêguman destnîşankirina asta vê bikêrhatina îndustriyê yek ji wezîfeya sereke ya rêveberiya exlaqî û polîtîk e. Civakên Rojhilata Navîn her çiqasî ji aliyê îndustriyalîzma kapîtalîzmê ve bi qasî welatên

wekhev û karibe domdar bibe ji nû ve mumkin bike. Hemin pêdiviya civakê bi van gelekî heye. Li şûna îndustriyalîzmê xweşhaliya ekolojîk pêdiviyeke rastî û li rêza pêş e. Welatên Ewrûpayê yên pêşketî dema îndustriya xwe ya ne ekolojîk dixwazin weke îndustriya ekolojîk bidin rûniştandin, tekstîl, otomobîl û turîzma wan tedarik bikin hingê ew ê van pirsgirêkên civakî bi tenê giran bikin. Kapîtalîzm bi vê riyê hêmanên hilweşînê yên mirovatiyê globalîze dike. Binesaziya teknîk a modernîteya demokratîk divê ekolojîk be. Bêyî înkara îndustriyalîzm û îndustriyê, ekonomiyeke ekolojîk komunal a bê bipêşxistin wê bibe hêza pêkhêner a jiyana neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk têkûz û yekpare dike.

Kurdistan weke welatekî lê netewdewletparêzî û îndustriyalîzma kapîtalîzmê herî kêm bi pêş ketiye, dikare vê rewşa xwe ji bo avakirina ekonomiya ekolojîk û komunal bi awayekî herî baş binirxîne.

Di vî warî de rewşa xwe ya paşvemayî dikare veguherîne avantajê. Bi tevahî girseyên mirovan, girseyên bêkaran dikare di ekonomiya ekolojîk û komunal de bi rêxistin bike, welatê berê cennet bû dikare li ser riya şaristaniya demokratîk weke neteweya demokratîk ji nû ve ava bike. Ji bo vê hema bi tenê rûmet û eşqa ji bo jiyaneke li welatê azad û civaka demokratîk hebe bes e!*

*Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Rêber Apo, Weşanxana Şilêr, 2018, p:650-678*

# EZMÛNA DEH SALAN A ŞOREŞA ROJAVA

**Pêdiviya şoreşan bi girseyên gel ên rêxistî û pêşengiya îdeolojîk heye. Dema ku mijar dibe Kurd û erdnîgariya Kurdan ev pêdivî zêdetir sotîner dibin.**

HEVALÊ RAÛF

Mirov projeksiyonê bide ser tecrûbeya pratîkî ya 10 salên şoreşa Rojava wê bi qasî çareserkirina pirsgirêkên rojane yên şoreşê di warê avakirina civaka siberojê de jî pir girîng be. Şoreş, heke di encam de wê wekî avakirineke nû ya civakî bê bidestgirtin, pêdivî pê heye ku em ji bo pirsa, 'em li ku derê vî karî ne?' li bersivê bigerin. Ji bo ku mirov di şoreşê de roja îro fêmbar bike divê mirov fêm bike ka duh çi bûye. Heger mêzekirin bi perspektîfeke dîrokî çênebe zehmet e ku armanc û hedefên şoreşê bi têrkerî bên fêmkirin. Ronîkirina paşxaneya dîrokî ya ku karakterê şoreşê, xisletê şoreşê, perspektîfa îdeolojîk a şoreşê, pêşengiya wê, avaniya wê ya rêxistinî,

tifaqên wê, stratejî û taktîkên wê diyar dike ji bo fêmkirina siberojê gelekî girîng e. Ji bo ku hafizayeke dîrokî jî çêbibe pêwîst e ku pêvajoyên dîrokî bi hesasî bên bidestgirtin.

Pêlên helezonî yên bihara Ereban, ku di sala 2010'an de li Tûnisê dest pê kir, dema ku di Adara 2011'an de gihişt Sûrî ji destpêkê ve nediyar bû ku wê mesele ber bi ku ve biberide. Nedihat pêşbînîkirin ku wê rabûna girseyî heta ku derê ve biçe û li ku derê bisekine. Bûyerên girseyî di nîvê Nîsanê de jî li seranserî Sûrî belav bû. Hêzên dijberî rejîmê yên li Sûrî derketin holê, beşên muxalîf ên ku di nav de komên çete jî hebûn, gelek bajar û bajarok xistin bin kontrola xwe. Li welatên ku bihara Ereban tê re derbas bû rêveberî guherîn. Feqet li Sûrî bandora dihat payîn çênebû û rê li ber kûrbûna şerê navxweyî vekir. Gelên Sûrî li beramberî guherîna muhtemel mîna girseyên bê rêxistinî bûn, ji perspektîfa îdeolojîk bêpar bûn û wisa bê amadekarî hatin zeftkirin. Sûrî hat halekî wisa ku ji destwerdanên derve re vekirî be. Rêxistinên terorî yên Îslamî ji aloziya şerê navxweyî sûd girtin, wekî li Iraqê kirin hewl dan li erdnîgariya Sûrî jî serwer bibin. Ruxmî ku li Sûrî otorîteya dewletê di asteke mezin de şkiyabû jî bi temamî ji holê nehatibû rakirin. Hêzên koalîsyonê yên bi pêşengiya DYE hatibû avakirin, Rûsya û Îran jî tevlî şer bûn û ev yek bû sebeb ku şerê navxweyî yê Sûrî asteke navneteweyî qezenc bike.

Li seranserî Sûrî şerê navxweyî kûr bû, bajar hilweşiyan, bi milyonan însan birîndar bûn û mirin û bi qasî wan jî însan penaber bûn. Sûrî ber bi kaosekê ve dehf dan, di serî de êrîşên komên çete û bi taybet jî êrîşên dewleta Tirk, destwerdanên ji derve hatin kirin bû sebeb gelek xwîn ji Sûrî biçe. Bû sedem ku krîza li Sûrî kûrtir bibe û karesatên însanî zêdetir bibin. Hilweşîneke ji ya di 2003'yan de hatibû serê Iraqê mezintir di sala 2011'an de bi serê Sûrî de hat. Pirsgirêkên siyasî, ekonomîk û ewlekariyê kûrtir bûn, bêîstiqrarî her çû zêdetir bû. Sûrî bû welatekî ku kaosa Rojhilata Navîn ji herî kûranî ve dijî.

Li Rojava, li cihê Kurd dijîn, ev pêvajo gelekî bi endaze derbas bû. Piştî aloziyên navxweyî yên Sûrî dest pê kir bi salekê rewşa niha ya Rojava hêdî hêdî teşe girt. Di 18'ê Tîrmeha 2012'an de gelê Kobanê hêzên rejîmê ji bajar derxist û bajar kontrol kir. Piştî rojekê, di 19'ê Tîrmeha 2012'an de jî hemû erdnîgariya Rojava ji bin kontrola hêzên rejîmê hat derxistin. Ev rewşa êdî wekî Şoreşa Rojava hat bibîranîn.

Bêguman mirov dikare behsa rewşeke fîîlî bike. Ev rewşa fîîlî ya ku bi pêvajoya bihara Ereban dest pê kir veguherî şoreşê. Helbet ev yek ne rewşeke jiberxweve ye. Pêdiviya şoreşan bi girseyên gel ên rêxistî û pêşengiya îdeolojîk heye. Dema ku mijar dibe Kurd û erdnîgariya Kurdan ev pêdivî zêdetir sotîner dibin. Erdnîgarî û gelekî ku sîstema kapîtalîst

a kûrewî parçe kiriye heye. Di vir de rakirina vî gelî ji baweriyan jî wêdetir hêzeke mûcîzewî pêwîst dike. Ji ber ku beriya her tiştî, Kurdistan sed sal in welatekî mêtingeh e. Di nava çar welatên mêtinger de hatiye parvekirin, erdnîgariya wê wekî çar parçeyan hatiye dabeşkirin û gelê wê hatiye parçekirin. Gelekî wisa qirkirinên fîzîkî û çandî dîtiye û bi asîmîlasyonê re hevrû bûye heye. Ev gel gihandina şoreşê pir zehmet e. Wekî nirxandin bê gotin, hema di demeke kurt de hişmendiya neteweyî çêbûye, organîze bûye, dest bi têkoşîna azadiyê kiriye û şoreş pêk aniye, ev ê zêde cihê xwe negire. Ji ber vê yekê jî, li beramberî rewşa fîîlî ya li Sûrî gelê herî amade bêguman Kurd in.

Şoreşa Rojava ne tevgereke wisa ya gel e ku li gel bihara Ereban jiberxweve pêş ketibe. Jixwe Bihara Ereban jî çiqasî ‘bihar e’ mijareke nîqaşê ye. Dema ku destwerdana hêzên kapîtalîst ên li ser herêmê û pirsgirêkên li herêmê gihiştin hev protestoyên berfireh ên gel çêbûn. Dema ku çalakiyên protestoyî fireh bûn û di nav dewletên Ereb ên li dora Deryaspî de bandora domînoyê kir navê ‘Bihara Ereban’ girt. Kurdan karîbû vê firsenda dîrokî û zemanê ku ji bo şoreşê kamil bûye baş binirxanda. Kurdan bi perspektîfa xwe ya şoreşê li cem gelên li herêmê berê xwe dan pratîka înşakirina siberojeke nû û vê yekê destketiyên girîng anîne. Şoreşa Rojava şoreşeke wisa ye ku di neqeba kaosa Rojhilata Navîn de zîl daye. Lewma jî pêwîst dike ku mirov avaniya fikrî ya îdeolojîk-felsefî ya şoreşê, dînamîkên wê, pêkhateyên wê yên gel, şert û mercên wê, bingehê wê yê pêkhatinê, bi kurtî şert û mercên wê yên objektîf û sûbjektîf hesab bike.

Dikare bê gotin ku Şoreşa Rojava wekî zarokeke ne li ser rêya sîstema serwer a dinyayê hatiye dinê û hêna di dema pitikbûnê de hatiye xwestin ku di nava dorpêça sîstema kapîtalîst a kûrewî û netew-dewletên herêmê de bê fetisandin. Avaniya zihniyetê ya şoreşa Rojava li hemberî sîstema kapîtalîst a kûrewî pozîsyon girtiye. Bi temamî li ser hêza xwe pêş dikeve. Karaktera xwe ya azadîxwaz bi piştgiriya xwe ya ji gelan digire qezenc dike. Bêyî ku bikeve nav nakokiyên berjewendiyên dewletên serwer, bêyî ku bibe aliyek rêya xwe xet kiriye û dimeşe. Ev yek pêşketineke şoreşî ye.

Şoreş li erdnîgariya Bakur û Rojhilatê Sûrî ji aliyê hêzên xweparastinê yên ku ji pêkhateyên gelên li herêmê pêk tê hatiye pêşxistin û sînorên erdnîgariya Rojava derbas kiriye. Pêkhateyên gel ên ji Kurd, Ereb, Çerkez, Tirkmen, Asûrî-Suryaniyan pêk hatiye Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) ava kirine, rêveberiyeke xweser saz kirine. Ev yek ji bo çareseriya pirsgirêka Sûrî wekî modeleke ku pêşiyê vedike derketiye holê.

**Çavkaniyên Bingehîn ên Şoreşa Rojava**

Her çiqasî dîroka pêkhatina Şoreşa Rojava wekî 19’ê Tîrmeha 2012’an hatibe diyarkirin jî bingehê pratîkî yê şoreşê beriya bi dehan salan hatiye

danîn. Zanebûna bi dîroka rabirdûyê wekî xetkirina bextê siberojê ye. Ji ber vê yekê pêwîst dike ku mirov bi kurtî jî be li dîrokçeya beriya Şoreşa Rojava binêre.

Erdnîgariya Kurdan bi peymanên Qesra Şîrîn (17'ê Gulana 1639'an), Sykes-Pîcot (29'ê Nîsana 1916'an) û Lozanê (24'ê Tîrmeha 1923'yan) wekî çar parçeyan hat parçekirin û piştî wê ji bo cografyaya Kurdan a di nava sînorên Sûriyeyê de ma 'Bin Xet' hat gotin. Piştî pêvajoya şoreşê jî navê Rojava girt. Di dema BAAS'ê de Kurdên li Rojava hem di warê cografîk de hem jî di warê nifûsê de nikarîbûn xwe di nava sînorên Sûrî de îfade bikirana. Bi gelemperî li ba gelê Rojavayê Kurdistanê hişmendiyeke welatparêziyê heye. Di hin beşên dîrokê de li gorî berjewendiyên neteweyî li parçeyên din ên Kurdistanê tevlî berxwedanan bûne. Li Sûrî li dijî mêtingeriya Fransa jî bi awayekî çalak cih girtine. Dîsa bi berxwedanên li Bakur û Başûrê Kurdistanê re eleqedar bûne û bi awayekî fîîlî tevlî jî bûne. Li her devereke Kurdistanê ya ku li dijî mêtingeriyê berxwedan pêş ketiye Kurdên li Rojava teqez di nava têkoşînê de cihê xwe girtine. Tevlî tevgerên çepgir-sosyalîst jî bûne, her wiha li Rojava jî rêxistinên mîna vê hatine avakirin. Di vê demê de mînaka herî watedar di şexsê Osman Sabrî de derketiye holê. Dîsa di warê wêjeya Kurd de Cîgerxwîn di asteke neteweyî de bandor kiriye û ronî kiriye.

Ji bo rêxistinên ji Başûrê Kurdistanê, rêxistinên wekî PDK û YNK'ê, bi salan malovanî kirine. Tevkariyên pir girîng ji bo berxwedana Başûrê Kurdistanê kirine. Tevlî van rêxistinan bûne û di nava şer de jî cihê xwe girtine. Mirov dikare mînakên bi vî rengî zêdetir jî bike.

Li cem gelê Rojavayê Kurdistanê hişmendiya kûr a welatparêziyê her tim hebûye. Di nava Rojava de biçûk-mezin gelek rêxistin hatine avakirin. Ji bo fikrên rizgariya neteweyî her tim vekirî bûye. Lêgerînên ciwanên şoreşger jî dewam kiriye. Ronîbûneke cidî dîtiye. Derketina mezin a esasî ya îdeolojîk jî piştî ku têkoşîna rizgariya neteweyî ya li Bakurê Kurdistanê pêşketî nas kir pêk aniye. Ji destpêka salên 1980 û şûn de di serî de ciwanên zanîngehê li seranserî Rojava ciwanên şoreşger-welatparêz di nava PKK'ê de cih girtine û tevlî têkoşîna şoreşgerî bûne. Gelê welatparêz ê Rojava PKK zû nas kiriye, ji hemû partiyan zêdetir li dora PKK'ê kom bûye û bûye tevgera gel a rêxistî. Ev rewş bingehên esasî yên şoreşa niha pêk tîne.

**Çavkaniya îdeolojîk a Şoreşa Rojava**

Guhertina herî mezin a ku qedera gelê Rojava guhert têkoşîna şoreşgerî ya li Bakurê Kurdistanê ye. Pêla şoreşgerî ya li Bakurê Kurdistanê ber bi Rojavayê Kurdistanê ve hat veguhestin û gelê Rojavayê Kurdistanê beriya bi dehan salan îdeolojî û pratîka têkoşîna rizgariya neteweyî nas kir. Ev pêvajo dema ku Rêberê Gelê Kurd Serok Apo ji Bakurê Kurdistanê derbasî Rojavayê

Kurdistanê bû û ji wir jî derbasî Lubnanê bû dest pê kiriye.

Di vê demê de li seranserî dinyayê şoreşên gel ên demokratîk û têkoşînên rizgariya neteweyî li pêş in. Di demeke wisa de Tevgera Azadiya Kurd li Rojhilata Navîn vebû. Ev di heman demê de dihat vê maneyê ku têkoşîna şoreşgerî ji bo gelên Rojhilata Navîn jî tê veguhestin. Tevgera PKK'ê li Filistînê di demeke kurt de ji bo xwe di nava rêxistinên Filistînî de bingehekî cidî çêkir. PKK'ê di heman pêvajoyê de di nava Rojava de jî xwe di nava gel de belav kir. Ev yek hestyarbûna gelê Rojavayê Kurdistanê ya li beramberî şoreşgeriyê nîşan dide. Di demên piştre de jî gelê welatparêz ê Rojavayê Kurdistanê tevlî nav têkoşîna azadiya Kurdistanê bûye. Ciwanên wê yên şoreşger di nava şerê li dijî mêtingeriyê de bi awayekî çalak cih girtine û bi hezaran şehîd dane. Heger îro behsa şoreşa Rojava tê kirin, pêwîst e bê gotin ku hişmendiya şoreşê ji zû ve girtibû. Gelê Rojava ya ku bû girseyeke polîtîk û rêxistinî, bi bihara Ereban re firsendên dîrokî baş nirxandiye û rê li ber derketineke şoreşgerî vekiriye.

Sparteka fikrê ya Şoreşa Rojava, ruxmî ku daneheva dîrokî ya rabirdûyê di nava xwe de dihewîne jî derketina wê ya herî girîng a girseyî bêguman şiyarbûna neteweyî ya li Bakurê Kurdistanê ye. Fikra şoreşgerî ya ku li Bakurê Kurdistanê pêş ket di asta neteweyî de bû, xwedî pênaseya welatê mêtingeh bû, xwedî feraseta rêxistinbûna hevpar bû, azadiya çar parçeyên Kurdistanê jî kiribû hedefa xwe û ev yek li gorî hişmendiya welatparêziyê ya li Rojava bû. Sala 1978'an saleke wisa ye ku piştî ku li Bakurê Kurdistanê tevgera PKK'ê derket holê pêla şoreşgerî her çû pêş ket û berbelav bû, dem bi dem wekî şerê çekdarî veguherî û dewleta Tirk hejand. Darbeya eskerî ya faşîst a li Tirkiyeyê pêk hat di ser rêxistinên şoreşgerî re wekî gindorekî derbas bû û gelek ji wan pelçiqandin. Serok Apo ev talûke ji mêj ve dîtibû û ji bo ku têkoşîna azadiya Kurdistanê neyê astengkirin ji Bakurê Kurdistanê derket û derbasî Rojavayê Kurdistanê bû. Darbeya faşîst a eskerî ya 12'ê Îlona 1980 bi pêşbîniyeke mezin beriya wê bi salekê ferq kir û tedbîr girt. Rêber Apo di 2'yê Tîrmeha 1979'an de ji Tirkiyeyê derket, wekî rawestgeha yekemîn a hîcreta li Rojhilata Navîn derbasî Kobanê bû. Ev dihat wê maneyê ku fikrê rizgariya neteweya Kurdistanê di demeke zû de li xaka Rojavayê Kurdistanê bê çandin.

Tevgera Azadiya Kurd li zemînê Lubnanê li gel rêxistinên Filistînê peywendiyên dostaniyê danîn, li cem gelê Ereb pirên dostaniyê danîn. Ev yek pêlika destpêkê ya vebûna li Rojhilata Navîn bû. Serok Apo nêzî 20 salan (1979-1998) li zemînê Rojhilata Navîn ma. Ev dem pêvajoyeke wisa ye ku pêwîst e di gelek milan de bê bidestgirtin. Zemînê Rojhilata Navîn hiştiye ku tevgera azadiya Kurd û têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê ji aliyê derdoreke mezin ve bê naskirin. Sehaya Rojhilata Navîn di serî de xebatên perwerdeya îdeolojîk-

teorîk, ji bo xebatên eskerî, siyasî, dîplomatîk bû navend. Ev 20 salên ku Rêber Apo li Libnan û Sûrî derbas kir têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê gihand asteke navneteweyî. Rojhilata Navîn ji bo têkoşîna azadiya Kurdistanê bi rola biryargeha navendî ya şoreşê rabû. Ev sal di heman demê de salên wisa ne ku hiştiye gelê Rojava rêxistin bibe û şoreşa îro pêk were.

Mijar mijareke wisa ye ku ji çarçoveya Kurdan û Rojavayê Kurdistanê zêdetir pêwîst e di çarçoveya gelên Rojhilata Navîn de bê bidestgirtin. PKK'ê di nava şerê Lubnan-Îsraîlê de, ku sala 1982'yan de pêk hat, cihê xwe li cem gelan girtiye û xwe ispat kiriye. Ji bo piştevaniya gelê Ereb 11 milîtanên PKK'ê di vî şerî de şehîd bûne. Salên piştre ev peywendî û diyalog derketine merheleyeke jortir. Ji bo şoreşa Kurdistanê ji nava gelê Ereb tevlîbûnên yekem pêk hatine. Li gel rûspî, serokeşîrên civakê peywendiyên girîng hatin danîn. Li cem gelên Rojhilata Navîn bingehên jiyanê di van salan de hat danîn. Tişta herî girîng a ku PKK ji rêxistinên din ên Kurdan cuda kir peywendiyên dostaniyê yên li ba gelên din hatin danîn û feraseta wê ya têkoşîna hevpar bû. Serok Apo li ba dewletên Ereb di asta rêveberiyê de peywendiyên dîplomatîk pêş xist. Dema ku mirov van li ber çav digire ji bo gelan wekî destketiyeke girîng derdikeve pêş.

Avabûna rêveberiya xweser a Bakur-Rojhilatê Sûrî û statuya heyî, encameke xebata bêeman e ku di rabirdûyê de hatibû meşandin.

Di encama Komploya Navneteweyî de Rêber Apo ji Sûrî derket, di hevsengiyên siyasî de serûbinbûnek çêbû, sîstema kapîtalîst a kûrewî dest li Rojhilata Navîn werda û di encam de guhertin û veguhertinên cidî çêbûn. DYE êrîşî Efxanîstanê kir û dûvre êrîşî Iraqê kir. Vê êrîşê hilweşandina netewdewletên ku wekî astengê li pêşiya sîstema kapîtalîst disekinin kir hedef, her wiha ji bo derketina rêxistinên terorî yên Îslama radîkal jî bingeh vekir. Rojhilata Navîn a di hedefa moderníteya kapîtalîst de êdî bi ti şeklî nikarîbû pêsîra xwe ji şer xelas bikira û bû qadeke şer.

Rêber Apo di destpêka salên 2000'î de berê xwe da guhertina paradîgmayî, ku wekî 'rafînebûna di fikrî de' îfade dike, û vê yekê rotaya şoreşa îro xet dikir. Mîna ku kaosa li Rojhilata Navîn ji mêj ve didît. Mîna ku destwerdanên li ser Rojhilata Navîn ji mêj ve didît. Rêber Apo di encama komploya navneteweyî de hat girtin û ev di heman demê de dihat wê maneyê ku sîstema kapîtalîst ji bo destwerdana li Rojhilata Navîn pêşiya xwe vekiribû. Derketina ji vê atmosfera tevlîhev û bi şer mêzekirineke nû, hêza fikrê û guhertina zihniyetê pêwîst dikir. Rojhilata Navîn veguherîbû arenaya şer û gelan ji ber cudabûnên xwe yên olî-mezhebî û etnîkî berê xwe didan hev. Ji bo çareserkirina vê, ji bo ku deriyek li azadiya gelan vebibe, ne mimkun bû ku qalibên berê yên fikrê karîbûna kar bikirana. Rêber Apo bi guhertina paradîgmayê hêzeke mezin a a fikrê

derxist holê. Ji ber vê yekê guhertina paradîgmayê ne guhertineke ji rêzê ye; tê maneya avabûna zihniyeteke nû. Ev zihniyet di heman demê ji bo pêşketinên şoreşgerî yên li Rojava rû didin çavkanî ne, spartekên bingehîn in ku şoreşê li ser piyan digirin û xalên nîrengiyê ne. Paradîgmaya nû ya ku wê di nava her cure mij û moranê de karibe keştiya gelan li ser avê bide meşandin û xwedî Rêberekî wisa yê fikrê ye, hem li dijî miletperestiya netew-dewletê hem jî li dijî moderniteya kapîtalîst di têkoşînê de alternatîfan pêşkêş dike û çareseriyan diafirîne. PKK'ê, di neqeba kaosê ya Rojhilata Navîn de ku Iraq û Sûrî ketine navê, ruşta xwe di warê pratîkî de jî ispat kiriye.

**Sparteka Eskerî, Siyasî û Rêxistinî**

Heger Rojavayê Kurdistanê li gel peywendiyên xwe yên derve bê bidestgirtin wê sûdmend be. Xwedî taybetmendiyeke wisa ye ku ji şert û zirûfên derve bandor dibe. Rûdanên herêmî di asteke mezin de bandorê li Rojavayê Kurdistanê jî dikin. Destwerdanên siyasî-eskerî yên ji derve li ser herêmê tên dewletan ber bi guhertinê ve dehf didin, rê li ber guhertinên desthilatdariyê vedikin, bandorê li hevsengiyên siyasî dikin. Di nava vê rewşê de ne mimkun e ku bandorê li Rojava jî nekin. Ji ber vê yekê girîng e ku mirov şert û mercên hundir û derve jî li ber çavan bigire.

DYE di sala 2003'yan de bi awayekî eskerî mudaxeleyî Iraqê kir, rejîma li Iraqê rûxand, Sedam bi dar vekir. Vê yekê rê li ber neqebeke mezin a kaosê û atmosfereke şer vekiriye. Bêîstîqrariya siyasî, ekonomîk, nediyariya siberojê Iraq ber bi helezoneke mezintir a şîdetê ve dehf daye. Wekî encama atmosfera şer, rêxistinbûna çete ya DAÎŞ'ê li Iraqê teşe girt, di havîna 2014'an de di carekê de derket holê, bi awayekî lez belav bû û di nava demeke kurt de li Iraq û Sûrî di asteke ne kêm de fireh bû. DAÎŞ, a ku bi qetlîamên xwe yên hov ve ket rojeva cîhanê, herî zêde jî berê xwe da Kurdan. Civaka Êzidî ya li Şengalê di qirkirinê re derbas kir. Ji ber ku qetlîamên komî pêk anîn û bû sebeba koçberiyên komî hema hema gel bi giştî neçar ma xakên xwe biterikîne. Hêzeke sînordar a gerîlayên PKK'ê ya ku xwe gihand Şengalê û çendek însanên ji nava gel li ber xwe dan û pêşî li qirkirineke mûtleq girtin. Bi vî rengî Şengal bi temamî neket bin kontrola çeteyên DAÎŞ'ê.

Qadeke din a ku DAÎŞ'ê berê xwe dayê jî cografyaya Sûrî û bi taybet jî Rojava ye. Yek ji qadên ku DAÎŞ'ê bi hemû hêza xwe ve êrîş kirê jî Kobanê bû. Di nava tevlîheviya şerê navxweyî yê Sûrî de ji ber ku otorîteya dewleta navendî rûxiya valatiyek çêbû û nêzîkatî ew bû ku ev valatî bi çeteyên DAÎŞ'ê ve were tijîkirin. Heger Rojava bibe hedefa êrîşên DAÎŞ'ê di vê de rola bêyom a dewleta Tirk heye. Polîtîkaya dewleta Tirk a ji bo Sûrî li ser esasê rûxandina rêveberiya Esad hatibû avakirin û ji bo vê jî hêna ji destpêkê ve piştgirî da komên çete-muxalîfên rejîmê. Heta Nûnerên Rojavayê Kurdistanê jî vexwendin Enqerê û li wir

ji wan xwest ku ji bo van polîtîkayan xizmetê bikin. Dema ku ji Kurdan encama dixwest nikarîbû bi dest bixista wekî stratejiya esasî êrîşa li ser Kurdan û wekî dijmin îlankirina Kurdan da ber xwe. Dewleta Tirk hêviya xwe bi êrîşa DAÎŞ'ê ya li ser Kobanê ve girê dabû. Bi berxwedana Kobanê hêza êrîşê ya DAÎŞ'ê hat şkandin. Bi vê yekê DAÎŞ'ê piştî derketina xwe yekemîn têkçûna xwe ya cidî li Kobanê dît û vê yekê di gelên herêmê de hêvî ava kir. Ji ber ku çanda berxwedanê ya bi şoreşa Rojava pêş ket hemû gelan digire nava xwe vê yekê pêşketineke girîng a pratîkî jî bi xwe re aniye.

Di pêkanîn û parastina şoreşa Rojava de roleke girîng a paradîgmaya çareseriyê û rêxistinbûna gel heye. Heger çar aliyên wê ji aliyê dijberên şoreşê ve hatibe girtin û ruxmî ku di dorpêça hêza dijmin de ye jî li ser piyan dimîne, ev yek encama wan destketiyan e ku beriya şoreşê qezenc kiribû. Êrîşên dewleta Tirk û DAÎŞ'ê, nêzîkatiyên berjewendîperest ên DYE, Rûsya, Îran û Şamê, helwesta dijminane ya PDK'ê û hevkarên ENKS'ê yên ku dixwazin şoreşê ji hundir ve birûxînin bênavber dewam dikin û her tim êrîş dikin. Heger şoreşa Rojava ruxmî vê jî nehatibe rûxandin, sedem ew e ku hêza xwe ji daneheva xwe ya dîrokî digire.

Di roja me de stratejiya dewleta Tirk a ku ji atmosfera şer sûdê digire bi temamî li ser esasê dijminatiya Kurdan e. Di polîtîkaya hundir û derve de Kurdan wekî dijmin îlan dike, êrîşî her deverê dike û bi vî rengî ji bo xwe qadên siyasî, eskerî, dîplomatîk, ekonomîk vedike. Di dijminatiya Kurdan de gihiştiye asteke ku sînoran nas nake. Li dijî hêzên gerîla tevî çekên kîmyewî her cure teknolojiya pêşketî û teknolojiyên şer ên nûjen bi kar tîne. Êrîşên li dijî gel li erdnîgariyeke berfirehtir belav dike û li her devera ku Kurd lê hene êrîşan dike. Gelê Mexmûr, Şengal û Rojava rojane di hedefa êrîşan de ne. Tevî jin û zarokan gelek sivîlan jiyana xwe ji dest dane. Ruxmî ku bi van êrîşan re hiqûqa navneteweyî bin pê dike jî li pêşiya wê ti astengî nayên danîn. Ev yek jî nîşan dide ku gelê Kurd û lewma Şoreşa Rojava bi talûkeyeke çiqasî mezin re hevrû ye, di nava rewşeke man-nemanê de têkoşîna jiyanê dimeşîne. Ruxmî hebûna gelek hêzên ku hewl didin şoreşê asteng bikin, li pêşiyê bisekinin, vala derxînin û birûxînin jî yekane hêza ku têkildarî çareseriya pirsgirêkan xwedî fikr e dîsa Kurd in. Perspektîfa Rêya Sêyemîn a ku Rêber Apo kiriye têgîn, ji bo pirsgirêkên herêmê bûye mifteya çareseriyê. Şoreşa Rojava jî hêza xwe ji vê perspektîfê digire.

Di têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê de di qada eskerî de serketinên girîng hatin bidestxistin. Girîngiyê dide têkoşîneke li ser esasê Şerê Gel ê Şoreşgerî. Ev yek jî nîşan dide ku xwe gihandiye hêzeke têkoşînê ya demdirêj. Li şûna ku di warê eskerî de girêdayî derve bibe, stratejiya Şerê Gel ê Şoreşgerî xistiye meriyetê, pişta xwe bi gelên herêmê xurt kiriye. Ev yek ji bo Rojava tê wê maneyê ku bûye xwediyê berxwedaneke mezin.

Heger rewş hinekî din şênbertir

bê bidestgirtin, daneheva dîrokî ya rabirdûyê esasê şoreşa Rojava ye. Ji van ya yekemîn, binesaziya îdeolojîk e. Paradîgmaya wê xwedî hêza çareseriyê ye. Ya duyemîn, girseyên gel rêxistî ne û têkoşîn xwe dispêre hêza cewherî. Ya sêyemîn, kadroyên ku ji bo şoreşê pêşengiyê dikin xwedî daneheva siyasî-eskerî ne, xwedî ezmûn û tecrûbeya pratîkî ne. Hebûna van hersê xisûsên bingehîn diyarker bûne. Ji firsendên ku bi awayekî çalakî û fikrî derketine holê sûd girtiye û statuya îro bi dest xistiye.

**Xisleta Demokratîk a Şoreşa Rojava**

Şoreşa Rojava li milekî hewl dide di nava atmosfera şer de ku bi êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk dewam dike xwe biparêze, li milê din jî hewl dide xebatên înşaya civakî paralelî vê bimeşîne û şoreşê mayinde bike. Xisleta herî bingehîn a şoreşê ew bûye ku xwe spartiye hêza xwe ya cewherî. Li gorî şert û mercên xweser fikrên guncav afirandine û karîbûye pêk bîne. Di navbera gelan de karîbûye hevkariyê ava bike, piştevaniyê pêş bixîne û yekîtiya hêzê biafirîne. Karîbû organên xwerêveberiyê ava bike û xweparastinê pêş bixîne. Karîbû di çarçoveya dersên dîroka şoreşên cîhanê de paradîgmaya nû bixe meriyetê. Karîbû rêveberiya gel a demokratîk a ku dewletê danayne pêşiya xwe û îradeya gelan derdixîne pêş esas bigire. Karîbû nûnertiyeke wisa ya jiyana hevbeş bike ku avaniyên etnîkî û baweriyên olî bi hev re bijîn. Rengên civakî yên ku wekî nakokiya herî esasî ya Rojhilata Navîn lê hatiye, di binê heman sîwanê de tevî xweserî û taybetmendiyên wan, dikarîbû ew qebûl bikirana û li dora nirxên hevpar bigihandana hevdu. Wekî kombûna van pêşketinan hemûyî, karîbû biketa nav hewldana avakirina Neteweya Demokratîk. Ji ber vê yekê pênaseya Neteweya Demokratîk ji bo Rojavayê Kurdistanê têgîneke wekî mifteyê ye. Ev pêşketin hemû jî li dora têgîna Neteweya Demokratîk tên hûnandin.

Ferqa wê ya ji tevgerên şoreşgerî yên tên zanîn ew e ku paradîgmaya wê dikare li gorî şert û mercên şênber ên roja me bê guncandin. Belkî jî xisleta wê ya herî bingehîn ev be. Ew û têkoşînên rizgariya neteweyî yên klasîk ên endeksî şoreşên sosyalîst hatine kirin pir naşibin hev. Ne têkoşîneke wisa ye ku tenê xwe dispêre yek neteweyê. Ji vê wêdetir, bi pêkhateyên xwe re jiyaneke hevpar ava dike û li ser eksenê xwe yê têkoşînê cudatiyan dide rûniştandin. Ev yek guhertineke mezin e. Têkoşîna ku xwe dispêre tenê yek neteweyê ne mimkun e ku li Rojava karibe serketinê bi dest bixe, her wiha ev yek di konjonktura siyasî ya herêm û dinyayê de jî pir mimkun xuya nake. Ji ber vê yekê pêwîstî bi zihniyeteke nû ya ku dikare gelan bigihîne hev heye. Felsefeya şoreşa Rojava ew e ku mîna beriya dewletê, mîna civakên xwezayî bi hev re dijiyan; nasname, bawerî, çanda qedîm a gelên Rojhilata Navîn, yanî bi kurtî rehendên pêwîst ên ji bo neteweya demokratîk pêwîst li ser bingehê zanistî ji nû ve bê şîrovekirin, bi şeklê civaka bêyî dewlet bê guncandin

û civaka demokratîk înşa bike.

Yek ji xisletên wê yên herî girîng ew e ku karaktera şoreşê civaka demokratîk e. Demokratîkbûna ku reel sosyalîzmê nikarîbû bi ser bixista dike xerca (cabila) înşaya civakî.

Piştî hilweşîna reel sosyalîzmê, di nava tevgerên şoreşgerî yên cîhanê de di warê fikrî de alozî çêbû û vê yekê têkoşînên şoreşgerî qetûbir kir (sekte xwar). Tevgerên şoreşgerî, ku li ser însafa dinyaya yekqutbî mabûn û tê de hikma serweriya sîstema kapîtalîst hebû, di warê pêşengiyê de ketibûn nav qeyranên ciddî. Partiyên karkeran, komunîst, çepgir-sosyalîst ketibûn nav krîzeke cidî ya îdeolojîk. Hin partiyan xwe ji nû ve ava kirin, lê hin partî jî ji hev belav bûn. Nêzîkatiyên îdeolojîk, vebûnên teorîk ên ku karibin pirsgirêkên civakî çareser bikin, ji bo têkoşîna şoreşgerî rotayên nû xet bikin pir zêde derneketin holê. Ji ber ku pergala reel sosyalîst di encama krîzên kûr ên siyasî-ekonomîk de parçe bû û belav bû, ji bo tevgerên şoreşgerî pêwîstî bi teoriyeke nû hebû. Ji fikrê heta çalakiyê hema di her mijarê de pêwîstî bi stratejî û taktîkeke nû hebû. Ne tenê di asta cîgayî û herêmî de, pêwîstî bi paradîgmayeke wisa hebû ku karibe di asta kûrewî de rê nîşan bide. Paraznameyên ku Rêber Apo li Îmraliyê pêş xistin wekî berhemê vê lêgerîna nû teşe girtin. Şoreşa Rojava qûtên xwe yên îdeolojîk ji paraznameyên Rêber Apo digire.

Ji bo pirsgirêkên tewtewe yên Rojhilata Navîn, nakokiyên wê yên civakî, problemên wê yên ji ber netew-dewletê, vekirîbûna wê ya li beramberî destwerdanên derve heta êrîşên sîstema kapîtalîst, ji bo ku ji halê wê yê kaosê re çareserî bê dîtin û derketina ji vî halî mimkun bibe, Rêber Apo bername û projeyên jiyanî danîne holê. Heger çareseriyên demokratîk nehatana afirandin îro belkî jî me yê nikarîbûya behsa şoreşa Rojava bikira. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku şoreşa Rojava li gorî tevgerên din ên şoreşên cîhanê îstîqameteke cuda şopandiye û wisa pêş ketiye. Di nava xwe de têkoşîna rizgariya neteweyî jî dihewîne û dikare wekî şoreşa demokratîk û heta çandî jî bê pênasekirin. Pêvajoyeke nû ya şoreşî ye. Pêwîst e bê diyarkirin ku ne şoreşeke wisa ye karibe li ser qalibên klasîk ên şoreşê bê rûniştandin. Xwedî têkoşîneke wisa ya civakî ye ku di dîrokê de mînakên wisa yên rûdayî tine ye. Her çiqasî hêna di asta tê xwestin de bi sazî nebibe jî, bi pergal nebibe jî, ji aliyê navneteweyî ve statuya wê nehatibe qebûlkirin jî rewşa fîîlî xwedî xisletên wisa yên neteweya demokratîk e ku îlhamê dide gelên bindest ên cîhanê.

Vebijêrka demokrasiyê ji bo gelên li Rojava pêwîstî ye. Girîng e ku têgîna demokrasiyê ji nû ve bê şîrovekirin û wekî çîmentoya ku gelan digihîne hev fonksiyonel bibe. Xulase, paradîgmaya ku Rêber Apo wekî demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê îfade kir rêberê fikrî yê şoreşa Rojava ye. Di nava atmosfera Rojhilata Navîn de ku bi

nakokî û şer barkirî ye, pêkhatina pêşketineke wisa ya şoreşgerî ji bo gelên bindest û mêtingeh di her warî de dibe mînak. Naveroka demokratîk a şoreşê garantiya şoreşê ye.

Li Rojhilata Navîn bêîstîqrariya siyasî serweriya xwe didomîne, netew-dewlet bi polîtîkayên bêçareseriyê ve bêîstîqrariyê heyî kûrtir dikin. Dema ku li ser van êrîşên hêzên kûrewî jî zêde dibin halê şer bi rengekî bênavber dewam dike. Li gel hebûna netew-dewletê û mudaxeleyên derve û şerên wesayetê, hebûna cudatiyên civakî jî wekî hinceta şer tê nîşandan û ev yek derketina şoreşgerî ya gelan zehmet dike. Hêzên ku ji nakokî û şer sûdê digirin her tim êrîş dikin û şer geş dikin û bi genên civakê dilîzin. Ev sebebên herî bingehîn ên kaosa Rojhilata Navîn in. Ji nava vê atmosfera krîzê derketina bi rêka vebijêrka demokrasiyê, demokrasî dana dawerivandin, ew bi gewde kirin pir girîng e. Ji bo ku terzê jiyana kevneşop a çandên bicihbûyî, avaniya eşîrî ya civakê, nasname û baweriyên wan, bi kurtî aîdiyetên wan li ber çav bên girtin û çareserî bê afirandin, pêwîst e têgîna demokrasiyê rast were pênasekirin û nava wê bê tijîkirin. Sir û raza serketina îro ew e ku şoreşa Rojava biryara xwe ji bo rêbaza demokrasiyê daye. Hemû cudatiyên civakî, nasname, bawerî, yekparebûna xaka Sûrî li ber çav girtiye, hewl daye li gel rêveberiya Sûrî pirsgirêkan bi rêka demokratîk çareser bike. Vê yekê pêşî li atmosfera şer girtiye. Heger li gorî şerê li seranserî Sûrî erdnîgariya Rojava zêdetir xwedî îstîqrarê be sedema wê ji ber vê atmosfera xweşbîn a demokratîk e.

**Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye**

Yek ji xisletên din ê girîng ê şoreşa Rojava ew e ku şoreşa jinê pêk aniye. Jin di navenda hemû pêşketinan de cih digire. Hêza herî çalak û bingehîn a veguherîna civakî bêguman jin in. Jina Rojhilata Navîn bi qasî ku bi ti demê re nikare bê qiyaskirin bi şoreşa Rojava re pêş ketiye. Têkoşîna cinsî ya ji bo wekheviya cinsiyetê daye meşandin, îdîa û biryardariya hebûna di her qada jiyanê de, mafê nûnertiya wekhev, di nava têkoşîna jinê de destketiyên ku dikarin ji bo cîhanê bibin mînak bi dest xistine. Li Rojhilata Navîn a ku zihniyeta zilamserwer lê reh û rîşên xwe berdane, destketiyên ku jinê li Rojava bi dest xistine bi serê xwe pêşketineke şoreşî ye. Têkoşîna jinê ne tenê ji bo jinê, ji bo ku pergala demokratîk a li ser eksena jinê pêş bikeve, di veguherîna civakê de pêşîkêşî kiriye û lez daye şoreşê. Hebûna jinê ya di şoreşê de ji ber vê sedemê ye ku şoreş xwe dispêre azadiya jinê.

Di şoreşê de nûnertiya jinê xwe dispêre pergala hevserokatiyê. Pergala hevserokatiyê di nava partiyên karkeran ên bi navenda rojava de derketiye holê. Ruxmî ku mafekî wisa yê nûnertiyê ye jî niha tekane cihê ku mafê nûnertiya wekhev li her qada civakê belav kiriye û pêk aniye Rojavayê Kurdistanê ye. Pergala hevserokatiyê di

her qada jiyanê de, di hemû organên rêveberiyê de, di hemû qadên pratîkî de bûye rêgeza bingehîn a jiyanê.

Bi rastî jî di nava tevgerên şoreşê yên cîhanî de ti tecrûbeyeke wisa tine ye ku jinê ewqasî bide pêş, ji bo pêşketina jinê zemînê amade bike û têkoşîna azadiya jinê di navenda şoreşê de bide rûniştandin. Yekîneyên çekdarî yên jinê li ser bingehê artêşbûna jinê hatin rêxistinkirin û di hemû sengerên şer de cih girtin. Ev jî yekemîneke din a şoreşa Rojava ye. Jinên ku hêza xwe ji paradîgmaya azadîxwaziya jinê girtin, di her qadê de xweseriya xwe parastin, xwe li dijî zihniyeta baviksalarî rêxistin kirin û ji bo şoreşê bûn mîna darê piştê. Ev yek ji bo têkoşîna azadiya jinê destketiyeke mezin e. Şoreşa Rojava bi milê xwe yê azadiya jinê ve ji bo jinên şoreşger ên dinyayê bûye tecrûbeyeke girîng û her wiha bûye sengereke têkoşîna cinsî.

**Xisleta Enternasyonal a Şoreşê**

Rehendê piştevaniya navneteweyî ya şoreşa Rojava xisûsekî wisa ye ku divê bi girîngî bê diyarkirin. Ji nû ve ruh bi enternasyonalîzmê ketiye. Şoreşa Rojava ji bo tevger û şoreşgerên şoreşên cîhanê bingehekî nû yê piştevaniyê ava kiriye. Şoreşa li Rojava şoreşgerên ji gelek welatan ber bi xwe ve kişandiye. Dikare bê gotin piştî hilweşîna reel sosyalîzmê li qada navneteweyî hêviyeke şoreşgerî ava kiriye. Dema ku karakter, armanc û hedefên Şoreşa Rojava li ber çav tê girtin, ji bo têkoşînên rizgariya neteweyî û tevgerên gel ên şoreşgerî rêyeke nû pêşniyar dike. Xwe ji şerên ku xwe dugêsînî dikin, fikrên dogmatîk pak kiriye, bi qasî ku moderníteya kapîtalîst dahûrandiye bi rexneyî nêzî Marksîzmê jî bûye û perspektîfeke nû ya têkoşînê ya ku di sosyalîzma zanistî de israr dike ava kiriye. Bi qasî destketiyên pratîkî yên şoreşê, bi pêşniyarên teorîk-îdeolojîk ji bo tevgerên şoreşgerî yên dinyayê jî tevkariya fikrî dike. Ji bo ku tevgerên şoreşgerî karibin ji tecrûbeyên pratîkî yên şoreşê sûdê bigirin Şoreşa Rojava bi qasî ku bi rola dibistanekê rabe bûye xwedî ezmûn û danehev.

Şoreşgerên enternasyonal ji pratîkên borî yên piştevaniya enternasyonalîst ders derxistine, li ser esasê perspektîfa demokrasiya neteweyî û kûrewî li hev kom bûne, bi awayekî pratîkî tevlî şoreşa Rojava bûne, di her astê de ketine nava xebatên pratîkî û bedel dane. Ne tenê tevlîbûna nava şoreşê, her wiha ji tecrûbeyên pratîkî yên şoreşê sûd girtine û berpirsiyarî li xwe girtine ku ezmûnên têkoşînê ji bo gelên xwe veguhezînin. Pir girîng e ku têkoşîna şoreşgerî di nava gelan de rê li ber atmosfera piştevaniyê veke û fikrê demokrasiya kûrewî di nava gelên cîhanê de belav bibe. Tifaqên stratejîk ên şoreşê bi rengekî pir cudatir tên avakirin û ev jî yek ji xisletên karakterîstîk ê Şoreşa Rojava ye.

**Destkeftiyên Şoreşê**

**- Xweparastin**

Xweparastin, yek ji destketiyên sereke ye. Pêwîst e karaktera şoreşgerî ya rewşa li Rojava bi gelek milên wê ve bê bidesgirtin. Li Rojava şoreş di merheleya destpêkê de ye û hêna kevir tam bi cih nebûne. Xisûsa herî girîng a ku divê beriya her tiştî li ser bê sekinandin parastin û pêşxistina xweparastinê ye. Ji tinekirina dewletê zêdetir, ruxmî dewletê jî dikare xwe bi rê ve bibe û xwe biparêze. Ev rewş di heman demê rewşeke li gorî paradîgmaya şoreşa Rojava ye. Ev rewş tersî feraseta şoreşa klasîk e; pêwîstiya nêzîkatiyeke wisa ya îdeolojîk e ku di Rojava de bêyî ku dewletê hemûyî tasfiye bike, rola dewletê biçûk dike û civakê derdixîne pêş. Li gel dewleta Sûrî di astên cuda de pirsgirêk hene û di vê mijarê de hêna lihevkirineke wekî tê xwestin pêk nehatiye. Pêwîst dike ku bi armanca domandina hebûna xweseriya fîîlî rê û rêbaz bên dîtin, wekî hebûn bê qebûlkirin û garantîkirin. Qebûlkirina statuya xweseriyê jî, ku gel li ser bingehê pîvanên demokratîk siberoja xwe tayîn dikin, wê bi dewletê jî guhertina demokratîk bide kirin.

Di vê merheleyê de ku pêvajoya şoreşê dewam dike, destketiyên heyî qet ne biçûk in. Ruxmî ku di warê ewlekariyê de rîskên wê hene, hewldanên êrîş û dagirkeriyê yên dewleta Tirk dewam jî dikin xebatên înşaya şoreşê di her qadê de didome.

Di pêvajoya Şoreşa Rojava de ji bo ku şoreş bi sazî bibe, rêveberiya xweser ava bibe û bibe îradeya gel gavên girîng hatine avêtin. Di serî de hêzên asayîşê, yên ku ewlekariya hundirîn pêk tînin, hêzên xweparastinê yên mîna YPG-YPJ-QSD, di parastina gel û destketiyên şoreşê de bûne xwedî performanseke serketî. Qada eskerî jî tecrûbe qezenc kiriye û bûye hêzeke parastinê ya têkûztir. Di têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê de ruşta xwe ispat kiriye. Avaniya QSD'ê ya ku hêza koalîsyona navneteweyî wê wekî muxatab digirin û pê re hevpar dixebitin, ji bo ewlekariya herêmê bi roleke girîng rabûye. Di mijarên rêveberiya xweser û xweparastinê de tecrûbeyên girîng girtine. Hişmendiya xweparastinê girtiye û li ser vî bingehî wekî gel parastina xwe pêş dixîne. Ev yek tê wê maneyê ku mafekî xwe yê ji bûyînê bi kar tîne. Di nava atmosfera şer de mafê xwe yê parastinê dewrî hêzên din nekir, bi xwe bi kar anî û xwe di qada eskerî de bi rêxistin kir. Ev yek desketiya herî girîng a gelan e.

Rêxistinbûna xweparastinê ya gelan, xweparastina gelan gel ji qirkirineke mûtleq xelas kiriye. Di Şoreşa Rojava de hatiye ispatkirin ku rêxistinbûna xweparastinê mijareke çiqasî heyatî ye. Li holê ye, dewleta Sûrî ya ku nikare xwe biparêze wê nikaribe gel biparêze. Girîngiya ezmûna xweparastinê ji bo gelên ku bi Kurdan re heman qederê parve dikin û bi hev re dijîn careke din hatiye peyitandin. Ti zindiyek nikare ewlekariya xwe teslîmî hebûneke din

bike. Dema ku mijar gel bin girîng e ku karibin li ser bingehê parastina rewa xwe biparêzin. Li Sûrî, ku otorîteya dewletê hejiyaye, di sala 2014'an de DAÎŞ'ê êrîş kir û li beramberî vê gel û xak hatin parastin, pêşî li qetlîamên muhtemel hatin girtin. Ev bi xwe jî destketiyeke girîng e. Berxwedana Kobanê bi serê xwe wekî mînaka berxwedana bêhemta derbasî dîrokê bû. Ne tenê li erdnîgariya Bakur û Rojhilatê Sûrî, têkoşîneke ku li giştî Sûriyeyê DAÎŞ'ê bi dawî dike hatiye meşandin.

Li gel destketiyên dîrokî di qadên siyasî, rêxistinî û dîplomatîk de jî qederek gav hatine avêtin.

**- Xwerêveberî**

Şoreşa Rojava ya ku avakirina dewletê nake armanc, pergala modela xwe ya rêxistinbûna neteweya demokratîk ava dike, saziyên wê karîger dike û gihandiye statuyeke diyar. Bêguman, destketiyên girîng in. Ji perwerdeyê heta xizmetên tenduristî û binesaziyê, xebatên ku pêdiviyên gel dibersivînin tên meşandin û hatiye halekî ku karibe xwe bi xwe bi rê ve bibe. Ev yek ji vî alî ve desketiyek e.

Derbaskirina elimandinên jiyanê yên gel, xisletên ferd û civakê yên ku ji aliyê netew-dewleta Sûrî ve hatine çêkirin, rûniştandina modela nû ya rêxistinbûnê demê pêwîst dikin, wê demê bixwin. Li erdnîgariyê li şûna otokrasiya rejîma BAAS, demokrasî tê avakirin. Bi vê re li hemû qedemeyên rêveberiyê pergala hevserokatiyê ket meriyetê. Ev wekî feraseta rêveberiyê û terzê rêveberiyê yê nû pratîze dibe. Pêşketina erka siyasî û xebitîna saziyan di her milî de modeleke nû ye. Vê modelê di nava atmosfera şer de teşe girtiye û ji aliyê pêkhateyên gel ve hatiye qebûlkirin. Avaniya wê ya siyasî xwe dispêre avaniyeke wisa ya rêveberiyê ku li ser esasê rêxistinbûna berwarî (ufqî, horizontal) ye, li ser bingehê esasên demokratîk dixebite û nûnertiya wê meclîsa demokratîk dike.

Desketiya herî mezin a siyasî ya Şoreşa Rojava ew e ku organên xwerêveberiyê ava kirine. Pêkhateyên gel hewl didin li ser esasê komun û meclîsan xwe bi rêxistin bikin û yekser tevlî pêvajoya siyasî bibin. Ev yek rewşeke nû ye. Xweseriya demokratîk xwe di nav gel de rêxistin dike. Modela rêveberiya xwecihî bi awayekî pratîkî dikeve meriyetê. Gelek qadên xebatê hêna di dema xwe ya çarpîka de ne. Pêwîst dike ku serketina di şoreşa Rojava de hatiye bidestxistin li ser civakê biteyise, bandorê li jiyana civakê bike û rê li ber guhertineke siyasî veke. Bêguman, hêna di gelek qadan de pir xisûsên ku divê werin pêşxistin hene. Meclîsa gel a demokratîk a ku hatiye avakirin wekî rêveberiya jorê di asta tê xwestin de hêna tam karîger nebûye. Her çiqasî wisa jî be di cewher de wekî modela rêveberiya demokratîk fonksiyonel e. Meclîsa xweser a Bakur-Rojhilatê Sûrî di vê maneyê de ezmûneke girîng e. Pêkhateyên gel ên ku ji bo şoreşa Rojava darê piştê ne, biryar li ser mekanîzmayeke wisa

ya siyasî dane ku ji avaniyeke navendî zêdetir xwe dispêre xwerêveberiyê, ku li herêman fonksiyonel e. Li derveyî avaniya dewletê wekî mekanîzmayeke nû ya rêveberiyê xwe rêxistin dike.

**- Dîplomasî**

Li qada navneteweyî teyisandina pêvajoya şoreşê, zêdekirina xebatên dîplomasiyê, ji bo Rojavayê Kurdistanê pêşketineke girîng e. Xebatên dîplomasiyê bi qasî ku zêde ne her wiha bûye xebateke berbelav jî. Bi taybet têkoşîna li dijî rêxistina çete ya bi navê DAÎŞ'ê, serketina hatî bidestxistin ji aliyê gelên cîhanê ve bi teqdîr tê pêşwazîkirin. Ji Rûsyayê heta DYE'yê, ji gelek paytextên Ewropayê li beramberî Şoreşa Rojava eleqeyeke mezin pêş ketiye. Şande bi şeklekî beramber serdana hevdu dikin û di warê dîplomasiyê de çûnhatineke zêde heye. Lê nikare bê gotin ku eleqeya dîplomatîk a tê nîşandan bi têrkerî li sehaya pratîkî tê teyisandin. Heger îro statuya heyî ya Şoreşa Rojava ji aliyê paytextên navborî ve bi awayekî fermî nehatibe qebûlkirin divê lêpirsîna vê rewşê bê kirin. Şandeyên dîplomatîk ên Rojavayê Kurdistanê li paytextên cîhanê bi merasîmên fermî tên pêşwazîkirin, feqet heman dewlet xwe nêzî qebûlkirina hebûna Şoreşa Rojava û statuya heyî ya li Rojava nakin. Ev yek jî bêsamîmîbûna wan dide nîşandan. Peywendiyên siyasî, hewldanên dîplomatîk li ser esasî naskirina şoreşê pêş nakevin. Dewleta Tirk rojane gefan li Rojava dixwe, lê li beramberî vê piştevaniyeke ku karibe êrîşên îşgalê bisekinîne, dewleta Tirk ji vê biqerîne tine ye. Ev yek ji nebesiya hewldanên dîplomatîk zêdetir nêzîkatiya sîstema kapîtalîst a li beramberî şoreşa Rojava nîşan dide.

Li şûna dîplomasiya Kurdê hevkar, dîplomasiya gelê Kurd dema ku PKK li Rojhilata Navîn vebû dest pê kir. Dîplomasiya Rojava tê vê maneyê ku heman xeta îdeolojîk bi rengekî din tê domandin. Çareseriya pirsgirêka Kurd xwedî bandoreke wisa ye ku dikare ji kûranî bandorê li rûdanên herême bike û heta wan diyar bike. Ji ber vê yekê pirsgirêkeke wisa berfireh e ku dikare berjewendiyên sîstema kapîtalîst a kûrewî jî bihejîne. Di maneya giştî de pirsgirêka Kurd ji ber ku pirsgirêkeke berfireh e û rehendên şoreşa Rojava jî derbas dike, divê dîplomasiya Kurd ji parçeyekî zêdetir di nava giştî û yekparebûnê de bigire dest. Wekî çawa tenê parçeyekî Kurdistanê eleqedar nake, her wiha dîplomasiya tenê di asta parçeyekî de jî zêde encamê nade. Xebatên dîplomasiyê yên Şoreşa Rojava ji xebatên di xweseriya Rojava de wêdetir pêwîst e karibe bikeve nav peywendiyên dîplomatîk ên ku berjewendiyên giştî yên gelê Kurd temsîl dike. Di nava 10 salên şoreşê de peywendiyên eskerî û siyasî hatin danîn û pêşxistin. Her çiqasî ji encama tê xwestin dûr jî be dîsa jî di asta muxataban de peywendiyên girîng hatine danîn.

**- Perwerdeya Bi Zimanê Dayikê**

Yek ji nîşaneyên herî mezin a şoreşê jî ew e ku pergala perwerdeyê ji nû ve hat avakirin. Avakirina pergala perwerdeyê, cara yekemîn pêkanîna perwerdeya bi zimanê dayikê, ruxmî hemû neyênîbûnan û nebesiyan jî gihiştiye astekê. Her çiqasî ne asteke têrker be jî di vê mijarê de hewldan û israr dewam dikin. Ji ber ku dewleta Sûrî zimanê Kurdî wekî zimanê fermî yê perwerdeyê qebûl nekir zimanê Kurdî tenê wekî zimanê axaftina rojane maye. Eşkere ye, zimanê dayikê yê Kurdî dema ku wekî zimanê perwerdeyê bê bikaranîn wê di merheleya destpêkê de zor û zehmetiyan bi xwe re bîne. Ji naveroka dersan heta mamosteyan, heta avaniyên fîzîkî yên dibistanan gelek nebesiyên teknîkî derketine holê. Xebatên perwerdeyê di nava merheleyên zor û zehmet re derbas bûne û heta roja me hatine. Di rewşa heyî de ji dibistanê heta zanîngehê perwerde bi zimanê dayikê hatiye dayîn. Ev yek pêşketineke girîng e. Li gel van hemûyan pêwîstî pê heye ku wesfê perwerdeyê zêdetir bê bilindkirin.

Li Rojavayê Kurdistanê avakirina pergala perwerdeya Kurdî ji bo parçeyên din ên Kurdistanê jî destketiyeke cidî ye. Gelê welatekî mêtingeh û parçebûyî cara yekemîn bi zimanê dayikê perwerdeyê dibîne. Ev yek ruxmî hemû kêmasî û nebesiyan jî destketiyeke cidî ye. Ziman û çanda Kurdî ji zihniyeta qedexeker a netew-dewletên serwer xelas bibe ev ê di çareseriya pirsgirêka Kurd de gaveke girîng be. Gelê Kurd karibe bigihêje azadî û mafên xwe yên demokratîk, pirsgirêka xwe ya nasnameya etnîkî çareser bike ev ê di asta herêmî de bandorê bike.

Di çarçoveyeke berfireh de saziyên perwerdeyê hatine avakirin. Bi taybet jî li ser perwerdeyên gel bi girîngî tê sekinandin. Akademiyên gel bi awayekî berbelav dixebitin. Di van saziyan de ji her temenî însan perwerdeyê dibînin û lewma jî ji bo ku hişmendiya demokratîk berbelav bibe xwedî rol û fonksiyoneke girîng in. Akademiyên xweser ên jinê, akademiyên ciwanan, akademiyên eskerî bi heman şeklî tevkariyê bi hişmendiya civakî re dikin. Ji bo ku hişmendiya civaka demokratîk bê qezenckirin, çanda wê bê girtin akademî xwedî roleke diyar in. Armanca akademiyan tenê ne ew e ku fêrî hin agahiyan bikin. Ji perwerdeyeke teorîk wêdetir ji bo avakirina fikrê ye, ji bo ku xitimandinên şoreşê yên di qada pratîkî de derbas bikin hatine avakirin. Her çiqasî gelek sazî di nava xwe de xebatên perwerdeyê dimeşînin jî akademiyên gel hemû xebatkaran bi navberên diyar di dewreyên perwerdeyan re derbas dikin.

Li Rojavayê Kurdistanê di van mijaran de destpêkeke girîng çêbûye. Ziman û çanda Kurdî ya ku li dijî qedexe û asîmîlasyonê li ber xwe da di Rojava de bi serbestî tê bikaranîn. Qeyd û zincîrên li neteweya Kurd a mêtingeh hatibûn xistin hatine parçekirin. Li Rojavayê Kurdistanê avakirina siberoja

xwe ya demokratîk û azad ji bo giştî Kurdistanê jî desketiyeke mezin e.

**- Pergala Aboriyê ya Ne Li Ser Bingehê Karê**

Ji bo ku destketiyên şoreşê bên parastin divê şoreş di warê aboriyê de karibe têra xwe bike. Pêwîst e girêdayî derve nebe. Pêwîst e çavkaniyên xwe yên ekonomîk bi rengekî berhemdar bi kar bîne, pişta xwe bi hêza xwe girê bide û li gorî vê polîtîkayên guncav biafirîne. Jêneger e ku ji hilberandinê heta îstîhdamê pirsgirêkên herî bingehîn çareser bike. Perspektîfa ekonomîk a şoreşa Rojava ew e ku xwe li ser bingehê kooperatîfan rêxistin bike, karibe li beramberî polîtîkayên ekonomîk ên sîstema kapîtalîst polîtîkayên alternatîf biafirîne. Pêdiviya wê bi pergala hilberandina komunal a ku xwe dispêre pêdiviyan û xwe naspêre karê heye. Ji bo vê jî ya jêneger bêguman pergala kooperatîfê ye.

Ji bo ku asta jiyana gel bilind bibe û jiyana komunal pêş bikeve jî rêxistinkirina pergala aboriyê ya şoreşê şertê pêşî ye. Gelê Rojava debara xwe bi cotkarî û ajaldariyê dike. Bi şoreşê re kanên petrolê jî ketin bin kontrola gel. Ev hemû jî di pêşwazîkirina pêdiviya gel de nebes dimînin.

Erdnîgariya Rojavayê Kurdistanê ji çar aliyan ve hatiye dorpêçkirin. Li milekî çeteyên DAÎŞ'ê, li milê din êrîş û gefên dewleta Tirk a faşîst hene. Êrîşên dewleta Tirk bênavber dewam dikin. Qadên wekî Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî hatine dagirkirin û beşeke mezin a gel jî dane koçberkirin. Yanî halê şer ê ku Şoreşa Rojava tê de ye dewam dike û li gel vê rîskên şer jî zêde dibin. Ji bo gelekî di nava şer de jî pêwîstiyên sereke yên ekonomîk diguherin. Ruxmî van neyênîbûnan jî di warê aborî de li ser piyên xwe disekine.

Pêdivî pê heye ku li gorî paradîgmaya şoreşê modeleke nû ya aboriyê bê pêşxistin. Pêwîstî pê heye pergala komun û kooperatîfan bê pêşxistin. Aboriya li ser esasê kanên sînordar ên petrolê nikare pêdiviyên gel pêşwazî bike. Ji ber vê yekê pêwîstî pê heye berê xwe bide çavkaniyên cewherî yên mîna cotkarî û ajaldariyê û pergala kooperatîfê rêxistin bike. Modela ekonomîk a xwe dispêre pergala kooperatîfê wekî çawa wê tevkariyê bi piştevaniya gelan bike, her wiha wê ferqa dahata di navbera çînan de jî rake. Di vê mijarê de jî hêna di asta tê xwestin de pêşketin çênebûye. Binesaziya ekonomîk bi têrkerî nehatiye avakirin. Ji bo Şoreşê yek ji qadên sereke yê xwedî rîsk jî qada aboriyê ye.

**- Neteweya Demokratîk**

Şoreşa Rojava beriya her tiştî şoreşa gelan e. Gelek pêkhateyên gel di nava xwe de dihewîne û ev jî rengê şoreşê diyar dike. Gel li dora îdealên nû dicivin û bi hev re îradeyê nîşan didin. Ev tê wê maneyê ku neşterê li nakokiya herî esasî ya li Rojhilata Navîn didin. Bawerî û nasname bi hev re yekpare dijîn. Gel xwedî li nasname û baweriyên xwe, azadiya xwe ya rêxistinbûn û îfadeyê, mafê xwe yê nûnertiyê û xwedî li

îradeya xwe derdikeve. Ev yek ji bo gelan serketineke mezin e. Gelên Rojhilata Navîn di bin pençên netew-dewletê û sîstema kapîtalîst de ne û her tim di ser cudatiyên gelan re dijminahî hatine afirandin. Cudatiyên ol û baweriyan bûye sedema şerên mezhebî. Cudatiya nasnameyê jî bi heman rengî ye. Miletperestiya netewa serdest her tim nasnameyên bindest pelçiqandine. Rengên ku di warê hejmarê de kêm mane her tim bi qetlîam û qirkirinan re hatine hevrûkirin û di bişavtinê re hatine derbaskirin. Şoreşa Rojava ev nakokî hemû derbas kirine. Yekîtiya qedera hevpar hatiye avakirin û di her qada jiyanê de yekîtiya hêzê hatiye avakirin.

Gel li gorî perspektîfa neteweya demokratîk li dora hişmendiya hemwelatîbûnê hatine ba hev û civaka demokratîk ava kirine. Ev, gaveke cidî ye. Ev destkeftî, ne tenê ji bo gelên li Rojava, ji bo gelên li herêmê jî modeleke wisa ya rêveberiyê ye ku pêwîst e li ber çav bê girtin. Heger neteweyên cuda karibin li ser bingehê krîterên demokratîk bi hev re bijîn, karibin bibin xwedî fikir û pratîka vê wê pirsgirêkên herêmî jî di asteke mezin de bên derbaskirin. Pira di navbera gelan de bi Şoreşa Rojava re hatiye avakirin. Gavên wê yên şênber û pratîkî hatine avêtin. Pêdivî pê heye ku ev yek zêdetir bê pêşdebirin. Heger karibin li dora nirxên hevpar kilît bibin, bibin xwedî hişmendiya neteweya demokratîk, xwe bigihînin normên civaka exlaqî-polîtîk jêneger e ku wê şoreşa rastîn a gelan pêk bînin. Bayê Şoreşa Rojava ber bi gelên derdor ve diçe û ji bo ku gel karibin di nava aştiyê de bi hev re bijîn mînak e.

Şoreşa Rojava ruxmî hemû êrîşên derve, dagirkerî, dorpêç, pirsgirêk û nebesiyên navxweyî jî wekî Ronesansa Rojhilata Navîn ronahiyê dide. Ji bo pirsgirêkên civakî çareseriya demokratîk nîşan daye. Zihniyeteke nû ava kiriye. Şoreşa Rojava hêna di pêvajoya xwe ya destpêkê de ye, di pêvajoya înşayê de ye. Di heman demê de bi êrîşên derve re jî hevrû ye û pêvajoyeke tijî rîsk li pêşiya wê ye. Bi saziyên xwe yên ku li her qadên jiyanê ruxmî van neyênîbûn û bêderfetiyan jî ava kiriye, di nava tecrûbeya xwe ya deh salan de gelek tişt bi cih kirine. Şoreşa Rojava li şûna reçeteyên hazir ên dikarin bên pêkanîn, ji ezmûn û tecrûbeyên pratîkê fêr dibe, bi destketiyên xwe û bi çavkaniyên xwe di rêya xwe de diçe.

### Pêvajoya ku Şoreşa Rojava Tê Re Derbas Dibe û Rîskên Wê

Şoreşa Rojava ruxmî ku pêvajoyeke 10 salan li pey xwe hiştiye jî hêna di pêvajoya avakirinê de ye. Hêna di gelek qadan de bisazîbûna wê temam nebûye. Di warê çareserkirina pirsgirêkên xwe yên avanî de û bipergalkirina wê de nehatiye asta tê xwestin. Her çiqasî gelek sedemên vê hebin jî di encam de wekî hedefên ku pêwîst e pêk werin û şoreş pê mayinde bibin li pêşiya civakê disekinin. Pirsgirêkên civakî yên ku ji rabirdûyê

dewr hatine girtin li benda çareseriyê ne. Wekî saziyên binesazî û jorsaziyê pêwîst e li gorî ruhê şoreşê berê xwe bide avakirinekê.

Di serî de pirsgirêkên navxweyî, ekonomîk û ewlekariyê, di nava Şoreşa Rojava de pirsgirêkên avakirina civaka demokratîk hene û pêwîst e bên derbaskirin. Ji bo ku karibe destketiyên di nava deh salan de qezenc kirine biparêze erkên wisa ne ku pêwîst e bi lez bên bicihanîn. Bêguman bi qasî pirsgirêkên navxweyî ji ber gefên derve jî pirsgirêk hene. Hêzên dijşoreşê ji bo fetisandina şoreşa Rojava ketine nav êrîşeke giran. Êrîşên îşgalê yên dewleta Tirk ji bo tinekirina statuya fîîlî ya şoreşê ye. Ji ber vê yekê êrîşên dagirkeriyê didomîne. Qadên wekî Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê dagir kiriye. Beşa erdnîgariyê ya mayî jî di bin gefa dagirkirinê de ye. Êrîşên rojane bênavber dewam dikin. Polîtîkayên dijminane yên dewleta Tirk ên li dijî Kurdan wekî her qadê li Rojavayê Kurdistanê jî zêde bûne. Êrîşên komên çete yên ku di bin serweriya dewleta Tirk de ne dewam dikin. Çeteyên DAÎŞ'ê ji nû ve çalak dike û ji bo şoreşa Rojava rîskê ava dike. Ji bo ku karibe gelên di nava tifaqa şoreşa Rojava de ne parçe bike kampanyayeke mezin a reşkirinê dimeşîne. Dikeve nava her cure pratîka dijşoreşgerî û hewl dide Şoreşê biqedîne.

Li hundir û derveyî Rojava avaniya hevkar a bi navê ENKS jî ji bo Şoreşa Rojava gefeke cidî ye. Li gel dijminên şoreşê bûye parçeyekî ji êrîşan. ENKS hem bi dewleta Tirk re hem jî bi PDK'ê re kengî keysê bibîne hewl dide rêveberiya xweser a Rojava birûxîne. Ji bo ku nirxên hatine avakirin desteser bike û van destketiyan pêşkêşî dijmin bike ketiye nav hewldanan.

Rêveberiya PDK hêna ji destpêkê ve bi roleke li dijî Şoreşa Rojava rabûye. Rêkên şoreşê birîne û ji bo ku şoreşê bêhnçikandî bike çi ji destan hatiye texsîr nekiriye. PDK hêzeke wisa ye ku serê tevgera dijşoreşê dikşîne. Hevkariya stratejîk a li gel dewleta Tirk a faşîst pêş xistiye ji bo tinekirina tevgera azadiya Kurd e. Balafirên Bêmirov ên Biçek êrîşên xwe yên li Mexmûr, Şengal û Başûrê Kurdistanê bi agahiyên îstixbaratê yên PDK'ê ve pêk tîne. Başûrê Kurdistanê di her warî de ji bo pratîk û polîtîkayên dewleta Tirk a dijminê Kurdan vedike û jê re pêşkêş dike. Qîma xwe bi vê jî nayne li ser Rojava hesab û kîtabên pir qirêj dike. Şoreşa Rojava ji bo xwe wekî hebûneke dijmin dibîne û hewl dide ji holê rake. Hewl dide bi rêka ENKS'ê mudaxeleyên siyasî, bi rêka "pêşmergeyên Roj" mudaxeleyên eskerî, bi rêka deriyê sînor mudaxeleyên ekonomîk bike û hewl dide dorê li Rojava bipêçe. PDK û dûvika wê ENKS hem ji hundir hem jî ji derve berê xwe dane destketiyên şoreşê û hewl didin rêveberiya xweser a Rojava tasfiye bikin.

Dewleta Sûrî jî li şûna ku polîtîkayên çareseriyê biafirîne bi navê ku ji nû ve serweriya dewletê ava bike şoreşa Rojava nas nake. Lêgerîna wê ew e ku otorîteya dewletê ya hejiyaye ji

nû ve ava bike. Hêna rêveberiya Şamê û rêveberiya xweser a Rojava li ser rewşa heyî muzakere jî nekirine. Fikrên li ser yekparebûna welat û siberoja hevpar a gelan nebûye mijara hevdîtinê. Rûsya, DYE û Îran wekî aliyên pirsgirêka Sûriyeyê li herêmê ne û têkildarî siberoja Sûrî diaxivin. Ji ber vê yekê di heman demê de şirîkên pirsgirêkan e jî. Wekî hêzên ku siberoja rêveberiya Şamê diyar dikin di heman demê de aliyên pirsgirêkê ne jî. Ji ber ku di vê mijarê de pir zêde aktor hene, têkildarî siberoja şoreşa Rojava jî rîsk hene.

Sîstema kapîtalîst a kûrewî jî hevsengîparêz û berjewendîparêz nêzî şoreşa Rojava dibe. Bi qasî ku berjewendiyên wan eleqedar dike pê re eleqedar dibin. Navendên wisa ne ku ji bo êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk destûr dane. Rewşa fîîlî ya heyî ya şoreşa Rojava jî qebûl nakin û statuya wê ya heyî nas nakin. Di hevdîtinên navneteweyî de rêveberiya xweser a Rojava wekî muxatab nayê dîtin û tevlî xebatên destûra nû ya bingehîn nayê kirin. Ev yek jî nîşan dide bê niyeta hêzên serwer têkildarî Şoreşa Rojava çi ye.

Şoreşa Rojava ruxmî her tiştî jî bi hêza cewherî ya gel, bi îmkanên xwe yên kêm li ser piyan disekine û ji bo gelên Rojhilata Navîn modeleke nû derxistiye holê. Ruxmî tehdîdên derve û rîskan jî deh sal li pey xwe hiştine. Pêkhateyên gel ên şoreşa Rojava heta ku têkildarî siberoja xwe wekî hêza gotin û biryarê destketiyên şoreşê biparêzin wê şoreşa Rojava jî wekî berhemê gelan hebûna xwe dewam bike.

**Şoreşa Rojava hêna di pêvajoya xwe ya destpêkê de ye, di pêvajoya înşayê de ye. Di heman demê de bi êrîşên derve re jî hevrû ye û pêvajoyeke tijî rîsk li pêşiya wê ye.**

# BINGEHA ŞOREŞA ROJAVA FIKRÊN AZADIYÊ YE

**Mînaka hevalê Rustem Cûdî heye. Di PKK'ê de rol lîst û hem di şoreşa Rojava de hem jî di şoreşa tevahiyê Kurdistanê de xebat meşand. Hevalê Îsmaîl, hevalê Mihyeddîn û yên wekî wan, hevalên ku ji bo Rojavayê Kurdistanê kesayetiyên pêşeng**

HEVALÊ SOFÎ

Beriya Serok APO di bingeh de tiştekî ku Kurdên Rojava li ser wê bibûna mutefîq tune bû. Ango her 9-10 kesan ji xwe re partiyek ava kiribûn û xwe cuda kiribûn. Serok APO dikarîbû vê valatiyê dagire. Ciwanên ji vê derê ku hêvî didan tevlî nav refên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK'ê) bûn. Rizgariya Rojavayê Kurdistanê di PKK'ê de didîtin, di PKK'ê de şoreşa mezin a Kurdistanê didîtin. Ji ber wê ciwanekî ku wisa fikrê xwe yê welatparêz hebe, fikrekî xwe yê çep hebe, xwedî karakterekî şoreşgerî be, di van

partiyan de hêvî nedîtin û lewma tevlî PKK'ê dibûn. Mînaka hevalê Rustem Cûdî heye. Di PKK'ê de rol lîst û hem di şoreşa Rojava de hem jî di şoreşa tevahiyê Kurdistanê de xebat meşand. Hevalê Îsmaîl, hevalê Mihyeddîn û yên wekî wan, hevalên ku ji bo Rojavayê Kurdistanê kesayetiyên pêşeng in û bi roleke mezin rabûne.

Di Şoreşa Rojava de mîrasa PKK'ê û Rêber APO faktoreke esasî ye. Faktoreke ku em ji rêxistinên din cuda kirin, ji tevgerên din cuda kirin, ev faktor bû. Hêzên navnetewî û yên herêmî ji bo ku li Sûriyê hêzên cur bi cur bidin şerkirin bi milyaran dolar xerc kirin, bi tonan cebilxane dan wan, lê nikarîbûn hebûnek raber bikirana û di demeke kurt de tasfiye bûn. Yan bi rengê grûbên çete veguherîn, yan bûn rantxwar, yan jî tasfiye bûn û çûn. Hinan bîadî DAÎŞ'ê kirin, bîadî El Nusra kirin û tevlî wan bûn. Ya me, tişta ku em li ser piyan hişt û hişt ku em li hember DAÎŞ'ê bi ser bikevin û hebin û di Rojava de şoreşê bi ser bixin, mîrasa APOCÎ ye, ku bingeha wê li Rojavayê Kurdistanê û li Sûriyê hatibû avêtin.

Serok APO di Tîrmeha 1979'an de, di gundekî Kobanê re derbasî Rojava bû. Destpêkê, naskirineke xwe ji bo Rojava tune bû, naskirineke xwe ji bo herêmê tune bû, eleqatek, pêwendiyek, tune bû. Li Rojava hinek partiyên ku berê bi Kurdîniyê re mijûl dibûn hebûn, hinek qaçaxçî û hinek malbatên ku li herdu aliyên sînor mane hene, di navbera Sirûcê û Kobanê de hene. Zemînê heyî ewqas bû. Serokatî demeke kurt li wê derê dimîne. Piştre derbasî qada Rojhilata Navîn dibe. Bi tevgerên şoreşgerî yên Filîstinî re peywendiyan datîne. Paşê jî di Rojhilata Navîn de bi gelek însanan re peywendiyan pêş dixîne.

Li kêleka dahûrandinên Serokatî, Berxwedana Zîndana Amedê jî xwedî cihekî taybet bû. Paraznameyên hevalê Mazlûm, hevalê Kemal, hevalê Hayrî û hevala Sakîne bi zimanê Erebî hatin tercûmekirin û wekî pirtûk hatin belavkirin. Wê pirtûkê bi tena serê xwe efsaneyek da çêkirin. Cara ewil wisa di zîndanên faşîzmê de çawa îrade bi ser dikeve, çawa berxwedanî li hemberî zaliman tê meşandin, van herçar hevalan di paraznameyên xwe de û bi gotinên xwe yên li dozgeriyê ve bi rastî jî heyecaneke pir mezin dan çêkirin. Ev heyecan bi 15'ê Tebaxê re jî gihişt lûtkeya xwe, ango berxwedana li zindanan a hevalê Mazlûm, hevalê Kemal, hevalê Hayrî, hevala Sara (Sakine Cansiz) û hevalên din û pêngava 15ê Tebaxê ya hevalê Egîd hevdu temam kirin û Rojavayê Kurdistanê di dawiya salên 1980 de, ango 87, 88, 89 û 90'î de êdî ji bo guherîn û veguherînê ket nav pêlekê. Bi hezaran sempatîzanên tevgerê çêbûn, bi sedan ciwan beşdarî nav refên tevgerê bûn û derbasî nav refên gerîla bûn.

Piştî Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê hêzên komploger Serok Apo dîl girtin. Vê yekê bandoreke neyênî li ser moralê gelê me yê li Rojavayê Kurdistanê kir. Ji ber ku gel ji nêz ve

Serokatî dîtibû, Serokatî nas kiribû, 20 salan pê re mabû, hinek dost hebûn ji sala ku Serokatî hatibû Rojava heta 15'ê Sibatê bi Serokatî re mabûn. Komployê di moral de wendahiyeke mezin dabû çêkirin. Ew wendahiya moral di destpêkê de qûlibî hêrsa tolhildanê, ew tevlîbûnên salên 99 û 2000'î, ew tevlîbûna fedaî ya ku di van salan de pêk hat, di bingeh de wekî berteka li dijî vê ye.

Di pêvajoya avakirina PYD'ê de û di avakirina KCK'a Rojava de, ji ber ku li ser vê di sala 2006-2007'an de êdî KCK'a Rojava hatibû avakirin, ango ev xebatên KCK'ê di Rojava de di bin sîwanekî de hatin komkirin û navê wê wekî KCK'a Rojava hat danîn. Komîta siyasî PYD bû, partiyên siyasî hebûn, partiya jinê hebû, komîteya malbatên şehîdan hebû. Ango KCK li Rojava jî hate avakirin. Hin heval hene, ku ji vê pêvajoyê re pêşengtî kirine. Ji van di serî de Hevala Şîlan û hersê hevalên din; hevalê Fuat, hevalê Zekeriya û hevalê Cemîl tên. Ev herçar heval bi destê hin xayinan li ser sînorê Iraqê hatin şehîdkirin.

Di Rojavayê Kurdistanê de hem di avakirina PYD'ê de, hem jî di avakirina pergala me ya civakî de, rola hevalê Rustem pir zêde ye. Xebatên ku hevalê Rustem li vir da meşandin, kadroyên ku hevalê Rustem perwerde kirin û şandin vir, rola mezin a hevalê Rustem îfade dike. Ji bo vê cihê van herdu hevalan, hem hevala Şîlan û hem jî hevalê Rustem, di avakirina PYD û KCK'a Rojava de, ku paşê xwe wekî TEV-DEM'ê bi nav kir, roleke mezin e, ya pêşengtiyê ye. Ev şoreş, li ser xwîna wan, li ser bîranîna wan bi ser ket.

**Li Sûrî Zexta Li Ser Tevgerê Zêde Dibe**

Di navbera salên 2001 û 2011'an de serdemeke nû heye. Di vir de hem esareta Serokatî û hem jî mirina Hafiz Esed heye. Hafiz Esed di sala 2001'ê de mir. Li Sûriyê pêvajoyeke nû dest pê kir. Li gor xwe aqil kirin, ango li gor wan gotin; "Mîsyona PKK'ê temam bûye, PKK êdî ne tevgereke wisa ye ku mirov karibe bi rêka wê zextê li ser Tirkiyê bike û li ser Tirkiyê bi bandor bibe. PKK êdî ji wê pozîsyonê derketiye". Li ser vê yekê rejîma Sûriyê li gorî xwe fikirî û got; "Ji bo ku ez ji ber pratîka xwe ya berê xwe bidim efûkirin û ez ji xwe re qadekê vekim ya herî baş ez xwe nêzîkî Dewleta Tirk bikim". Jixwe reel sosyalîzm jî belav bibû. Lewma ji bo xwe Tirkiye wekî rêya vebûna ber bi Ewropa ve û her wiha, rêya ku xwe ji mudaxeleyên Emerîka û ji êrîşên derve biparêze dîtin.

Ji ber vê wekî çare xwe xistin bin sîwana Erdogan, xwe teslîmî Tirkiyê kirin. Peymana Edenê bi rastî jî teslîmiyet e. Niha hinek xalên wê eşkere dibe. "Tirkiye dikare ji Peymana Edenê sûdê wergire, dema ku tehdît ji Sûriyê ve li ser wê hebe dikare were heta 30 kîlometreyan û di xaka Sûriyê de êrîşê bike û vegere". Me fêm kir ku ev maf di Peymana Edenê de ji bo Tirkiyê hatiye dayîn.

Ji ber vê piştî salên 2003-4-5 hetanî 2011'an êdî wekî wîlayeteke Tirkiyê li Sûriyê hatibû. Di aliyê ekonomîk de li hev kirin. Kir weke sûkeke aboriya Tirkiyê. Berhemên Tirkiyê anîn li Sûriyê firotin. Bi Sûriyê re deriyê tîcaretê vekirin. Dewleta Sûriyê êdî kadroyên PKK'ê digirt û teslîmî wan dikir. Tirkiyê jî ji bo vê yekê xelat dida Sûriyê. Beşar Esad jî wisa texmîn dikir ku wê ev eleqatê wî ya bi Erdogan re wî biparêze. Nizanîbû ku Erdogan wekî mar e, xwe dixe bin çengê mirov, paşê bi mirov ve vedide.

Xebatên tevgerê hemû li vir hatibûn qedexekirin, welatparêzên ku alîkariya hevalan dikirin dihatin girtin, êşkence didîtin û Tirkiyê Sûrî tam xistibû bin bandora şerê xwe yê taybet. Hin hevalên ku ji aliyê rejîma Sûriyê ve teslîmî dewleta Tirk hatibûn kirin, hîn jî di girtîgehên Dewleta Tirk de ne. Pêvajoyeke dijwar bi ser Kurdan de anîn. Nêzîkatiyên şoven ên faşîst ên dewleta Tirk bûn ku di Sûriyê de li ser gel, tevgerê û hevalan dihate meşandin. Mesela jixwe nêzîkî 300-400 hezar Kurd, nîv milyon Kurd bê nasname hatibûn hiştin, ne hemwelatî bûn, ji mafên xwe yên hemwelatiyê û civakî hemû mehrûm bûn, nikaribûn li zanîngehê bixwendana, nikaribûn pasaport bigirtana, nikaribûn li ser navê xwe tiştek tapo bikirana, qeyd bikirana. Her tişt ji wan re qedexe bû. Te digot qey di welatê xwe de wekî ecnebiyan bûn, ecnebî bûn. Li ser Kurdan bi giştî pêkanînên pir xerab dan meşandin.

Sûriye jî bi vê hat xapandin. Berjewendiyên wan jî tê de hebû, ji ber wê Kurd feda dikirin. Ji bo ku tifaqa xwe ya bi Dewleta Tirk re bibin serî, Kurd feda dikirin. Vê yekê zerareke mezin da civakê. Derveyî bûyera Amûdê û bûyera girtîgeha Hesekê, bûyereke ku gelê Kurd û Ereb hevdu qetil kiribin û dijminatiya hev kiribin tune ye. Lê, rejîma BAAS'ê êdî pêkanînên dewleta Tirk a faşîst li vê derê dida meşandin. Ji ber vê gelek bûyerên neyînî çêbûne. Ji van yek jî di 12'ê Adara 2004'an de Qetlîama Qamişlo bû. Armanc çi bû? Tirsandina çavên Kurdan bû. Ji ber vê yekê ev bûyer fireh bû, li hemû bajaran belav bû. Wê demê tevgerê mudaxele kir. Yên ENKS'ê wisa ne, provokasyonan dikin, paşê xwe didin alî, xwe mexdûr didin nîşandan. Tevger kete dewrê, hevalan gelek çalakî kirin, li Efrînê, Kobanê, Cizîrê çalakî kirin, êrîşî ser navendên rejîmê kirin, navendên rejîmê xera kirin. Ji ber wê rejîm neçar ma ku paşde gav bavêje. Beşar bi xwe derket, lêborîn ji Kurdan xwest û soz da ku hemû girtiyan berde, birîndaran derman bike û hwd. Lê, sozên xwe bi cih neanî, ango derew kir. Herî kêm paşde gav avêt û şertên gel qebûl kir. Ji bo wê ev bûyera 2004'an li Qamişlo pêk hat di bingeh de raber kir û rejîmê mesajeke wisa girt ku gelê Kurd xwedî rêxistin e û nêzîkatiyên çewisandinê qebûl nake.

12 salên ku me li pey xwe hiştine, di dîroka mirovahiyê de mirov dikare wekî pêvajoya guherîn û veguherînê ya di Rojhilata Navîn de pênase bike.

Gelek nav û pênase ji bo vê pêvajoyê hatin pêşxistin. Berê wekî bihara Ereban an jî bihara Rojhilata Navîn hate binavkirin. Wekî şoreşa Rojhilata Navîn hate binavkirin û ji ber ku hîn pêvajo berdewam dike, bi rastî jî lêkirina navekî misoger helbet zehmet e. Lê rastiyek li holê heye ku di vê sedsala me de 12 salên herî dijwar me li pey xwe hiştin. Vê pêvajoya van 12 salan ji Tûnisê dest pê kir û niha bi hemû dijwariya xwe ve li Sûriyê berdewam dike û hevsengiyên navnetewî û herêmî raber dike ku ev şer û ev pêvajo wê hîn jî dirêj bike. Gelek kes û Rêber APO jî wisa texmîn dikin ku ev pêvajo heta sala 2025'an bi vê germiya xwe ve di erdnîgariya Rojhilata Navîn de, li herêmên cuda cuda bê meşandin. Serok APO vê pêvajoyê wekî Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi nav dike. Hîn beriya 20 salan ev nav lê kiriye. Ji ber ku hevsengiyên navnetewî û dîyalektîka têkilî û nakokiyan vê raber dike. Aloziya ku modernîteya kapîtalîst gihiştiyê, aloziya ku netew-dewlet di Rojhilata Navîn de bûye sedema wê û êş û azarên civakê, trajediya ku civak dijî, vê didin xuyakirin. Ji ber ku li cihekî dema nakokî gihiştibin lûtkeyê, em wê lûtkeyê wekî kaos pênase dikin. Helbet kaos merhaleya beriya guherîn û veguherînên mezin e. Piştî wê guherînên mezin çêdibin. Yan ev kaos ber bi hilweşandinê ve dibe, yan jî rê li pêşiya çareseriyê vedike û ev jî ne aloziyeke herêmî ye, ango pirsgirêkeke cîhanî ye. Ji ber ku jiyana em tê de ev nêzîkî 500 salî ye di bin tesîra çanda moderníteya kapîtalîst de ye, nêzî 200 salî ye jî nexweşiyeke bi navê netew-dewletê derketiye holê û hemû cîhan xistiye bin bandora xwe. Li ser vê bingehê êdî ji pirsgirêkên mirovahiyê re çare nabîne. Jiyan ber bi hilweşandinê ve diçe. Ev pêşveçûn raber dikin ku wê pêvajo çawa be. Serok APO ji ber ku xwedî zanebûneke kûr a dîrokê ye, di heman demê de di warê pêşbîniyê de jî hîn kûrtir e. Ji ber vê yekê texmînên Rêber Apo rast derketin. Yekî dîrokê baş zanibe, dîyalektîka pêşveçûna dîrokî zanibe, mekanîzmayên ku vê pêşveçûnê, vê guherîn û veguherînê bi xwe re tîne zanibe, wê demê dikare texmînên wisa bi îsabet bike û texmînên xwe rast jî derkevin. Bi mentiqê "Dîrok di roja me de û em jî di destpêka dîrokê de veşartîne", mirov dikare rastiya pergalên serdest û li gorî vê guherîn û veguherînên muhtemel texmîn bike.

**Derketina YPG-YPJ'ê û Şêrê Li Dijî Hêzên Çete**

Dema ku di sala 2011'an de li Tûnis, Misir, Lîbya, Yemen û Sûriyê serhildanên gel çêbûn, helbet bingehekî pir guncav ji bo ku El Qaîde careke din îlana cîhadê bike derkete holê. Ev der jî Sûriye bû. Ji ber wê, di destpêka bûyerên Sûriyê de, ji ber ku wê demê wekî bayekî çêbû, ango bûyerên Tûnisê deh rojan dirêj kir, Misir mehekî dirêj kir, Lîbya bi şer ve 5-6 mehan dirêj kir, her kesî got; "Wê yê Sûriyê jî wisa bibe". Ji ber wê ew modela ku li Lîbya, Misir û Tûnisê çêbûye, bingehekî li Sûriyê jî derxiste holê ku her kes karibe çekan bi dest bixe û xwe li vê derê bi cih bike. Rejîm

zeîf ketibû, bê piştgirî mabû, ji bo ku di Sûriyê de rejîm bê guhertin ji milekî ve Tirkiye, ji milekî ve Urdin, ji milekî ve Siûdî Erebîstan û Qeter, ji milekî ve hêzên navneteweyî, her kesî alîkariya muxalefetê dikir. Lewma jî ev ji bo El Qaîde fersendekî dîrokî bû. Li ser vî bingehî tevgera xwe li vê derê çêkir û kesên ku mensûbê El Qaîde bûn û ji derve dihatin, bi qismî jî yên ku li vê derê bi cih bûbûn, hinekên ku ji İraqê reviyabûn û li Sûriyê bi cih bûbûn, wan kesan hemû xwe komî ser hev kirin û rêxistineke bi navê Cephet El Nûsra ava kirin. Serokatiya wê kesekî bi navê Ebû Mûhammed El Colanî kir. El Nûsra destpêkê wekî tevgerên asayî yên wekî artêşên ku bi navê OSO (Artêşa Sûriyeya Azad) çêbûna xwe da nîşandan. Li Efganîstanê û Iraqê şer kiribûn. Ji ber wê tecrûbeyên xwe yên şer hîn zêdetir bûn û hîn radîkaltir bûn. Ji ber vê yekê, cihê ku OSO (Artêşa Azad) digirt, diçûn û ji wan distendin, hêzên OSO an bîat dikir, an jî ji wir direviyan. Di demeke kurt de El Nûsrayê beşeke mezin ji erdnîgariya Sûriyê girt û di Sûriyê de serweriya xwe ava kir.

Em cara ewil li ku derê bi El Nûsra re hatin beramberî hevdu? Di şerê Serêkaniyê de, paşê jî li Til Ebyad û Reqayê, qismek jî li Efrînê em hatin beramberî hevdu. Kurdan jî ji vê rewşa guherîn û veguherînê ya di Sûriyê de feyde girtin û heremên xwe rizgar kirin. Her kesî digot “Şoreş e”. Ji ber ku di Sûriyê de însanên herî mexdûr Kurd in. Ji ber vê Dewleta Tirk ji bo ku vê rastiyê berovajî bike, çi kir? Berê êrîşên El Nûsrayê da milê me. El Nûsra pêwist bû ku li hemberî rejîmê şer bikira, ji ber ku serhildan li her derê li hemberî rejîmê bû, lê belê wan wisa nekir, di xizmeta Erdogan de şerê Kurdan kirin. Êrîşa ewilî ya li hember me li Serêkaniyê bû.

Piştî wê, şerê Kobanê çêbû. Ev şerekî mezintir bû. Piştre şerê Efrînê çêbû. Di bingeh de berxwedana mezin a Serêkaniyê ye. Du salan li hemberî çeteyên bi navê OSO û El Nûsra, li Serêkaniyê berxwedaneke dîrokî çêbû. Vê berxwedanê nasnameya YPG û YPJ’ê da qezenckirin. YPG-YPJ ne berhemê berxwedana Kobanê û Efrînê ye; YPG-YPJ berhemê berxwedana Serêkaniyê ye. Ango YPG-YPJ di bingeha xwe de li Serêkaniyê ava bû. Ji ber ku şerê wê derê şerekî gelêrî, şerekî civakî bû. Şerê gel bû. Pir kêm hevalên kadro û yên xwedan tecrûbe hebûn. Lê belê, yekîneyên YXK ku hevalê Şehîd Xebat ava kiribû û paşê jî bûbûn YPG-YPJ, ev yekîne ji ciwanên herêmê pêk dihatin. Wan ciwanan karîbûn berxwedaneke gel bidin meşandin û berxwedaneke dîrokî li hemberî çeteyên OSO û paşê jî li hemberî çeteyên El Nûsra bidin meşandin. Destpêkê ji bo meşrûiyeta xwe OSO şandin ser tevgerê. Hevalan, OSO ji wê herêmê derxistin, paşê jî ji bo ku me ji wê herêmê derxînin El Nûsra rê kirin.

Şoreşger nikarin tirsonek bibin. Tirsonek nikarin şoreşê bikin. Şoreş karê însanên wêrek e, însanên radîkal e, însanên bi hêz e. Şoreş karê kesên wekî Şehîd Serhed û Şehîd Lewend e, kesên wisa dikarin şoreşê bikin.

Yên wekî Yekîtî an jî Hemîdê Heyderê nikarin şoreşê bikin. Hemîdê Heyderê di sala 2013'an de digot "Em ji rejîmê re pêşniyar dikin ku Qamişlo teslîmî me bike." Ma şoreş bi pêşniyaran dibe? Em jî pêşniyar dikin Erdogan Amedê bide me! Çi baş e ne wisa? Li ser vê bingehê gel wisa xwedî li YPG'ê derket. Çi hebû? Du helwest hebûn. Yek jê helwesta Şehîd Lewend û Şehîd Serhed bû. Zarokên Qamişlo yên ku di sala 2013'an de çêbûne, nîviyê wan bi navê Lewend an jî Serhed e. Du hevalên wisa fedaî bûn. Xwedan sekneke civakî bûn, kê ew dîtibin heyranê wan mane. Bi dehan malbatên ku niha bûne dostên me yan yên serdema Serokatiyê ne, milîsên me yên kevn in, an jî hevalê Lewend û hevalê Serhed ew bi rêxistin kirine. Niha jî dilsoz in. Paşê ev çand ji aliyê hevalê Seydo û hevalê Devrîm ve hat berdewamkirin, lê herdu heval qehremanên serdemê bûn.

Dema ku OSO hat û Serêkaniyê dagir kir bi Cephet El Nûsra re, alên xwe yên wekî rûwê xwe yê reş daliqandin. Serêkaniyê bi temamî kete destê wan. Derveyî taxa Sinaa, hemû deverên din girtin. Hevalan ji milê Dirbêsiyê ve teqwiye şandin û ew der wisa girtin. Hevalan li wir şer û berxwedanî dan destpêkirin. Ev cemeata ENKS'ê tevî 14-15 ciwanên xwe ala PDK'ê rakiribûn û tekbîr berz dikirin. Digotin, "Ellah û Ekber" û berê xwe dan baregehên wan. Dema ku mirov van dibîne ji Kurdîniyê şerm dike; însan dikare encax ewqasî kole be, encax ewqasî rezîl be. Ev, ruhê koletiyê nîşan dide. Kurd beriya PKK'ê wisa bûn. Çanda Berzanî wisa ye. Heger Kerkûkê nîv saetê li ber xwe nedabe, ji ber vê çandê ye. Dema ku Tirk tên cem wan, hema wisa destê xwe didin ber hev û diçin destê wan maçî dikin. Kurdên teslîmgirtî, kole, hevkar ev e. Lazim e mirov jê nefret bike, dilê mirov jê bixele.

Gelê Serêkaniyê dît ku hinek teslîm dibin, hinek çiqas rezîl in, bîatî çeteyan dikin, hinek xwe difiroşin, hinekan malê xwe dan pişta xwe û reviyan, çûn di Tirkiyê re derketin, di cem PDK'ê re derketin, lê belê hinekan ji wan jî çongê xwe danîn erdê û bi erdê ve girê dan. Wekî Omer Mûxtar kirin, bi xwîna xwe ve erdê Serêkaniyê rizgar kirin, pîroz kirin. Gelê Serêkaniyê wisa bû dostê me. Nexwe ji derveyî hevalê Rustem û yek-du hevalên din, me ji Serêkaniyê tu kes nas nedikir. Tu hemû hevalên ji Serêkaniyê yên di nav me de kom bikî, belkî 10-12 heval tune bûn. Lê ji 2013'an û şûn ve nîviyê YPG'ê ji Serêkaniyê bûn.

**Derketina DAÎŞ'ê û Gotina 'Kobanê Li Ber Ketinê Ye'**

El Nûsrayê demeke dirêj li ber xwe da û şerê me kir. Herêm hemû di destê wan de bûn. Li Til Ebyad şerê me kirin. Bi alîkariya DAÎŞ'ê li Reqayê hevalên me şehîd kirin. Êrîş birin ser Qestel Cindo. Li Cizîrê jî bi riya Til Hemis, Til Berek û di riya Til Koçer re êrîş anîn ser herêmên me. Seyare dişandin û di nav me de diteqandin, motorbisiklêt di nav me de diteqandin, çete dişandin û di nav me de êrîşên întixarî dikirin. Ji bo vê

ev herêma rizgarkirî lazim dikir ku li hemberî wan bi ser bikeve ku bikaribe xwe biparêze. Ji ber vê yekê pêngavên mezin ên Serêkaniyê, Elok û paşê jî Rimêlan Paşa, ya Dîcle, ya Til Koçer, paşê jî ya Til Berek û Til Hemis hatin pêşxistin. Pêngava Til Hemîs ji bo El Nûsra bû nuqta şikestinê. Yan wê paşde bireviya, Til Hemîs biterikanda, yan jî lazim dikir ku hawara xwe bigihîne hêzên din. Dewleta Tirk dît ku heger El Nûsra di Til Hemîsê de bişkê, wê YPG û YPJ hemû herêmê kontrol bike. Ji ber vê Îhrarî Şam şand, Tewhîd şand, hemû jî çeteyên dewleta Tirk bûn. Herî dawî jî DAÎŞ şand. Helbet hevalan ev yek ferq nekiribûn, dema ku çûn gotin belkî wekî berê ne, çeteyên El Nûsra ne. Şevekê çûn, ketin Hiseyniyê, di wir de heval şehîd ketin, em neçar man û me heval paşde kişandin. Hevalan xwe komî ser hev kirin û em careke din bi ser wan de çûn. Ev El Nûsra ya ku di şerê Serêkaniyê de li hemberî me şer kir, di Til Hemîsê de bi bin ket. Li wê derê êdî alîkarî ji DAÎŞ'ê xwest û DAÎŞ jî hat. DAÎŞ'ê piştî ku Til Hemis parast, ji çeteyên El Nûsrayê re got; "Me ev der parastiye. Ji ber vê yan hûn ê bîatê ji me re bikin, yan jî em ê we hemûyan bikûjin." Yên El Nûsra qismek ji wan reviyan, çûn milê Îdlibê, qismek ji wan jî teslîmî DAÎŞ'ê bûn, bîat ji DAÎŞ'ê re kirin, qismek ji wan jî kuştin. El Nûsra bi vî awayî bi dawî bû û di sala 2014'an de şerê me yê bi DAÎŞ'ê re dest pê kir.

El Nûsra dibû wersiyona sêyemîn a El Qaîdeyê. El Qaîde wersiyona yekem e, Mûshab El Zerkawî di Iraqê de wersiyona duyemîn e, El Nûsra jî wersiyona sêyemîn e. Piştî wan jî DAÎŞ hat. DAÎŞ jî heman îdeolojiya Wehabî esas digire, heman fikrê Selefî yê radîkal esas digire. Li ser vê bingehê ev erdnîgariya ku El Nûsrayê girtibû êdî xiste bin destê xwe û pê re di Sûriyê de fireh kir, paşê jî çû Til Ebyad girt, Reqa girt, Dêrazor girt û di roja 14'ê Tîrmeha 2014'an de êrîş bir ser Mûsilê û ew der jî girt. Bi girtina Mûsilê re DAÎŞ'ê êdî enerjî, hêz û derfetên dewletekê bi destê xwe xist. Ji ber ku tenê pereyên naqit ê di bankaya navendî ya Mûsilê de 25 milyon dolar bû. Reqamên fermî wisa bûn, lê muhtemelen du-sê qatî ji vê zêdetir be. Ji xeynî çek, tang û topan, bîr û şîrketên petrolê ewqas pere jî bi dest xistin. Bi vî awayî bendava Mûsilê girtin û berê xwe dan Bexdayê, Samara girtin û piştre jî Ramadî girtin, hema hema nêzîkî Bexdayê bûn. Bi ber Başûrê Kurdistanê ve, bi aliyê Kerkûkê û Dihokê ve jî çûn, êrîşî ser Şengalê kirin. Herî dawî jî di Tîrmeha 2014'an de kesekî bi navê Ebûbekir Bexdadî xwe da naskirin, xwe wekî serokê El Qaîde û xelîfeyê Misilmanan, yê xîlafeta DAÎŞ'ê da naskirin û Dewleta Îslamê ya Iraq û Şamê îlan kir.

Bi rastî jî DAÎŞ ji sala 2014'an heta niha tenê ji bo Dewleta Tirk xebitî. Niha jî hinek ji wan rexneyan li xwe dikin, dibêjin;"Me nizanibû ew der Kurdistan e, me Kurd nas nedikirin, Kurdan jî pêwist e bîat ji me re bikirana." Axaftinên wisa bê qiymet dikin. Heqîqet dide xuyakirin ku Erdogan ew berhêlî kirin. Ew DAÎŞ a ku êrîşî ser Kobanê kir, heger êrîşî ser

Şamê bikira, wê Şam bigirta. Ew DAÎŞ a ku êrîşî ser Kobanê û Şengalê kir, êrîşî ser Bexdayê bikira, wê bigirta. Temam, çima Kobanê, çi yê Kobanê hebû? Ma petrola wê hebû, gelo malbata xelîfe li wê derê bû, dewleta xîlafetê li wê derê bû? Tiştekî wê tune bû. Bi awayekî rêk û pêk genim jî lê şîn nayê. Ceh diçînin, baran jî lê nayê, wekî çolekê ye. Lê ji bo Erdogan pir tiştî îfade dike. Kobanê wisa bû, ji bo DAÎŞ'ê ne tiştek bû, lê ji bo Dewleta Tirk her tişt bû. Ji ber ku Serok APO gava xwe ya ewilî ya li Rojava li Kobanê avêtibû. Li Rojava, Kobanê ew cih bû ku fîşeka ewil li hember faşîzmê hatibû teqandin û şoreşa 19'ê Tîrmehê lê dest pê kiribû. Lewma jî ji bo Kurdan her tişt bû, ji bo Erdogan jî kabûsek bû. Li ser vê bingehê tê wê wateyê ku yê DAÎŞ berhêlî dikir, yê DAÎŞ dida meşandin, di vî şerî de Erdogan bû. Nexwe çi karê DAÎŞ'ê bi çiyayê Şengalê heye, çi karê DAÎŞ'ê bi Kobanê heye, heke DAÎŞ dixwest dewlet ava bikira bila biçûya Bexdad bigirta, bila biçûya Şam bigirta, bila biçûya Mekke û Medîne bigirta, bila biçûya Riyad bigirta. Çi eleqeta DAÎŞ'ê bi Kobanê heye? Ev tê wê wateyê ku siyaseta li vir bi armanca têkbirina Şoreşa Rojava dihat pêşxistin.

Di encama van êrîşan de û bi dîktatoriyetê, Erdogan bi zorê xwe kire serokkomar, di hilbijartinê de bi zorê xwe kire hikumet û destpêkê êrîş bire ser Cerablûsê. Paşê çû û bi Rûsya re tifaq çêkir; Heleb firot bi mûqabilê Îdlibê, Gûta firot bi mûqabilê Efrînê û bi vî awayî tîcaret li ser şoreşa Sûriyê kir û dijminatiya xwe bi rêka Îxwanî Mûslîmîn berdewam kir. Ew çeteyên ku niha li Efrîn û Serêkaniyê ne, di bingeh de girêdayî Îxwanî Muslîmîn in. Sûltan Mûrad e, El Nûsra ye, yên din in, hemû ew çete ne. Ji bo vê heger bala we kişandibe ev berxwedan di pratîk de şerê Kurdan û El Nûsra bû, şerê YPG-YPJ-QSD û DAÎŞ'ê bû, lê di heqîqetê de şerê hêzên şaristaniya demokratîk û dewleta faşîst a Tirk û Erdogan e. Ango ev şer bi nûnertî, bi wekaletê dihate meşandin. Wekîlê Erdogan kî bûn? Tewhîd bû, ew bi bin ket. Ew guhert û kir El Nûsra. El Nûsra bi bin ket û ew guhert û kir DAÎŞ. DAÎŞ bi bin ket û niha ew bi xwe bi navê dewleta Tirk ketiye dewrê. Bi artêşa xwe û çeteyên xwe yên Îxwanî Muslîmîn ve vî şerî li hemberî şoreşa Rojava û li hemberî şaristaniya demokratîk berdewam dike. Lewma heger mirov bêje ev şer şerê hêzên demokratîk yê li hember faşîzma dewleta Tirk e, ne şaş e. Nûnerê şerê ku hatiye meşandin di bingeh de dewleta Tirk bû.

Her roj ji bo ku êrîşî şoreşa Rojava bike û hikumeteke faşîst a kontr-gerîla ava bike di nava hewildanan de ye. Ji ber vê ev şoreş bi rastî jî şoreşeke pîroz e, şoreşeke bi armanca însanî ye, bi armanceke wisa ye ku însaniyet ji zilm û dîktatoriyetê rizgar bibe. Lê, Erdogan dest avêtê û xwest bi heqîqeta vê şoreşê bilîze. Lewma jî mirov niha ne dikare ji şoreşa Tûnisê re bêje şoreş, ne ji ya Misrê re bêje şoreş, ne ji ya Lîbyayê û ne jî ji ya Sûriyê re bêje şoreş. Ji ber ku Erdogan berjewendî û hesabên xwe

yên qirêj xist nav, destê xwe yê qirêj xiste nav û Sûriye, Misir, Lîbya vegerand gola xwînê. Di van 12 salên dawî de yek ji berpirsiyarên esasî ya vê xwîna ku di Rojhilata Navîn de rijiyaye Erdogan e.

Ji bo vê bihara 2014'an em dikarin bêjin wekî seferberiyeke kombûnê bû, lê bi havînê re pêleke nû pêş ket û pêvajoyeke nû dest pê kir. Ew jî pêvajoya DAÎŞ'ê bû. Êdî El Nûsra û OSO ne li Efrînê, ne jî li Şêx Meqsûdê ne reqîbê me bûn, em bi hêzeke din re rû bi rû man. Êdî DAÎŞ'ê xwe wekî dewletekê îlan kiribû. Ne tenê rêxistineke radîkal û întixarî bû, di heman wextî de hêzeke xwedan derfet jî bû. Tankên wê hebûn, pereyên wê hebûn. Jixwe di ser dewleta Tirk re korîdoreke vekiribû û wisa petrol difirot. Tirkiye ji wan re bûbû wekî korîdorekê, bûbû wekî qenalekê. Dinya alem hemû dizane, DAÎŞ'î ji Ewropayê dihatin, ji Emerîkayê dihatin, ji her derê dihatin û li balafirgeha Stenbolê peya dibûn û bi seyaran dihatin Riha û Dîlokê peya dibûn û ji wir derbasî Rojava û Sûriyê dibûn. Her wiha berê xwe dan Kurdistanê, Şengal girtin û li Şengalê qetlîam kirin. Berê xwe dan bakur û Bendava Mûsilê girtin û ber bi Dihok û Hewlêrê de çûn. Beşeke mezin ji Kerkûkê girtin. Qismek ji bajêr girtin û Çiyayê Hemrîn û Dûsxurmatû girtin. Bi vî awayî di Iraqê de tevgereke êrîşê dest pê kir. Di Sûriyê de jî berê Reqa û qismekî Dêrezorê girtibûn. Piştî wê berê xwe dan Kobanê. Bi vî awayî DAÎŞ'ê tevgereke belavbûn û êrîşê da destpêkirin. Bi rastî jî belav dibû. Ber bi Samara, Ramadî, Kerkûkê û Dihokê de çû, Mûsil, Samara girt. Ber bi Şamê ve çû Titmir girt. Ber bi Cizîrê de hat û ber bi Kobanê ve çû.

Ya ku ji bo her kesî herî zêde bû îbret, helbet Şengal e. Tiştên DAÎŞ'ê li Şengalê dikir ferman e, di der heqê gelê Kurd û civaka me ya Êzidî de ferman e. Gelê Şengalê vê rastiyê baş dizane û ew wekî fermana 74'an bi nav kir. Ango berê di der heqê wan de 73 ferman hatibûn derxistin û ev jî wekî fermana 74'an bi nav kirin. Dema ku artêşa Iraqê di Mûsilê de şikest PDK'ê bi helwesteke fersendperest, berjewendîperest çû û Şengal girt. Wisa bawer dikir ku wê DAÎŞ'ê êrîşî wan nekira. Mesela li hin cihan ew û DAÎŞ li beramberî hevdu disekinîn. Televizyona Rûdaw heye, wê tu caran nedigot DAÎŞ, her tim digot Dewleta Îslamî. Ji wan re nedigotin terorîst jî. Dema ku Mûsil girtin fermandarê DAÎŞ'ê yê Mûsilê di weşana zindî de tevlî Rûdawê bû.

Li ser vê yekê wisa pratîka DAÎŞ'ê ya Şengalê ji bo her kesî wekî îbret bû. Du-sê hezar sal in însan di bazaran de nehatine kirîn û firotin. Berê, di serdema koledariyê de desthilatdaran kole dibirin sûkê û difirotin. Lê piştî sê hezar salan jinên Kurd, jinên Êzidî li sûkên Dêrazorê û Reqayê hatin kirîn û firotin. Tiştekî wisa ye ku mirov jê îbret bigire. Di bingeha wê de şovenîzm heye, însan hatin serjêkirin. Pratîkeke wisa dan destpêkirin û êdî şer ji Sûriyê derket û bû şerê Rojhilata Navîn.

2014 ji bo hemû Rojhilata Navîn, heta ji bo cîhanê, saleke awarte bû. DAÎŞ'ê bi dagirkirina Mûsilê re cara ewil xwe wekî dewlet îlan kir. Di çar milan de êrîş pêş xistin. Wekî din ji eniyê ve ji bo ku qadên me ji destê me bigirin êrîş pêş dixistin. Lê belê, dema ku em gihiştin havîna 2014'an planên wan ên esasî eşkere bû ku hedefa wan ne avakirina dewletê ye. Hedefa wan ew bû ku firsenda Kurdan a bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi destê xwe xistine ji holê rakin. Destkeftiyên Kurdan ên 19'ê Tîrmehê ji holê rakin. Ev, rastiyekê nîşan dide; di navbera DAÎŞ û Erdogan de peymanek çêbûye. Wekî hedef hilbijartina Kobanê ne tercîha DAÎŞ'ê bû; ev yek ji aliyê Dewleta Tirk ve hat kirin, dewleta Tirk ew araste kirin. Çima? Ji ber ku Kobanê cihê malovaniya şoreşa Kurdistanê bû; Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Kobanê dest pê kiribû. Erdogan beriya 6'ê Cotmehê digot, "Kobanê jî hema hema li ber ketinê ye." Lê piştî wê rewş guherî. Ew gotin bû bela serê wî. Ango gel wî efû nekir, bi wê xalê girt. Ew gotina wî êdî wî da dest û gel bi ser de çû, berxwedana gel encam girt, bi vî awayî koalîsyona navnetewî ji bo Kobanê piştgiriya cebilxanê û piştgiriya lêdanê ya bi balafiran da û vê jî hevsengiya heyî hinekî guhert.

Di encama tifaqa QSD'ê û koalîsyona navnetewî de, Minbic, Reqa, Dêrazor, Şeddadê û Til Ebyad rizgar bûn. Ev hemû jî di bingeh de berhema vê berxwedanê ne. Ango Kobanê biketa, wê hemû Rojava biketa. Di 6-8'ê Cotmehê de jî li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê serhildanên mezin çêbûn, peyameke pir dijwar dan cîhanê û Tirkiyê. Di vê peyamê de gotin ku Kobanê wê nekeve. Gelê me yê li Ewropa, hêzên demokrat, hêzên enternasyonalîst, ango bi tevahî Kobanê êdî nasnameyeke cîhanî qezenc kir û bi vî awayî berxwedanê dîrokek nivîsand. Pêvajoya piştî wê, helbet pêvajoya rizgarkirinê ye. Ji ber ku heyecan, moral derkete pêş, DAÎŞ cara ewil dişkest. Ango li Sûrî û Iraqê ti dever tine bû ku DAÎŞ'ê dema êrîş dikir negirta, ji bilî Kobanê. Êrîş bir ser ku derê ew der digirt. Lê, ev yek di Kobanê de şkest, êdî DAÎŞ her çû bi paş ket. Koalîsyona navneteweyî jî dît ku hêza dikare vê belayê li ser rûyê cîhanê rake, vê terorê bi dawî bike YPG û YPJ ye. Ji bo vê tifaqek çêkir û bi vî awayî hevkariyek pêş ket. Hemû cîhan tevlî berxwedana Kobanê bû.

**Rizgarkirin û Parastina Bajarên Bakur-Rojhilatê Sûrî**

Helbet di aliyê leşkerî de Minbic jî ji bo DAÎŞ'ê pir stratejîk bû. Piştî Mûsil û Reqa, operasyona herî berfireh, mirov dikare bêje ku ya Minbicê bû. Ji ber vê yekê me bedelên giran dan. Di Bakurê Sûriyê de jî bajarê herî mezin ê di bin kontrola DAÎŞ'ê de bû. Korîdora DAÎŞ'ê ya bi Tirkiyê re bû. Minbic û Cerablûs li kêleka hev in. Cerablûs navçeyeke Minbicê ye. Li ser vê bingehê Rizgarkirina Minbicê, operasyona wê ji bo YPG û YPJ, ji bo QSD operasyoneke stratejîk bû. Operasyona ewil bû ku li derveyî Rojavayê Kurdistanê dihat kirin û Minbic bajarekî mezin bû. Helbet bi

sedan ciwanên Minbicê tevlî bûn. Bi vê re enerjî û moralekî mezin derket holê. Lê, ji ber kêmasî û şaşitiyên taktîk ên fermandariyê li şûna ku QSD bi Rizgarkirina Minbicê re hîn mezintir bibe, hinekî êşandin çêkir. Di kadroyan de jî, di herêmiyan de jî, heta di asayîşê de jî êşandinek çêkir. Ji ber ku DAÎŞ'ê Minbic bi hêsanî berneda û her tim êrîş dikir, di wan êrîşan de windahiyên hevalan çêbûn, lê dîsa jî hem di aliyê leşkerî de, hem di aliyê siyasî de û hem jî di aliyê civakî de Rizgarkirina Minbicê cihekî xwe yê stratejîk heye. Korîdora DAÎŞ'ê ya bi Tirkiyê re, ango ya di ser Tirkiyê re diçû Ewropayê hat qutkirin.

Operasyona Rizgarkirina Reqayê derdora sê mehan dirêj kir. Du mehan jî ji bo rizgariya bejahiya wê kişand. Di aliyê taktîk de li gorî Minbicê gaveke li pêştir bû. Li gorî pozîsyona DAÎŞ'ê û mewzîgirtina wê bedel hatin dayîn. Baş hate dorpêçkirin. Piştî Rizgarkirina Tebqayê, Başûrê Reqayê, ango Başûrê Firatê jî hate rizgarkirin. Ji bo ku ji milê Başûr ve jî Reqa were dorpêçkirin korîdoreke ku firehiya wê derdora 20 kîlometreyan li wî aliyê din ê Firatê jî hate girtin. Navbera wê û Dêrezorê jî hate rizgarkirin, ji Cezrata dest pê bike heta digihêje Hemrat, ev mintiqe hate rizgarkirin. Bi vî awayî xeta Başûr jî li ser DAÎŞ'ê hate girtin. Jixwe di milê bakur de Tebqa hat girtin û korîdor li ser wî hate girtin. Di milê rojhilat de jî Şeddadê, Mergede, Mekmen û Hol hatin girtin. Êdî dorpêç li ser Reqayê temam bû.

20'ê Çileya 2018'an dewleta Tirk bi piştgiriya çeteyan êrîşî Efrînê kir. Lê, di esas de bi teknîk û artêşa xwe ve hat. Teknîka ku li hemberî me bi kar anî teknîka herî pêşketî bû. Ji ber wê ev berxwedana 58 rojan layiqî navê xwe derket û ev nav heq kiribû. Lê belê, encam wek vê giranahiya cidî çênebû, ev yek jî mijara rexnedayîn û hesapxwestinê ye. Divê em binirxînin û hesabê wê bidin. Ji ber ku cihekî ewqasî welatparêz, cihekî ewqasî pîroz bû, ciwanên wê ewqasî fedaî bûn û teknîka me jî di asteke xurt de bû. Dîsa 9'ê Cotmeha 2019'an jî dewleta faşîst a Tîrk bi desteka hêzên navdewletî erîşî Serêkanî û Girê Spî kîr. Dagirkirina hersê bajarên Kurdan nîşanaya faşîzmê bû, nîşaneya polîtîkaya dewleta Tirk a înkar û îmhaya gelê Kurd û projeya Neteweya Demokratîk bû. Ji bo ku li herêmê pêşiyê li pêşketina gelê Kurd û projeyên Rêber Apo bigire ev êrîş pêk anîn.

Helbet ji van êrîşên dewleta Tirk derxistina dersên pêwîst û li gorî wê xwe li beramberî êrîşên nû amadekirin û her wiha ji bo rizgarkirina van bajaran xwe hazirkirin ji bo me girîng e. Ev yek hem cihê rexnedayînê ye hem jî erk û berpirsiyariyên me ne. Di vî warî de têkoşîna me dewam dike. Ev şoreşa me ji bo giştî mirovatiyê moralek û yekgirtineke mezin afirandiye. Li ser vî bingehî em di wê baweriyê de ne ku bi stratejiya Şerê Gel ê Şoreşgerî wê serketin teqez a me be.

# ŞOREŞA ROJAVA Û TEVGERA CIVAKA DEMOKRATÎK

**TEVDEM'ê xwe ne tenê wekî tevgereke civakî, her wiha xwe wekî tevgereke siyasî û parastina civakî jî bi rêxistin kiriye.**

HEVALA RÛKEN

Rojava beşeke ji xaka Kurdistanê ye û piştî peymana Sykes-Picot a di 1917'an de ji bo Sûriyeyê hatiye hiştin. Tevgera Azadiya Kurdistanê, PKK'ê, salên dûvdirêj xebatên cur bi cur li vê xaka Kurdistanê meşandiye û tesîreke pir mezin li civaka Rojavayê Kurdistanê kiriye. Bi taybet jî Rêberê Gelê Kurd Rêber Apo di sala 1979'an de derbasî Rojavayê Kurdistanê bûye, heta sala 1998'an li vê qadê xebat meşandiye, civaka Rojava li dora bîr û baweriyên azadiyê civandiye. Li ser vî esasî bi hezaran ciwanên Rojavayê Kurdistanê tevlî nav refên gerîlayên azadiyê bûne.

Ji ber ku li Rojavayê Kurdistanê bi vî rengî şoreş pêş ketiye dewleta Tirkiye tengav bûye, NATO ji xebatên Tevgera Azadiyê tirsiyaye. Li ser vî esasî li dijî Rêberê Gelê Kurd Rêber Apo komployeke navneteweyî ketiye dewrê, Serokatî ji qadê derketiye û piştî wê jî hêzên komploger Rêber Apo radestî dewleta Tirkî kirine. Di nava vê komployê de rejîma Şamê jî cihê xwe girtiye û wekî peymaneke teslîmbûnê di 20'ê Cotmeha 1998'an de li gel Tirkiyeyê Peymana Edeneyê îmze kiriye. Naveroka vê peymanê bi giştî li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê bûye û piştî peymanê rejîma Sûrî li Rojavayê Kurdistanê zexteke mezin li ser civaka Kurd kiriye, li pêşiya xebatên siyasî û civakî her cure astengî daniye û bi taybet jî ev zexta xwe li dijî fikir û felsefeya Rêber Apo meşandiye. Ango, li Rojavayê Kurdistanê xebatên siyasî û civakî ketiye bin atmosfereke zehmet, rejîma Sûrî derfet nedaye ku ti rêxistinên civakî bên avakirin, pêş bikevin.

Di sala 2003'yan de jî dema ku bi êrîşa DYA'yê re hikûmeta li Bexdayê hilweşiya û Başûrê Kurdistanê girêdayî vê rewşê wekî herêmeke azad hatibû ragihandin metirsiya li gel rejîma Sûrî zêdetir bibû. Ditirsî ku heman rewşa li Bexdayê çêbûye bi serê wê de jî were. Li ser vê yekê li dijî daxwazên Kurdên li Sûrî ket nav hewldanan. Bi bahaneya ku di navbera du tîmên futbolê de, tîma Dêra Zorê û tîma Qamişlo, nakokî çêbûne di 12'ê Adara 2004'an de rejîma BAAS'ê li Qamişloyê komkujiyeke nîjadperestî kir. Vê komkujiyê di nava civaka Kurd a Sûrî de nerazîbûneke mezin çêkir û bû sebeba serhildanê. Wê demê hem rejîma Sûrî hem jî hin partiyên ku qaşo xwe Kurdî dibînin berpirsiyariya vê bûyerê avêtin ser Apociyan. Li ser vê yekê civaka Kurd bi giştî û bi taybet jî alîgirên Tevgera Azadiyê kirin hedefa xwe, bi destê rejîma Sûrî kiryarên herî qirêj anîn serê Kurdan. Wê çaxê di nava civaka Rojava de nîqaş hatin kirin, dihat gotin ku pêwîst e lixweveger, xwebirêxistinkirin û parastin pêş bikeve. Di vê navberê de ku piraniya partiyên siyasî yên li Rojavayê Kurdistanê di nava xemsariyeke mezin de bûn, xebatên xwebirêxistinkirinê dihat meşandin û tevgereke siyasî-civakî dihat avakirin. Ango, tevgera civaka demokratîk di nava civakê de dihat rêxistinkirin.

## Di Nava Zor Û Zehmetiyan De Damezrandin Û Pêşketin

Ji komkujiya 2004'an û şûn de rejîma Sûrî li dijî gelê Rojavayê Kurdistanê siyaseteke pir hişk meşandiye. Şahî, hilkeft, komcivîn, xebatên siyasî û civakî hatin qedexekirin. Ne tenê ev, êşkence û gulebaran jî hebûn. Ji Adara 2004'an û şûn de desthilatdariya BAAS'ê li dijî Kurdên li Sûrî siyaseteke nîjadperest şopand. Ji ber ku hikûmeta Sûrî di nasnameya Kurdan de ji bo xwe metirsî didît. Li ser vê yekê di sala 2004'an de 36 kes qetil kirin, zêdetirî 160 kesî birîndar kirin, zêdetirî 2 hezar kesî jî binçav kirin. Piştî vê,

kiryarên wekî kuştin û binçavkirinê qet ranewestiyan, bi dehan alîgirên Tevgera Azadiyê û welatparêzên Rojavayê Kurdistanê hatin binçavkirin û êşkencekirin.

Partiya bi navê AKP'ê di Mijdara 2002'yan de li Tirkiyeyê bû desthilatdar, ji bo siyaseta derve bi dirûşma "Sifir Pirsgirêk" ket nav hewldanan. Di vê çarçoveyê de li gel rejîma Sûrî gelek gavên pratîkî avêtin. Dijminatiya di navbera xwe de veguherandin dostaniyekê û bi vî rengî rejîma Sûrî hem bi xwe li hundirê Sûrî êrîşên xwe yên li dijî alîgir û têkoşerên Tevgera Azadiyê zêde kir hem jî piştgirî da êrîşên Tirkî yên li dijî Tevgera Azadiyê. Wekî bedela vê lihevkirina qirêj Tirkiyeyê rêjeya ava Feratê ya digihêje milê Sûrî zêde kir. Kapasîteya bazirganiyê ya ku di 1998'an de 600 milyon dolar bû, di sala 2010'an de gihand 2,3 milyar dolarî.

Piştî ku ev tifaqa dewleta Tirk û Sûrî ava bû di serî de Tevgera Azadiyê, gelê Kurd bedelekî giran da. Êdî Sûrî ji bo gelê Kurd bû wekî zindaneke servekirî û rûbirûyî kiryar û siyasetên herî xerab hatine. Di nava rewşeke wiha de ku civaka Rojavayê Kurdistanê hewcedarî rêxistineke xurt û hevgirtî bû, di sala 2006'an de yekemîn rêxistina Tevgera Civaka Demokratîk bi navê Komaleya Civaka Kurd a Li Rojavayê Kurdistanê hat damezrandin. Ev yek wekî çawa ji bo civaka Rojavayê Kurdistanê pêdiviyek bû her wiha ji bo rejîma Sûrî jî bû bersivek. Rejîma Sûrî gelekî tehde li gel dikir û bi kiryarên şovenîst nêzî gel dibû. Li gel vê, bi taybet piştî qetlîama li Qamişlo ya di 2004'an de civak ji tevgerên siyasî yên heyî bêhêvî bibû. Ji ber ku ev tevger di asta bûyer û geşedanan de xuya nedikirin, pratîkên wan tine bû. Lê, Komaleya Civaka Kurd a Li Rojavayê Kurdistanê li ser bingehê azadiya Kurdistanê û demokratîkbûna Sûriyê hat avakirin û bi pratîka xwe ve hêviyeke nû li ba civaka li Rojavayê Kurdistanê ava kir.

Bêguman, tevn û torên rejîma Sûrî li Rojavayê Kurdistanê xurt bibû, ji ber vê yekê Komaleyê xebatên xwe li Rojava û Sûrî bi awayekî veşartî, dûrî çavê dezgehên ewlekariyê yên girêdayî hikûmeta Şamê bi rê ve dibir. Tevgerê dixwest li giştî Rojavayê Kurdistanê û li hin bajarên mîna Heleb, Şam, Lazqiye, Hums heta Lubnanê xebatên xwe berfireh bike. Ji avabûna Komaleyê û şûn de, salên di navbera 2006 û 2011'an de rejîma Sûriyeyê ji bo ku dilê dewleta Tirk xweş bike û her wiha tirs û xofa xwe ya li beramberî Tevgera Azadiyê bişkîne bi dehan endam û serkirdeyên Tevgera Azadiyê binçav kirin, girtin, gelek endamên TEV-DEM'ê di zindanên rejîma Şamê de şehîd xistin, çarenûsa gelek endamên Tevgerê heta roja îro jî hêna ne diyar e. Her wiha, rejîma Sûrî girêdayî vê polîtîkaya xwe gelek têkoşerên Tevgera Azadiyê jî radestî Tirkiyeyê kirin.

## Di Nava Krîzê De Veguhertin

Di 16'ê Adara 2011'an de li dijî rejîma Sûrî li seranserî Sûrî xwepêşandanên gel çêbûn û ji bo rûxandina Serokê Sûrî Beşar Esad dirûşm hatin bilindkirin. Lê belê, hêna jî ji ber dîroka rejîma BAAS'ê bi gel re metirsî hebû. Ji ber ku di salên 1980'yî de, ku wê çaxê Hafiz Esad, bavê Beşar Esad serokê Sûrî bû, li deverên wekî Helebê komkujî çêbibûn. Rejîma Sûrî bi awayekî dijwar berê xwe dabû endamên Îxwanî Mislimîn. Bi taybet jî li bajarê Hemayê li gorî hin jêderan zêdetirî 30 hezar kesî hatine kuştin. Ji ber vê yekê li gel endamên Îxwanî Mislimîn, ku xwe di bin navên cuda de rêxistin kiribûn, dudiliyeke mezin hebû. Lê, gelê Kurd ji ber komkujiya di sala 2004'an de serî hildabû, dîwarê tirsê şkandibû û vê yekê jî ji bo ku gelên li Sûrî karibin li dijî rejîmê derkevin û heta hilweşînin hêviyek afirandibû. Her wiha, rêxistinên siyasî yên Sûrî, bi taybet jî Îxwanî Mislimîn ketibûn nav liv û tevgereke wisa, lê hêviya wan jî ew bû ku Kurd jî li hemberî rejîmê rabin û di hilweşandina Beşar Esad de cihê xwe bigirin. Ji ber vê yekê di ragihandin û dirûşmên xwe de her tim pesnê Kurdan didan û behsa yekbûna gelên li Sûrî dikirin.

Tevgerên siyasî yên Kurd ên li Sûrî jî, ji bilî PYD'ê, bûyer û geşedan pir ji rêzê dixwendin, digotin di nava çend mehan de wê rejîma BAAS hilweşe. Ji ber vê yekê ev partiyên siyasî ketin bin bandora alîgirên Îxwanî Mislimîn, ku wekî "Hevrêziyên Şoreşê" dihatin binavkirin û dirûşmeyên Îxwanî Mislimîn bi zanebûn berz dikirin û îro jî bi nezanî dibêjin. Bi vê yekê berê gelê Kurd û çarenûsa Rojavayê Kurdistanê ber bi nediyariyê ve, ber bi windakirinê ve dibirin.

Komaleya Civaka Kurd a Li Rojavayê Kurdistanê ev rewş ferq kir, dît ku bi vî rengî civaka Kurdî bi hişmendiya hevrêziyên Îxwanî Mislimîn û bi siyaseta tevlîhev a partiyên Kurd ber bi jihevdeketinê ve diçe û dikeve bin xizmeta Îslama Siyasî. Dît ku partiyên siyasî yên Kurd, ku piştre wekî ENKS hat naskirin, nikare rewşê ji hev derxîne û ketiye bin tesîra hevrêziyan, nexwest civaka Kurdî û civaka Sûrî bikeve bin xizmet û ajandayên hêzên herêmî û hêzên kûrewî û bi taybet jî bikeve bin xizmeta dewleta Tirk, ku ji destpêka krîza Sûriyeyê ve du armancên wê hebûn; yek, bi hilweşandina rejîma Esad re wê Îxwanî Mislimîn bianiya ser desthilatdariyê û dudu, wê Kurd ji her cure mafî bêpar bihişta. Ji bo vê yekê, Komaleya Civaka Kurd a Li Rojavayê Kurdistanê di 3'yê Tîrmeha 2011'an de li bajarê Girkê Legê bi tevlîbûna bi dehan kesayet, serokên êlan, însanên ji pêkhateyên cuda, jin, ciwan, rewşenbîr û welatparêzên Rojavayê Kurdistanê kongreya xwe li dar xist. Di vê kongreyê de ji ber ku navê Komaleya Civaka Kurd a Li Rojava wekî Tevgera Civaka Demokratîk-TEVDEM'ê guheriye wekî kongreya yekemîn a Tevgera Civaka Demokratîk, TEVDEM'ê, jî tê zanîn.

**Xwebirêxistinkirina TEVDEM'Ê**

Di nava civaka Rojavayê Kurdistanê de TEVDEM weke modeleke nû ya xebatê bû. Civaka Rojavayê Kurdistanê tevgerên siyasî û partiyên siyasî nas dikirin. Her yek ji wan xwediyê karakterekî diyar bû û xwe di çarçoveyeke dogmatîk de bi rêxistin kiribûn. Ji ber ku TEVDEM'ê bi armanca guhertina civakê û lidarxistina şoreşê ji xwe re civak esas girtibû, di bingeh de ji van tevger û partiyên siyasî cuda dibû.

Ji sala 2011'an û şûn de rejîma BAAS'ê li paytexta xwe Şamê, li hin bajarên mîna Hema, Hums, Helebê zehmetî kişandin û tengav bû. Ji ber vê yekê xwe ji deverên Rojavayê Kurdistanê vekişand. Li ser vê yekê alîgirên Tevgera Civaka Demokratîk û Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) leşker û saziyên emnî yên rejîma BAAS'ê yên li Rojavayê Kurdistanê mane qewitandin. Bi vî rengî TEVDEM'ê xebata xwe ya civakî li gel xebata siyasî û xweparastinê da destpêkirin.

Piştî ku rejîma BAAS'ê ji herêmên Rojavayê Kurdistanê hat qewitandin wekî cihê şanazî û serbilindahiyê yekemîn saziya hat vekirin Saziya Zimanê Kurdî bû. Bi gotineke din, şoreşê bi şoreşa çandî dest pê kir. Li gel vê yekê, TEVDEM'ê di nava pêkhateyên herêmê de jî liv û tevgereke pir mezin kir. Ji bo ku nûnertiya hemû pêkhateyan di nava meclîs û saziyan de hebin, ji olan bigirin heta mezheb û êlan, heta rûspiyên Kurd, Ereb û Xrîstiyanan, li cem gelek rengan peywendî hatin danîn. Ji bo ku civaka Rojavayê Kurdistanê bi tevahî beşdarî xebatan bibe danûstendinên berfireh çêbûn. Ji bo ku bedeneke siyasî çêbibe û nûnertiya deverê bike li gel rêxistin û partiyên siyasî têkilî hatin danîn. Ji ber vê yekê, TEVDEM'ê xwe ne tenê wekî tevgereke civakî, her wiha xwe wekî tevgereke siyasî û parastina civakî jî bi rêxistin kiriye. TEVDEM'ê piştî van xebatan xwe li Rojavayê Kurdistanê wekî sîwaneke siyasî û rêveberiyê daye pêş û xwe di ber vê yekê de erkdar dîtiye.

TEVDEM'ê, di 16.12.2011'an de Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê ava kir. Li vir paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, projeya çareseriya pirsgirêka Kurd, projeya neteweya demokratîk pêşkêş kir. Lewma jî projeya ku wê hemû pêkhate çawa karibin bi hevbeşî bijîn, welatekî hevbeş çawa bê avakirin, civakeke xweser çawa bê avakirin û çawa karibe bi rengekî dûrî zihniyeta dewletê xwe bi xwe bi rê ve bibe pêşkêş kiriye. Bi vî şeklî TEVDEM'ê di gelek waran de xwe da pêş, ji destpêka damezrandina xwe ve civak bi rêxistin kir, armanc kir ku di nava civakê de çand û nirxên demokratîk berbelav bibe û çanda xweparastinê bi cih bibe. TEVDEM'ê dixwest li Sûrî giştî xwe bigihîne pergaleke siyasî ya adilane û di vir de jî bi roleke çalak û bi bandor rabe.

Di nava TEVDEM'ê de pênc partiyên sereke hebûn:

-Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD),

-Partiya Yekîtiya Lîberal a Kurdistanê,

-Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanê,

-Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê

-Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê (Partî).

Li gorî Tevgera Civaka Demokratîk, sîstemên desthilatdar hêna jî li dijî gelê Kurd û gelên din siyaseta qirkirinê dişopînin, bi vê yekê armanc dikin ku hebûna Kurdan ji holê rakin, vîna gelên din ên ku bi Kurdan re dijîn têk bibin. Ji ber vê yekê TEVDEM'ê li ser esasê fikir û ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya gelê Kurd û azadiya giştî pêkhateyên din gelek erk û berpirsiyartî li xwe girtine.

**Armancên Mezin Tevgereke Xurt Hewce Dike**

Li Rojavayê Kurdistanê avabûna Tevgera Civaka Demokratîk ne tiştekî ji rêzê bû. Di demeke wisa de hat avakirin ku civaka Rojavayê Kurdistanê hewcedarî rêxistinbûn û tevgereke cidî bû. Ji ber ku lazim bû berpirsiyariya serdemê hilgire ser milên xwe. Çunkî wê çaxê Rojavayê Kurdistanê di aliyê siyasî û civakî de ketibû nava tevlîheviyeke pir mezin. Li milekî partiyên siyasî yên heyî nikarin bi têrkerî pêvajoya siyasî bixwînin û çareseriyan ava bikin, li milê din jî têkildarî siberoja Rojavayê Kurdistanê û Sûrî gumanên civakê hebûn. Di nava aliyên siyasî û rêxistinên heyî de, ku di nava krîzê de bûn, civak bi rengekî dawiya wê nediyar dihat û diçû. Ango, civaka Rojavayê Kurdistanê xwe di nava vê rewşê de bêyî rêveber û bêyî pêşeng didît. Ji ber vê yekê TEVDEM li hemberî vê tevlîheviya siyasî û civakî bû bersiveke xurt, ji bo Kurdan û hemû pêkhateyên herêmê projeyên çareseriyê pêşkêş kir. Her wiha, maskeya muxalefeta ku xwe li ser esasê îdeolojiya Îxwanî Mislimîn ava kiribû û şaxên xwe berdida Rojavayê Kurdistanê jî daxist jêrê.

TEVDEM'ê bi rêka tevger û xebatên xwe ve armancên xwe ji civakê re zelal kiriye, jixwe armancên Tevgera Civaka Demokratîk di rêziknameya wê de jî hatiye eşkerekirin. TEVDEM'ê li gorî rêziknameya xwe hewl daye civakê di aliyê siyasî, aborî, çandî de bi rêxistin bike û pêş bixîne. Avakirina civakeke demokratîk, exlaqî û siyasî daniye pêşiya xwe. Xwestiye maf û azadiyan biparêze û hemû koçber li welatê xwe vegerin. TEVDEM'ê, bi rengekî tersî tevgerên siyasî yên li Rojavayê Kurdistanê, li dijî nîjadperestiya li ser bingehê etnîkî û baweriyan têkoşîn meşandiye. Bi vî şeklî TEVDEM'ê dikarîbû pêkhateyên cuda cuda jî di nava xwe de vehewîne û derfetê xebata hevbeş bide avakirin. TEVDEM'ê jin û ciwan wekî pêşengên pergala civakî pênase kiriye, mîsogeriya mafên wan

ji erka xwe dîtiye, hewl daye derfetên pîşesazî û perwerdekirinê hêsan bike. TEVDEM'ê azadiya jinê û beşdarbûna wê ya di hemû qadan de (siyasî, aborî, çandî û hwd.) wekî pîvana azadiya civakê dîtiye û li ser vî bingehî avakirin û rûniştandina pergala hevserokatiyê wekî armanc daye ber xwe.

Ji bo vê pergala Tevgera Civaka Demokratîk dikare bê gotin ku di cihanê de pergaleke yekta ye, hemtayê wê tine ye. TEVDEM'ê, di çarçoveya neteweya demokratîk de, li ser esasê welatê hevpar û prensîbên azadî û dadmendiya civakî projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk pêşkêş kiriye. Di serî de pirsgirêka Kurd, ji bo çareseriya pirsgirêkên hemû herêmên Sûrî li ser vî hîmî xebat meşandine. Ji bo ku çanda demokratîk bi bernameyên perwerdeyê di Akademiyên Civaka Demokratîk de were pêşxistin, civak di çarçoveya Saziyên Civaka Sivîl de were zanekirin û di xizmeta berjewendiyên giştî civakê de kar bike, rêxistinên civaka sivîl di berhemdayîn û xizmetguzariyên civakî de werin çalakkirin, li ser asta Sûrî têkiliya xwişk-biratî, hevkarî û yekîtiya di navbera rêxistinên civaka sivîl de bê xurtkirin, piştevaniya gelên ku dixwazin çarenûsa xwe diyar bikin bê kirin, bi piştevaniya neteweyî ji bo ku koçber bi awayekî ewle li warên xwe vegerin, edaleta civakî bê sazkirin, ku bi avakirina yekîtiya neteweyî dikare pêk were, TEVDEM'ê xebat meşandine û bi vî rengî hedefên xwe diyar kirine. Her wiha, Tevgera Civaka Demokratîk di avakirina civakeke demokratîk, siyasî û exlaqî de rewşa tevgerên siyasî yên Kurd jî piştguh nekiriye, her dem hewl daye bi awayekî yekrêzî û hevbeş li gel van tevgeran kar û xebatê bide meşandin. Bi taybet piştî ku TEVDEM'ê kongreya xwe ya Yekemîn li dar xist, ji bo çareserkirina aloziya di nava Sûrî de rû dide ket nav hewldanan. Ji ber ku wê demê grûbên çekdar ên Îslamî û rejîma Sûrî di nava zihniyet û kiryarên qirker û şerên mezhebî de xwe li hev radikişandin. Her wiha TEVDEM li dijî jihevbelavbûna mala Kurdî jî têkoşiyaye, ku partiyên wê yên siyasî ketibûn nava nakokiyan.

TEVDEM'ê, ji bo ku helwestên partiyên Kurd jî bibin yek li Rojavayê Kurdistanê xebat meşandine, însiyatîfeke zêde bi kar aniye. Lê belê, di nava van hewldanên xwe de her tim li zihniyeta teng a partiyên Kurd rast hatiye. Dîsa, ji ber zextên dewleta Tirk û bandora Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ya li ser hin partiyên siyasî, ev hewldanên yekîtiyê yên TEVDEM'ê bê encam mane. TEVDEM'ê di Sibata 2014'an de projeya Çareseriya Demokratîk pêşniyar kiriye. Di vê pêşniyarê de hemû aliyên siyasî, çandî, dîplomatîk û xweparastinê li ber çav girtiye. Wekî alternatîfa sîstema serdestî û nîjadperestiyê, pergala demokratîk û ne navendî pêşniyar kiriye. Di nava vê pêşniyarê de mafê hemû pêkhate û mezheban mîsoger dike û ji bo ku li

Sûrî çareseriya demokratîk pêk were rêgezên bingehîn pêşniyar dike.

Rêgezên hatine pêşniyarkirin bi vî rengî ne:

**Rêgezên Civakî:** Ji bo rewşa desthilatdarî, civak û jinê, lazim e em têkiliyên civakbûnê yên li ser kokê û destpêkê esas bigirin; lazim e rewş, cih û rola jinê ya di nava civakê de bê sererastkirin, bi rêya pêşxistina saziyan ve karibe di hemû qadên jiyanê de tevlî aktîvîteyan bibe. Bi vî rengî wê karibe ji hemû aliyan ve xwe bigihîne şayanê xwe û bi hevbeşê din re di nava civakê de karibe çanda jiyana wekhev pêk bîne.

Civaka Sûrî, ku xerakirina berfireh gihiştiye hemû aliyên wê, ji yekeya civakbûnê ya herî biçûk, malbatê, dest pê dike ta giştî civakê diçe. Li vê derê, hem ji bo rewşa civakê ya giştî hem jî ji bo rewşa civakê ya taybet, ji bo hemû pêkhateyên Sûrî, li gel hemû taybetmendiyên wê yên çandî û nasnameyî divê em rêzê raber bikin. Bi vî rengî civaka Sûrî wê karibe heta astekê azadî û serxwebûna pêkhateyên xwe mîsoger bike.

**Rêgezên Siyasî:** Dema ku li gorî rewşa Sûrî çareserî tê danîn, lazim e rewşa pirçandî û pirrengiyê li ber çav bê girtin. Her wiha, lazim e rastiya hebûna Sûrî û dewleta Sûrî li ber çavan were girtin. Pêwîst e serxwebûn û azadî ji bo hemû pêkhate, nasname û avaniyan bi pergaleke ne navendî ya demokratîk bê mîsogerkirin.

**Rêgezên Zagonî:** Zagona demokratîk ji bo xwe pirrengiyê dike bingeh. Ji vê jî girîngtir zagona demokratîk kêm caran berê xwe dide rêzkirina zagonan. Binyada zagona demokratîk bi rengekî sade tê avakirin. Netew-dewlet rengekî zordar ê dewletê ye ku kiryarên xwe herî zêde bi rêka zagonan pêk tîne. Destê xwe ji tiştên herî biçûk heta tiştên herî mezin dixe nava hemû tiştî. Binpêkirina kevneşopî û fikrên civakî bi taybet ji xwe re dike armanc. Lê, daxwaza civakên kevnar bi piranî ew e ku pirsgirêkên xwe bi kiryarên xwe yên ramyarî û kevneşopî çareser bikin.

**Rêgezên Xweparastinê:** Xweparastin, parastineke rewa ye. Xwe dispêre aktîfbûna hêzên civakê yên xweser ên xwedî vîneke xweser û li benda pejirandina dewletê yan piştgiriya dewletê yan jî rênîşenderiya dewletê namîne. Lewma jî saziyên parastinê yên cuda heta asteke mezin serbixwe ne û xebata destûra demokratîk li welat bi rêxistin dikin.

**Rêgezên Aborî**: Ji nav cureyên dagirkeriyê dagirkeriya aborî cureya herî xeter e. Ji bo ku civakekê pê bişkîne û ji hev bela bike wekî rêbazekî dijminatiyê tê bikaranîn. Ji ber vê yekê êsîrbûna di aliyê aborî de ji bo înkara nasnameyê û tinekirina azadiyê bûye saziya herî dijwar.

Di nava rêveberiyên xweseriya demokratîk de pergala aborî ne tenê li ser van kiryarên hovane disekine,

her wiha ji bo ku civak ji nû ve aboriya xwe bi dest bixe xebatan dimeşîne.

**Rêgezên Dîplomasî:** Dîplomasî ji bo netew-dewletan wekî organekî şer dixebite. Yanî wekî saziyeke ji bo amadekirina şer dixebite, ne ji bo aştiyê. Lê, li gorî zanista Neteweya Demokratîk dîplomasî ji bo ku di navbera civakan de aştî pêk were, piştgirî pêş bikeve, danûstendinên afirîner çêbibin û pirsgirêkên zehmet bên çareserkirin dixebite.

**Rêgezên Çandî:** Li dijî "tekbûn" û înkarê, şoreş şoreşeke pirçandî û demokratîk e. Ev şoreş wê pirsgirêka ku zimanên resen wekî zimanên fermî îlan dike çareser bike. Gel wê fêrî zimanê xwe bibe û her wiha zimanê xwe fêr bike. Li ser vî bingehî wê pêwîstî bi vekirina akademiyên ziman û çandê û navendên çandê çêbibe.

Li ser bingehê pêşniyar an jî projeya TEVDEM'ê ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûrî bi giştî, xebatên xweseriya demokratîk bi piranî hatine meşandin. Bêguman, li gorî geşedanan, li gorî pêdiviyên pêvajoyan TEVDEM'ê jî berê xwe daye guhertin û veguhertinan.

### Veguhertinên Di Nava TEVDEM'Ê De

Komalên Civaka Kurd a Li Rojavayê Kurdistanê wekî Tevgera Civaka Demokratîk veguherî û bi vî rengî TEVDEM hat damezrandin. Di Kongreya Yekemîn a TEVDEM'ê de desteya rêveber bi karûbarên tevgerê re radibû û hîna bi awayekî fermî pergala hevserokatiyê tine bû. Her çiqasî di warê pratîkî de hebe jî ji ber leza geşedanên li Rojavayê Kurdistanê guhertinên pêwîst wekî dihat xwestin di nava TEVDEM'ê de çênedibûn. Wê çaxê grûbên çekdar zehf êrîşî herêmê dikirin û bi taybet jî grûba bi navê DAÎŞ'ê.

Tevgera Civaka Demokratîk, Kongreya xwe ya Duyemîn di 2015'an de li dar xist. Bi vê kongreyê re guhertinên mezin jî di nava xwe de çêkirin. Yek ji van guhertinan jî avakirin û rûniştandina sîstema hevserokatiyê bû. Jixwe di dema kongreya duyemîn de jî yek jê jin yek jî mêr 2 kesan hevserokatiya TEVDEM'ê kirine. TEVDEM'ê roleke sereke daye jinê û hewl daye jin di nava hemû sazî û rêxistinên nû yên TEVDEM'ê de cihê xwe bigirin. Her wiha, Tevgera Civaka Demokratîk girîngiyeke mezin daye avakirina komun û meclîsan. TEVDEM'ê hewl daye li tevahiya gundewar û bajarên Rojavayê Kurdistanê komun û meclîsan bi rê xîne û gel bi awayekî çalak beşdarî van rêxistinan bike. Her wiha, bingehê Xweseriya Demokratîk, ku li ser esasê felsefeya neteweya demokratîk e, ji hêla TEVDEM'ê ve hatiye danîn. Ango, TEVDEM'ê heta kongreya xwe ya sêyemîn, ku di 2018'an de hat lidarxistin, li Rojavayê Kurdistanê wekî sîwaneke siyasî-civakî xebat daye meşandin.

Ji 2011'an û şûn de, ango bi destpêkirina krîza navxweyî ya Sûrî re TEVDEM'ê di nava civaka Rojavayê Kurdistanê de gelek xebat dane meşandin. Ji bo ku karibe li Rojavayê Kurdistanê rêxistinkirineke demokratîk bi cih bike li dijî her cure cudaxwazî, tekperestî, newekhevî û zihniyeta serdestiyê têkoşiyaye. Ji bo ku aliyên siyasî karibin li hev bikin û bi hev re xebatan bikin di aliyê siyasî de kedeke pir mezin daye. Gihişt wê astê ku di damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk de û di Pêşxistina Rêveberiya Wê de bi roleke sereke rabû. Bi beşdarbûna partiyên siyasî û bi hilbijartinên demokratîk ve Xweseriya Demokratîk daye rûniştandin.

TEVDEM'ê bi zanebûn û tecrûbeyên xwe ve dizanî ku tu pergalên siyasî bêyî çavdêriyeke civakî wê nikaribe rêya demokratîk biparêze. Lewma rêxistinbûna tevgereke sivîl hewce dîtiye. TEVDEM'ê ji destpêka damezrandina xwe ve xwe di ber civakê de berpirsiyar dîtiye, xwe çareserkerê kêşe û aloziyên civakê dîtiye. Her wiha, TEVDEM bûye avaker û parêzvanê Şoreşa Rojavayê Kurdistanê. Parastin û pêşxistina destketiyên gel wekî erka xwe dîtiye. Li ser vî hîmî, TEVDEM'ê li dijî terorê û zordestiyê zemînekî gelêrî û hevpar ava kiriye.

Lê, piştî ku li Bakur-Rojhilatê Sûrî rêveberiyên xweser û rêveberiyên sivîl hatin ragihandin û Meclîsa Sûriyeya Demokratîk hate avakirin, di TEVDEM'ê de hewcedarî bi guhertinên nû çêbûne. Ji ber vê yekê jî di rêxistinbûna TEVDEM'ê de gelek guhertinên cuda hatine kirin.

Ji bo xebatên TEVDEM'ê, Kongreya 3'yemîn a ku di Tebaxa 2018'an de hatibû lidarxistin bibû qonaxeke nû. Di Kongreyê de hat destnîşankirin ku hewce ye TEVDEM di binesaziya rêxistinbûn û siyaseta xwe de guhertinê çêbike, rengekî sîwana saziyên civaka sivîl bigire, bi vî rengî di parastin û pêşxistina Xweseriya Demokratîk de rolê bilîze, hişmendiya civakê pêş bixîne, civakeke rexnegir û çavdêr ava bike. Li gel vê yekê, di vê pêvajoyê de Rojavayê Kurdistanê û Bakur-Rojhilatê Sûrî di demên pir nazik û girîng re derbas dibûn. Di vê pêvajoyê de roleke nû, guhertineke nû ji TEVDEM'ê dihat xwestin. TEVDEM'ê wê nûnertiya qada sêyemîn bikira. TEVDEM'ê, ji ber ku bi giyanê şoreşa civakbûyînê xebata xwe dida meşandin û ji bo ku karibe pirsgirêkan bi awayekî bingehîn çareser bike xwe dispart felsefeya guhertina giştî. Ji ber ku TEVDEM, nûnertiya civakê dike û xwe di ber civakê de berpirsiyar dibîne.

Bi kurtasî, ji bo ku li Bakur-Rojhilatê Sûrî projeya neteweya demokratîk bê mayindekirin, parastin û avakirin Kongreya Sêyemîn a TEVDEM'ê pêngaveke nû ya têkoşînê bû. Ev jî bi rengê rêxistinkirina qada sêyemîn bû, ango bi rêxistinkirina civaka sivîl pêk dihat.

Li gorî guhertinê, TEVDEM'ê yekîtî, sendîka û ode ava kirin, bi vî rengî wê civaka sivîl bi şeklekî sîstematîk rêxistinbûyîna civaka sivîl xurt bikira. Di heman demê de rêxistin û saziyên ku di nava Tevgera Civaka Demokratîk de hatine birêxistinkirin wê di nava xwe de civak jî bi rêxistin bikira. Wisa jî rêxistinên civaka sivîl, ango çarçoveya qada sêyemîn wê xwe ava bikira û xurt biba. Ji ber ku civak xwe di van saziyan de bi rêxistin dike û dikare di nava van saziyan de parastina dozên xwe yên siyasî jî bike. Wek mînak, dikare di nava van saziyan de li dijî hişmendiya baviksalarî têbikoşin û her wiha parastina dozên neteweyî yên gelan jî bikin.

Bêguman, ji bo ku TEVDEM'ê karîbûya di çarçoveya qada sêyemîn de yan jî di qada civaka sivîl de xebat bimeşanda pêwîstî bi guhertina sazûmaniyên wê hebû. Ji ber vê yekê TEVDEM'ê sazûmaniya xwe ya nivîsgehê û komîteyên girêdayî xwe guhertin. Dest pê kir gelek beş û komîteyên nû yên ku dikarin di qada civaka sivîl de xebatan bimeşînin ava kir. Hingî jî wekî gava yekemîn li Bakur-Rojhilatê Sûrî nivîsgehên xwe yên rêxistinî vekirin. Dîsa, ji bo parastina mafê hejar û welatiyan jî nivîsgehên qanûnî-mafî hatin avakirin. Van nivîsgehan guhdarî giliyên welatiyan dikirin, wekî navbeynkar di navbera welatî û saziyan de xebat dimeşandin û hewl didan mafan biparêzin. Yek ji karên sereke yê TEVDEM'ê jî ew bû ku piştgiriyê bide yekîtiyan. Di navbera yekîtiyan û saziyên Rêveberiya Xweser de navbeynkarî dikirin, piştgirî didan hemû yekîtiyên sivîl û bi wan re alîkar dibûn.

Ji bo ku civakeke saxlem û pêşketî bê avakirin bêguman perwerde xaleke sereke ye. Ji ber ku civaka bêyî perwerde her tim li paş dimîne û xwe nas nake. Lewra TEVDEM'ê nivîsgehên perwerdeyê jî ava kirin. Bi rêka van nivîsgehan hewl da di nava civakê de derfetan û pisporiyên fikrî û rêxistinî werin avakirin.

Ji bo ku li cem tevahî rêxistin û tevgerên li Bakur-Rojhilatê Sûrî û dewletên li herêmê peywendî bên danîn, Nivîsgehên Têkiliyan jî hatin aktîfkirin.

Wekî tê zanîn Şoreşa Rojavayê Kurdistanê di serî de şoreşa jina têkoşer e, yan jî şoreşa jinê ye. TEVDEM'ê, ji bo ku jin karibin xurt bibin û di avakirina civakê de bi rola xwe rabin Nivîsgehên Jinan jî vekir. Ji bo avakirina civakeke demokratîk bi taybet li ser rêxistinbûna wê sekiniye.

Ciwan, di nava TEVDEM'ê de xwedî cihekî girîng hatine dîtin û li ser vî bingehî Nivîsgehên Ciwanan jî hatine vekirin. Ji ber ku ciwan di avakirina civaka demokratîk de bi rola sereke radibin, di avakirina siberojê de esas in.

Bi berdewamkirina xebatê re di asta Bakur-Rojhilatê Sûrî de di bin sîwana TEVDEM'ê de zêdetirî 27 yekîtiyan, rêxistinan, sazî û komaleyan xwe rêxistin kirine û xebatên xwe dane

meşandin. Ev guhertinên hatine kirin hemû jî encamên Kongreya Sêyemîn bûn. Ji ber ku di kongreya sêyemîn de, ku di 28'ê Tebaxa 2018'an de hatibû lidarxistin, TEVDEM'ê diyar kiribû ku ew ê di nava xwe de gelek guhertinan pêk bîne, ji aliyê rêxistinî ve wê guh bide saziyên civaka sivîl û rêveberiya karûbarên civakê bike. Dîsa, destnîşan kiribû ku wê meclîs û komunan radestî Rêveberiya Xweser a Demokratîk bike. TEVDEM'ê ragihandiye ku ew ê bi rêya saziyên civaka sivîl dest bi rêxistin û dîsîplînekirina qad û çînên civakê bike.

Weke gaveke di vî warî de jî TEVDEM wê hemû meclîs û komunan radestî desteyên peywendîdar ên Rêveberiya Xweser bike û wê karên xwe li navçeyên ku ji destê DAÎŞ'ê nû hatine rizgarkirin berfireh bike.

Hêzên Parastina Civakê (HPC), ku bi beşdariya xelkên ji tax û bajaran hatiye damezrandin û ji bo parastina ewlekariya herêmên xwe li kêleka Asayîşê çek rakirine, wê girêdayî TEVDEM'ê bimînin û karê xwe bi vî rengî bidomînin.

Li gorî mekanîzmaya nû, TEVDEM wê li gel parêzer, dermansaz, pîşesaz, rojnamevan, jin û hemû qad û çînên civakê peywendiyê deyne. Armanca TEVDEM'ê ya ji van têkiliyan ew e ku rêxistinî û yekîtiya van saziyan pêş bixîne.

TEVDEM'ê ji bo ku karibe vê bername û ajandaya xwe pêk bîne meclîseke ji 64 endaman pêk tê ava kiriye.

**TEVDEM Tevahiya Sûriyê Digre Dest**

Ji Kongreya Sêyemîn a TEVDEM'ê û şûn de di nava Tevgera Civaka Demokratîk de gelek guhertinên mezin çêbûne. Di vê pêvajoyê de di asta Bakur-Rojhilatê Sûrî de xebat meşandine. Di vê pêvajoyê de li Rojavayê Kurdistanê û Sûrî gelek geşedan û pêşketinên nû çêbûne. Yek ji mînakên van pêşketinan jî di nava giştî pêkhateyên Bakur-Rojhilatê Sûrî de, her wiha di nava gelên Sûrî û bi giştî Rojhilata Navîn de belavbûna projeya çareseriya demokratîk û neteweya demokratîk e, ku mîmarê wê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Ji ber ku xebat berfireh bû û diviyabû gelên Ereb, Suryan, Ermen û giştî pêkhate tevlî nav xebatan bibin, her wiha ji bo ku xebat ne tenê di asta Rojavayê Kurdistanê de, di asta giştî Sûrî de bê meşandin, hewcedarî bi guhertinên nû, rêbazên nû û sazûmaniyeke nû hebû.

TEVDEM'ê, Kongreya xwe ya Çaremîn di 5'ê Sibata 2022'yan de bi dirûşma "Çanda Demokratîk Bi Saziyên Demokratîk Pêş Dikeve" û bi beşdariya 400 delegeyan li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran a li Rimêlanê li dar xist. Di nava beşdaran de şexsiyetên ji tevahî rêxistinên siyasî, civakî, çandî, sendîka, rûspiyên eşîrên Kurd, Ereb û Suryanan amade bûn.

Tevgera Civaka Demokratîk di vê kongreya xwe de jî destnîşan kir ku

ew ê di xeta polîtîk a sêyemîn de û di qada sêyemîn de, ango di nava rêxistinên civaka sivîl de xebatan bimeşîne. Her wiha di kongreyê de li ser berfirehkirina meclîsa giştî jî hatiye sekinandin, hejmara endamên meclîsê yên ku di Kongreya Sêyemîn de 64 bûn, di Kongreya Çaremîn de wekî 80 hatine diyarkirin. Di kongreyê de hat diyarkirin ku TEVDEM wê ji bo avakirina Sûriyeyeke ne navendî û bi mînaka xweseriya demokratîk, ku maf û azadiyên tevahî pêkhateyan tê de mîsoger dibe, têbikoşe. Di kongreyê de li gel van gelek biryarên rêxistinî jî hatin girtin.

Di Kongreya 4'emîn a TEVDEM'ê de hatiye destnîşankirin ku pêwîst e Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê di vê qonaxa hesas de bê lidarxistin, ji bo ku hemû herêmên dagirkirî bên rizgarkirin û hemû koçber bi rengekî ewle vegerin warên xwe jî têkoşîn bê meşandin. Ji bo ku Rêber Apo karibe bigihêje şert û mercên azadiya fîzîkî û ji bo ku navê PKK'ê ji lîsteya terorê bê derxistin, TEVDEM wê bi hemû derfetên xwe ve têbikoşe û di vê mijarê de jî piştgiriyê bide hemû însiyatîfên navneteweyî.

TEVDEM'ê di Kongreya xwe ya Çaremîn de biryar girt ku ji bo ku karibe avaniya rêxistinên civaka sivîl xurt bike li cem sazî û dezgehên civaka sivîl peywendiyên dîplomatîk deyne û di bin navê rêxistinên civaka sivîl de her sê mehan carekê kovarekê derxîne û biweşîne. Hatiye diyarkirin lazim e xebat li ser esasê parastina nirxan, fikrên civakî, karên dilsozî û xêrî bên meşandin, mafên civakê bên parastin, rêveberiya civakê li ser bingehên xurt ên pergala demokratîk bê avakirin.

Tevgera Civaka Demokratîk di Kongreya xwe de pêdiviya bi guhertina binesaziyê jî îfade kiriye û diyar kiriye ku TEVDEM sîwana sazî, rêxistin û yekîtiya civaka sivîl a li Bakur-Rojhilatê Sûrî bû, êdî pêwîst e wekî sîwana tevahî saziyên sivîl li giştî Sûrî bixebite.

Qada sêyemîn yek ji stûnên bingehîn ên pergalên demokratîk e û bêguman ji bo parastina demokratîkbûna vê pergalê jî hewcedarî bi çavdêrî û beşdarbûna civakê heye, pêwîst e civak karibe bi pêşniyar, biryar, sererastkirin û rexneyên xwe ve pergalê pêşde bibe. Ji ber vê yekê, TEVDEM'ê wekî çawa di destpêka avabûna xwe de avakirina civakeke demokratîk kiribû hedef, her wiha di kongreya xwe ya çaremîn de jî hemû xebata xwe ya ji avabûna Tevgera Civaka Demokratîk heta lidarketina Kongreya xwe ya Çaremîn di ber çav re derbas kiriye û bi vî rengî derbasî qonaxeke nû, pêvajoyeke nû ya xebatê bûye. TEVDEM'ê êdî ne tenê Rojavayê Kurdistanê, lê bi giştî Sûrî kiriye armanca xebatên xwe. Her wiha, yek ji armancên guhertinê yên TEVDEM'ê jî ew e ku karibe di xebatên qada sêyemîn de li Rojhilata Navîn bi giştî jî bibe bersiv.

## Wekî Encam

Piştî ku "Bihara Ereban" dest pê kir, di Adara 2011'an de vê rewşê bandora xwe li nava sînorên Sûriyeyê jî kir. Girêdayî vê rewşê, li herêm û bajarên Kurdî jî li dijî rejîma Beşar Esad xwepêşandanan dest pê kir. Wê çaxê di nava partiyên siyasî yên Kurd de di aliyê xwendina pêvajoyê û hedefê de tevlîhevî û nezelalî hebûn. Partiyên ku xwe wekî partiyên Meclîsa Kurdî didîtin, bi piştgiriya PDK'ê ya li Başûr hatibûn avakirin û xwe wekî beşeke ji muxalefeta bi ser Îxwanî Mislimîn de didîtin. Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), li hemberî van û di heman demê de xebateke rêxistinkirî dimeşand. Ji van partiyan dixwest ku di bin sîwana xeta sêyemîn de gavan biavêjin. Ruxmî hemû hewldanên PYD'ê jî xebatên avakirina yekîtiya helwestên partiyên siyasî yên li Rojavayê Kurdistanê ji ber ajandayên dewleta Tirk û PDK'ê neçûne serî. Ji ber vê yekê, ji bo ku Rojavayê Kurdistanê bibe xwedî pergalekê û bê rêxistinkirin di Mijdara 2013'an de hin partiyên siyasî yên mîna Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Partiya Yekîtiya Lîberal a Kurdistanê, Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanê, Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistanê Li Sûrî (Partî) di bin sîwana Tevgera Civaka Demokratîk de li hev kom bûn û ji bo herêmê îlana "Rêveberiya Demkî" kirin. Bi vî rengî TEVDEM ji bo Rojavayê Kurdistanê bû sîwaneke siyasî-civakî.

TEVDEM bi giştî tevgereke civakî ye û ji bo ku civakeke exlaqî-polîtîk, civakeke demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê dixwaze ava bike têdikoşe. Tevgera Civaka Demokratîk xwe dispêre wekheviya civakî, jiyana hevbeş, rêzgirtina ji bo pirrengiya çandî-etnîkî û parastina mafên hemû beşên civakê. Li beramberî hemû baweriyan rêzdar e û xwe ji jêr ber bi jor ve, bi rengekî dûrî têgeha dewletbûnê rêxistin dike.

**TEVDEM'ê li ser esasê fikir û ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya gelê Kurd û azadiya giştî pêkhateyên din gelek erk û berpirsiyartî li xwe girtine.**

# SEDSALA 21'EMÎN WÊ BİBE SEDSALA JİNÊ

**Yek ji xalên herî balkêş ew e ku di fêmkirina rastiya dijmin de hestekî li pêş li gel jina Kurd hebûye, lewma jî li dijî her cure qirkirinên dijmin têkoşîneke mezin meşandiye û li ber xwe daye.**

HEVALA DÎCLE

Di dîroka mirovatiyê de pir gel hene ku ji ser rûyê cîhanê hatine tinekirin, êdî navên wan ji rûpelên dîrokê hatine birin û nayên bilêvkirin. Hinek ji wan jî wekî fîzîk mane, lê belê zimanê xwe ji dest dane, bi hin mafên biçûk ên ku netew-dewletê dane wan razî bûne. Yanî bêyî ku çalakiyan bikin yan jî li ber xwe bidin û bigihêjin mafên xwe li beramberî tiştên ku netew-dewletê dane wan qayil bûne.

Lê belê, pêwîst e ti carî neyê jibîrkirin ku gelekî her tim li beramberî qirkirina fîzîkî û çandî li ber xwe daye û heta vê deqê jî dijî heye, ew jî gelê Kurd e. Gelê Kurd di

dîroka xwe de li beramberî neheqiyê her tim serî rakiriye û li ber xwe daye. Bi dehan serhildanên li Kurdistanê pêk hatine nîşaneya vê ne. Jina Kurd di van serhildanan de cihê xwe her tim di asta pêşengtiyê de girtiye, di milê eskerî, siyasî û civakî de bi rolên girîng rabûne.

Yek ji xalên herî balkêş ew e ku di fêmkirina rastiya dijmin de hestekî li pêş li gel jina Kurd hebûye, lewma jî li dijî her cure qirkirinên dijmin têkoşîneke mezin meşandiye û li ber xwe daye.

Heger ku gelê Kurd îro li ser piyan mabe, heta roja îro jî li beramberî ewqas êrîşên dijwar ên qirkirina fîzîkî û çandî çand û zimanê xwe winda nekiribe û nehatibe helandin, heke di roja me de li ser rûyê dîrokê mabe ev yek bingehê xwe ji jina Kurd digire. Bi rastî jî dema ku mirov di dîrokê de li jinê dinêre tê dîtin ku dîrokeke muhteşem heye. Li hemberî dijmin ti carî serê xwe netewandiye, xwe ti carî teslîmî nav lepên dijminê xwe nekiriye. Ji ber vê yekê jî ji bo ku nekeve destê dijminê xwînxwar xwe di zinaran wer kiriye û ev mîrate îro di nava Tevgera Azadiya Kurdistanê de hêna jî zindî ye û berdewam e. Li ser vî bingehî jin ji bo ku nekevin destê dijminê qirker bombeyên xwe bi xwe ve teqandine, xwe di zinaran wer kirine. Wek nimûne, dema ku çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kirin, jin ji bo ku nekevin destê dijmin xwe ji çiyayên Şengalê avêtin xwarê û jiyana xwe ji dest dan. Bingehê vê yekê jî ew welatparêzî ye ku ji nava xelekên dîrokê heta roja me bi rêka jinê wekî mîrate hatiye hiştin.

Bi taybet piştî hevpeymana Lozanê li ser gelê Kurd polîtîkayeke navdewletî hatiye meşandin, Kurd hatine parçekirin û ji bo ku di warê fîzîkî û çandî de bên tinekirin hewldan hatine meşandin. Ev êrîşên înkar û îmhayê bi taybet di şexsê şefê faşîst Erdogan de her ku çûye dijwartir bûne û heta roja me hatine. Li beramberî vê berxwedana li ser esasê parastina hebûna xwe û bidestxistina azadiya xwe hatiye meşandin hiştiye ku gelê Kurd tine nebe, ji nav pelên dîrokê neyê derxistin û heta roja me jî wekî gelekî hebûna xwe biparêze. Di vê yekê de jina Kurd bi roleke pêşeng rabûye.

Li beramberî polîtîkayên înkar û îmhayê berxwedana gelê Kurd pêş ketiye, li gelek qadan gelê Kurd di qirkirinên fîzîkî re hatiye derbaskirin û bi taybet piştî berxwedana Agiriyê dijminê gelê Kurd wisa fikiriye ku êdî wan gelê Kurd li çiyayê Agirî binax kirine, bi betonê jî ser wan girtine. Yanî kengî serê xwe rake wê serê wê li dîwar bikeve û bêje ez mirime.

Di van êrîşên tinekirinê de rola hêzên hegemonîk eşkere ye. Bi taybet piştî hevpeymanên ku hebûna gelê Kurd înkar dike di qirna 20'an de erk dan dewleta Tirk ku gelê Kurd îmha bike. Bawer dikirin ku gelê Kurd piştî van êrîşan wê ti carî nikaribe serê

xwe rake û wê tine bibe. Maneya van êrîşên dijwar çi bû? Dixwestin ji çanda dayika xwedawend tolê rakin. Ji ber ku kok e, xwedî hebûneke herî kevnar e, di vê axê de ji bo hemû mirovatiyê pêşengtî kiriye.

Li gorî hesab û kîtabên hatine kirin, li gorî hevpeymanên hatine pêşxistin wer difikirîn ku wekî çawa gelê Ermenî di qirkirina fîzîkî re derbas kirin, wê ji bo gelê Kurd jî ev bikirana. Bi vê armancê di qirnên 19'emîn û 20'emîn de hêzên xwe ji bo qirkirina fîzîkî û çandî ya gelê Kurd seferber kirin. Rê û rêbazên cur bi cur ceribandin. Di encama van polîtîkayên înkar û îmhayê de ku sed sal in didomin, wisa kirin ku Kurd bi qedera xwe razî bibin, ji rastî û hebûna xwe dûr bikevin, heta ji nasnameya xwe şerm bikin. Di roja me de jî ev polîtîka bi rengên cur bi cur dîsa li ser kar in û bi saya têkoşîn û berxwedana gelê Kurd ev polîtîka eşkere bûne û li dijî van polîtîkayên înkar û îmhayê têkoşîna gelê Kurd didome.

Rêber Apo di sala 1949'an de li gundê Amarayê hat dinê û ji zarokatiya xwe ve ferqa xwe danî holê. Piştî lêgerînên dijwar di salên 1970 de wekî rêber derket pêş, bi mezinkirina têkoşînê ve ew Kurdên dihat gotin mirî ye, ji xewa giran şiyar kir, rakir ser piyan û xist nav têkoşîna hebûn û azadiyê.

Bi derketina Rojê re ew tarîtiya li ser gelê Kurd rabibû. Bi vê re civaka Kurd a ku ji ber hebûna xwe, Kurdîtiya xwe şerm dikir gav bi gav fikir û felsefeya Rêber Apo nas kir, piştre xwe nas kir û xwe bi dinyayê da nasandin. Ev Ronahî destpêkê li ser Bakurê Kurdistanê belav bû, dûvre belavî çar parçeyên Kurdistanê û her devereke ku Kurd lê ne bû. Yek ji parçeyên Kurdistanê ya ku feyde ji vê ronahiyê girt, ev fikir û felsefe dawerivand hinavên xwe jî Rojavayê Kurdistanê ye. Ev pirs dikare bê pirsîn, gelo çima ewqas însan, tevî jin, zarok, kal û pîrên xwe li dora vê îdeolojiyê kom bûn? Ji ber ku ev îdeolojî ket serê wan, di mejiyê wan de bi cih bû, pê bawer kirin û gotin xelasiya wan di vê îdeolojiyê de ye. Qeneh bûn ku bi rêka vê îdeolojiyê wê xwe ji zilma sedan salan rizgar bikin. Û her wiha, sir û raza vê îdeolojiyê jî ew bû ku xeleka herî lawaz dixist navenda xwe. Yanî neteweya destpêkê hatiye kolekirin, jin, xist navenda xwe û têkoşîna xwe li ser vî bingehî domand. Lewma dema ku Rêber Apo derbasî Rojavayê Kurdistanê bû beşeke ji civake li dora tevgerê kom bû û bi demê re mezin bû.

Rêber Apo di sala 1979'an de derbasî Rojavayê Kurdiistanê bû û di nava gel de xebitî. Vê xebata Rêber Apo heta Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmeha 1998'an jî dewam kir. Di vê navberê de Rêber Apo diçû malên gel, civîn li dar dixistin, gel li Kampa Mahsûm Korkmaz kom dikir, ji Rojava bi hezaran însan diçûn Libnanê û Rêber Apo didîtin. Di van civînan de

jin, ciwan, zarok, kal, pîr ji her temenî û cinsî însan amade dibûn. Dema ku vedigeriyan mala xwe jî bi moral û motîvasyoneke mezin vedigerin. Bi vî rengî dest bi kar û xebatên xwe dikirin. Ev xebata Rêber Apo ya ji çend malan dest pê kir û gihişt bi hezaran malan, her ku çû berfirehiya îdeolojiyê jî mezin kir û di dil û mejiyê gel de kûrtir kir. Gel zana kir. Gel hebûna xwe nas kir, li xwe vegeriya, ket maneya xwebûnê. Bi taybet jî rastiya dijmin baş da naskirin. Di encama van xebatan û vê ronîkirinê de bi sedan ciwanên Kurd ji Rojavayê Kurdistanê tevlî nav Têkoşîna Azadiyê bûn. Yanî xwe ji wê fikra teng a ku Kurdistanê tenê derdora xwe, tenê wekî parçeyekî dibîne xelas bûn. Diyar kir ku li ku derê dibe bila bibe wê ji bo Kurdistanê şer bike û têbikoşe. Gelê Rojavayê Kurdistanê hem di milê manewî de hem jî di milê maddî de xwe bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re kir yek. Ji ber vê yekê mirov nikare bibêje ku heger îro li Rojavayê Kurdistanê şoreş pêk hatibe ev tişt ji ber xwe ve çêbûye. Şoreş, di encama keda mezin a Rêber Apo de pêk hatiye.

Li Rojavayê Kurdistanê mijara ku gel herî zêde pê bandor bû berxwedana li zindana Amedê bû. Bi taybet jî berxwedana hevalên destpêkê yên mîna hevalên Mazlûm, Hayrî, Kemal, Hakî, Ferhat û Sakîne bû. Ji ber vê bandoriyê li Rojavayê Kurdistanê navê van hevalan li zarokan dihatin kirin. Bi taybet ji bo jinan berxwedana hevala Sara destanî bû û bandoreke bêhempa ava dikir. Hevala Sara jin bû, ruxmî hemû êşkenceyên fîzîkî û psîkolojîk jî li beramberî dijmin serî netewand û teslîm nebû. Di şexsê hevala Sara de diyardeya namûsê baştir hat fêmkirin. Ji bo namûsê di nava civakên feodal de tê gotin ku ‘jin namûs e’. Ev îdîa têk çû. Hat dîtin ku namûsa herî mezin welatê te ye, bi namûsî jî bênamûsî jî girêdayî rewşa welatê te ye. Cihekî mîna Kobanê, ku di Rojavayê Kurdistanê de wekî qada herî feodal tê nasîn, ji vê yekê gelekî bandor bû û ket nav guhertineke mezin. Li cihên mîna Kobanê nedihiştin jin ji malê derkevin, jin ewqasî biçûk dihatin dîtin. Dema ku ev îdeolojî, berxwedan nas kir, jê fêm kir wê çaxê hemû adetên civaka feodal serûbin bûn. Piştî wê ji bo nav tevgera azadiyê tevlîbûna jinê çêbû. Yek ji mînakên vê guhertinê jî hevala Dîcle Kobanê bû.

Heman guhertinê xwe li Efrîn û Cizîrê jî nîşan dida. Dema ku Akademiya li Lubnanê hat girtin Rêber Apo wê demê got; “Akademî hat girtin, lê belê wê her maleke Rojava bibe akademiyek.” Ev yek bi rastî jî wisa bû. Her maleke Rojavayê Kurdistanê bû cihê perwerdekirina ciwanên Rojavayê Kurdistanê. Rêber Apo bi xwe bi van perwerdeyan re eleqedar dibû û encamên pir baş hatin derxistin. Di encama van perwerdeyan de bi sedan jinên ciwan tevlî nav refên tevgera azadiya Kurdistanê bûn.

Di dîroka Rojavayê Kurdistanê de bi hatina Tevgera Azadiya Kurdistanê re cara yekemîn gel wisa tê rêxistinkirin. Ew civakbûna ku bi demê re hatibû belavkirin, hatibû lawazkirin careke din bi hatina Tevgera Azadiya Kurdistanê re zindî bû. Beriya ku Tevgera Azadiya Kurdistanê derkeve herêmên Cizîr, Kobanê û Efrînê, yanî hersê herêmên Rojavayê Kurdistanê ji hev qut bibûn, peywendiyeke rêk û pêk di navbera van herêman de tine bû. Rojavayê Kurdistanê yek parçe bû, lê belê ev yek parçe jî di nava xwe de bibû sê parçe. Ji ber ku êrîşên parçekirinê û nêzîkatiyên feodal bi bandor bûn û lewre gel pir zêde bi rastiya xwe nizanîbû nakokî ketibûn navbera herêman. Herêman ji hev hez nedikirin, bi çavekî biçûk li hev dinêrin, henekên xwe bi hev dikirin. Wek mînak, kesên ku li herêma Cizîrê diman pir zêde erdnîgariya Efrînê nizanîbûn û her wiha civaka Efrînê jî pir zêde nas nedikirin. Yanî di nava parçeyekî Kurdistana hatî parçekirin bi xwe de jî gel parçe parçe bibû. Ev hemû jî di encama polîtîkayên dijmin de pêş ketibûn û heta astekê jî hatibûn.

Tevgera Azadiya Kurdistanê hat Rojavayê Kurdistanê, hemû mijarên ku zirar dida gel tespît kir û bi têkoşîneke mezin ve sererast kir. Ew biyanîbûna ketibû nav gelê Kurd ji holê rakir, civakbûna Kurdan careke din zindî kir, geş kir û ruhekî ku hevdu his bikin, bi hev bihesin ava kir. Ruhekî wisa ava kir ku kesên li Kobanê rûdinên bi rûdanên li Efrîn û Cizîrê dihesin û his dikin. Bi vî rengî gel karîbû xwe û derdora xwe baş nas bike, zihniyeta netew-dewletê ya ku civak parçe dikir fêm bike û li dijî wê têkoşînê bimeşîne. Her ku civakê Tevgera Azadiyê nas kir zêdetir xwe nêz kir, bi sedan ciwanên xwe tevlî nav partiyê kir û ji bo têkoşîna Azadiya Kurdistanê derbasî çiyayên azad kir.

Xebatên gel ên li Rojavayê Kurdistanê bi awayekî veşartî û dizî dihatin birêvebirin. Ji ber ku dewleta Sûrî, rejîma BAAS'ê nedihişt Tevgera Azadiyê xebatên gel bi rê ve bibe û zext dikir. Xebatên gel ên Tevgera Azadiyê bi taybet bi salên 1990'î re geş bû, berfireh bû. Bi van xebatan re di nava hemû beşên civakê de rêxistin hatin avakirin; rêxistinên xwendevanan, jinan, zarokan û ciwanan. Heta yekîtî jî hatin avakirin. Di van rêxistinkirinan de xala herî sereke perwerdekirina gel bû. Rêber Apo bi vê perwerdeyê gel ronî dikir, gel rastî û dîroka xwe nas dikir, dizanîbû ji ku derê hatiye û pêwîst e çi bike. Bi saya van perwerdeyan gel zêdetir xwedî li Tevgera Azadiya Kurdistanê derket. Wisa lê hat ku gel bi destê xwe zarokên xwe wekî diyarî dida Tevgera Azadiyê. Nuqteyeke pir girîng bû; dê û bav zarokên xwe wekî diyarî didan nav refên têkoşînê. Sedema vê jî ew bû ku gel bi vê îdeolojiyê bawer kir, dema gihişt vê baweriyê ku rizgarî di vî fikrî de ye hat wê astê ku tişta li ber dilê wan herî

giranbiha, zarokên xwe, li ser vê rêyê bexşandin.

Lûtkeya vê bawerî û dilsoziyê di dema Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibata 1999'an de pir diyar bû. Hêzên hegemonîk, hemû dinya bibû yek û bi ser Rêber Apo de dihat. Li ser vê yekê ji gelê Rojavayê Kurdistanê însan ref bi ref herikîn nav çeperên gerîlayên Azadiya Kurdistanê. Zêdetirî van tevlîbûnan jî ji jinên ciwan pêk dihat.

Di encama xebatên Rêber Apo de li Rojavayê Kurdistanê bingehekî şoreşê hat danîn û tenê li benda çirûskekê bû. Ev çirûsk di sala 2011'an de bi serîrakirina gel a li Tûnisê dest pê kir û li welatên din ên li Rojhilata Navîn belav bû. Gelan ji bo azadiya xwe serî rakirin û xwestin xwe ji hikumdariya bi salan xelas bikin. Lê belê, di giştî de gel negihiştin wê encama ku dixwestin. Sedem ew bû ku gel ne rêxistinkirî bûn. Ji ber vê yekê jî yên hatin ser hikum xwedî heman zihniyetê bûn. Gel dîsa perîşan bû, koçber bû. Ev pêla serhildanan di heman demê de gihişt Sûrî jî. Serhildanê li Derayê dest pê kir û belavî hemû bajarên Sûrî bû. Van serhildanan di nava bajarên Kurdan jî bandora xwe nîşan da û Kurdan ev yek ji bo xwe wekî firsendeke dîrokî nirxandin, ji bo ku azadiya xwe bi dest bixin rabûn ser piyan.

Mîna ku Rêber Apo dibêje, di pêvajoyên wisa de kîjan gel rêxistinkirî bin ew dikarin bi ser bikevin. Li Rojavayê Kurdistanê mîna vê firsendê di sala 2004'an de jî çêbibû, lê belê wê çaxê rewşa heyî pir cuda bû. Wê çaxê jî gel rabibû ser piyan, feqet pêşengiyeke xurt a ku karibe rê nîşanî gel bide tine bû. Wê çaxê di nava PKK'ê de hewldanên tasfiyekariyê hebûn û wan kesayetên tasfiyekar xwestin di şexsê Rojavayê Kurdistanê de derbê li xebatên Rêber Apo bidin. Lê, ev hedefa wan bi ser neket. Wê çaxê gel ji aliyê Rêber Apo ve hatibû perwerdekirin û xwedî hişmendiyekê bû. Lewre dikare bê gotin ku her şoreşek li ser bingehekî dîrokî pêk tê, yanî her şoreşek xwedî mîraseke dîrokî ye.

Şoreşa Rojava jî xwedî mîrateyekê ye, wisa jiberxweve çênebû. Di warê îdeolojîk de xwedî bingehekî xurt e. Rêber Apo bi xwe yekser li vê qadê 20 salan ked daye, xebat meşandiye. Di heman demê de keda bi hezaran hevalan heye. Dîsa, keda gel heye, ku bi ruhê welatparêziyê li dijî hemû zilm û zora bi ser de hat jî li ber xwe da û ev berxwedan gihand asta şoreşê. Gel xwe bi rêxistin kir, xweseriya xwe ava kir, artêşa xwe ava kir, YPG û YPJ rêxistin kir, pergala xwe ya xwerêveberiyê ava kir, yanî li ser esasê perspektîfên Rêber Apo, bi armanca avakirina neteweya demokratîk gel xwe bi xwe bi rê ve bir û gel bi xwe bû xwedî îrade.

Yek ji xalên sereke û navendî ya di fikir û felsefeya Rêber Apo de ew e ku cins, çîn û neteweya herî destpêkê hatiye kolekirin, yanî jinê datîne destpêkê, ji vir dest pê

dike û îdeolojiyê li ser vî bingehî dide rûniştandin. Ferqa tevgera me ji tevgerên din ên cîhanê ev e. Rêber Apo mijara jinê wekî mijareke stratejîk girt dest û têkoşîn li ser vî esasî meşand. Tevgerên din ev mijar bi awayakî stratejîk negirtin dest, taktîkî nêz bûn û piştî ku şoreş gihişt serî jî rewşa jinê dîsa wekî berê ma, nêzîkatiya li beramberî jinê jî wekî berê ma. Ji ber vê yekê ew tevger û partiyên bi vî rengî nêzî jinê bûn di dawiya dawî de dîsa ketin hembêza modernîteya kapîtalîst û ji hedef û armancên xwe yên destpêkê dûr ketin. Sir û raza sêhrî ya serketina îdeolojiya Rêber Apo di vir de ye.

Li Rojavayê Kurdistanê ya herî zêde derket pêş û civak jî kişand nav tevgerê tevlîbûna jinê bû. Tevlîbûna jinê ya ji bo nav tevgera azadiyê bû bingeh ku di nava civakê de guhertineke kokî, hîmî pêk were. Ev rewş çawa çêbû? Berê baweriya malbatan bi keçên wan nedihat, tenê nedişandin cihekî, yan jî nedihiştin li gel yekî ku nas nekin derkeve derve. Her wiha nedihiştin keçek bi tena serê xwe derkeve û mal bi mal bigere. Dîsa, dema ku xortekî ji derve, biyanî bihata û li malê zilamek tine bûya, li ber derî paşve dişand. Yek ev mînak heye, yek jî encama perwerdeya Rêber Apo heye bê çiqasî di civakê de guhertin çêkiriye. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku civaka Rojava ti carî ewqasî rêxistinkirî nebûye. Di encama hewldan, ked û têkoşîna Rêber Apo de ji xwendekarên zanîngehê, ji xwendekarên amadehî û gelek beşên din ên civakê gelek kes tevlî nav refên şoreşa Azadiya Kurdistanê bûn.

Ji ber vê yekê, heger îro li Rojavayê Kurdistanê şoreş li ser piyan be bingeha wê li ser vê kedê û zihniyetê ye. Dîsa dema ku li Rojava hem navxweyî hem jî derve êrîşên tên pêşxistin, dorpêça heyî li ber çav tê girtin baştir tê fêmkirin çima şoreş heta niha têk neçûye. Sedema vê ya esasî ew e ku şoreşê ji bo xwe xeta sêyemîn kiriye bingeh, li ser vê xetê dimeşe û wê li ser vê xetê bimeşe. Heger şoreşê wekî şoreşên din, yan jî tevgerên din bigota ew hêza me nîn e, em mecbûr in pişta xwe bi hinekan girê bidin, wê heman aqûbet bidîta. Di dîrokê de jî ji bo vê ferasetê ji bilî binketinê rêyeke din tine ye. Bingehê îdeolojiya şoreşa me li ser esasê baweriya bi hêz û îradeya cewherî ye. Di vê rewşê de hêz gel e, ji bilî gelê xwe tu pişta xwe nadî ti hêzeke din. Ji ber vê yekê Tevgera Azadiya Kurdistanê rêxistinkirina gel esas girt û li hemberî zihniyet û siyaseta faşîst û qirker bi vî rengî dest bi têkoşînê kir û têkoşîna xwe li ser vî hîmî domand.

Şoreşa Rojava deh sal li pey xwe hiştin û niha 11 salî ye. Şoreşa Rojava wekî şoreşa jinê tê birêvebirin. Wekî bingehê fikrî, îdeolojîk jixwe wekî me li jorê jî diyar kir xwe bi pêşengiya jinê îfade kir û li ser esasê azadîxwaziya jinê têkoşîn meşand. Her wiha, di pêvajoya şoreşê de jî jinê xwe li her qada jiyanê, ji qada leşgerî heta qada civakî, bi rêxistin

kir û di vî warî de jî hewl da rola xwe ya pêşengiyê bi cih bîne. Li hemberî sîstem û zihniyeta baviksalarî têkoşîn meşand, bi têkoşîna xwe ve qadên ku li ser jinê hatine girtin û qedexekirin vekir, di qada rêveberiyê de bi pergala hevserokatiyê ve cihê jinê yê hatibû dizîn, dabûn şêlûkirin û li jinê hatibû qedexekirin careke din li ser esasê pîvanên civaka demokratîk û azadîxwaziya jinê lê vegerand. Jinê jî êdî got ez heme, xwedî îrade me, xwedî nasname me. Got ti kes nikare bi zorê, bi dek û dolaban vê pergala ku bi keda Rêber Apo û bi hezaran şehîdan hatiye avakirin desteser bike. Ji bo vê yekê li dijî çeteyên bi zihniyeta zilamserwer şer kir. Li dijî dijminê jinê şer kir. Li dijî dijminê civakê şer kir. Li dijî dijminê mirovatiyê şer kir. Ev dijminê wisa hemû tortên zihniyeta zilamserwer bi awayekî eşkere bi xwe re hilgirtibû têk bir. Bi ruhê fedaî yê Arînan, Avesteyan, Biharan bi ser vî dijminê xwînmij de çû. Bi vê sekna canbexşane raber kir ku xeta Bêrîtan û Zîlanan tê domandin, zindî ye û hikmê xwe îcra dike. Vê yekê jî bingehê xwe ji îdeolojiya Rêber Apo girt, bi ked û hewldanên Rêber Apo pêk hat. Rêber Apo ev şer û têkoşîn di asta şaristaniyan de girt dest. Wekî têkoşîna Modernîteya Demokratîk û Modernîteya Kapîtalîst. Şerekî di vê astê de mezin hat meşandin. Ji ber vê yekê Şoreşa Rojava bi hêza leşkerî ya YPJ'ê ve deng veda, zêdetir hat naskirin û ji bo hemû jinên cîhanê bû îlham. Zihniyeta ku qadan li jinê digire, li ser jinê qedexe dike, dibêje jin nikare şer bike têk çû. Şoreşa Rojava di pêşengiya jinê de ev zihniyet ji binî ve hilweşand. Bi taybet jî şerê li dijî çeteyên zilamserwer ên xwînxwar û têkbirina wan ev rewş bi awayekî eşkere raxist ber çavan.

Yek jî di aliyê înşakirina civakê de pêwîst e mirov li mijarê mêze bike. Di nava şoreşa Rojava de yek ji xalên girîng jî pergala hevserokatiyê ye. Pergala hevserokatiyê li dijî qalibên zihniyeta baviksalarî bûye bersiveke dîrokî. Li gorî van qalibên zihniyeta baviksalarî zilam her tişt bû, zilam di her qada jiyanê de cihê xwe digirt, cihê jinê jî tenê nav çar dîwarên malê û çend karên diyar ên mîna mamostetî, hemşîretiyê bû. Bi Şoreşa Rojava re ev sîstema ku bi vî rengî li ser esasê cinsiyetparêziyê hatiye avakirin hat xerakirin û bi pêşengiya jinê ji bo civakeke demokratîk, azad û wekhev pergala hevserokatiyê hat rûniştandin. Wisa jî ew zihniyeta ku dibêje asta zilam ji ya jinê bilindtir e têk bir. Di çareserkirina hemû pirsgirêkên civakî de hevserok bi hev re biryar didin, hêza çareseriyê datînin holê û pirsgirêkên gel bi hev re çareser dikin. Her wiha, jinê wekî bingehê pergala Konfederalîzma Demokratîk di avakirina komun û meclîsan de jî rol lîst, bi rêka van saziyan gihişt wê astê ku pirsgirêkên jinan li komînê, li taxê yan jî gund, nîqaş bike, binirxîne û çareser bike. Li gel vê, ji bo jinên ku di mal de li beramberî nêzîkatî û helwestên

zihniyeta zilamserwer zehmetiyan dikşînin jî malên jinan hatine avakirin. Li van malan jî li ser pirsgirêkan û çareseriyên wan nîqaş tên meşandin. Dîsa jinê wekî pergala xwe ya xweser di her qadê de komîteyên xwe ava kirine. Ji komîteya tenduristiyê heta parastinê, ji komîteyên maliye, aborî heta komîteya rêxistinkirina zarokan jinan di nava pergala xwe ya xweser de xwe rêxistin kirine. Ji bo guhertin û veguhertina zihniyeta zilamê serdest jinan dest bi xebatên perwerdekirina zilaman kirine. Ev yek bi xwe serketineke bêhemta ye. Di Şoreşa Rojava de bi pêşengtiya jinê ji bo ku malbat a dendika şaristaniya dewletdar, şaristaniya cinsiyetparêz e bê guhertin, demokratîk bibe mîna vê xebatên cur bi cur tên meşandin.

Li gel vê, hemû gelên li ser xaka Rojavayê Kurdistanê dijîn xwe di bin sîwana Konfederalîzma Demokratîk de bi rêxistin kirin, saziyên xwe çêkirin, hêza xwe ya parastinê ava kirin. Li ser xaka Rojavayê Kurdistanê ti gelekî bê rêxistin nema. Bi rêberiya fikra neteweya demokratîk û konfederalîzma demokratîk civakan xwe nas kirin, doza azadiya xwe kirin, ji bo vê yekê têkoşîn meşandin, xwe bi rêxistin kirin, di rêveberiya pergala Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûrî de cih girtin. Yek ji bingehên esasî ya ku şoreşê li ser piyan digire jî ew e ku hemû rengên civakê yên li ser xaka Bakur-Rojhilatê Sûrî dijîn xwe li gorî pergala neteweya demokratîk bi rêxistin kirine, di nava vê pergala demokratîk de her reng xwe îfade dike, li gorî çand û zimanê xwe rêxistina xwe ava dike, dibe xwedî îrade û xwe bi xwe bi rê ve dibe.

Heger îro bi ser Bakur-Rojhilatê Sûrî de ewqas êrîş pêş dikevin, tê dorpêçkirin û li beramberî êrîşan bêdengî heye, yanî hevkariya di van êrîşan de bi awayekî eşkere tê nîşandan sedemê wê ev e. Pergala li Bakur-Rojhilatê Sûrî li ser bingehê civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê dixwaze tê hûnandin. Yanî li dijî sîstema modernîteya kapîtalîst e. Pergala li Bakur-Rojhilatê Sûrî hewl dide li ser xeta modernîteya demokratîk xwe ava bike û ev jî berjewendiyên hêzên yekdestdar hemûyî têk dibe. Ev model cara yekemîn bi vî rengî li Rojavayê Kurdistanê dikeve meriyetê û her diçe serketina xwe jî ispat dike.

Di rewşa heyî de dijminên gelê Kurd ji bo hilweşandina vê pergalê ketine nava her cure hewldanan. Hemû rê û rêbazî bi kar tînin. Wekî çawa Rêber Apo jin xist bingeha fikrên xwe û li ser vî bingehî pergal pêş xist, dijmin jî di hedefa xwe ya yekemîn de jin bi cih kirine, êrîşên pir dijwar pêş dixin. Dijmin dema ku jinê dike hedef jî ferq û cudatiyeke mîna milîtan e, welatparêz e, herêmî ye, sempatîzan e naxe navberê. Hemûyan jî dike hedef û bi vî rengî êrîş dike. Êrîş wekî çawa bi rêka fîzîkî pêk tên, her wiha bi rêka şerê taybet jî di dewrê de ne. Ji bo dijmin her jina ku tehma azadiyê kiriye, azadî nas kiriye hedef e. Lewma

jî di vê pêvajoyê de êrîş herî zêde bi rêka şerê taybet tên pêşxistin. Bi vê rêkê dixwazin di şexsê jinê de civakê xera bikin. Dixwazin çand û exlaqê civakê ji hev bixînin û civakê ji civakbûnê derxînin.

Li beramberî van êrîşan hemûyî, çi di warê fîzîkî de dibe çi jî bi rêkên cuda yên şerê taybet dibe, di serî de jina Kurd, jin xwe li ser esasê Stratejiya Şerê Gel ê Şoreşgerî bi rêxistin dikin. Jin bi awayekî rêxistî salên şoreşê pêşwazî dikin. Şîara "Jin Jiyan Azadî" ya ku êdî li cîhanê bûye sembola azadiya jinê, wê bibe sîwaneke wisa ku di sedsala 21'emîn de hemû jin di bin banê wê de kom bibin. Bi avakirina Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn a bi pêşengiya jinê ve wê sîstema modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn têk biçe û wekî Rêber Apo jî gotiye, wê sedsala 21'an bibe sedsala jinê. Li ser vî bingehî di serî de azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, erk û berpirsiyariyên me yên kêm mane, me bi cih neanîne hene. Ji bo pêkanîna erk û berpirsiyariyên xwe derfetên me hene, dîrokê firsend daye me, tenê ya dimîne ew e ku em wekî jin karibin dil û mejiyê xwe bi ronahiya felsefeya Rêber Apo bihûnin, rêxistinbûna xwe xurttir bikin, bi awayekî xurttir xwedî li erk û berpirsiyariyên xwe derkevin û em qirna 21'emîn bikin qirna jina azad.

**Şîara "Jin Jiyan Azadî" ya ku êdî li cîhanê bûye sembola azadiya jinê, wê bibe sîwaneke wisa ku di sedsala 21'emîn de hemû jin di bin banê wê de kom bibin.**

# ABORIYA LI BAKUR-ROJHILATÊ SÛRÎ

**Mêtingeriya ekonomîk derba herî mezin li aboriya xwezayî û çanda komunal a ku bi dehhezaran sal in çêdibe, xistiye. Zihniyet û îdeolojiya kara herî zêde bûye sebeb ku di nava civakê de nirxên manewî dejenere bibin.**

HEVALÊ EMÎN

Aboriya li Bakur-Rojhilatê Sûrî dikare di bin sê sernavan de bê nirxandin. Yek, bandor û encamên mêtingeriya ekonomîk a li ser aboriya civakê. Dudu; rewşa aboriya civakê. Sisê; rêxistinbûna Aboriya Komunal Demokratîk û encamên wê. Rewşa aborî ya ku di bin sê serenavan de bê xulasekirin dikare ronîker be.

### A-Li Rojava Mêtingeriya Ekonomîk

Mêtingeriya li Kurdistanê bi xisleta qirkeriyê rabûye. Mêtingeriya ekonomîk hewl daye vê siyaseta qirkeriyê temam bike. Li herçar parçeyên Kurdistanê jî bi şeklekî hemaheng mêtingeriya ekonomîk hatiye pêkanîn. Ya ji hev cuda terz

û rêbazên wan bûye. Çawa ku Mêtingeriya Tirk, Îran û Iraqê bi rengekî xweserî xwe siyaseta qirkirinê meşandibe, mêtingeriya Sûrî jî li gorî xweseriya xwe ketiye nav taktîk, rêbaz û terzên qirkirinê. Înkara Kurd û Kurdistanê herî zêde di dema BAAS'ê de hatiye pêşxistin. BAAS, bizav û tevgereke faşîst û nîjadperest e. Xwe dispêre miletperestî û şovenîzma Ereban. Ji Hîtler, yanî ji faşîzma Elman bandor bûye. Dixwazin "Pan-Erebîzmê" wekî bizavekê pêş bixin. "Nîjada Serdest a Ereb" diparêzin. Hedefa wan ew e ku mafê jiyanê nedin Kurdan. Zekî El-Arsûzî û Mîşel Eflak di avaniya îdeolojîk a partiya BAAS'ê de bi rola pêşeng rabûne, "nîjada serdest a Ereb" diparêzin û dibêjin; "Ereb tekane nîjad e ku wekî mîrasa bavê me Adem ji bo ku nûnertiya nirxên serdest ên ser rûyê erdê bike ji kûrahiyên dîrokê heta roja me hatiye." Suleyman Hiş, ê ku di sala 1964'an de bû Wezîrê Çandê yê Partiya BAAS'ê, di sala 1953'yan de wisa got: "Ey Birayê min ê Ereb! Heger tu rojekê neçar ma şerê Siyonîstan bikî berê tifinga xwe ewilî bide Kurdan."

Di sala 1952'yan de Cemal Abdulnasir bi darbeyeke eskerî desthilatdariyê bi dest xwe dixe. Ev pêvajoya darbeyê bandorê li miletperestiya Ereb dike. Di 22'yê Sibata 1958'an de Komara Erebî ya Yekbûyî tê îlankirin. Di pêşketina vê bereya faşîst de, "Bereya Neteweyî" (wê demê li Sûrî desthilatdar bûn) û BAAS'î bi awayekî çalak cihê xwe digirin. BAAS'î, bi bandora Komara Erebî ya Yekbûyî jî êrîşî Kurdan dikin. Li ser tinekirina Kurdan siyasetê dimeşînin. Axaftina bi Kurdî, nivîsandina bi Kurdî, weşana bi Kurdî, çêkirina muzîka Kurdî, guhdarkirina muzîka Kurdî û hwd. ji kok tên qedexekirin. Xebatên siyasî tên qedexekirin û xebatên neteweyî yên Kurdan bi Siyonîzmê, bi Emperyalîzma Rojava re têkildar tên hesibandin, wisa tên şîrovekirin û hewl didin bidarizînin. Hikumeta faşîst Ereban dikişkişîne û berê wan dide Kurdan. Kurd ji qadên kar û aboriyê tên dûrxistin. Du vebijêrkan datînin pêşiya Kurdan; yek; hevkarî, xweînkarkirin û xizmeta mêtingeriyê. Dudu; heger berxwedan hebe, mirin û mehkûmbûna birçîbûnê. Sirgûn dibin, navê Muhacir lê dikin. Wekî talûkeya potansiyel her tim di lîsteya "ewlekariyê" de cihê xwe digirin.

Komara Erebî ya Yekbûyî di 28'ê Îlona 1961'an de bi darbeya Albay Abdulkerîm Nahlawî, ku ji "baskê rastê ye û karmendên xeyidî yên li Urdin, Siûdî Erebîstan û Sûrî" piştgirî didanê, hilweşiya. Di encama vê dijdarbeyê de Komara Erebî ya Sûrî tê îlankirin. Binavkirina Komarê ya tenê bi nîjada Erebî nîşan dide ku wê înkara Kurd dewam bike. Kurd bi vî rengî şîrove dikin. Jixwe piştî demeke kurt jî ev şîrove mafdar derdikevin. Hikumeta nû di sala 1962'yan de li Hesekê serjimêriyê dike, ku 150 hezar Kurd lê dijîn, bi dehhezaran Kurdî ji hemwelatîbûnê derdixînin. Li

seranserî Cizîrê nêzî 120 hezar Kurd ji hemwelatîbûnê tên derxistin. Bi vê rêkê Kurd dikevin pozîsyona ecanîb (biyanî) yan jî maktûmîn (derveyî qeydê) û xakên di dest Kurdan de bi navê reformê li Ereban tên belavkirin. Li gel vê Kurd ber bi koçberiyê ve tên dehfdan û avaniya demografîk diguherin. Girseya Kurd ji ekonomiyê tê dûrxistin, dikeve bin pêkanîna sûcdarên potansiyel û her tim tên venêrînkirin. Lêpirsîn, mehkeme, zindan û qetilkirin li ser wan Kurdên ku li dijî mêtingeriya aborî radibin yan jî îhtîmal e rabin tên pêkanîn. Ji bo Kurdan rêveberiya nû ya Sûrî jî wekî berdewama ya beriya xwe dibe. Siyaseta înkar, îmha û qirkirinê bi rê û rêbazên cudatir tên domandin. Li Tirkiyeyê çawa ku “dibistanên” mêtingeriyê wekî amûrê bingehîn ên bişavtina Kurdan tên bikaranîn, mêtingeriya Sûrî jî nahêle girseya Kurd bixwîne û binîvîse û bi vê rêkê hewl dide asîmîle bike. Teyisandina vê ya li ser ekonomiyê jî ew e ku Kurdan dikin însanên bêwesf. Kurdên ku bi vî rengî ji karên dewletê tên dûrxistin bi vê rêbazê jî ji bo sirgûna ber bi qadên wekî Beyrûd, Şam, Helebê ve tên dehfdan. Dixwazin Kurdan cahil bihêlin û di asta xizmetkirinê de bi cih bikin. Di qada siyasî de jî hewl didin nehêlin hişmendiya welat û polîtîkbûna Kurdan pêş bikeve.

Di dema Hafiz Esad û Beşar Esad de jî rejîma BAAS’ê neguheriye. Ji berê cudatir di warê taktîkî de hin guhertin kirine û hewl dane desthilatdariya xwe biparêzin. Tişta esas girtine jî parastina rejîma BAAS’ê bûye. Ji bo vê yekê bi qasî pêwîst radîkal bi qasî pêwîst jî hewl dane nerm tevbigerin. Di navenda pêwîstiya vir de jî bekaya rant, desthilatdarî û dewleta bi zihniyeta BAAS’ê heye. Berjewendiyên civakê û gelan wekî rûpoşê hatine bikaranîn. Di dema Hafiz Esad de rejîma BAAS’ê ji bo Kurdan (1980-1990) taktîka lihevkirinê tercih kiriye, lê muxalefeta Sunî ya Ereb jî di qetlîamê re derbas kiriye. Piştî Osmaniyan, mêtingeriya Sûrî û Tirkan bi giranî di mijarên wekî avên Ferat, Dîcle û bajarê Hatayê de nakokî hev dibin. Ji ber van nakokiyan Hafiz Esad li dijî mêtingeriya Tirk tercîh dike ku li gel Tevgera Azadiyê peywendiyên taktîkî pêş bixîne. Bi vê yekê hewl dide dewleta Tirk tengav bike û jê tawîzan bigire. Tevgera Azadiya Kurd jî hewl daye ji nakokiyên Mêtingeriya Tirk û Sûrî sûdê bigire û peywendiya taktîkî domandiye. Bi giranî li ser esasê îmkanên Sûrî li Rojhilata Navîn bi salan siyaset kiriye û têkoşîn meşandiye. Tevgera Azadiyê di nêzîkatiya xwe de rêgezî tevgeriyaye û peywendiya taktîkî domandiye.

Beşar Esad bi rengekî berevajî nêzî vê pêvajoyê dibe. Rûyê din ê rejîma BAAS’ê dixebitîne, înkarker û zextker nêzî Kurdan, Tevgera Azadiyê û gelên din dibe û dixwaze bitepisîne. Di encama vê de mêtingeriya Tirk dikeve nava peywendiyeke nû ya taktîkî û hevpeymana Edeneyê ava dikin. Beşar Esad hewl dide pala xwe

bide mêtingeriya Tirk, wisa Kurdan bitepisîne û bi vî rengî rejîma BAAS'ê biparêze.

Di vê pêvajoyê de rejîma BAAS'ê ti carî dest ji avaniya xwe ya navendî-dîkta bernade. Heta dem bi dem zêdetir hişk dibe, hewl dide muxalefeta ku daxwazên demokratîk ên gelekî mafdar tîne ziman bi şîdetê bitepisîne û texsîr nake ku ji bo vê yekê bi sedan însanî qetil bike. Rejîma ku hêna ji destpêkê ve ketiye nav sûc ti carî demokratîkbûnê naceribîne. Tenê avaniya navendî û antîdemokratîk esas digire. Ji ber vê yekê ye ku her tim li dijî muxalefeta hundirîn qetlîam, tepisandin û mêtingerî esas girtiye. Bi vê rêbazê hewl daye desthilatdariya xwe biparêze. Dema Hafiz Esad û Beşar Esad ji bo girseyên gel dîktatoriyê îfade dike. Em careke din diyar bikin, rejîma BAAS'ê qirker nêzî Kurdan bûye. Rejîma BAAS'ê ya bi pêşengiya Esadan ji vê armanca xwe dûr neketiye û dewam dike. Pêkanîna vê ya herî diyar û pratîkî Kembera Ereban e û polîtîkayên qetlîam, sirgûn û dana koçberkirinê yên li dijî Kurdan e. Di dema Esadan de jî Kurd ecnebî û maktûmîn in. Navê wan qedexe ye. Qedexe ye ku bi zimanê xwe binivîsin, bixwînin, biaxivin, muzîkê çêkin. Li ser wan kesên ku li dijî vê derketine jî cezayên giran hatine birîn. Navê Kurdî yê bajar, navçe, gund, çiya, deşt, cih, heta navê Kurdî yê şexsan jî hatiye qedexekirin û guhertin. Bêmilkkirina Kurdan herî zêde di dema Esadan de pêk hatiye. 120 hezar Kurd ji hemwelatîbûnê hatine derxistin, bêyî ku ti berdêlek bê dayîn malên wan hatine desteserkirin. Bi rêka provokasyonan bi sedan Kurd bi awayekî eşkere hatine qetilkirin. Qetlîama Sînema Amûdê (di 13'ê Mijdara 1960'î de 283 xwendekar hatine şewitandin û wisa hatin qetilkirin) û Qetlîama Meleba Qamişlo (12'ê Adara 2004'an 52 Kurd hatin qetilkirin) mînakên vê yên eşkere ne.

Li Sûrî yek ji plan û projeyên herî berfireh a mêtingeriya ekonomîk "Kembera Ereban" bûye. Kembera Ereban li Sûrî tê pêkanîn, lê plansazî ji aliyê "Komara Erebî ya Yekbûyî" ku Misir serê wê dikşîne û çar hêzên mêtinger (Tirkiye, Iraq, Îran, Sûrî) ve tê çêkirin. Proje di warê îdeolojîk de bi temamî zihniyeta BAAS a nîjadperestiya Ereb îfade dike. Di vê maneyê de Projeya Kembera Ereban berhemê BAAS'ê ye.

Piştî salên 1960'î nîjadperestên Ereb li ser kemberê nîqaş dikin. Ji vê û şûn de nîjadperest û rejîma BAAS'ê li ser projeyên mêtingeriya aborî zêdetir hûr dibin û amadekariyan dikin. Kembera Ereban hedef dike ku Rojava bi temamî bê valakirin, Kurd bi komî bên asîmîlekirin, ji cotkarî, zireet û ajaldariyê yan jî aboriyê dûr bikevin. Bi milekî din jî ev "qirkirinê" îfade dike, qirkirina di her qadê de, di warê ekonomîk, sosyal, kulturel û etnîkî. Kurdan li welatê Kurdan mehkûmî birçîbûnê dikin. Kembera Ereban ji Serêkaniyê heta Dêrikê,

Sêmalkayê diçe. Nêzî 280 kîlometre dirêjahî, 10-15 kîlometre kûrahiyê digire nava xwe. Di vê qadê de 332 gund hene. Dixwazin 140 hezar Kurdî ji herêmê derxînin. Li vê herêmê 7 hezar malbatên Ereb tên bicihkirin. Di sala 1969'an de bi giştî milyonek û 374 hezar donim erazî tê xespkirin. Ev erazî bi giştî ji Kurdan tên girtin. Eraziya hatiye girtin di nava girseya Ereb de tê belavkirin, ku ev jî li herêmê hatibûn bicihkirin.

Her ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê û pêkanînên Neteweya Demokratîk pêş ketin kembera Ereban zeîf bû. Her çû xisleta wê ya înkar, îmha û qirkirina ekonomîk têk çû. Mêtingeriya Tirk hewl dide Rojava dagir bike, valatiya ku ji ber rejîma zeîfbûyî ya BAAS'ê çêbûye dagire û Kembera Ereban bi kembera faşîst a Tirkan berfireh bike û rojane bike. Di vê mijarê de hewl dide bi Sûrî, Îran, Iraq, Rûsya û DYE re li hev bike û xwe mayinde bike. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku Kembera Ereban hêna jî ji bo Kurdan wekî pirsgirêkeke bingehîn dewam dike.

Polîtîkayên Fransî û Îngilîzan ên li ser Rojhilata Navîn bûye bingeh ku kembera Ereban çêbibe, Kurd bêstatu bimînin, bên sirgûnkirin û asîmîlekirin, di qetlîam û qirkirinan re bên derbaskirin û li welatên xwe bêyî aborî bimînin. Rojava jî tê de, Sûrî bi giştî di 16'ê Gulana 1916'an de bi hevpeymana Sykes-Picot'ê ji bo Fransayê hat hiştin. Ev hevpeyman di 14'ê Tîrmeha 1922'yan de ji aliyê NY jî hat erêkirin. Hevpeymana Sykes-Pîcot di encam de nehiştiye dewleteke Kurd ava bibe; bingehê pirsgirêkên îro ava kiriye û bûye sebeb ku Kurdistan li gorî berjewendiyên Rojavayiyan bê parçekirin. Fransiyên di 1920'î de Şam dagir kirin, di 17'ê Nîsana 1946'an de ji Sûrî vekişiyan. Di vê pêvajoyê de Fransiyan jî li Sûrî polîtîkayeke pirmilî xistin meriyetê, bi awayekî yekser ti hêz nedan hemberî xwe û hewl dan ji hemû hêzan feydeyê bigirin. Ev terzê siyasetê li beramberî welat, beşên gel ên cuda, kêmneteweyan, şexsên ku di nava eşîr, malbat û civakê de giraniyeke wan hene pêk anîn. Bi vî rengî nêzî baweriyan jî bûn. Hem şerê Kurdan kirin hem jî li hev kirin. Wekî çawa xweseriya wan parastine her wiha bêstatubûna wan jî parastine û pêk anîne. Fransiyan her tim Kurd kirine mijara bazarên xwe. Li beramberî mêtingeriya Tirk, Ereb û Farsan wekî kartekê bi kar aniye. Di encam de Fransiyan Kurd û Kurdistan di bin mêtingeriya Tirk, Sûrî, Iraq û Îranê de hiştin û di 17'ê Nîsana 1946'an de ji qadê vekişiyan. Encama polîtîkaya ku bi Îngîlîzan re hevpar hatiye meşandin, Kurdistana parçebûyî ye. Kurdistana parçebûyî jî bi rengê Rojhilata Navîn a parçebûyî û şerê sedsalên siberojê hatiye hiştin. Di encam de jî ev pêk hat û hêna jî şer û pevçûn didomin.

Di vê pêvajoyê de Kurd di warê şer û polîtîkayên xwe de pir belave û parçeyî ne. Li şûna Yekîtiya Neteweyî, bi serê xwe rêxistin, partî, eşîr, malbat, heta şexs jî siyasetê

dimeşînin. Siyaseta neteweyî nayê meşandin, girêdayî vê şerê neteweyî jî nayê meşandin. Qalibên Îslama siyasî nayên derbaskirin. Di nava mêtingeran de tercîh tê kirin û refên xwe diyar dikin. Dema ku vebijêrka sêyemîn tine ye, yanî xwe hilnabijêrin, tercîha wan dibe yek ji mêtingerên heyî. Li ser sînorê "birayê Misilman" û "umetparêz" dimînin. Xwe dispêrin argumanên teng û bêmane yên mîna Fransî û Îngîlîzên "Xrîstiyan" û "Gawir" û hewl didin wisa siyasetê bikin. Ev zihniyeta siyasetê û şer ji bilî ku xizmeta mêtingeriyê bike kêrî tiştekî din nayê. Di vê demê de Kurdan ji bo mêtingeriya Fransî, Îngîlîz, Tirk, Ereb û Farisan xizmet kirine. Siyaseta Kurd a parçeyî geh li gel Fransiyan geh jî li cem Tirkan (Osmanî û Komar) cih girtine. Tişta ku nikarîbû bikira yan jî herî kêm kiriye jî meşandina siyaset û şerê xwe ye. Nebûye îrade. Ji vê re bêsiyasetî, koriya neteweyî ya siyasî bê gotin dibe guncavtir be. Di encam de ji ber ku nikarîbûye siyaseta neteweyî bike nikarîbûye şer bike, nikarîbûya pêsîra xwe ji qirkirinê, asîmîlasyonê, li welatê xwe birçî û bêyî ekonomîbûnê, sirgûnê, ecnebîbûn û maktûmînbûnê, bêstatubûnê xelas bike.

### B-Rewşa Ekonomîk a Civakê

Cografyaya Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrî di warê ekonomî de xwedî potansiyelek dewlemend e. Di navbera du çemên wekî Ferat û Dîcle de cih digire. Yanî li nîvê Mezopotamya cih digire. Her wiha, ji Bakurê Kurdistanê gelek çem diherikin herêmê. Ji ber pirsgirêkên ekolojîk her diçe baran kêm dibin û hişkayî (ziwayî) pêş dikeve. Ev qad qederekê tavê digire û ji ber ku rêjeya wê ya nemê kêm e mirov dikare bibêje xwedî avhewayeke ziwa ye. Zivistanên wê ne hişk in û bayê wê jî pir ne dijwar e. Her çiqasî li hin deveran şoraxbûn (bêweçbûn) pêş ketibe jî xaka wê berdar e. Li Sûrî beşeke mezin a berhemên çandinî yên wekî genim, ceh, nîsk, nok, pembo, garis, sewze li Bakur-Rojhilatê Sûrî digihêjin. Di warê ajaldariyê de jî ev qad dikare giştî Sûrî xwedî bike. Di berhemdariya fêkiyan de bi qasî dexl û zad nebe jî pêdiviyeke girîng pêşwazî dike. Her wiha, petrol û enerjiya ji petrolê ya Sûrî bi temamî ji vê qadê tê pêşwazîkirin. Beşeke mezin a enerjiya elektrîkê ji bendavên Tişrîn û Tebqayê yên ku li ser Feratê hatine avakirin tê bidestxistin. Avaniya wê ya civakî bi tecrubeya hezaran salan di qadên wekî cotkarî, ajaldarî, zîreet û qadên din de xebata ekonomîk dimeşîne. Bakur-Rojhilatê Sûrî ya ku parçeyekî girîng ê Mezopotamyayê ye, xwedî Çanda Aboriya Xwezayî ye. Zeneetên ku bi pêşengiya gelên Asûrî û Ermenî pêş ketine hêna jî hene. Berhemdariya sanayî û teknolojiyê ne di wê astê de ye ku karibe pêdiviyên civakê pêşwazî bike. Feqet di asta sanayiya biçûk de; atolyeyên montajê, berhemdariyê, şirîke pêşketî ne. Qadên xebatê yên wekî tamîrxane, qutkirina hesinan, firotina parçeyan û hwd. dixebitin.

Her wiha li qadê di asteke biçûk de be jî fabrîqe û îmalatxane hene. Asta heyî ya sanayiyê nikare bersivê bide pêdiviyên sanayiyê yên hemû civakê. Encax di warê binesaziyê de xwedî potansiyelekê ye. Li ser vê binesaziyê, li hemû qadên sanayiyê bi rêka projeyên xweser û koperatîfan gelek pêdiviyên civakê dikarin bên bersivandin.

Mêtingeriya ekonomîk derba herî mezin li aboriya xwezayî û çanda komunal a ku bi dehhezaran sal in çêdibe, xistiye. Zihniyet û îdeolojiya kara herî zêde bûye sebeb ku di nava civakê de nirxên manewî dejenere bibin. Alîkarî, piştevanî, bêyî bendewarî ji xwe dayîn, çanda diyariyê, xwedîderketina li tişta bi edalet, bi exlaq û hwd., di mijarên wekî van de nirxên manewî hatine zeîfkirin. Milkiyetparêziya taybet, civak û malbat zêdetir parçe kiriye. Di vî warî de çanda maddiyatparêz zêdetir pêş ketiye.

Ruxmî vê jî li Bakur-Rojhilatê Sûrî çanda aboriya xwezayî hêna jî hebûna xwe didomîne. Tevgera azadiyê bandoreke girîng li ser Rojava û qadê kiriye. Di warê îdeolojîk, polîtîk û neteweyî de bandorê li gel dike. Asteke cidî ya hişmendiyê derxistiye holê. Gelê Rojava bi xwe ji bo jiyana komunal a Rêber Apo û Apociyan şahidî kiriye. Lewma jî bingehê civakî yê Rojava ji Şoreşa Gel a Demokratîk re vekirî bûye. Di roja me de mirov dikare bibêje ku li Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrî potansiyela parastina Şoreşa Gel a Demokratîk xurt e. Civak û milîtanê pêşeng gihiştine hev û vê yekê avakirina Neteweya Demokratîk û Ekonomiya Komunal Demokratîk ji her demê zêdetir mimkun kiriye.

**C-Lêgerîna Ji Bo Rêxistinkirina Aboriya Komunal Demokratîk**

Her çiqasî bi Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an re statuya mirin û tinekirinê ya layiqî Kurd û Kurdistanê hatiye dîtin hatibe belavkirin jî talûke bi temamî ranebûye. Mêtingeriya ekonomîk û talûkeya qirkirinê hêna jî dewam dike. Rakirina vê talûkeyê di asteke girîng de girêdayî avakirina pergala Neteweya Demokratîk û Aboriya Komunal Demokratîk e. Tevgera Azadiyê xwestiye li Bakur-Rojhilatê Sûrî Aboriya Komunal Demokratîk di asta pergalî de ava bike. Ji bo vê yekê şehîdên mezin û kedên mezin hatine dayîn. Wekî îfadeya têkoşîna li qadê hewldanên avakirina hem Neteweya Demokratîk hem jî Aboriya Komunal Demokratîk dewam dikin. Feqet heta niha asteke wisa ya serketinê nehatiye bidestxistin ku em karibin bibêjin "ev jî modela me ya aboriyê ye." Heta mirov dikare bibêje, "ekonomiya lîberal di asteke mezin de hebûna xwe didomîne."

Gelê me û kadroyên ku xebata Rêveberiya Xweser, avakirinê dimeşînin dizanin ku Aboriya Komunal Demokratîk bi hemû rêgezên wê ve di asta pergalî de nehatiye înşakirin. Ev rewşa ketina ferqê û zanebûna bi vê pêwîst dike ku

mirov zêdetir hewl bide û bi fedakarî tevlî bibe. Pêwîst dike ku mirov zêdetir zana, bi bername, rêxistî û girêdayî rêgezan tevbigere. Pêwîst dike ku ya nehatiye înşakirin bê înşakirin û herî girîng jî baweriyê, qenehbûnê û guhertina zihniyetê hewce dike.

Pêkanîna şoreşê zor e, lê avakirina pergala şoreşî, yanî şoreşê zortir e. Em li Bakur-Rojhilatê Sûrî di vê pêvajoyê de dijîn. Ji vê re "pêvajoya navberê" jî dikare bê gotin. Rastiyek e, em di înşayê de zehmetiyan dikşînin. Înşa û şerê parastinê di zik hev de tên meşandin. Ev yek jî li gorî xwe pirsgirêk û zehmetiyan tîne. Pêvajo "aboriya şer" mecbûrî dike.

Dema ku mirov karibe li beramberî desthilatdarî, dewlet û sermayeya yekdestdar nekeve nava çepandinê, li ser îstîqameta îdeolojîk û polîtîk bimîne, mirov bizane li dijî modernîteya kapîtalîst û ekonomiya lîberal têbikoşe mîsoger wê şoreş bigihêje serketinê. Ev jî di her qadê de têkoşîneke bênavber mecbûrî dike. Têkoşîna li dijî dijmin li ser du xalan tê meşandin. Yek, têkoşîna navxweyî ye. Ev, qad û terzekî wisa yê têkoşînê ye ku Tevgera Azadiyê bêyî navber û bêyî sist bike meşandiye, dimeşîne. Di vê mijarê de avantaj û tecrûbeyên pir girîng derketine holê. Vê yekê bi xwe re îmkan û avantajên girîng anîne. Ya girîng ew e ku mirov têkoşîna navxweyî teng neke, sînordar neke û li dijî desthilatdarî, dewlet, rant û zihniyeta jiyana luks têkoşînê bimeşîne. Ya duyemîn jî têkoşîna li dijî derve ye. Ji bereyê ve, yekser modernîteya kapîtalîst û mêtingeriya ekonomîk dike hedef û li dijî wê wekî têkoşîna îdeolojîk, polîtîk, eskerî, çandî, civakî û aborî tê meşandin. Dîroka tevgera azadiyê û perspektîfa Çareseriya Neteweya Demokratîk ji bo vê yekê qederekê pêşiya mirov ronî dike.

Li dijî hundir û derve, bi kurt û kêmasî jî be têkoşînek tê meşandin. Ji bo ku têkoşîn bilindtir bibe îmkan hene. Eşkere ye, bi vê rêkê jî wê serketinên girîng bên qezenckirin. Ji bo hin pêşketin û encaman jî pêdivî bi wextê heye.

Rêveberên xebata avakirinê û civaka Rojava di destpêka pêvajoyê de li avakirina Aboriya Komunal biyanî bûn. Biyanîbûn wekî berê nebe jî hêna jî pirsgirêkeke girîng e û divê bê derbaskirin. Di nîvê sala 2005'an de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî Aboriya Komunal Demokratîk gelek nirxandin pêş xistin. Bi israr diyar dikir ku pêwîst e aboriya civakî bê rêxistinkirin. Piştî vê pêvajoyê mijara ekonomiyê zêdetir bû rojev û hat nîqaşkirin. Encax di mijara rêxistinbûna pratîkî de û encamgirtinê de tevgerek çênebû. Piştre Rehendê Ekonomiya Komunal Demokratîk, yanî Komîteya Aborî hat rêxistinkirin. Komîteyê di vê merheleyê de bi erk û berpirsiyariyên xwe pir zêde nizanîbû. Wê çi bike, ji ku derê dest pê bike, têkildarî vê nîqaş meşand. Di encama lêhûrbûn û nîqaşan de derket holê ku pêwîst

e xwe perwerde bike. Bi perwerdeya xwe dest bi xebatê kirin û ev ya rast bû.

Yên ku xebata avakirina Rêveberiya Xweser meşandin, beriya Doktrîna Aboriya Komunal Demokratîk fêrî agahiya aboriya li ser esasê sosyalîzma pêkhatî bibûn. Bi salan di nav çavkaniyên Marksîst de bi navê Aboriya Sosyalîst li ser ekonomiya lîberal a kapîtalîst xwendibûn, fêr bibûn û bibûn xwediyê agahiya teorîk. Agahiya aboriya kapîtalîst a lîberal a tenê di asta agahiya teorîk de çepandinek bû. Ketibin ferqê yan neketibin ferqê ev tiştekî cuda ye, lê aboriya kapîtalîst a lîberal bandoreke girîng kiribû.

Di encam de rêveberên xebata avakirinê yên ku têkildarî Aboriya Komunal Demokratîk bi têrkerî nehatibûn perwerdekirin û xwe perwerde nekiribûn, bi zanebûna xwe ya berê li Rojava ketin nava xebatên pratîkî û xebatên avakirinê. Bi awayekî xwezayî hewl dan tiştên dizanin pêk bînin. Wekî me li jorê diyar kir, pratîka pêkhatî bi giranî ji derveyî aboriya lîberal a kapîtalîst pê ve ne tiştekî din bû.

Di nava pratîka giştî ya jiyanê de dewlet, burokrasî, desthilatdarî û “aborî” hatibû fêmkirin. Encax li milê din civaka xwezayî, tecrûbe û xebata aboriyê ya ji çanda diyariyê mane jî hebûn. Her wiha, tecrûbe, ezmûn û agahiya têkoşînê ya ku di qada ked, karker û sendîkal de tên meşandin jî, ku mirov dikare li ser navê sosyalîzma pêkhatî bihesibîne, çêbibû. Doktrîna Aboriya Komunal Demokratîk a Rêber Apo jî hebû, ku van tiştên beriya vê rexne dike û red dike. Li Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrî ev agahiyên têkel hemû li ser navê Aboriya Komunal Demokratîk ji aliyê saziyên cuda ve hatin pratîzekirin. Rêxistina aboriyê ya ku di nav lêgerîna aboriya komunal de ye, li ser navê avakirinê rêxistinên cuda cuda ava kirin. Her çiqasî di hin mijaran de serketin hebin jî di giştî de gelek kêmasî û nebesî hene. Yanî serketin û serneketin di nav hev de dimeşin.

Yek ji sedemên esasî yên nebesiyan jî ew e ku di destpêka xebatan de rêxistineke Aboriya Komunal a hatî perwerdekirin û dizane çi bike tine bû. Beriya rêxistina ekonomiyê xebata maliyê hebû. Di vê pêvajoyê de mijûlahiya maliyê jî ew bû ku budçeya şer ava bike. Bi rengê kara azamî bazirganî û xebatên din dihatin meşandin. Xebata kara azamî di nava şert û zirûfên şer de wekî neçarî dihat dîtin û wisa dihatin meşandin. Komîteya aboriyê ev nêzîkatî û xebata kara herî zêde rexne kiribû. Feqet li şûna wê avakirina Aboriya Civakî pêk nehatibû. Her çiqasî hewldan hebin jî encam nehatiye girtin. Tê gotin tu di hin karan de çawa dest pê bikî wisa diçe. Bi temamî ne wisa jî be li Rojava xebatên aboriyê wisa bûye. Demek dirêj wekî destpêka xwe dewam kiriye. Hatiye xwestin ku bi aqlê maliyê yê bi zihniyeta kara herî zêde

xebata ekonomiyê bê meşandin. Maliye û aborî, ji ber xwezaya wan, karên nêzî hev in. Feqet bi temamî jî ne eynî ne. Avakirina budçeya saziyê û rêxistinkirina aboriya civakî hevdu temam dikin, feqet xebatên cuda ne. Aboriya civakî carina wekî kara herî zêde û feyde tê fêmkirin. Bandora vê nêzîkatiyê hêna jî pir zêde ye. Komîteya Aboriyê ya Rojava di 2014'an de hat avakirin. Di rewşên wisa de tişta bê kirin ew e ku tu yê valatiyê dagirî. Di vê pêvajoyê de dagirtina valatiyê bi avakirina komîteyên ekonomî û maliyeyê çêbûye. Komîteya maliyeyê tê avakirin. Encax komîteya ekonomiyê nayê avakirin û xebatên ekonomiyê wisa tên hiştin, yanî ji bo gel û bazirganan tê hiştin. Yanî xebata aboriya saziyê ji bo maliyeyê tê hiştin. Piştî şoreşê bi du salan komîteya aboriyê tê avakirin. Di Komîteya Aboriyê de terzê kara herî zêde û zihniyeta vê derdikeve pêş. Aqlê civakî, komunal li piştê dimîne. Tê xwestin bi vê zihniyetê xebata Aboriya Komunal Demokratîk bê meşandin. Ev nêzîkatî, terz û rêbaz ti carî bi aboriya civakî nade qezenckirin. Di rabirdûyê de mişkule bû, îro jî mişkule ye, wisa dewam bike wê di siberojê de jî pirsgirêk be. Her wiha, Komîteya Aboriyê di bin navê aboriya civakî de tenê bi koperatîfan tê sînordarkirin. Ji ber pirsgirêk, ezmûn û bêtecrûbetiya ku me li jor jî îfade kir, koperatîf jî di vê pêvajoyê de wekî tên xwestin nayên rêxistinkirin. Ji zihniyet, pêkanîn, nêzîkatî, rêxistinbûn, terz û rêbazê giştî tê fêmkirin ku îro jî pirsgirêka tecrûbe, ezmûn, agahî û danehevê heye.

Mijareke din a ku dibe sedema neserketinê jî perwerde ye. Di nava Tevgera Azadiyê de armanca perwerdeyê pêkanîn e. Fêrbûna te bi qasî ku tu dikarî pêk bînî rast e. Ya mayî jî bi milekî dibe demagojî. Perwerdeya giştî helbet pir tiştan fêr dike. Lê ji bo pêkanîn û pratîzekirina rehendan (boyûtan), perwerdeya xweser pêwîst e û şert e. Komîteya Aboriyê di vê mijarê de pir li piştê maye, li pey pêvajoyê maye. Pir nîqaş kiriye, encax nikarîbûye rêbaza perwerdehiyê ya ku karibe pirsgirêkê çareser bike pêş bixîne. Ji ber sedemên cuda û bêmane ev yek derbas kiriye û çûye. Careke din bê diyarkirin wê sûdmend be; heta ku pirsgirêka perwerdeyê ya hêza pêşeng neyê çareserkirin û mirov di avakirina Aboriya Komunal de li benda serketinê be, ev ê bibe mîna di serê keçel de çandina sîrê, yanî bibe wekî kolandina avê. Xulase, pêşeng û xebatkarên Aboriya Civakî nehatine perwerdekirin. Îro jî heman pirsgirêk di asteke cuda de dewam dike.

Heger mirov ji bo mijarê kurtebir bibêje; li beramberî Aboriya Komunal bêbaweriyeke veşartî yan jî eşkere heye. Ev bêbawerî dibe sebeb ku xebatkarên aboriyê di nava çarçoveya kara azamî û ekonomiya lîberal de bimînin. Ji ber vê yekê aboriya civakî di terzekî demokratîk de pêş nakeve.

Navendî dimîne û dibe sebeb ku antîdemokratîk bibe. Ev bêbawerî û zihniyet avaniya aboriya civakî ber bi xebatên bazirganî û sanayiyê yên ku bi kara azamî barkirî ve dikşîne. Zihniyeta ku dibêje, “bêyî kar bazirganî, sanayî û aborî nabe”, heta ku ev bawerî û feraset hebe avakirina aboriya civakî nabe. Di vê babetê de li beramberî Aboriya Komunal bêbawerî heye. Pirsgirêka esasî ev e. Aboriya Komunal Demokratîk kara azamî red dike. Ekolojîk e, demokratîk e, azadiya jinê dixwaze, alîgirê bazara civakî û civakê ye.

Rêxistinbûna avakirina Neteweya Demokratîk, wekî Rêxistinbûna Civakê û Rêxistinbûna Îdarî dibe du qadên bingehîn. Heta ku yek nebe wê ya din jî nebe. Rêxistinbûna tîkane zêdetir avaniya îdarî îfade dike. Rêxistinbûna ufqî (berwarî) jî avaniya civakê ye. Herdu qadên rêxistinbûnê jî avakirina Neteweya Demokratîk temam dikin û wê pêk tînin.

Aboriya Komunal Demokratîk wekî qada îdarî û civakê li ser esasê du nuqteyên esasî xwe rêxistin dike. Herdu qadên rêxistinbûnê li ser esasê hevdu temam bikin pergala avakirina aboriya civakî îfade dikin. Ya ku hatiye xwestin li Bakur-Rojhilatê Sûrî bê pêkanîn jî ev bûye. Encax hevsengî, yanî teraza di navbera du rêxistinbûnên bingehîn de wekî hevdu temam bikin pêk nehatiye. Bi giranî ya hatiye pêkanîn, hatiye avakirin rêxistinbûna navendî, yanî rêxistinbûna îdarî bûye. Lewma jî avaniya îdarî ya aboriya ku di bin kontrola rêxistinbûna navendî de hatiye rêxistinkirin antîdemokratîk xebitiye û ketiye ser rêya îqtîdarê. Her çûye ev yek jî bûye sedemek ku pergala giştî, Şoreşa Bakur-Rojhilatê Sûrî ji hedefên xwe dûr bikeve. Rêxistinbûna komun, meclîs, akademî û koperatîfê bi rengekî ku hevdu temam bikin û wisa rêxistinbûna aboriyê saz bibe pêk nehatiye. Lewma jî hemû qadên rêxistinbûnê yên aboriyê hatine derengxistin, komun nehatiye xebitandin, meclîsan qaşo (bêhemdî) hebûna xwe domandine.

Endamên komun, meclîsên bajarok, navçe, bajar û kantonan, yanî yên hatine hilbijartin nehatine fonksiyonelkirin. Avaniya meclîsê jî tercîh kiriye ku îdarî û navendî bimîne û bi vî rengî xebatan bimeşîne. Her ku keys dît jî hewl daye bibe îqtîdar. Di komun û meclîsan de rêgezên esasî esas bên girtin, bi vî rengî aborî bê rêxistinkirin ji bo ku avaniya giştî jî bibe xwedî pergal wê bi roleke girîng rabe. Lê belê, ya ku herî zêde tê derengxistin, heta nayê pêkanîn jî di nava komun û meclîsan de rêxistinkirina aboriyê ye. Terzê herî baş ê rêxistinbûna pergalê ew e ku avakirin bi awayekî yekpare bê bidestgirtin. Aborî li vir dibe yek ji boyûtên temamker. Ruxmî vê jî aborî di asta pergalî de jî nehatiye rêxistinkirin. Kêm û kurtiyên wê hebin jî di sala dawî de hewldan hene ku li komunan komîteyên aboriyê bên rêxistinkirin. Feqet ev kar jî bi

rengê aborî û koperatîfa komunê veneguheriye xebateke fîîlî. Di vê mijarê de hêna jî pirsgirêk hene. Dema ku yên karên înşayê dimeşînin hatine bicihkirin, plansazî û vesazî li gorî kar û rola civakî û îdarî nehatiye kirin, ev nehatiye esasgirtin. Kesên ku lazim e di pozîsyona pêşeng de bin di nava rêveberiyan de û di avaniya îdarî de hatine bicihkirin. Halbûkî ji bo karên îdarî agahiya pîşeyî pêwîst e, heta carina pisporî hewce ye. Ferd kirine berpirsên van karan û ji rêxistinbûna civakî dûr xistine. Tenê bi avaniya îdarî hatine sînordarkirin û mîna ku di vê qadê de hatine hepskirin. Lewma jî pêşengên esasî yên ku karên înşayê dimeşînin bêfonksiyon hatine hiştin û mîna ku hatine tasfiyekirin. Endamên komun û meclîsê yên hatine hilbijartin jî di ber karên îdarî, navendî û burokratîk de hatine erkdarkirin û di vê qada teng de hatine hepskirin. Di encam de pêşeng, kesên hatine hilbijartin, sazî û xebatkarên wan li gorî esasên komun, meclîs, akademî û koperatîfan nehatine bicihkirin. Vesazî û xebat jî li gorî vê nehatine plankirin.

Di Aboriya Civakî de cihê sanayiyê girîng e. Girîng e ku mirov ya heyî rêxistin bike, nû bike, pêş bixîne û ya tine jî ava bike. Xebatên sanayiyê dikarin di bin du serenavan de bên nirxandin. Yek; sanayiya bi destê civakê tê avakirin. Li Bakur-Rojhilatê Sûrî sanayiya giran tenê ji çend fabrîqeyan pêk tê. Bi giranî sanayiya biçûk e, cihên wekî febrîqe, şirîke, îmalatxane, tamîrxane û cihên cuda yên hilberînê ne. Em li vir yekser diyar bikin, ev kom wekî yekîtiyên pîşeyî di bin banê TEV-DEM'ê de hatine rêxistinkirin. Yekîtiyên heyî yên pîşeyî di piştevaniya komunal, hevpar, kolektîf de lawaz dimînin. Di nava piştevaniyekê de naxebitin, wisa hilnaberînin. Di hemû xebatan de tenê bi qadên xwe re sînordar dimînin. Ji ber ku danehevên wan ên sermayeyê, agahiyên wan ên pîşeyî û asta wan a hilberînê tenê bi wan re sînordar dimîne asta tê xwestin a berdariyê jî dernakeve holê. Lêhûrbûn, plansazî, proje û xebatên pratîkî yên bi naveroka piştevanî û yekîtiya hêzê pir sînordar û kêm in. Piştevanî, yekîtiya hêzê û kolektîvîte di asta şîrîkatiya kar a xwezayî de dimîne.

Di vê mijarê de Rêveberiya Xweser piştevaniyeke pir sînordar a qanûnî û fîîlî dide. Heta di burokrasiyê de û di mijarên cuda de hin astengî û pirsgirêk jî derdikevin. Sazî û kesên ku di nava xebat û berhemdariya sanayiyê de dixebitin, nikarin bi maliyeteke kêm hilberînin û nikarin bi fiyetekî guncav mal, malzeme û amûran temîn bikin. Ev rewş di kar û berhemdariyê de wekî ku "dixwazin kara herî zêde bi dest bixin" li gel diteyise. Ji gumrikan îxracat û îthalata bêpirsgirêk, temînkirina enerjiya ku ji bo meşandina şirîkan mecbûrî ye, dibin pirsgirêkên cidî. Bi rêka pergala navendî rewşên wekî kredî, deyn, hîbe, piştgirî çênabe. Di encam de

ev tablo derdikeve holê: Berhemdarî, qada kar û girseya sanayiyê ya ku takekesî, bi piştevaniya navmalbatî sînordar, parçeyî dimîne û di agirê xwe de dişewite. Sermaye, pîşe, danehev, tecrûbe-ezmûn û îmkanên din ên girseya sanayiyê hene, lê rêxistina wan tine ye. Ji ber vê yekê jî pir parçeyî û belave ne. Girêdayî vê yekê, pirsgirêka bêkarî û îstîhdamê jî derdikeve holê.

Ev encam ne tenê ji ber şer wisa ye. Civaka di nava şert û zirûfên şer de pêwîstiyê zêdetir bi fedakarî, piştevanî, rêxistinbûn, hişmendî û plansaziyê dibîne. Parastina welat vê yekê pêwîst dike. Ya ku nayê fêmkirin, ya ku nayê pratîkkirin ev e.

Dudu; xebatên sanayiyê yên girêdayî Rêveberiya Xweser e. Li Bakur-Rojhilatê Sûrî gelek kargeh, febrîqe, şirîkeyên ji rejîmê mane hene. Piraniya van di dema şer de derbe xwarine, hatine yexmekirin û bi demê re kevn bûne, jeng girtine û ji xebatê ketine. Ji van hin deverên girîng, hin febrîqe, şirîke, atolye û cihên cuda yên berhemdariyê hatin tamîrkirin û hatin xebitandin. Di rewşa heyî de ev qadên berhemdariyê bi kêm û kurtiyan jî be berheman didin. Berheman didin, hewl didin pêdiviyên gel li wê herêmê, li ser esasê çavkaniyên wir pêşwazî bikin. Hewl didin bi erzanî, bêyî ku maliyeta wê giran bikin hilberînin û bêyî ku bikevin pey hesabên kara azamî bidin bazarê. Pirsgirêka li vir ew e ku hin kes di pozîsyona "patron" de ne. Îdîa ew e ku bi peywendiya karker-patron wê xebata Aboriya Komunal Demokratîk bê meşandin. Di rewşên wisa de ji bo ku peywendiya karker-patron çênebe, mirov ji vê peywendiyê xelas bibe divê xebatkar bibin şirîkên destketiya maddî û manewî. Mirov kargehê bi rêbaza demokratîk bixebitîne û bi rê ve bibe. Ya ku rêxistina aborî û rêveberiya înşayê ya Bakur-Rojhilatê Sûrî nikare bike ev e. Dema ku rêveberiya demokratîk bê xebitandin, rêveberî hebe, însanên dixebitin bibin şirîkên dahatan (karê), wê komîteya aboriyê û di şexsê wê de rêveberiya Xweser ji pozîsyona peywendiya karker-patron derxîne. Bi vê rêbazê wê her kesên ku li febrîqeyê, kargehê, şirîkê dixebitin bibin xwedî kar. Wê xwe wekî xwediyê kar bibîne û wisa nêzî nirxên maddî û manewî bibe. Li vir wê ti kes bêmoral nexebite, wê ti kes zirarê neke, wê bibe komeke wisa ya kedkaran ku zêdetir bi hişmendî û berpirsiyariya welat û hilberînê dixebitin. Ev rêbaza xebatê çiqasî bê rûniştandin wê aboriya komunal û girêdayî wê pergala Xweseriyê jî ewqasî pêş bikeve. Di vê babetê de hin gav hatin avêtin, tên avêtin. Ev girîng e. Lê rastiyeke wisa jî heye ku em hêna di destpêka vî karî de ne.

Dubare jî be diyarkirina vê yekê wê sûdmend be; nuqteya ku nebesî tê de heye, rêxistinbûna civakê ye. Însanên xwedî pîşe dikarin li qadên kar li hev bên civandin û bi vî rengî pêşiya karên mezintir bên vekirin. Her xebatkar;

esnaf, yên xwedî pîşe, muteşebîs, pispor, endazyarên zireetê, veterîner (baytar) û têkildarî aboriyê hemû kesên xwedî pîşe dikarin ji vê rewşa parçeyî bên xelaskirin, bi rêxistinbûna koperatîfê ve veguherin rêxistinên kedê. Pîşesaz dikarin bên rêxistinkirin, di her mijarê de yekîtiya hêzê ava bikin, piştevaniya hev bikin û ji bo gelek pêdiviyên civakê bibin bersiv, berheman biafirînin. Di projeyên mezin de, ku hêza wan têrê nekir yan jî pêwîstiya wan çêbû, Rêveberiya Xweser dikare piştgiriyê bide û bi vî rengî karên mezin dikarin bi ser bikevin. Heman rêbaz di qada cotkariyê de, di bazirganiyê de û di her qada aboriyê de dikare pêk were. Komên hilberîner di qadên kar de, ku pê dizanin û tê de pispor in, dikarin bên birêxistinkirin û hedefên mezin dikarin pêk werin. Komun û meclîs, komîteyên rêxistinbûnê yên avaniya Xweseriyê dikarîbûn di vê plansaziyê de pêşengî bikirana û qada civakî ya aboriyê pêş bixistana. Di rewşa heyî de di vê qadê de bi zêdehî lawazî hene.

Rêveberiya Xweser, bi qasî ku budçeya wê têrê dike, navendî dimîne, bêyî ku avaniya meclîsê jî bixebitîne febrîqe, şirîke, çiftlikên cotkariyê û hwd. ava dike. Ev terzê rêxistinbûnê û xebitîna ekonomîk, ne civakî ye. Xebateke wisa ye ku li ser esasê rêbaz, terz û peywendiya patron-karker hatiye rûniştandin. Ev xebat ne demokratîk û komunal e. Li ser esasê zihniyeta kara azamî ye. Di vê maneyê de ne ekonomiye jî. Ji bo ku karibe bibe ekonomî lazim e terz, rêbaz, armanc û hedefa wê jî biguhere. Her ferdekî/e li wê kargehê dixebite wekî xwediyê/a wir berheman dide û li ser navê raya giştî lê xwedî derdikeve. Li ser esasê feyde û pîvana raya giştî dibin şirîkê/a dahata wê. Her xebatkareke/î li qada raya giştî dixebite dibe şirîkê/a kargeha xwe. Li cihê ku peywendiya patron-karker-kedkar, terz û rêbaza wê û kara azamî heye mirov nikare behsa raya giştî bike. Li wir mirov dikare bi navê raya giştî behsa mêtingeriya dewletê bike. Qet ferq nake bê asta wê, çawaniya wê, navê wê, sifatê wê û rêveberê/a wê kî ye. Ya ku li wir çêbûye û dixebite dewlet e, îqtîdar e û yekdestdarî ye. Di vê mijarê de qederekê nakokî û pevçûn hene. Doktrîna Ekonomiya Komunal Demokratîk wekî perspektîf tê bidestgirtin û lêgerînên ji bo çareseriyê jî tên pêşxistin.

Di Ekonomiya Komunal Demokratîk de cihê koperatîfê girîng e. Koperatîf yekser xebata gel e. Lêkolîn, proje û plansazî bi esasgirtina rêgezên ekonomiya komunal çêdibe, pêkanîna wê ya pratîkî jî bi rêbaza koperatîfan çêdibe. Ya ku lê hûr dibe, nîqaş dike, biryarê digire, pêk tîne û bi rê ve dibe jî gel bi xwe ye. Di vê maneyê de heta dawiyê demokratîk e. Koperatîf ne tenê rêxistinbûnên aboriyê ne. Di asta civak û koman de, hemû qadên jiyanê yên piştevaniyê yên wekî civakî, çandî, perwerde û hwd., ku rêxistinbûn û xebata

ekonomiyê dibe wesîleya wan, digire nava xwe. Di nava qada koma xwe de dikare xebatên civakî, çandî, perwerde û xebatên din jî rêxistin bike. Hêza pêşeng di pêşketina koperatîfan de di mijarên wekî îdeolojîk-polîtîk, jiyan, rêxistinbûn, perwerdeyê de rolê dilîze. Bi tena serê xwe nabe organê biryarê. Dihêle ku komun, meclîs, akademî û koperatîf hevdu temam bikin û bi vî rengî pergalê ava dike.

Beriya Şoreşê, rêxistin û xebatkarên Ekonomiyê têkildarî koperatîfên demokratîk ne xwedî ezmûn û tecrûbeyê bûn. Di rabirdûyê de neketibûn nava xebata koperatîfê. Agahî û daneheva teorîk di asta giştî de hebû. Xebatên koperatîfbûnê û tevgerên komunal ên li dinyayê hatibûn xwendin. Feqet bi van agahiyan ve di pratîkê de rêxistinkirina koperatîfan zor bû. Her wiha, ew firsend jî çênebibû ku karibin li derve li mînakên koperatîfê binêrin, lêkolîn bikin. Ji ber vê yekê nikarîbûn ji tecrûbeyên dinyayê jî bi têrkerî feyde bigirtana. Rêxistina aboriyê bi neçarî hewl da tişta dizane pêk bîne. Tiştên ku dizanin jî ji bo vê qad û xebata dêwasa ne têrker bûn.

Em dikarin li encamên pratîkî yên heta niha derketine holê binêrin û wisa bibêjin: Di pratîka Rojava de ji bo koperatîfan hin gav hatine avêtin. Encax ji bo pêdiviya civakî nebûye bersiv. Yanî modela aboriyê ya ku karibe xweseriya Bakur-Rojhilatê Sûrî temsîl bike pêk nehatiye.

Em hinekî din girêdayî rabirdûyê lê bikolin; bi navê koperatîfê bi sedhezaran donim erazî bi kirêyeke pir kêm li gelê feqîr û malbatên şehîdan dihat belavkirin û ji vê re jî koperatîf dihat gotin. Li gorî siyaseta aboriya civakî, mirov ji bo xebitînê xakê bide gel ne şaş e. Tabî heger kara azamî tê de tine be û li gorî usûlê aboriya komunal be, divê xak li gel bê belavkirin. Di vê çarçoveyê de pêdiviyên wekî av, xak, enerjî, kredî û hwd. dikarin bên pêşwazîkirin. Encax avakirina koperatîfê, xebitandina koperatîfê xebateke din e. Bêyî ku amadekariyeke binesaziyê hebe, lêkolîn hebe, proje hebe, bi agahiyên seranser, bêyî ezmûn û tecrûbe xebatên wisa tên meşandin. Di hin qadên kar de bêyî ku plansazî çêbibin, parên (hîsse) biçûk wekî sermaye li hev tên komkirin û tên razandin. Însan mîna ku pereyan li borsayê dirazînin, li van plan û projeyan dirazînin. Bi vê sermayeyê hewl didin koperatîfan ava bikin. Di vê rewşê de, heger li gel koperatîfekê tecrûbe, agahî, ezmûn tine be wê serketî nebe, ev yek eşkere ye. Di encam de xebatên wisa ji derveyî bidestxistina ezmûn û tecrûbeyê serketî nebûne û li gel vê jî neserketîbûn wekî para terzê koperatîfê hatiye dîtin. Halbûkî xebatên hatine meşandin ne li gorî esasên koperatîfê ne. Em wekî mînak bibêjin; par hatine komkirin, razandina wê çêbûye, girse li hev hatiye komkirin, lê meclîs (lijneya giştî) û saziya girêdayî wê nehatiye

çêkirin. Yanî lijneya giştî, rêveberî, dîsîplîn, kontrol nehatiye avakirin, li cihên hatine avakirin jî nehatine xebitandin. Bi terzekî antîdemokratîk xebitîne, navendî mane û xwestine bi vî rengî encamê bigirin. Rêzikname û esasên xebatê nehatine amadekirin, ji ber vê yekê jî nehatine pêkanîn. Yanî xebateke ketober (çawalêhato) çêbûye. Xebat û rayeyên komê, gel mîna ku li cem pêşeng kom bûne. Pêşengên koperatîfê çi gotine wekî biryar hatine fêmkirin û hatine pêkanîn. Halbûkî ked, sermaye, avaniya rêxistinî aîdî gel bûya wê encam cuda bûya. Dema ku wisa nebûye asta xwedîderketina li koperatîfan jî lawaz maye. Ev xebat hemû bi niyeteke baş hatine meşandin û xwestine bersivekê bidin dîrokê. Feqet encama derketî qet wekî niyetê rû nedaye.

Di rewşa heyî de koperatîf bi giranî li ser esasê kedê tên avakirin, hewl tê dayîn bê avakirin. Nebes jî be tecrûbe û ezmûnek çêbûye. Dikare bê gotin şaşiyên berê wekî berê ne zêde ne. Me li jor jî diyar kiribû; di koperatîfê de ked û sermaye aîdî endaman dibe. Rêxistinkirin, berhemdarî, firotin, bazarî û xebatên din ji aliyê endaman ve tên kirin. Ev rewş dikare li gorî kar û erkê biguhere. Di seranserî koperatîfê de ya ku lazim e esas bê girtin serweriya endam e. Ji ber xebatên têkçûyî yên di rabirdûyê de hatibûn ceribandin, li beramberî koperatîfan eleqeya gel kêm bûye. Ji ber ku feqîr e û bi budçeyeke sînordar debara xwe dike heta ku garantiyê negire naxwaze bikeve nav xebatên mîna koperatîfê. Naxwaze çend qirûşên xwe yên heyî jî bixe rîskê. Heta ji ber ku hin însan bi dahateke rojane debara xwe dikin ji derveyî keda xwe ti tiştekî ku karibe di koperatîfê de razîne tine ye. Ji ber vê yekê jî bêyî ku tevkariyeke maddî bike, tenê li ser esasê kedê dixwaze bikeve nav koperatîfan. Heta li beramberî kedê mûçe tê xwestin. Ev jî têrê nake. Girseyeke pir feqîr heye, ku dixwaze beramberî keda xwe rojane mûçeyan bigire. Wek nimûne; karkerên rojane yên ku bi keda xwe ya rojane debara xwe dikin wisa ne. Komîteyên ku xebata koperatîfê dimeşînin ji ber ku hewl didin beşa herî feqîr a civakê rêxistin bikin neçar dimînin ji vê pirsgirêkê re çareyê bibînin û wisa rêxistin bikin. Di nava gelek koperatîfan de, sermaye, mekan û hemû lêçûnên din ên maddî aîdî Rêveberiya Xweser e. Bi şertê ku kolektîf bixebitin, li ser rêjeya wê ya karê ev kom dikarin li ser projeya koperatîfê li hev bikin. Di nava hin koperatîfan de endam bi keda xwe û bi qismî jî be bi sermayeya xwe tevlî dibin. Qezenca bê, li gorî potansiyela dahatê di koperatîfan de bi rêbaza kredî û deyndarkirinê dikarin bên xebitandin. Di vê rewşê de nêzîkatiya ku di rêxistinbûna koperatîfê de esas tê girtin ew e ku li gel endaman aîdiyeta kar û xwedîderketin bi pêş bikeve. Ji bo vê yekê jî bi qasî mimkun e tê xwestin ku tevkariya maddî bikin, di rêveberiyê de cih bigirin, bi rêbaza

demokratîk xwe bi xwe bi rê ve bibin, di nava hemû xebatên koperatîfê de cih bigirin. Yanî wê bizanin ku xebatkar, îdarekar, rêveber, hilberîner, tucar pêwîst e ew bi xwe bin û vê bibînin. Dîsa wê bi hewldan û hunera xwe ve bazirgan, komîsyonker û sîmsar ji navberê derxînin.

Yek ji xalên girîng jî ew e ku Rêveberiya Xweser ji xwe re rêgezên Aboriya Komunal esas bigire û nîşan bide ku ew li gel endam û xebatkarên koperatîfê ye û koperatîfê jî di vê mijarê de qeneh bike. Di encam de rêbaza ku di rêxistinbûnên koperatîfên heyî de tê bikaranîn ew e ku rêxistinbûnên civakê û komên xweser di warê îdeolojîk û polîtîk de karibin bigihêjin Rêveberiya Xweser. Yanî mirov karibe bi rêbazên demokratîk û komunal ji bo pirsgirêkê çareseriyê bibîne û rêxistinbûna wê ava bike.

Dema ku xebat tên meşandin bêguman hin pirsgirêk derdikevin, wê derkevin. Encax ji ber ku di asta rêgezên bingehîn de şaşiyeke cidî çênebûye xebata koperatîfê jî bi awayekî çêkertir didome. Ya herî girîng jî ew e ku li pêşiya me pêvajoyeke ku ji bo pêşketinê vekirî heye. Di vê salê de (2023) û di salên pêş de wê projeyên têkildarî cotkarî, ajaldarî, enerjî, sanayî û qadên din ên aboriya civakî hebin, ku hemû Bakur-Rojhilatê Sûrî digirin nava xwe. Ev proje wê bi giranî bi rêxistinbûnên koperatîfê bikevin meriyetê. Di vê mijarê de jî amadekariyên cur bi cur hene.

Wekî çawa di giştî de wisa ye, di aborî û koperatîfan de jî xebata perwerde û akademiyê stratejîk e. Xebata Aboriya Komunal perwerdeya xweser a têkildarî qadê mecbûrî dike. Pir zehmet e ku mirov karibe bi agahiyên heyî aboriyê fêm bike û pratîze bike. Hêz û derdora ku berpirsiyariya avakirina qada aborî li xwe girtiye ji ber ku di nava mijûlahiyê de nikarîbû xwe perwerde bike nikarîbû heq ji meseleyê jî derketa. Her wiha, welatparêzên ku dilsoz in, dildar in û dixwazin tevkariyê bikin jî nehatine perwerdekirin. Ev însan ji bandora maddiyatê nehatine xelaskirin û girêdayî nirxên manewî yên şoreşê nehatine kirin. Di vê maneyê de ji bo ku karibin bibin welatiyên azad û welatparêzên berpirsiyar ya hewce nehatiye pêkanîn.

Akademiyên heyî û asta perwerdeyê têrê nekiriye ku karibe potansiyela heyî perwerde bike. Di vê maneyê de pêdiviya perwerdeyê jî nehatiye derbaskirin. Yên hatine hilbijartin, rêveber, xebatkarên di avanî û saziyên îdarî de, welatparêzên xebatan dimeşînin ji ber ku nehatine perwerdekirin bi awayekî objektîf li pêşiya avabûna pergala Ekonomiya Komunal wekî asteng mane. Lewma jî di perwerdekirinê de nebesî hene. Welatparêzên ku di saziyên aboriyê de dixebitin xwedî pozîsyoneke girîng in. Xwedî pozîsyoneke wisa ne ku îro bêbandor in, lê ji bo siberojê wê rêveberên çalak bin. Herî kêm

pêwîst e mirov wisa bibîne û wisa binirxîne. Em yekser bibêjin, ne wekî berê ye, lê gelek însanên me yên dixebitin bê perwerde ne, bê tecrûbe ne û ne di ferqa berpirsiyariya cihê xwe de ne. Hejmara kesên ku difikirin ji ber mûçeya xwe li wir cih digirin û wisa bêberpirsiyarî nêz dibin ne kêm in. Ev derdor xwe wekî memûrên ku bi mûçeyan di nava "dewletê" de dixebitin dibîne. Di warê avakirina demokratîk a pergalê de ev nêzîkatî gelek pirsgirêkan diafirîne. Bi heman rengî, dema ku Neteweya Demokratîk û Pergala Aboriya Komunal Demokratîk wekî "dewlet" û "îqtîdar" bê şîrovekirin, bibe sedema şîroveyeke wisa, ev ê ji bo xwezayê, civakê, kedê, exlaq, polîtîka, dîrok, heqîqet û Tevgera Azadiyê bibe neheqiya herî mezin.

Eşkere ye, di nava xebatên aboriyê de jin tine be, wê ew xebat nebe xebateke civakî, ekolojîk, komunal, demokratîk û azadiya jinê dixwaze. Jin di aboriya civakî de pêşeng e. Li ser vî esasî berpirsiyariyê digire. Jin di Şaristaniya Demokratîk de sûbjeya civakî ye. Wekî xwezayê ye. Pênaseya Kurdan a ji bo xweza û xweda û ji bo pênaseya jinê di nuqteya jiyana xwezayî de digihêjin hev, eynî dibin. Jin tîne dinyayê, mezin dike, bi kedê dide nasandin, perwerde dike, bi exlaq dike, çandê bar dike, civakî dike, rêzdar dike, ziman û aqil dide. Jin-dayika ku civakê bi ked û aboriyê didomîne li ser vî bingehî dibe nûnera Şaristaniya Demokratîk. Di nav Kurdan de jin; ruxmî hemû şêwazên desthilatdariyê jî nûnertiya binesaziya çandî ya Neteweya Demokratîk dike. Civaka xwezayî û aboriyê bi jiyan û çandê dide jiyandin, xwedî pozîsyoneke wisa ye.

Li Bakur-Rojhilatê Sûrî di rêxistinkirina qada aborî de tecrûbe, ezmûn û rêxistinbûna jinê jî çêbûye û girêdayî van li pirsgirêkan jî rast hatiye. Di merheleya heyî de di mijarên cuda de pêşketinek çêbûye. Di qadên xebata aboriyê de nûnertiya jinê tevî kêm û kurtasiyan jî pêk tê. Di vê mijarê de hestyarbûneke mezin çêbûye. Her diçe bi sazî dibe. Her diçe jin zêdetir eleqedar dibin ku tevkariyê bi xebatan bikin û berpirsiyariyê bigirin. Di aboriyê de asta çawanî û nûnertiya jinê jî pêş dikeve. Biçûk jî be hin projeyên xweser jî tên pêşxistin. Tiştên ku em diyar dikin bi maneya amadekariya ji bo siberojê ne, wekî binesaziyê ne. Feqet rewşên neyênî yên ku me ji bo aboriya giştî diyar kirin hene û di qada civakî de lêkolîn, proje û plansaziyên ku bikaribin li ser eksenê jinê ji bo rêxistinbûna xweser bibin binesazî çênebûne.

Pirsgirêkên aboriyê yên jinê bi rêxistinbûna xweser bi qismî dikarin bên çareserkirin. Di nava giştî de jî wê çareseriyên qismî pêş bikevin. Encax çareseriya kokdar; bi rêxistinbûna aboriya civakî ya giştî û xweser dikare pêkan be. Li vir, asta hevtemamker a pergalî ya herdu rêxistinbûnan wê pirsgirêkê çareser bike. Di rewşa heyî de jin di nava rêxistinbûna giştî de

hewl dide di mijara aboriyê de xwe ava bike. Ev girîng e, lê teng û seresere dimîne. Hewldana ku dixwaze di nava aboriya giştî de hejmara jinên xebatkar zêde bike, hevserokatiyê pêş bixe, di nava xebatên pratîkî de cih bigire girîng e. Feqet berpirsiyariya dîrokî ya jinê heye. Pêwîst e di aboriya komunal de pêşeng be. Her wiha, di nava giştî civakê de ji bo ku jin rolê bigire hestyariyek jî çêbûye. Ev jî pêşketinek e. Di giştî aboriyê de jin cihê xwe digirin. Di hin qadên kar de jin zêdetir çalak e û bi pozîsyona pêşeng radibe. Nebes jî be projeyên xweser tên pêşxistin. Xebatên aborî û koperatîfên wisa hene ku tenê jin tê de cih digirin, pêşengiya wê dikin, berpirsiyariya wê ya pratîkî radikin. Rêbaza koperatîfê ya ku me li jor behsê kir di projeyên xweser de zêdetir tên pêkanîn. Sedema wê jî ew e ku jin di warê tevkariya maddî de zêdetir bi pirsgirêkan re hevrû dibe. Di xebatên aboriya Rojava de pêşiya jinê vekiriye; îmkan heye ku xwe di zanebûn, danehev, tecrûbe, ezmûn û hwd. de pêş bixîne û ji bo pirsgirêkê bibe bersiv.

Di vê mijarê de xebatên perwerdeya taybet û xweser dikarin bên pêşxistin. Di perwerdeyan de mirov dikare giraniyê bide ser jina pêşeng. Hêza jina herêmî ya ku wê pêşengiyê bike dikare zêdetir bê pêşxistin. Di vê mijarê de potansiyel heye. Bi lêkolînan dikare hawizekî daneyan bê avakirin. Girêdayî van daneyan projeyên mayinde û demdirêj bên pêşxistin dikare encamgir be. Ji bo vê yekê lazim e xebatên lêkolîn û pêşxistinê bi sazî bibin. Bi vî rengî mirov dikare li Bakur-Rojhilatê Sûrî pirsgirêkên aboriyê yên jinê tespît bike û projeyên çareseriyê pêş bixîne. Heta mirov dikare îmkan û derfetên Bakur-Rojhilatê Sûrî binirxîne û ji bo rêxistinbûna jinên Kurdistanî yên ku li çar parçe Kurdistan û li deverên cuda yên dinyayê belav bûne piştgiriyê bide û pêşengiyê bike.

Li Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrî yek ji astengên herî girîng a li pêşiya Pergala Aboriya Komunal Demokratîk jî beşa tucaran e. Hem asteng e hem jî beşeke wisa ya civakî ye ku li benda rêxistinbûnê ye. Tucar; ji ber pîşe, kar, feraset û karaktera xwe li pey Kara Azamî ye. Di her şert û mercî de dixwaze zêdetir qezenc bike. Bi qasî ku exlaqî, wijdanî, civakî û neteweyî bibin ewqasî jî sûdmend dibin. Tucar û ticaret bi vesaziyên qanûnî dikarin ji pozîsyona kara azamî bên derxistin. Berevajî vê bibe, wê tenê bi zihniyeta kara herî zêde tevbigere û di her dem û şertî de bi pozîsyoneke dijber derkevin holê. Wê di hevkariyê de israr bikin û zêdetir dijber bibin.

Beşeke ji tucaran, bi awayekî sûbjektîf dijber in. Yanî tercîha xwe bi zanebûn dikin, dijberiya îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk, pergalî dikin û dikevin nav xebatên dijminane. Li gel dewleta Sûrî, Tirkî, Îran, Iraqê û hêzên din ên navneteweyî dixebitin, hevkariyê dikin, di nava vê rêxistinbûnê de li ber Neteweya

Demokratîk û Pergala Aboriya Komunal dibin asteng. Ev beşa tucaran ku bi mêtingeriya ekonomîk re hevkariyê dike, di nava civakê de beşeke wisa ye ku herî zêde ketiye pey kara azamî, çavbirçî ye, sînor û pîvanekî exlaqî nas nake. Serkêşên jirêderketinê ne. Li gel mêtingeriya ekonomîk hevkariyê dikin û hewl didin aborî û bazirganiya Rêveberiya Xweser bi xwe ve girê bidin. "Ji bo ji sedî dehekî (10) bi ewle pê razî ye li her derê bixebite; ji sedî 20'ê mîsoger madê wî vedike; ji sedî 50 derfehatî (kustex) dike, ji sedî 100 hemû yasayên însanî dide binpêkirin; bi kara ji sedî 300'î, îhtîmala daliqandina xwediyê wî jî tê de hebe, ti cinayet tine ye neke, ti talûke tine ye nekeve navê." (I.J. Dunning)

Tiştên ku li jorê hatin diyarkirin rewşeke taybet îfade dikin. Tabî ji bo vê yekê tedbîrên pêwîst tên girtin. Feqet dema ku mirov bi awayekî giştî nêzî meselê dibe tedbîra herî girîng û mayinde ew e ku qad bê birêxistinkirin. Bazirganî û bazirganê ku di çarçoveya Xweseriya Demokratîk de nehatibe rêxistinkirin nikare bê kontrolkirin û nakeve bin xizmeta pergalê. Di her dem û şertî de wê bibe talûke. Di rewşa heyî de li Bakur-Rojhilatê Sûrî ticaret û tucar bêrêxistinî ne. Lewma jî bê kontrol in. Halbûkî beşa tucaran û qada bazirganiyê avaniyeke girîng a civakî ye û divê were rêxistinkirin. Bazirgan ne ji derveyî çarçoveya rêxistinbûna Neteweya Demokratîk e. Di nava potansiyela rêxistinbûna ekonomîk de cihê xwe digirin. Her çiqasî li ser vê qadê lêhûrbûnên rêxistina aboriyê ya Rêveberiya Xweser hebe jî ne xwedî projeyên berfireh û pêkan e. Pêwîst e ji bo pirsgirêkê çareseriyeke komple, di warê pergalî de bê peydakirin. Ev lêgerîn û hewldan pir sînordar e.

Nêzî heft sal in Yekîtiya Bazirganî û Sanayiyê hatiye avakirin. Xebata esasî ya yekîtiyê ew e ku di nava Wezaretê de xebatên bazirganî û sanayiyê bi kareke zêdetir û bi leztir bide meşandin. Yanî di burokrasiyê de xebatan hêsan dike. Xebateke bidestxistina kara azamî ye. Halbûkî di nava aboriya civakî de karê yekîtiyê ew e ku di vê qadê de piştevaniyê û yekîtiya hêzê pêş bixîne û projeyên mezin bixe meriyetê. Biserxistina wan karan e ku kesek nikare bi tena serê xwe bike. Di nava piştevaniyê de ev potansiyela bêbandormayî bikeve meriyetê wê di gelek mijaran de serketin çêbibin. Bi milekî jî ev derdorên kar wê bi koperatîf, piştevanî û yekîtiya hêzê ve ji bo aboriya komunal, bazara civakî bên qezenckirin. Meşandina nîqaşan, lêhûrbûn, pêşxistina projeyan, berpirsiyariya beramber nehatiye pêşxistin. Rêxistina Aborî û TEV-DEM di vê mijarê de pêwîst e bi rola pêşengiyê rabin, lê belê tê de rola xwe nelîstine. Di encam de hewce dike ku

qada bazirganiyê û beşa bazirganan hem di warê ekonomîk de hem jî di warê polîtîk de bên birêxistinkirin. Berevajî vê, her biçe wê zêdetir serêş çêbibe û zêdetir pirsgirêkan biafirîne. Wê bi awayekî objektîf îmkan bê dayîn ku ev beş li ser serê civakê mijokdariyê bike. Ji bo mêtingeriya ekonomîk wê zemîn bê vekirin.

Encam

Avakirina pergalê rêxistinbûna komple îfade dike. Rêxistinbûna aboriyê jî li ser vî esasî û di vê çarçoveyê de pêwîst e bi komîteyên din re peywendîdar be. Aboriya Komunal Demokratîk di asta pergalî de rêxistin dike û di avakirina neteweya demokratîk de bi roleke temamker radibe. Her komîte di astên cuda de bi aboriyê re peywendîdar dibe. Di astên cuda de û bi terzê dizanin hewl didin aboriyên xwe yên pêwîstiyê pê dibînin rêxistin bikin. Bi vî şeklî carina li derveyî rêgezên Aboriya Komunal Demokratîk dimînin. Ji ber vê yekê Komîteya Aboriyê ewilî pêwîst e di mijara sererastkirina feraset, terz û rêbazê de hestyar be. Divê bi rê û rêbazên cuda karibe piştgiriyê bide komîteyan û wan girêdayî rêgezan bihêle. Heta pêwîst e karibe di vê mijarê de pêşengiyê bike. Heger karibe peywendiyên xwe yên bi TEV-DEM, Şaredarî, Maliye, Ekolojî û komîteyên wekî van re xurttir bike wê encamgiriya wê jî zêdetir bibe. Jixwe ew û komîteya aboriyê ya jinê bi hev re dixebitin. Ji bo xebatên ekonomîk ên ku divê bi hev re bên meşandin karibe lêkolîn, proje û plansaziyan amade bike wê karibe encamên girîngtir bi dest bixe. Di mijarên wekî sanayî, bazirganî, zîreet, cotkarî, avahîsazî, veguhestin, ajaldarî û hwd. de wê piştevaniyeke kolektîf derkeve holê. Xulase, Komîteya Aboriyê bi peywendiyên di navbera saziyan de armanc dike ku Pergala Aboriya Komunal bê avakirin û di înşaya Rêveberiya Xweser de rolê bigire.

Rêxistinbûna komun, meclîs, akademî û koperatîfê esas bê girtin avakirina aboriya civakî di asteke mezin de dikare pêk were. Bi qasî ku rêgezên Ekonomiya Komunal Demokratîk (wekî ekolojîkbûn, azadîxwaziya jinê, alîgiriya bazara civakî, dijberiya kara azamî û endustriyalîzmê) jiyanî bibin wê aboriya têra xwe dike pêş bikeve û înşa pêk were. Bi qasî ku bi avaniya giştî re hevdu temam dike wê civak karibe xwe bi xwe bi rê ve bibe. Pergala Konfederal a ku di Bakur-Rojhilatê Sûrî de bê avakirin wê bandorê li hemû Rojhilata Navîn bike û azadiya gelan bîne.

# HEYVANÊ CIVAKÎBÛNA NÛ; AKADEMIYÊN CIVAKA DEMOKRATÎK

**Însan, wekî hebûna civakî, encax dema ku qalikê xwe yê tê de ye nas bike dikare maneyê bide hebûna xwe. Civak di vê maneyê de ji bo her însanî/ê şekil, formekî wisa ye ku tê de digihêje maneya jiyanê.**

HEVALA MELSA

Demên em tê de ne demên ji nû ve bimanekirina jiyanê ne. Manedayîn di heman demê de fêmkirina jiyanê ye. Manedayîna jiyanê ew e ku însanê çalak hayjêhebûna xwe datîne holê. Însanê di ferqa xwe de di heman demê de ew însan e ku bi jiyanê maneyê dide qezenckirin. Bi mêzekirineke gerdûnî, hebûna ku hewl dide maneyê bide jiyanê însan bi xwe ye. Cureyê însan ê ku herî kêm hewldana manedayînê bi fikra xwe datîne holê bi jiyanê re qezenc dike. Di felsefeya "Jiyan dema tê jiyîn nayê fêmkirin" de nakokiya di navbera mane û jiyanê de di civakîbûna însan de wekî 'azadî' dikare bê bidestgirtin. Nakokiya di navbera jiyan û maneyê de, dema ku

jiyan tê jiyîn nayê fêmkirin, nîşan dide ku însan hêna di kêliyê de negihiştiye hêza maneyê. Perwerde, çalakiya ku hêza maneyê bi jiyanê qezenc dike û dide qezenckirin, di vê maneyê de di civakîbûna însan de asteke girîng e.

**Perwerde Ew Çalakî Ye Ku Hişmendiya Jiyanê Dide**

Civakîbûnê, ku rêxistinbûna biwatekirina jiyanê ye, xwe di hafizaya dîrokî de wekî "Jin-Jiyan" ava kiriye. Ev formul, ku behsa çalakiya civakîbûna herî bingehîn dike, hîmê têgihandina yekemîn a civakîbûnê û paradîgmaya yekemîn a civakê ye. Ev formul, ku hişmendiya civakîbûnê ye, di înşaya civakê de wekî fikra yekemîn jî tê qebûlkirin. Biwatekirina hebûna xwe, yanî jiyana xwe, li dora jin-dayikê pêk hatiye. Naxwe perwerdeya yekemîn a jiyanê li ser bingehê fikra jin-dayikê ye. Dûrbûn an jî qutbûna ji vî fikrî tê maneya jiyaneke bêmane.

Di warê têgînî de perwerde, bi însan dana qezenckirin, di hafizayê de bicihkirin di domahiya pêvajoya civaka xwezayî de çêbûye. Li ser vî bingehî armanca bingehîn a perwerdeyê manedayîna jiyanê ye. Însan, ku maneyê bi jiyanê dide qezenckirin an jî maneyê didiyê, fikra ku wekî civakê jiyanê bide domandin qezenc kiriye. Pêvajoya civakîbûna gund-cotkariyê ya bi zihniyeta civaka jin-dayikê, ku karîbûye di nava pêvajoyên avabûna civakî de xwe bigihîne vê hişmendiyê, di heman demê de îfadeyeke wisa ye ku her însanekî/ê xwe gihandiye asta zanatî, zanyarî û fezîletdariyê. Rastiya wê, (ya ku ji civakê ne qut, xwe aîdî gerdûnê dibîne, li ser bingehê yekparebûna bi civakê re maneyê dide hebûna xwe û wisa dijî, rêzikên xwe yên exlaqî di civakîbûnê de derdixîne holê, li ferdbûna xwe di nava civakîbûnê de digere û dibîne), di heman demê de hêza wê ya civakbûnê bû.

Di formê civakî ya jin-dayikê de rêbazên wisa tên bikaranîn ku di asta herî jor de hemû fezîletên afirîner derdixîne holê û hişmendiya civakî bi ferd dide qezenckirin. Feraseta jiyanê ya bi wateyê hatiye strandin esas e. Mane, bi pratîka jiyanê pêk tê. Ev hestê heqîqetê bi saziyên şênber ên civakê ve digihêje avaniyê. Daxwaza ku jiyanê li heman erdnîgariyê dide domandin, dema ku pêdiviya naskirina mekanê heyî derdixîne holê xisletên ku însan dike însan û ji zindiyên din cudatir dike dike bîr û hafize. Dema ku hişmendiya bihevrebûnê û licemhevbûnê bû civak û wekî heqîqetekê di zihnê de xuya kir belkî jî perwerdeya yekemîn temam bibû. Dema ku civak xwe îfade dike yan jî xwe pênase dike, binasnamekirin bi tevkariya li jiyanê tê diyarkirin. Pêvajoya ku civak bûye civak di heman demê de wê wexta ku ferdên civakê maneyê qezenc dikin jî digire nava xwe. Dema ku ferd dibin xwedî hîşmendiyeke wisa ku bi civaka xwe dikarin maneyê qezenc bikin, pêşiya afirînerî û pêşketinê jî vedibe.

Pêvajoya ku civak dibe civak di heman demê de çalakiyeke wisa ye ku ferd xwe bi civakê re diafirîne û dikeve pey azadiyê. Civakîbûna di nava gerdûnîbûnê de bi maneyekê jî pêvajoyeke wisa ye ku civak li xwe vedigere, dibe ya xwe, pêvajoya xwebûnê ye. Pêvajoya xwebûna civakê diviyabû hem li gorî rêgezên pêşketina gerdûnî mîna hebûnên din li gorî rêzika girêdana bi hev bûya hem jî ji bo têkoşeriya avakirina ferqa xwe şahidî bikira. Bi vê maneyê perwerde dibe wextê xweavakirinê. Di nava vê pêvajoyê de hem hewl dide bibe civaka ku tê de maneya jiyanê his dike hem jî xweseriya xwe ava bike û li dijî eynîbûnê bikeve nava guherînê. Pêwîst e ev yek wekî taybetmendiyeke girîng a civakîbûnê bê dîtin. Ev xislet bi xwe dibe perwerdeya herî bingehîn. Wê çaxê mirov perwerdeyê bi civakîbûnê bide destpêkirin wê şaş nebe. Perwerde, bi kurtî wekî çalakiya civakîbûnê dikare bê pênasekirin.

Mekanê esasî yê perwerdeyê, ku bi civakbûnê dest pê kiriye, mîsoger Rojhilata Navîn e, ku lê ji aliyê civaka xwezayî ve şoreşa gund-cotkariyê hatiye kirin. Ev xakên ku jiyanê bi civakîbûnê mane qezenc kiriye, ji ser eksen û zihniyeta jiyana jin-dayikê şemitî û ket nav paşdeketineke yekalî, bêhevsengî û di eleyhê de. Heqîqeta xwebûnê ya li ser bingehê çalakbûna perwerdeyê, êdî paşde ket, parçe bû, eynî bû, jiyan bêmane bû. Rojhilata Navîn cihekî wisa ye ku bi qasî jiyan di zihniyeta însan de bi mane bûne, her wiha bûye cihê ku jidestdana maneya jiyanê dest pê dike. Însan, ku li gorî rêzikên pêşketina gerdûnî di formê civakê de bûye xwedî hebûn, dîsa li gorî pêwîstiya diyalektîka xwe ya pêşketinê ji hebûnên din jî di çarçoveya qezenckirina maneyê de bandor bû. Di nava pêvajoya jiyanê de ku di formê civakê de bi mane dibe, ji zihniyeta jin-dayikê ber bi avaniya civakê ya yekmilî ya li ser bingehê cinsê zilam ve guhertin çêbûye. Avaniya civakî ya yekmilî, ya li ser yek cinsî ewilî parçebûna di zihniyetê de daye destpêkirin. Parçebûna zihniyetê di avakirina avaniya civakî de jî teyisiye û li ser hemû têgihana jiyanê bi bandor bûye. Yekemîn têgihana jiyanê dema ku hest û fikir di asta optîmal de pêş ketine pêk hatiye. Dema ku yek ji dîlemayên bingehîn li ser a din zextê dike, ev yek ji ber ku hevsengiyê xera dike wê çaxê jiyana nakok bi têkoşîna ku wê di eleyh û leh de bê meşandin dewam dike. Wextê ku asta maneyê di mejiyê însan de bi fikrê re şênber dibe, di warê çalakiyê de rêxistinbûna pratîkî derdikeve holê. Di vê maneyê de rêxistinbûna civakê bi qasî ku ji bo cureyê însan hinceta hebûnê ye, her wiha di pêşketina gerdûnî de jî, ku bi qasî em dizanin yan jî bi qasî têgihana me têrê dike, nûnertiya asta herî jor a pêşketina heyî dike. Lewma mirov dikare bibêje karaktera pêşketinê ya di diyarkeriya yekcinsî de zexta li ser zihniyeta azad e. Bandora neyênî ya ku ev zext li ser têgihan û hestan çêdike jî ew e ku însan xwe sînordar dike, alûde

dibe, biyanî dibe, tenê li ser esasê analîzê tê digihêje û matematîkî difikire. Teyisandinên wê yên sosyolojîk jî ew in ku li gel xwezayê jiyana hevaheng pêk nayê, zêdegavî çêdibin, roleke zêde li razberiyê tê barkirin, olperestî, qirkirina civakê, desthilatdarparêziya cinsê zilam a ku bi koletiya jinê dest pê kir, bisazîbûna dewletê ya ku piştî bisazîbûna sermiyantiya malê dest pê kir û rêxistinbûna artêşê ye, ku rêxistinbûna şîdetê ye.

Pêwîst e xebatên avakirina civakê li ser esasê rastiyên dîrokî dest pê bikin. Ev rastiya bingehîn pirsgirêka fêmkirina civakê jî bi xwe re tîne. Heger însan karibe hebûna xwe bi civakê re nas bike yan jî bixwaze pênase bike, pêwîst e ji bo fêmkirina civakîbûna ku di nav de dibe xwedî hebûn hewl bide. Însan, wekî hebûna civakî, encax dema ku qalikê xwe yê tê de ye nas bike dikare maneyê bide hebûna xwe. Civak di vê maneyê de ji bo her însanî/ê şekil, formekî wisa ye ku tê de digihêje maneya jiyanê. Hişmendiya ku ev form çawa ye yan jî pêvajoya qezenckirina vê hişmendiyê perwerde ye. Perwerde jiyana bi hişmendî ye ku li ser esasê agahiya xwebûnê ye. Ji bo agahiya xwebûnê dîrok dikare bê gotin. Çalakbûna ku agahiyê vediguherîne hişmendiyê jî fêrbûn e. Ji bo vê hewldan, ked, sebr, azwerî û azm hewce ye. Çalakiya ku di encama vê hişmendiyê de tê pêşxistin jî çalakiya rêxistinbûnê ye. Formê civakê di van merheleyan re derbas bûye û xwe rêxistin kiriye. Ev jî îfadeya yekparebûna hest-fikir-çalakiya azad e. Lewre jî pêwîst e mirov di nava vê yekparebûnê de li karektera esasî ya perwerdeyê bigere.

Di nava dîroka civakî de peywendiya yekpare ya di navbera civak û civakîbûnê de bi civakîbûna gund-cotkariyê tê îfadekirin. Di vê merheleya civakîbûnê de fikra xwezayî serwer e û zihniyeta înşaya sosyolojîk û xweza yekpare ne, yanî hewl dide yekparebûna bi xwezayê re xera neke. Her kî vê yekparebûna bi xwezayê re xera bike li derveyî civakê dimîne. Derketina derveyî civakê jî vegera li heywanbûnê ye. Yên ku naxwazin paşde vegerin yan jî ditirsin paşde bimînin çaxa ku ev rêgez bi cih anîn tevlî exlaqê civakê dibin. Yên ku jiyana bi exlaq hildibijêrin wekî endamên civakê tên qebûlkirin. Li vir rêgeza hilbijartina azad tê pêkanîn. Pêkanîna vê rêgezê bi qasî ku ji bo civakîbûnê mecbûrî ye, her wiha ferqa cureyê însan û zindiyên din jî datîne holê. Naxwe armanceke bingehîn a hebûna rêzik yan jî rêgezên exlaqî heye. Ev armanc jî rêxistinbûna bi halê civakê ye. Cureyê însan encax dema ku xwe bi halê civakê bi rêxistin kir, jiyaneke bi vî rengî hilbijart an jî pê hesiya ku jiyaneke wisa jê re hestê bextewariyê, hestê heyecanê, hestê hezkirinê tîne jiyan zêdetir hembêz kiriye. Bi enerjiya ku cewherê xwe ji xwezayê digire, şadîmaniya xwe bi stranan aniye ziman û bi evîn û bengî nêzî jiyanê bûye. Di nava hewldanên xwedîderketina li jiyana helbestî de her tim têkoşîn meşandiye.

Wate, bi peywendiya di navbera însan û însan de derdikeve holê. Însanê/a cudabûyî dema ku wekî cinsên jin û mêr bê bidestgirtin wê çaxê civakîbûna yekemîn jî li dora peywendiyên jin-zilam pêş ketiye. Lewre civakîbûna yekemîn dibe perwerdeya yekemîn. Perwerdekara vê perwerdeyê jî jin-dayik e. Jin-dayik a ku ji bedengirtina gerdûnê digihêje kûraniya hişmendiya bedena xwe, înşaya nirxên civakbûnê dîsa li ser bingehê hişmendiya xwe ya hebûnê ava dike. Dema ku civakê înşa dike hişmendiya xwe ya xwezanînê bi perwerdekariya xwe ve ji bo hêmanê bingehîn ê civakê, zarokên xwe, radigihîne. Jin-dayik a ku peywendiya xwe û civakê li ser vê rêbaza bingehîn a perwerdeyê datîne û rêxistin dike, di nava civakê de wekî avakara hebûnê hatiye qebûlkirin. Yekparebûna ku ev wate qezenc kiriye û daye qezenckirin, di nava desthilatdarparêziya sîstema baviksalarî de parçe bûye. Ev parçebûn ewilî bandorê li zihniyeta jin û zilam dike. Parçebûna zihniyetê tê maneya parçebûna mijarên perwerdeyê jî. Êdî dema paradîgmayên wisa ne ku li ser parçebûnê hatine avakirin û dinyaya zihniyetê jî li gorî wê tê avakirin. Di binê zexta saziyên desthilatdarparêz ên hegemon de rêbazên perwerdeya li ser bingehê zihniyeta cinsiyetparêz hatine afirandin. Ji van saziyan a yekemîn saziya bavtiyê ye. Ji baviktiyê heta bisazîbûna baviksalariyê, her diçe pêşxistina sîstema dewletê û berfirehkirina wê ji bo her însanê/a ku di nava civakîbûnê de cih digire wekî halê tecawiza zihnî lê hatiye. Perwerdeya civakîbûnê li ser zemînê ku şênber û razber bandorê li hev dikin û ji hev bandor dibin pêş dikeve. Ji ber ku li atmosfera ku zext lê heye îmkanê fikra azad, hisên xweşik, hestê hezkirinê û rêgezên başiyê namîne fikrên heyî jî wê her tim birîndar yan jî serdest bimînin.

Civakîbûna ku em tê de ne asteke wisa ye ku ev fikirandinên birîndar yan jî di bin zextê de, razberkirin, biyanîbûn, şênberkirin, parçeyîbûn, sîmulasyon, bêhestbûn barkirî ye. Tê zanîn hemû tespîtên felsefî û zanistî ew in ku ber bi derketina ji civakê ve diçe. Aqil ji hest tê qutkirin, beden ji mekan tê qutkirin, teknolojiya bi aqlê însan tê afirandin bi awayekî neyênî li ser bingehê îdeolojiya "qirkirinê" tê bikaranîn. Pêvajoyeke mîna bêcivakîbûnê ya ku di fêmkirina mijarên herî bingehîn ên civakî de yên wekî huner, polîtîka, exlaq, baweriyê zehmetiyê dikşîne bi kapîtalîzmê tê pratîzekirin. Perwerdeya civakê jî ji vê pêvajoyê para xwe girtiye. Di navbera însanan de peywendî qut dibin, îdeolojiya takekesîtiyê ya lîberalîzmê wisa dike ku însan pêdiviyê bi însan nebîne. Vê yekê perwerde jî ji cewherê wê derxistiye. Girîngiya vê tespîtê bi vî şeklî tê fêmkirin; çanda civakîbûnê ya heyî çiqasî hatiye bêqîmetkirin. Herî dawî, di pêşengiya zihniyeta hegemoniya kûrewî ya pozîtîvîzmê de ji nû ve lêpirsînkirina jiyanê ketiye rojevê.

**Jinûve Civakbûn Pêwîst e Çawa Be?**

Êdî em ketine nav rojên wisa ku xweza ji ber qalibên zihniyeta pozîtîvîst ên li ser qirkirina civakê nikare xwe nû bike. Însanê/a xwedî xisleta civakî ji nû ve ketiye nav pêvajoyeke têkoşîna xweafirandinê. Ev têkoşîn bi xwe wê çawa be, ev girîng e. Têkoşîna ewilî pêwîst dike ku rastiyên heta îro hatine çepandin li gel sedemên wê ve di ber çavan re derbas bike. Ev yek bi xwe perwerde ye. Destpêkê divê teşegirtinên zihniyetê yên heyî bên fêmkirin. Pozîtîvîzm a li ser esasê objekirinê û subjektîvîzma ku hestan tenê li ser bingehê arasteker digire dest xwedî taybetmendiyeke wisa ye ku li derveyî civakê dihêle. Girîng e ku wekî di her avaniyê de heye, her ferd jî vê yekê di zihniyeta xwe de bibîne. Şaşiya ku her parçeyekî dixe şûna bitûnê pêwîst e ji aliyê her ferdî ve bê dîtin û wekî gava vê ya yekemîn xwe bigihîne asta zanebûnê.

Serdemên ku tê de fikir hatine înşakirin çêbûne û çêdibin. Bêcivakîbûneke ku li ser esasê însanên jin-mêr ên takekesî bûne, bi xapandinên hepsbûna di kêliyê de hatine gurçûpêçkirin û ev jî wekî çandeke jiyanê qebûl kirine, di roja me de jî wekî rastiyekê tê tespîtkirin. Di nava vê rastiyê de berpirsê herî mezin wekî sîstema hegemon a bi serweriya zilam şaristanî ye. Rastiyên hatine çepandin ên ku dijberî çanda jiyana komunal hatine avakirin ev sîstema serwer e. Mirov dikare jê re xasûkiya dîrokî jî bibêje, jin û mêrên xwedî fikra azad ji koma wan qut kiriye, bi rêka qanûnan di mekanên girtî de bi aqlê zilam dest bi perwerdeyê kiriye. Di rewşa heyî de, ku bi rêbazên afirandina komên cinsiyetparêz tê meşandin û ji aliyê saziya dewletê ya bi serweriya koma çînî û mêtinger tê meşandin, di bingehê sîstemên "ekol, okûlê" de înşayên aqlê heyî mewcûd e. Em di dema Sumeran de dibin şahidê pêşengiya vê yekê. Bi navê Eddûba tenê kur di temenên biçûk de ji bo perwerdeyên girtî tên hilbijartin û ev yek jî destpêka pêvajoyeke wisa ye ku bi bajarîbûnê pêş dikeve. "Edeb"a civaka bajar a nû, yanî exlaq, di van dibistanan de tenê bi rêka kurikan didin qezenckirin. Li Erîdûyê, ku ji bajarên Sumerê ye, (ew bajar e ku bi pêşengî û afirîneriya xwedayê xasûk Enkî tê pêşxistin) perwerdeya bi zihniyeta yekcinsî di bin navê pîroziyê de di nava jiyana civakî ya li ser eksena dayikê de tê pêşxistin. Ev hewldan, ku tê maneya yekemîn hewldana parçekirina civakê, bi demê re dibe bingehê sîstema rahîbên Sumeran. Keçik di van dibistanan de nayên bicihkirin.

Di van Eddûbayan de sîstema rahîban a kurikên ku ji civakê hatine qutkirin tê avakirin. Hemû sîstem û şêwazên perwerdeya di roja me de berdewamiya vê destpêka baviksalariyê ye. Avaniya bajar a Sumerê, ku malzaroka înşaya dewletê ye, xwedî xisleta destpêka parçebûneke wisa ye ku li ser esasê têgihana civaka cinsiyetparêz, çînî ya di zihniyeta civakî

de ye. Di berdewama Eddûbayan de, ku malzaroka zihniyeta çînî û cinsiyetparêz e, êdî wê kevneşopiya perwerdeyê ya ku wê heta roja me ya îro bi rola negatîf rabin dest pê bike. Hemû kadroyên rêxistinbûna dewletê ji van perwerdeyên dibistanê tên derbaskirin. Ev yek jî nîşane ye ku înşaya desthilatdarparêz a feraseta serweriyê di înşaya zihniyetê re derbas dibe. Ev şêwazê perwerdeyê li dijî zihniyeta civakî ya li ser eksenê jindayikê, di dîlemaya jiyanê de wekî rastiya çepandî di dîrokê de cihê xwe girtiye. Rêbaza şer û şîdeta li ser civakê û kevneşopiya ku vî terzî li ser welatên hatine dagirkirin bi rengekî emperyal li ser gelan ferz dike, li ser lêgerînên ferdan jî bandor kiriye. Têkoşîna ku fikra azad bi perwerdeya civakîbûna Zerdeştî diparêze di asta rêgezî de maye û jê wêdetir neçûye. Di nav heman beşa demê de lêgerînên fikra azad bi Platon (Eflatûn) re derbasî nîvgirava Yewnan tê kirin. Platon wekî ferd dikeve nav kar, ji bo ku karibe fikrên xwe bide qebûlkirin li baxçeyê zeytûnan bi navê "akademia"yê rêbazên nîqaşê pêş dixîne. Paradîgmaya li ser bingehê îdealîzma desthilatdarparêz, ku heta roja me bandora wê dewam dike, bi awayekî neyênî xwe du hezar û pênsed sal in didomîne. Piştî ku ji Eddûbayan derbasî Ekolan (okûl) bû û dûvre jî dema ku her sofîstekî ji van ekolan derket akademiya xwe ava kir, têgîhana hatî parçekirin ji nû ve parçe bû. Beridîn û kevneşopiya hemû saziyên roja me yên wekî dibistan, zanîngehê erk û berpirsiyariyên civak-ferd parçe dikin û ferdan dikin tîpên ji bo sîstematîka rêveber-hatina rêvebirinê. Encamên derketina ji rêya civakê ya zanebûnên li ser bingehê agahiyê wekî felsefe, astronomî, matematîk, psîkolojî, sosyolojî, kîmya û hwd. dewam dike.

Di nav amûrên sereke yên înşaya civaka dewletdar de sîstema dibistanên dewletê hene, ku kêlî li gorî saet, deqe, çirkeyên diyar parçe kiriye û xwe bi vê gurçûpêç kiriye. Saziyên mîna kreş, dibistana seretayî, dibistana navîn, dibistana bilind û hwd., ku têgihana civakîbûnê parçe kirine, însan li gorî temenên wan kategorîze kirine û bi derece kirine, di asteke mezin de bi civakê dane qebûlkirin. Hemû pêhesînên ferd û girêdayî vê têgihandinên ferd dikevin bin êrîş û dagirkeriyeke mezin. Çand û nirxên civakî yên ku ferd bi pêhesîna xwe ve dikare pê pêdiviya xwe ya manedayînê pêşwazî bike bi êrîşa dezenformasyonê re rû bi rû ye. Fikrandina estetîk û formasyoneke paralelî vê fikrê di zihniyetê de xuya nake. Nêzîkatiyên analojîk ên li ser bingehê dijberiyan, ku li şûna gotin û helwesta aîdî vê gotinê dijberiyên hevdu zêde nakin, ji nûbûnan re girtî, destûra avabûna cudatiyan nade û firsendê nadiyê, tenê çend milên qirkirina civakî ne. Nîqaşa ku fikrandina azad pêş dixîne, guhdarkirin, nêzîkatiyên hevsengiya empatî-sempatî li ber çav digire, cudatiya her ferdekî/ê qebûl dike, bi rêka vê qebûlê ve ketina nav lêgerîna avaniyên pirrengî di asta acîliyetê de

xwe dide hiskirin û girîng e ku mirov van nexweş nebîne. Li beramberî êrîşên ferazî yên kapîtalîzma yekdestdar em ketine pêvajoyên wisa ku girtina agahiyan jî talûkeyan di nava xwe de dihewîne. Pêvajoyên wisa ne ku pêwîst e nêzîkatiya li ser bingehê agahiyê ya ji civakîbûna perwerdeya jin-dayikê qut, bêformiya bêkesayetiya kesayeta mêtingeh wekî pirsgirêka herî bingehîn a civakî bi lezgînî bê bidestgirtin.

Pirsgirêkên ji nû ve pênasekirina jiyanê û lêgerîn û lêpirsînên ku li peywendiya di navbera wê û maneyê de digere di roja me de heta astekê dewam dike. Pêwîst e li şûna tespîta ku dibêje jiyana şaş rast nayê jiyîn çi were bicihkirin, hewldan heye ku bersivên ji bo vê bên dîtin. Bêguman lêkolînên felsefî û zanistî ji bo bersivandina vê pirsê û pirsên wisa di nava lêgerînê de ne. Feqet li qiraxa heqîqeta civakbûna civakê digerin. Jiyana şaş, dema ku şaşî hat eşkerekirin û têkoşîna li dijî vê şaşiyê bi wêrektir tê pêşxistin dikare bê derbaskirin. Parçebûna ku bingeha xwe wekî me li jor jî diyar kir ji civakîbûna bajêr a Sumeran digire, bi parçekirina yekparebûna jin û zilam a li ser bingehê cudatiyan dest pê kiriye. Ev rewşa duparçeyî dûvre di nava xwe de jî zêdetir parçe dibe û heta roja me tê. Di roja me de jî êdî em bi kesayet û civakên wisa re hevrû ne ku di navbera nehatina naskirin û bêmanebûnê de teşe digirin. Wekî pirsgirêkên cidî yên civakî rewşên wisa derdikevin holê ku di navbera civaka dewletdar û civakên kevneşopiyê de dimînin, di navbera kevneşopî û modernîteyê de asê dimînin, armanca domandina hebûna xwe û hevşibînê tevlîhev dikin, dixwazin û biryardar in bi xwezayê re bijîn û li milê din jî di bin zexta kapîtalîzmê de dimînin.

Di vê mijarê de li dinyayê ji bo van pirsgirêkan hemûyan paradîgmaya çareseriyê ya herî yekpare îdeolojî û analîza Modernîteya Demokratîk e. Li gorî vê paradîgmayê divê perwerde civakî be. Ya pêşdatir jî ew e ku mirov bibe xwedî civak û xwe wisa perwerde bike. Mebesta ji civakîbûnê ew e ku ji heft salî heta heftê salî hemû ferdên civakê li gel hev li heman nîvengê û li heman mekanê jiyanê bimînin û heta demekê li heman ortamê bidin û bistînin. Ji bo ku têgihandina civaka komunal bi pratîkê jiyanî bibe, wekî me li jor jî diyar kir, pêwîstî bi hişmendiya civaka dîrokî heye. Li ser bingehê manedayîna dema bihurî çaxê ku em li rabirdûyê vedigerin, serpêhatiyan dinirxînin û li gorî vê jiyana rojane rêxistin dikin ev yek bi xwe re li dijî bêcivakîkirina em tê de ne pêdiviya seknekê derdixîne holê.

İsrara di jiyana civakî de, li dijî sîstema kapîtalîst a roja me têkoşerbûneke mezin pêwîst dike. Têkoşîna li dijî feraseta civakê ya tê morîkirin, tê robotkirin, feraseta jiyana nû ye. Ji bo ku cudatî karibin bi hev re bijîn ewilî pêwîst e roja me bê fêmkirin. Ji bo vê jî divê hêmanên ku di her maneyê de li hev hatine biyanîkirin, hatine parçekirin bi şeklekî bitûn bi hev re bijîn. Em di beşeke wisa ya

dîroka qirkirina civakê de ne ku ji nû ve jiyana hevbeş a yên cudatirî hev wê zor û zehmet be. Çareseriya esasî avakirina zihniyeta demokratîk e. Vê yekê bi qasî zanistê çanda civakî jî ji me re dibêje. Li ser esasê van rastiyan berpirsiyariya avakirina civaka nû û nirxên wê ya li ser esasê berxwedanên civaka demokratîk xwe li ser hemû mirovatiyê ferz dike.

Beriya pênc hezar salan ji bo çepandina jiyan û zihniyeta civakîparêz xebat hatine destpêkirin. Li dijî vê dîsa civakê bi xwe heta astekê berxwedanek pêş xistiye. Li dijî zihniyet û sîstema serwer kevneşopiya fikra azad, kevneşopiyên civaka xwezayî bi rengê ziman û çandê hatiye parastin. Pêşketina zanista epîstemolojiyê armanc dike hebûna vê kevneşopiya azad deyne holê. Li dijî kevneşopiya akademîbûna cinsiyetparêz, olparêz, zanistparêz û bi armanca xizmeta desthilatdariyê her tim di dîrokê de gel, kom, mezheb û çandên berxwedêr çêbûne. Her berxwedaneke ku wekî agahî-zanebûn ji hev parçe nebûne û bi armanca parastina hişmendiya xwe ya civakbûnê tên pêşxistin, heger bisazî jî nebibe dîsa jî kevneşopiya civaka demokratîk e. Feqet pêwîst e ev yek jî bê nirxandin û dîtin ku ev kevneşopiya civakê nebûye pergal, nikare sosyo-psîkolojiya xweparastina bênavber derbas bike û ev yek jî bi xwe re lawaziyan tîne. Hebûna rêxistinbûnên akademiyan ên ku têkela xwecih û gerdûnî ne, ne zelal in, dikarin wekî şêlû bên nirxandin, li ber çavan e. Di civakîbûna Zerdeşt de, ku di dîrokê de ji tevgerên berxwedanê ye, di rêxistinkirina kevneşopiya akademiyê de Agirgeh girîng in. Feqet Magên ku pêşengên civakî bûn, nikarîbûn bersiv bidana guhertinên demê û xwestin di bin xizmeta desthilatdaran de hebûna xwe bidomînin. Vê nêzîkatiyê dawî li karaktera demokratîk aniye. Her wiha, di dîroka Îslamê de di nava Karmatiyan de tevgera Daiyan xwedî formatê akademiyên berxwedanê ye. Ruxmî vê jî ji ber ku giranî dane çalakbûna eskerî bi tenê ev rewş wekî yek ji sedemên têkçûna wan tê hesibandin.

Yek ji nirxên bingehîn ên civakbûnê jî tevgerên baweriyê ne. Dema ku tevgerên baweriyê tê lêkolandin tê dîtin ku parastina exlaqê civakbûnê wekî armanca herî bingehîn derdikeve holê. Ji bo ku bawerî bi rengê olê veguhere çareseriya ku xîtabî hemû civakê yan jî komê dike derdikeve pêş. Rêbaza vê jî dîsa akademî ne. Olên yekxwedayî yên serwer bi navê medrese, manastirê rêxistinbûnên xwe ava kirine. Ya ewilî danîne pêşiya xwe ew e ku kadroyên pergala xwe ava bikin. Ev xebat di heman demê de xebateke wisa ye ku îdeolojiya xwe, zihniyeta xwe li ser hakim dike. Bi pêşketina modernîteya kapîtalîst re ev xebat bi rêbazên emperyaltir di her qada civakê de tên meşandin. Êdî her ferdê/a civakê bi vê zihniyeta yekperest ji kreşê dest pê dike û dikeve nava çerxeke avakirina zihniyetê. Li beramberî akademiyên pozîtîvîst ên modernîteya kapîtalîst, bi Şoreşa 17'ê Cotmehê re rêxistinbûnên akademiyên sosyalîzma pêkhatî hewl dane bibin bersiv.

Di tecrûbeya sosyalîzma pêkhatî de paradîgmaya civakê ya li ser bingehê îdeolojiya çînî di çareseriya pirsgirêkên civakî de wekî mijara derketinê tê bidestgirtin. Bi fikrê materyalîzma çor ji bo ku civaka bêçîn bê afirandin li dijî kapîtalîzmê û bandorên civaka çînî têkoşîn hatiye meşandin. Wekî rêbazê xwegihandina komunîzmê hat diyarkirin ku ev têkoşîn li ser bingehê kolhozan bê rêxistinkirin. Perwerdeya civakî ya li ser eksenê akademiyê di nava vê rêxistinbûnê de, ku li ser bingehê pratîk û çalakiyê ye, cih negirtiye. Tê dîtin ku akademiya zanistê ya ku ji aliyê Çartiyê ve di 1725'an de hatibû avakirin piştî şoreşa Cotmeha 1917'an hewl tê dayîn wekî akademiyên bi zanista çînî gurçûpêçkirî bên veguherandin. Mirov nikare bibêje ev hewldan ne girîng in. Ji bo ku li Rûsyaya Sovyetê îdeolojiya sosyalîst bi wêje û hunerê li dinyayê belav bibe bi rola dîrokî rabûye. Di warê îdeolojîk de nikarîbû paradîgmaya demê derbas bikira, lewma jî nikarîbû rêbaza lêkolînê ya pozîtîvîst û feraseta materyalîzma çor derbas bikira. Vê nêzîkatiya ku di perwerdeya civakê de mohra xwe li pêşketina çand-hunerî jî daye, şêlûbûneke wekî têkela Çîn-Rûsyaya Sovyetê ava kiriye. Ev şêlûbûn wekî nexweşiya tîpîk a hemû tevgerên çepgir ên roja me jî dewam dike. Ji bo ku akademiyan bike malê civakê nikarîbû avaniya dewletî derbas bikira, navendîbûna xwe parastiye û hebûna xwe domandiye.

Me li jorê hinek mînak dan. Van tecrûbeyan di dîroka civaka demokratîk de cihê xwe girtine û girîng e ku mirov zanistî-felsefî nêzî wan bibe. Van tecrûbeyan heta astekê bandor li kom û civakên dinyayê kirine û divê ev neyê paşguhkirin. Ev xebatên akademiyê û terzên jiyanê ku di roja me de ji aliyê gelek koman ve wekî referans tên girtin, dewam dikin. Ji bo tevgerên sosyalîst, anarşîst û femînîst bûne çavkaniyên îlhamê. Wek nimûne, komeke rahîbên sosyalîst ên Xrîstiyan li Emerîkaya Latîn bi navê "akademiya rûyê erdê" akademiyeke jiyana pratîkî ya di nava civakê de ye vekirine û ev nêzî pêncî sal in didomînin. Dîsa li Tirkiyeyê bi pêşengiya komeke çepgir-demokratîk bi navê "zanîngeha azad" perwerdeyên alternatîf tên domandin. Feqet divê bê zanîn ku ev hewldan hemû jî ji bo xwe bigihînin civakîbûnê û hemû beşên civakê bi awayekî cidî bi pirsgirêkên îdeolojîk û pratîkê re rû bi rû ne. Her xebata akademiyê pêwîst e di çarçoveya xisletên civaka xwe de li gorî ku gelo ji bo pirsgirêkên xwe dibe bersiv yan na, bê nirxandin. Akademiya Zanistên Civakî ya Rûsyaya Sovyetê, ku pêdiviya avaniya dewletî pêşwazî dikir, nikarîbû têgihana "azadiyê" bi civaka Rûsya bida dawerivandin. Dema ku mirov di dîrokê de li berxwedanên gel û koman dinêre tê dîtin ku di bingeha têkçûnên wan de pirsgirêkeke wisa heye ku nikarîbûne feraseta yekparebûnê li gorî pirsgirêkên civakî yên rojane biguncînin.

**Têkoşeriya Xweqezenckirinê: Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê**

Ji bo ku xebatên akademiyên mînakên wan karibin werin zêdekirin werin fêmkirin, li cem mînakên dîrokî, pêwîst e were diyarkirin ku di roja me ya îro de jî hewldan hene. Di vê wateyê de bi şiklekî şênber bidestgirtina pratîka Bakur û Rojhilatê Sûriye ku bi qasî deh salan e dê sûdmend be. Xebatên akademiyên civakî yên Rojava ku îdîaya wan ew e taybetmendiyên gelek pratîkên li cîhanê di nava xwe de bihewîne, li vê erdnîgariya du caran ji şoreşa mirovahiyê re malovanî kiriye gelo dê karibe ji nû ve xwe bigihîne wê şensa mezin? Yan jî gelo di nava ava boş diherike ya dîrokê ya rûbara modernîteya demokratîk a sosyalîst de kariye zelaliya xwe ya îdeolojîk bi rêxistin bike? Zehmetiyên ku me li jor dûr û dirêj anîne ziman ên dema em jiyana bi wate ji nû ve ava dikin pê re rû bi rû dimînin çi ne? Ji bo ku li Bakur û Rojhilatê Sûriye, li Rojava akademiyên civakê werin avakirin, wekî li jor bi heman nêrîna dahûrîner û rexnegir mêzekirina li pirsgirêkan, dê bibe sedem ku pirsgirêk û her wiha nêzîkbûnên li ser çareseriyê çi ne zelatir bibin. Divê em destpêkê bandorên vê rewşê yên sosyo-polîtîk û sosyo-psîkolojîk derxin holê. Ev ê bike ku feraseta 'akademiyên civakî' were fêmkirin.

Wekî ku li hemû Kurdistanê bûyî ji aliyê dîrokî ve cihekî ku polîtîkayên dagirker bi şiklekî herî kûr tê meşandin jî Rojavayê Kurdistanê ye. Neteweperestiya BAAS'ê ya bi pêşengiya partiya BAAS'ê dihat wateya destwerdana civakbûna eşîrên Rojhilata Navîn, polîtîkayên Erebkirinê bi rêbazên înkar û îmhayê meşandiye. Pêkhateya civaka Rojava ku di bin bandora polîtîkayên asîmîlasyon û qirkirinê de maye, feraset û hişmendiya 'pirrengbûnê' , bi pir bawerî û pir olî dijî. Pêkhateyên Xiristiyan û Cihû ku li beramberê hemleya dîrokî ya Îslamê xwe parastine, di encam de bûye sedem ku taybetmendiyên heterojen ên civakî werin parastin jî. Ji aliyê baweriyê ve hewandina pir baweriyan ku yek ji taybetmendiyên civakî yên modernîteya demokratîk e, nîşaneya dewlemendiya ol, ziman û zarava ye jî. Tê dîtin ku têkoşînên pêkhateyên wisa yên dîrokî yên di çarçoveya modernîteya demokratîk de zêde zêde zeîf bûne û çavdêrîkirina vê dê ji bo avakirina akademiyên civaka alternatîf girîng be. Li beramberî pêşketina şaristaniya Îslamê di çarçoveya desthilatdariyê de, her çendî kevneşopiya berxwedêr a gelparêz a tesawûfî hebe jî, bi qasî ku mirov karibe bêje tine pêşketina hişmendiyê ya xwe dispêre hêza xwe bi xwe, zeîf e. Ji bo yên heyî jî eger were gotin ku di bin bandora zêde ya dewletên dagirker de şikil digirin dê ne şaş be. Ya ku tê jiyîn di wateyekê de rewşa ku bi çavê hişmendiya desthilatdar a hakim û oryantalîzmê li xwe dinêre. Rastiyeke civakî ku ji aliyekî ve bi xem û fikara xweparastinê têkiliyên xwe yên bi derve re qut dike û li aliyê din jî

bi xem û fikara ku xwe bi kapîtalîzmê bide qebûlkirin heya bi dawî sînga xwe jê re vedike hakim e. Hemû taybetmendiyên Rejîma BAAS'ê ku xwe li kapîtalîzma cîhana rojava digire lê mînakên Kapîtalîzma rojhilat, mînakên wê yên Rûsya Sovyetê û Çînê ji xwe re qebûl kiriye nîşan dide.

Di civakîbûna Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, ji aliyê taybetmendiyên kesayetiya civakî ve ku têkoşîna xwebûnê bi sosyalîteya xweparastinê dimeşîne, taybetmendiyên netew-dewlet û dagirkeriyê di zikhev de tên jiyîn. Tiştê ji perwerdeyê tê fêmkirin, dibistanên dewletê ne. Kevneşopîparêzî, rewşeke bi xumam a di nav de kapîtalîzm jî heye di hemû civakê de li ser qada hizrî hakim e. Zemîneke civakî ku bi bandora polîtîkayan ji derve bê îrade hatiye hiştin, hatiye yekrengkirin û civaka neolotîk tê de hatiye xetimandin derketiye plana pêş. Em dikarin diyar bikin ku ji ber giraniya nasnameyên bingehîn ên civakî, nasnameyên çandî û olî destûrê nade takekes ku karibe xweseriyên xwe bijî. Tevî ku takekes tine tê hesibandin, zemîneke xurt heye ku derketinên nû jî were kirin. Ev jî rastiyeke cuda ye. Kapîtalîzm dixwaze bersiva vê rastiya heyî bide. Bi Projeya Rojhilata Navîn a Mezin polîtîkayên perwerdeyê ku bi gel, civak, kom û civatên herêmê polîtîkayên qirkirinê didin qebûlkirin dixin meriyetê. Ev polîtîka li ser civak û takekes nakokî û dubendiyeke bingehîn derdixe pêş. Ji aliyekî ve bi israr îdeolojiya kapîtalîzmê ya bêcivakirinê û hem jî nakokiyên xwe avêtina ber bextê kevneşopiyan wekî pirsgirêka bingehîn tê jiyîn.

Rojava ku yek ji cihên bingehîn ê çêbûna şaristaniya demokratîk e, di heman demê de dibistana civakbûnê ye. Her wisa jî taybetmendiya civakîbûna çandinî û gund hucreya kok e, di heman demê de ew taybetmendiya ku Rojava bi wê heya bi roja me ya îro di civakîbûnê de israr dike. Heta mirov dikare li her gundî amûrên ji beriya deh hezar salî bibîne. Di heman demê de li cem dîrokê, jiyanên raborî tê wateya dewlemendbûna fêmkirina mirov jî. Şoreşa bajaran jî wekî vê, li ser heman erdan li cem nirxên jiyanê yên ji beriya xwe li ser bingeha cihêrengbûnê çêbûye. Vê bi heman şiklî ji bo guherînên hişmendiyê jî rê vekiriye. Armanca cihêrengbûna vê carê ew e ku li azadiyê bigere, nirxên demokratîk û exlaqî biparêze. Ji bo lêgerên destpêkê yên azadiyê malovanî kiriye, van taybetmendiyan jî nîşan dide; tevî ku van taybetmendiyan nîşan dide şikilgirtineke timî di pozisyona parastinê de ye û têgihiştinên sosyo-psîkolojîk jî afirandiye. Ji ber ku deformebûna çandî û baweriyê bi xebatên hişmendiyê bê bandor dibin, ji aliyê rêbazên hebûna xwe domandinê ve li şûna afirandinê xwe bi ya kevn ve şidandin, herêmî mayin, bê berhemî tê jiyankirin. Rêbaza desthilatîparêz û dogmatîk, destûr nedaye ku cihêrengbûnên bi nîqaşê pêk werin bi pêş bikevin. Yan jî nîqaşên heyî nekarîne qalibên diyar derbas

bikin. Kevneşopiya medreseyê ya perwerdeyê tevî ku di pozisyona heyî de li dijî kapîtalîzmê di berxwedanê de ye jî, nekariye ji bo nîqaş û nûbûnên di asta gerdûnî de ne bibe bersiv. Yan jî nîqaşan nekarîne qalibên heyî derbas bikin. Wekî ku Rêber Apo ji bo civaka Rojhilata Navîn gotiye, vê rewşa parçeyî ya qat bi qat, "yan dê derbas bike yan jî dê xwe bikuje". Mijara herî bi lezgînî ew e, têkiliyên di navbera pêkhateyên desthilatdar û berdevken kevneşopiya pêkhatina civakî de were rêkûpêkirin. Ev lezgînî ji bo civakê tê çi wateyê? Gelo civak di ferqa vê lezgîniyê de ye? Divê daxwazên civakê çawa werin pêşwazîkirin? Divê bi kîjan rêbazan pêdivên civakê werin eşkerekirin? Pêwîst e aliyên wê yên kêm, têrê nakin yan jî ferq û cudahiya aliyên wê yên şaş çawa jê re were eşkerekirin û kîjan rêbaz werin bikaranîn? Ma pêwîstî pê heye destwerdanek ji derve ji civakê re were kirin? Gelo ev destwerdan dê bi cewhera civakê re bibe yek? Û gelek pirsên bi lezgînî û bersivên wan dê me ber bi perwerdeyên akademiyê ve bibin.

Tenê dê karibe bi xebatên avabûna akademiyan-akedemîbûnê ya di nava civakê de bi civakê re ev lezgînî were derbaskirin. Pêwîst e ji vî aliyî ve dûrketina civakê ji dagirkeriya ku tê wateya hê jî parçebûna hişmendiya parçebûyî, çawa bibe? Hewce dike derbaskirina parçebûnê bi kîjan xebata hişmendiyê were kirin? Pêwîst e di kîjan zemînê de tevger çêbibe? Bersivên pirs û pirsgirêkên bi vî şiklî beriya her tiştî divê mirov di nava pirs û pirsgirêkê de bigere. Girîng e ku ev bibe rêbaza bingehîn a xebatên akademiyê.

**Li Rojava Xebata Ji Nû Ve Zindîkirina Hişmendiyê**

Perwerdeya destpêkê ku li ser bingeha têkiliyên civakbûnê hatibû birêkûpêkirin, di sedsala derbasbûyî de di nava PKK'ê de ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatiye pêşxistin. Bi rêbaz û uslûba yekpareparêz ku bi fikr û kedeke mezin a nîv sedsalê ji aliyê Rêber Apo ve hatiye afirandin, civaka nû hatiye bipêşxistin. Ji nû ve jin wekî faktora jiyanê ya yekemîn û pêkhênera bingehîn a jiyanê qebûlkirin û fêmkirin, di vê rêbazê de di serî de aliyê wê yê herî diyarker e. Îfadeya pratîkî ku dîrok di kêliyê de ye, civak ji aliyê takekes ve xwe dide der, wekî perwerde bûye tiştekî nû. Divê ev pratîk çawa civaka demokratîk ava bike? Divê civaka demokratîk bibe xwediyê rêbazeke çawa ya perwerdeyê? Pêwîst e bi kîjan rêbaz û awayên perwerdeyê hişê zilamê serdest û civaka desthilatîparêz a hegemon were derbaskirin? Divê hemû beşên civakê, çawa bi heqîqetê re hev bibînin? Pêwîst e bi kîjan mijarên perwerdeyê ji kesayetiya ku dagirkeriyê ew afirandiye heya bi fikra azad derbasbûn çêbibe? Pêwîst e feraseta perwerdeya ji neçarî çawa were derbaskirin? Divê çi were kirin ku civaka ku li perwerdeyê hatiye biyanîkirin, bi daxwaz û dilê xwe bixwaze were perwerdeyê? Bersivên pirsên bi vî şiklî bi perspektîfa modernîteya demokratîk a Rêber Apo

bi perwerdeya ku daneheva nîv sedsalê ye derketiye holê.

Hê jî aliyên werin diyarkirin hene. Tevî vê jî pêwîst bû xebata bingehîn a hişmendiyê, akademiyên civakî li beramberê hişmendiya netew-dewletparêziya Sûriye bihatana rêxistinkirin. Bersiva krîzên tên jiyîn, bi pergala perwerdeya ji aliyê Rêber Apo ve hatiye pêşxistin û di naveroka nîqaşan de hatiye peydakirin. Kevneşopiya civaka demokratîk ji neteweperestiya BAAS'ê hatiye qetandin. Piştî 1979'an Rêber Apo, bi çalakiyeke mezin a perwerdeyê berxwedan daye destpêkirin. Pêwendî û têkiliya bi xwe bi gelekî re tê maneya perwerdeya civakî. Têkoşîna li dijî bêbaweriyê tê meşandin, dê wateya rastîn a berxwedanê biafirîne. Her yek civîna bi gel re hatiye lidarxistin, ketina her malekê û ew cih wekî dibistanê lê kirin bi xwe berxwedan e, tê wateya dersê ku ji bo akademiyê hewce ye. Civîn tenê ne ji bo çînekê ne, ne ji bo cinsekê/î ne, tovên civakeke nû bûn. Her civîna dihat lidarxistin jin û zilam, ji heft heta bi heftêyî hemû civak tevlî dibû, dîsa bêyî ku nasnameyek were liberçavgirtin, Ereb, Kurd, Çerkez, Ermenî dikarîbûn tevlî bibin. Dîsa her kesên ji her baweriyê Misilman, Êzîdî, Xrîstiyan, Aşûrî tevlî bûye, ji her ziman û lehçeyê her kesî xwe îfade kiriye. Ev li Rojava tiştekî nû ye, destpêkek e. Em dibin şahide wê; Rêber Apo civakbûnê bi jiyaneke bi wate ji nû ve ava dike. Perwerdeya civakê ku xwe dispêre 19 salan, li beramberê feraseta elît, çînî ku biyanî dike û parçe dike hatiye pêşxistin. Di her kêliyê de û li her derê bi her beşa civakê re bi rêbazeke ku cih nade ferq û cudahiya cinsan perwerdeya gel li dar xistiye. Ev rêbaza perwerdeyê ji aliyê sosyolojik ve hewldana avakirina ji nû ve ya civakekê ye. Ewqas jî tê wateya ku civak cara destpêkê bi îradeya xwe tevlî bibe, bêyî ku ti xem û tirsa cezagirtinê hebe bi zimanê xwe fikra xwe bîne ziman. Ji ber vê hesta azadiyê ya di bingeha wê de heye, perwerde ji aliyê civakê ve tê qebûlkirin.

Diyarkirina vê rastiye bi qasî ku wê ji bo Sûriye-Rojava sûdmend be, ewqas jî dê ji bo civaka Rojhilat jî girîng û sûdmend be. Fêmkirina ji xebatên akademiyê di roja me ya îro de, fêmkirineke wisa ye ku ji aliyê hişmendiya desthilatdariyê ve hatiye avakirin. Di nava vê fêmkirinê de cîhana takekesên bi qasî ku ji civakê qut bûne ewqas jî ji civakbûn û îradeya civakbûnê qutbûnî heye. Pêwîst e were diyarkirin, ku gel û kesayetiyên bi polîtîkayên dagirkeriyê re, asîmîlasyon û nijadkujiyê re rû bi rû mane bi xwe bêbawer in, bêîdîa ne, li hêza xwe biyanî ne û ev hemû weke pirsgirêkên giran ên bingehîn tên jiyîn. Tê zanîn, kesayetiyên wateya hebûnê ji bîr kirine û jiyan ji bo wan bêwate bûye, bi hişmendiyên bi çavekî oryantalîst li xwe dinêrin beyar in, bêberhem û ne zindî ne. Rewşa bûna çol û sehra, kilsgirtîbûn û zuwabûn, dijberiya heqîqetê ye ku li ser serê gelên Kurdistan û Rojhilata Navîn tê pêkanîn. Diviyabû ku li beramberî hişmendiya

zuwabûyî, hişên beyarbûyî, ev nûbûna dîsa di nava civakê bi xwe de bihata peydakirin. Nêzîkbûneke ku civakê bi xwe esas digire, qîmet û nirx dide her takekes û endama/ê civakê wekî bingehîn, esasî û heqîqet derketiye holê. Nêzîkbûna felsefîk û têkoşeriya Rêber Apo ya bi şiklê "jinûve şînkirina dara zuwabûyî" ku 19 salan berdewam kiriye, ji bo akademiyên civakî bûye ava jiyanê. Bi şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an re hatiye dîtin ku ev heqîqet ne zêdegaviyek e. Tişta ku hatiye jiyîn ev e; di dîroka mirovahiyê de ji rewşa ku civakek jê diket şik û gumanê gelo ew heye yan tine, ew civak diket nav wê pêvajoya guherînê ku ew jî nirxek e. Descartes bi şiklê "kîjan heqîqet e" di navbera pergala desthilatdar û fikra azad de guman jiyaye. Bersiva ji bo gumanperestiya wî, berevajî ya wî, 'civak' e. Rêya ji nû ve vegera li jiyanê, ne ji bo xwe ji bo hinekên din nefes distîne. Şervantiya ji bo wateyê di têkoşîna vê rêyê de wekî rêbaza bingehîn a têkoşînê hate diyarkirin. Çêkirina civakê ji aliyê civakê bi xwe ve, fêmkirina akademiyên roja me ya îro bi cewhera wê ve hevrûkirin bû. Xebatên wekî pro-akademî werin fêmkirin û pergalên civînan ên her beşa civakî digirin nava xwe, di roja me ya îro de bûne bingehên civakî yên xweseriya demokratîk û rêxistina akademiyan.

Têgîna Akademiya û naveroka wê bi Rêber Apo gihîştiye cewhera xwe; ev di rastiya şoreşa Rojava de derketiye holê. Pirsgirêka perwerdekirina civakê li dijî bi her şiklê pergalên desthilatparêz, li dijî şiklê rêxistinbûnan di her demê de, li ser esasê nêzîkbûna akademiyan a Rêber Apo hatiye bidestgirtin. Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê di nava rêxistinbûna komunan de dest bi perwerdeya civakê hatiye kirin. Di nava her komunê de komisyonên perwerdeyê jî hatine birêxistin. Erka van komisyonan ew e ku li gund, belde, navçe, bajar û kantonên tê de cihê xwe digirin, kar û xebata ronîkirinê, zanebûnê plan bikin, pêk bînin û bi pêş bixin. Komisyon di heman demê de ji perwerdeyê berpirsiyar e. Ew bi xwe jî di nava perwerdeyê de cihê xwe digre. Mijarên dersan ên heftane û mehane, tên diyarkirin û kî dê van dersan bide dîsa ji aliyê komisyonê ve tê tespîtkirin. Bi piranî kesên berê di perwerdeyên Rêber Apo de amade bûne tên tercîhkirin. Piştî şoreşê bandoreke mezin a perwerdeyên komunan li ser civakê çêbûye. Gundiyan cara yekemîn jê re şahidî kirine ku ji aliyê wan ve li gund, mijar tên diyarkirin û li ser nîqaş tê meşandin, ew bi xwe fikra xwe diyar dikin. Her wiha ev jî bûye sedem ku ji bo ku pirsgirêk çareser bibin ew dikarin aqlekî hevpar bi pêş bixin, bawerî û hîseke wisa çêbûye.

Li ser vê bingehê piştî şoreşa Rojava xebatên avakirina akademiyên civaka demokratîk dest pê kirine. Li ser esasê berxwedana wan bi xwe nasnameyên Ereb, Kurd, Tirk û Ermen û dîsa bi giranî bi nasnameyên olî yên Êzidî, Xristiyan, Misilman di navbera pêkhateyên civakî yên pirçand û pirziman de hîmên komînal ên nû hatine danîn.

Navê yekeyên perwerdeyê li gorî forma çandî ya bingehîn mîrateya pirçandî ya Rojhilata Navîn wekî "Akademiyên Civaka Demokratîk" hatine diyarkirin. Mifredat û dersên jiyanê yên guherîn û veguherîna hişmendiya ku xwe dispêre olperestî, neteweperestî, cinsiyetperestî û xwe dispêre hişmendiya neteweperest pêk tîne, ji bo ku hişmendiya demokratîk bi wan bide qezenckirin hatine rêxistin. Li akademiyên ku armanca wan bipêşxistina hişmendiya civaka demokratîk e ji her çandê, her cinsê/î, ji her baweriyê, ji her temenî, ji her pîşeyî, ji her cihî beşdarvan hene; ev wekî nêzîkbûna bingehîn tê diyarkirin. Rêxistinbûna ku ji ciwanên civakê û beşên din ên civakê yên xwediyê berpirsiyarî ne û ji hemû jin û zilamên di nav civakê de pêk tîne, di bin sîwana akademiyên civaka demokratîk de hatiye komkirin. Her jin û zilamê ku qonaxa xwe ya zaroktiyê xelas dike bêyî ku ferqa jin û zilam bike, tevlîbûna wan ji bo perwerdeyê li ser bingehê dildariyê ye. Çawa ku tevlîbûn ji heman malbatan heye, her wiha zêdebûna endaman jî li ber çavan nayê girtin. Dildarî esas e. Çawa ku her beşa civakî digire nava xwe, ji bo ku di pratîkê de civak bê fêmkirin rasterast tevlîbûna beşdarvanan armanca bingehîn e. Li beramberê ezeziya lîberalîzmê bi komunalî, hem di pratîkê de û hem jî di teoriyê de, di nîqaşan de bipêşxistin, ji beriya her tiştî tê bidestgirtin.

Piştî şoreşa Rojava di nava komunan de bi rêxistina komisyonên perwerdeyê nîqaş hatiye destpêkirin ku xebatên pro-akademiyan dê bi kîjan formatan bibin pergal. Di encama perwerdeyan de ku di nava hemû civakê de belav bûne, kadro û xebatkarên civaka demokratîk û xweser hatine gihandin. Ji bo ku biyanîbûna civakî were derbaskirin û perwerdeyên girtî yên deh rojan werin birêxistinkirin, akademiyên demokratîk ên civakî yên destpêkê ji aliyê cih û pergalê ve dîsa bi nîqaşên demokratîk bûye biryar û pratîze bûye. Di sala 2013'an de li her bajar û kantonê Akademiyên Civaka Demokratîk li gorî biryarên bi şiklekî xweser û otonom ketine meriyetê. Di avakirina akademiyan de armanc ew e ku pirsgirêkên navçe, bajar yan jî kantonên lê hatine avakirin, bi heman şiklî li gorî sosyolojiya wan deveran, çareseriya pirsgirêkan, dîsa bi îradeya hevpar a kesên li van deveran dijîn were lêkolînkirin. Kesên çûne dibistanên dewletê yan jî nekarîne biçin, dixwaze bila xwendin û nivîsandina wan hebe yan tine be, kesên cotkar yan jî di çêkirina avahiyan de dixebitin, rewşa wan a zewicîbûnê çi dibe bila bibe û hwd. hedef ew e ku her takekes para xwe ji îdeolojiya demokratîk bigire. Li ser pirsgirêkên herêmî bi nêzîkbûneke akademîk û bi feraseteke akademîk-zanistî nîqaşkirin û ji bo wan peydakirina çareseriyan, wekî rêbaza bingehîn hatiye diyarkirin. Berevajî rêbaza modernîst hiyerarşîk a bi şiklê ders dide-ders distîne, pêşxistina çanda ku bizane hevdu guhdar bike û ji hevdu fêm bike, wekî

rêbaza bingehîn hatiye diyarkirin. Mijara her dersê ji aliyê kesên cuda ve bi formatên cuda tên dayîn. Vê rêbazê li ser gel bandoreke wisa ya psîko-sosyal kiriye; xwetevlîkirina di asteke bêdawî de û qebûlkirina modela ku alternatîfa perwerdeya dewletperest-qalibparêz e. Li şûna pergala perwerdeya ku afirandina civakeke homojen dike hedef, pêvajoyeke wisa ya perwerdeyê tê jiyîn; beşên civakî yên ji her pîşeyî yan jî kesên bê pîşe tevlî dibin, ji her grûbê, her kes ferq û cudahiyên hev fêm dikin û hem jî ferq û cudahiyên xwe bi xwe fêm dikin.

Dema ku di înşaya civakê de rol tê lîstin ev armanc û pêşdatir bi formê civakîbûnê derdikevin holê. Ji bo ku berpirsiyariya înşaya civakî dana qezenckirinê zehmetî rû didin. Di destpêka van zehmetiyan de têkoşîna li beramberê hişmendiya civaka dewletdar û avakirina jiyana komînal heye. Rêbaza jiyanê ya li derdora kapîtalê, hilberînerî û afirînerî koh kiriye, xetimandiye. Xwegihandina rêxistinbûna şênber a hişmendiya ku dikare ji civaka mezaxtker xwe paqij bike û ber bi qadên hilberîne ve biherike hê jî çênebûye.

Wekî me li jor jî diyar kir, têgîna akademiyê navê wî baxçeyî ye ku Platon li Yewnanîstanê perwerdeya vekirî dimeşand û lê nîqaş dikir. Ev rêbaza perwerdeyê ku perwerdeya vekirî û nîqaşên vekirî bêyî hebûna çewisîn û ferzkirinan her timî çêbûne, navê akademî lê hatiye kirin, heya bi roja me hatiye domandin û bûye kevneşopî. Di nava pergala dewletê de ev rêbaz, bi hişmendiya pozîtîvîst bûye parçeyek ji pergalê. Di serî de bi armanca xwegihandina her beşa civakî û çareserkirina pirsgirêkan, li her kantona hatiye avakirin, pêdiviya rêxistinkirina akademiyan hatiye pêşwazîkirin. Her akademî di bin berpirsiyariya wê civaka navçe, bajar û kantonê de ye. Tevlîbûn li ser esasê dildariyê ye. Sînordarkirinek tine ye. Ji bo xebatên rêxistinkirina saziyên avabûna piştî şoreşê, perwerdeyên destpêkê li ser bingehê îdeolojiya modernîteya demokratîk pêk hatine.

**Ber Bi Civakîbûneke Nû Ve**

Di van deh salên derbasbûyî de em dikarin behsa serkeftina xebatan bikin, ku bi perspektîfa dana qezenckirina hişmendiya komînal hatine meşandin û ji bo avakirina civaka demokratîk hewce ne. Wekî li jor jî behsa wê dibe yekparebûna teorî-jiyanê dana qezenckirin, di encama bi hev re jiyana bist û çar seatan de bi pêş ketiye. Perwerdeyên deh yan jî panzdeh rojan ên bi şiklê perwerdeyên girtî tên meşandin, di roja me ya îro de li ser esasê daxwaz û pêşniyara civakê jî di navbera bîst yan jî sih rojan de tê lidarxistin. Pêvajoya deh salan a derbasbûyî ji me re dibêje, ev rêbaza perwerdeyê ji aliyê gel ve hatiye qebûlkirin.

Rêbazê perwerdeyê li ser bingehê nîqaşa giştî ye. Ji bo kategoriyên wekî yên fêr dibin-yên fêr dikin destûr nayê dayin. Piştî nîqaşa li ser dersên wê rojê,

nirxandina perwerdeya wê rojê jî bi hev re tê kirin. Mijarên perwerdeyê di çarçoveya sosyalîteya heyî de li ser bingehê xwegihandina zanebûna civakbûnê ye. Kesên di pergala perwerdeyê de cihê xwe digirin di hemû kar û barê rêxistinkirina akademiyê de cihê xwe digirin û bi vî şiklî jî kevneşopiya demokratîk derdikeve holê. Pêşxistina berpirsiyariya civakî û xwepakkirina ji hiyerarşî, îqtidarperestî û cinsiyetperestiyê armanca bingehîn e. Dema ku hemû xebatên neçar in werin kirin di jiyanê de hatin parvekirin, berpirsiyariya li beramberî hev jî bi pêş dikeve. Hişmendiya desthilatî û koletî, parçekirinên yekparetiyê yên bi rengê şênber-razber, ruh-beden, zeman-mekan, dilinî-analîtîk, gerdûnî-herêmî, ontolojî-epîstemolojî û agahî-zanîn, tên derbaskirin. Ji derveyî kesên ku dema xwe ya zaroktiyê dijîn, li gel hev jiyîna her beşa civakê, rê û rêbaza xweşuştina ji hişmendiya pozîtîvîst e. Ev rastî ji raboriya deh salan a akademiyên civakî hatiye fêmkirin. Biyanîbûna ku di bin çewisandina bi taybetmendiyên zuwa û hişk ên malbatî, olî, neteweperestî û mezhebî de şikil digire, bi rêbaza "perwerdeya girtî" ya demkurt tê derbaskirin. Rêbaza bi hev re parvekirina bîst û çar saetên rojê, jiyana dendik a civaka nû ye. Takekesên ku hev nas nakin û li gund û bajarên cuda cuda mezin bûne, danûstendina çandê dikin û hev nas dikin. Di heman demê de ji hemû pîşeyan yan jî kesên ne xwediyê pîşe dikarin tevlî van akademiyan bibin. Yên ku di dibistanên pergalê de mezin bûne, tevî kesên di komunên gundan de tevlî jiyanê bûne di akademiyên civakî de cihê xwe digirin. Bi şiklekî kolektîf rêxistinkirina jiyanê, bi biryarên beşdarvanan bi xwe çêdibe. Nêzîkbûna berpirsiyarîgirtin yan jî berpirsiyarî dane kesên din, bi guherînên rêveberiyê deh rojan carekê tê qezenckirin. Berpirsiyariya bi şiklê hemwezîfe, di navbera cinsên jin û zilam de tê pêkanîn. Ji armancên bingehîn yek ew e ku prototîpa jiyanê li akademiyan were pêkanîn. Mînak, dibe ku jineke ciwan a 18 salî li cem zilamekî 50 salî bibin berpisiyarên wê dewreyê, yan jî xortekî 18 salî û jineke 50 salî dikarin bi hev re berpirsiyariya wê dewrê rakin.

Ji komunên gund heya bi meclîsên bajaran, di nava her rêxistina polîtîk de berdevka/ê xwe bi cih dike. Û bi vî şiklî di avakirina civaka demokratîk de bi rola xwe ya polîtîk radibe. Dike ku civak bi xwe perwerdeya xwe bi rêxistin bike. Biryarên li ser mijara ku dê perwerdeyên heftane, mehane û rojane çawa werin rêxistinkirin, di encama nîqaşên ku gel di nava xwe de bimeşîne tên diyarkirin. Li Bakur-Rojhilatê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê tevlîbûna perwerdeyan, wekî rêgezekê hatiye qebûlkirin.

Yek ji armancên perwerdeya akademiyên civakî jî ew e ku zanebûnê bide qezenckirin û bide fêmkirin ku perwerde di asta jiyanî de girîng e. Heger di nava civakê de ev zanebûn çênebibe sedemek jî nebesiya wan kesên perwerdekar in. Ev nebesî bi

rêbazan dikare bê derbaskirin. Zeîfiyên metodolojîk ên ku ji ber rojane xwe nû nake derdikeve holê, ji astengiyên bingehîn ên komîteyên perwerdeyê ne.

Cewhera xebatên akademiyên civakî yên Rojava, çêkirina formeke jiyanê ye. Li gorî vê ji bo dewreya perwerdeyê ya mehane, ji her sazî û her meclîsê kotaya tevlîbûnê wekî hejmar tê diyarkirin. Ev kota li gorî ku hejmara dewreyê sih yan jî sih û penc be tê amadekirin. Her beşdarvaneke/î tê akademiyê berê hatiye amadekirin. Li akademiyê jin û zilam li beşên cuda dimînin, di nava rojê de li cihên jiyanê (mitbax, cihên sporê, dibistan û hwd.) bi hev re tevger dikin. Di saetên destpêkê yên rojê de herî kêm nîv saetê spor tê kirin. Piştî sporê bi hev re taştê tê xwarin, lalik-fereq bi hev re tên şuştin. Mitbaxçiyê/a wê rojê di heman demê de yek ji endamên komîna erkdar a wê rojê ye. Ji bo ku jiyana komînal a wê rojê bidome, kesê/a ji xwarinê berpirsiyar dikare tevlî perwerdeyê nebe. Eger bixwaze tevlî perwerdeyê bibe, bi desteka komînal a hevalên din bi hev re xwarin tê amadekirin. Ferq û cudahiya jin û zilam tine ye. Kesekî/a di jiyana xwe de xwarin çênekiribe jî ji ber berpirsiyariya wî/ê ya rojane ya akademiyê, pêwîst e dema dora wî/ê hat bibe mitfaxçî (aşpêj). Di vê de armanca bingehîn ew e, ku bi keda wî/ê bi xwe li pêşberî civata di nav de ye wekî takekesekî/ê berpirsiyariya xwe bîne cih. Gava destpêke ya derbaskirina taybetmendiyên feodal û civakîbûna heyî ku ji qadên jiyan û xebatê yên cinsiyetperest pêk tê, di akademiya civakî de li ser bingeha plansaziya bi zanebûn tê avêtin. Eger zilamek nizanibe xwarinê çêke, li cem kesekî dizane xwarinê çêke wekî erkdarê rojê tê diyarkirin. Armanc ew e ku hesta hevkarî û kolektîvîzmê bi wan re were pêşxistin. Her tim di cih de nabe, her kes li gorî daxwaza xwe tevbigere yan jî kesek li gorî xwe hevalekî/ê xwe diyar bike nabe. Hedefa bingehîn; her kesê/a tê perwerdeyê hev nas bike û bi hev re jiyanê parve bike. Êvarê dema ku ders xelas dibe, di rewşa ku hemû beşdarvan amade ne de vegotin û nîqaşên di dersan de hatine kirin tê nirxandin.

Ji sê rojan carekê yan jî di hefteyekê de rojekê (mijara ku dê her çend rojan carekê bibe pêşniyarên beşdarvanan jî tê fikirîn), li ser mijarên wekî dê jiyan û têkiliyên nava komînan çawa bibin, kêmasiyên heyî, nêzîkbûnên şaş yan jî li ser berhemdariya dersan nirxandin bi pêş dikevin. Ev nirxandin di civînên mehane ku hemû beşên girêdayî xebata akademiyê tevlî dibin de tên parvekirin. Pirsgirêk û rêyên çareseriyê yên van pirsgirêkan tên îfadekirin, li ser pirsgirêkên nehatine çareserkirin jî bi hev re nêrîn û pêşniyar tên pêşxistin. Armanc û hedefa bingehîn bi van civînan ew e ku bi takekes zanebûna tevlîbûna polîtîk bide qezenkirin û takekes bi pêş bixe. Hedef; li ser bingehê rexne û rexnedanê şaşitî werin derbaskirin, kêmasî werin temamkirin û bi vê rêyê berpirsiyariya

polîtîk were bipêşxistin. Di heman demê de rexne jî tê bipêşxistin, heqê rexnedanê jî tê parastin. Piştî ku xwarina êvarê bi hev re tê xwarin, bi şiklekî serbest, aktîvîteyên wekî sohbet, pêşbaziyên fotbol, voleybol hwd. tên kirin. Dîsa nûçe bi hev re tên guhdarkirin. Saetên etudê yên êvarê jî hatine plankirin. Grûbên lêkolînê tên çêkirin. Her grûbek mijarekê digire dest û piştî demeke diyar, derbarê lêkolîna hatiye kirin, êvarê du saetan semînerê dide. Armanca vê plansaziyê, dana qezenckirina fêrbûna xwendinê, dana qezenckirina rêbazên lêkolînê û baweriya bi xwe ya xweîfadekirina li pêşberî civatekê ye.

Berpirsiyarên dewreyên akademiyê û dîsa rêveberiyên akademiyê yên ji nava civakê, plansaziya her rojê çêdikin û ji pêkanîna vê plansaziyê berpirsiyar in. Li her akademiyê bi şiklê hevserokatiyê kar û barê birêvebirina akademiyê tê meşandin. Endamên di rêveberiya akademiyê de cihê xwe digirin, 24 saetan dikarin li akademiyê bimînin. Ji bo her kesî/ê derfetên lêkolînê hatine pêkanîn. Di mijara hatin û çûna akademiyê de ti pirsgirêk nayên jiyîn. Li her akademiyê erebeyên ji bo hatin û çûna giştî amade ne. Kar û barên wekê endamên komisyonan ji malên wan anîn akademiyê û dîsa birina malên wan, ji bo ku pêdiviyên bingehîn ên xwarinê ji cih û bajarên cuda werin anîn, yên hatine dewreyê anîn û birine nexweşxaneyê û hwd. bi van erebeyan tên pêkanîn. Serfkirina pereyan ne mijara nîqaşê ye. Pêdiviyên navendî yên kolektîf, ji aliyê maliyeya xweser a akademiyê ve tê pêşwazîkirin. Her kes dikare pêdiviyên xwe yên taybet pêşwazî bike.

Di plansaziya dewreyên girtî de ji bo derve ger û geştên bi hev re hene. Serdana cihên dîrokî, muze, asarên dîrokî tê kirin. Dîsa ger û geştên cuda yan jî li melaban pêşbirk tên organîzekirin. Endamên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi agahî û erêkirina rêveberiyên akademiyan dikarin di demên diyar de serdana dewreyan bikin û derbarê pêşketinên siyasî de sohbet û nîqaşan bi pêş bixin. Beşdarvanên dewreyan dikarin bi şiklekî vekirî, rû bi rû derfet peyda bikin ku pirs, nêrîn û rexneyên xwe li cem rêveberiya pergala rêveberiya xweser nîqaş bikin. Bi vê, armanca bingehîn ew e her kesê/a li akademiyên civakî perwerde dibîne, di nav pergala xweser a demokratîk de tevlîbûna polîtîk a demokrasiya rasterast pêk bîne. Di vê maneyê de akademî pêpilka destpêkê ya tevlîbûna polîtîk in. Takekesên ku dewreyên van akademiyan dibînin li qadên diçinê, wekî bajar û gundên sazî yan jî malbatên wan lê ne, tevlîbûnên xwe yên polîtîk di çarçoveyên demokratîk de pêk tînin. Akademî di vê maneyê de ocaxên tevlîbûna polîtîk in.

Behskirina cureyên dewreyên perwerdeyê ji bo fêmkirina fonsiyona akademiyên civakî yên li Rojava dê sûdmend be. Çawa ku dewreyên girtî hene, her wisa dewreyên vekirî jî hene. Dewreyên vekirî, ji danê sibe heya bi

nîvro ne yan jî rojane ne. Êvarê hemû beşdarvan vedigerin li malên xwe. Dîsa perwerdeyên vekirî, li hemû saziyên di çarçoveya rêveberiya xweser de jî, li gorî saetên xebatê û tempoya xebatê, li gorî daxwaza heftane yan jî mehane wekî semînerên ji yek saetê yan jî ji du saetan pêk tên tên dayîn. Mijarên semîner yan jî dersan dibe ku ji aliyê her takekesî/ê ve werin pêşniyarkirin. Li gorî derfetan li gorî van pêşniyaran plansaziya perwerdeyê tê çêkirin.

Akademiyên civakî ji bo ji nû ve rêxistinkirina jiyanê, hewl didin bi rola model-mînak rabin. Ji ber vê armancê her kêliya jiyanê girêk bi girêk tê hûnandin. Hemû rêbazên çêkirina hişmendiya azad di ber çavan re tê derbaskirin. Rola bingehîn a akademiyan ew e ku hişmendiya azad a jiyana komînal pêk bînin. Di heman demê de perspektîfa wan heye, di jiyanê de hilberîn û afirîneriya adil, ekolojîk, çandî, jin û zilam bi hev re bingeh bigire; çi mijar dibe bila bibe dikin armanca xwe ku çanda lêkolîn û nîqaşê jî bi pêş bixin. Ji ber vê armancê di çarçoveya akademiyên civaka demokratîk de navendên lêkolînê hatine vekirin. Fonksiyona navenda lêkolînê ew e ku nîqaşên li akademiyên civakî tên kirin karibin bigihêjin ber destê civakê jî.

Ji bo xwegihandina beşên civakê yên nikarin tevlî perwerdeyên akademiyê bibin, li ser mijarên diyar di çarçoveya paradigmaya modernîteya demokratîk de broşur, kovar, nivîs tên nivîsandin. Ji aliyê teknîkî ve di qada dîjîtal de jî li ser navê akademiya civaka demokratîk malperek heye. Di vê sîteyê de gelek nivîs, makale, materyalên perwerdeyê, weşanên nivîskî û dîtbarî hene. Lê belê rastiyeke welê jî heye ku tê de hilberîna fikrî lawaz xuya dike.

Di çarçoveya çalakvaniya çandî de li ser sosyolojiya bajarê ku ew lê dijîn konferans, civîn û aktîvîteyên cuda cuda tên lidarxistin. Raporên ji encama van aktîvîteyan tên derxistin ji bo rêveberiyen sazî yan jî kantonan tên pêşkêşkirin. Di afirandina civaka polîtîk û exlaqî de, dîsa ji bo parastina hebûna xwe, jiyana heyî li gorî şerê gel ê şoreşgerî birêxistinkirin, kar û barê bingehîn ê akademiyan e. Bi rewşa xwe ya heyî şiklên mifredat û perwerdeyê di çarçoveya pêdiviyên civakî de hatine birêkûpêkkirin.

**Di Avakirina Civaka Demokratîk De Pirsgirêkên Rojanê yên Akademiyên Civakî**

Li cîhanê gelek filozof, rewşenbîr, sosyolog û zanyaran, ji bo derketina ji krîza civakîbûnê ku di serdema me de ji ber modernîteya kapîtalîst rû dide, gelek pêşniyar kirine. Bêguman girîng in û nirxekî van pêşniyaran heye. Lê belê, her çendî li ser navê çareseriyê ev pêşniyar bi pêş xistine jî, nekarîne asta pêşniyarê derbas bikin. Pêşniyara çareseriya Neteweya Demokratîk ku ji aliyê Rêber Apo ve di dawiya sedsala 20'emîn û di destpêka sedsala 21'emîn de hatiye pêşxistin, ku xwe dispêre paradigmaya ekolojîk, demokratîk û azadîxwaziya jinê, vê gavê li hemû

cîhanê pêşniyara yekane ye. Bi şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûrî re çareseriya Neteweya Demokratîk ji rewşa bûna pêşniyareke alternatîf derketiye, dest pê kiriye pêk tê. Rêxistinbûna civakê ya derveyî dewletê, bi komun-meclîsan pratîze bûye. Şoreşa Rojava ku di pêkanîna civaka demokratîk de zarokeke hê deh salî bi bîra mirov dixe, mezinbûna xwe didomîne. Di nava vê pêşketinê de, ku mirov wekî pirsgirêkên mezinbûnê pênase bike, avabûna akademiyên civakî û rêxistinbûna wan jî deh salî ye. Em dikarin diyar bikin, di pêşketina têkiliyên civaka demokratîk de, ku xwe dispêrin azadiya jinê, zehmetî û serkeftin di zikhev de bi pêş dikevin û ev rewşa dizikhevdebûnê didome. Ji aliyekî ve encamên avabûna hişmendiya cinsiyetparêz a 5 hezar salan ku bi hemû civakê dane xwarin, ji aliyekî ve jî di heman dem û cihî de encamên kevneşopiya ku li dijî desthilatperestî û koletiyê di nava berxwedaneke demokratîk de ye tê jiyîn. Şikilgirtina di bin bandora kûr û berfireh a cinsiyetperestî, neteweperestî û olperestiyê de, jiyîna nakokiyên cidî jî bi xwe re tîne.

Derbaskirina hişmendiya serwer a koledar, feodal û netew-dewletê bi ronîbûneke mezin rastiyeke wisa ye ku her kes li ser hemfikir e. Di xebat û rêxistinbûna akademiyên civakî de, perwerdeyên di destpêkê de bi dildarî û daxwazeke mezin dihatin dîtin, her diçe quweta xwe ya cezbê kêm dikin. Sedema vê ya herî girîng, şoreşa Bakur û Rojhilatê Suriyeyê hê jî di nava şer de ye. Pêvajoya şerê gel ê şoreşgerî hê jî didome. Li cem vê, pirsgirêka bingehîn ew e ku Xweseriya Demokratîk wekî bingeh pergala meclîsan esas digire. Li şûna feraseta yekîtiyê ya komînan a hevkarî, kolektîvîzm û dildariyê, derbasnekirina çanda hiyerarşiyê ya civaka dewletparêz faktoreke din e. Her çendî bi rêya akademiyên civakî dana qezenckirina hişmendiya Xweseriya Demokratîk, pêşketinên di asta ronesansê de pêk hatine jî, nedomdarkirina perwerdeyên di komînên gundan de hatine destpêkirin sedemeke din a zeîfiya heyî ye. Em dikarin bêjin, pêvajoya xweperwerdekirinê di heman demê de pêvajoya civakîbûnê ye û ev hê di qonaxa pitikbûnê de dijî. Xwedîderketina li nirxên bingehîn ên demokratîk û çanda modernîteya kapîtalîst a bêrûmetkirinê û mezaxtker di zikhev de tên jiyîn. Ev rastî sedema bingehîn a têkoşîna akademiyên civakî ye jî.

Li Rojavayê Kurdistanê akademiyên civaka demokratîk xwe xweser bi rêxistin dikin. Perwerdeya xwe dispêre dildariyê, dide hewcekirin ku kesên vî kar û barî radikin jî dildar bin. Di qonaxa niha de di mijara xwegihandina hemû civakê de pirsgirêkên cur bi cur tên jiyîn. Di meclîs û komînên gund, tax, kolanan ên destpêkê hatibûn avakirin de komîsyonên perwerdeyê bi kelecan û daxwazeke diyar perwerde bi rêxistin dikirin. Lê belê ev perwerde di asteke monoton, dubare de man, rêbazên dayinê nehatin guhertin.

Dîsa seraserabûn didome. Ev rewşa tê maneya xetimînê û li ser tevlîbûna perwerdeyê jî bandor dike. Tevî ku ji aliyê kûrbûnê ve astek heye, ji aliyê pirsgirêkên bingehîn ên civakî ve rewşa ku dibêje pirsgirêk di 'teoriyê' de dimînin ji aliyê gel ve tê rexnekirin. Her çendî li ser pirsgirêkan vekirî tê nîqaşkirin û ev yek bandorên erênî çêdikin jî, ji ber ku civak vê yekê bi şiklekî şênber nabîne nakokî tên jiyîn. Di çêkirina zêmînê nîqaşa azad de akademiyên civakî bi rola xwe radibin, lê di dana qezenckirina hêza çareseriyê ya şênber de hê jî zeîfî tên jiyîn. Li vê derê pirsgirêka bingehîn ew e ku perspektîfa akademiyên civakî û pratîka jiyana komînal a daye qezenckirin li hemû qadan nayê pêkanîn.

Diviyabû têkiliyên di navbera saziyan de bûbûna armanca pêşxistina civaka polîtîk, lê di asteke têrê bike de pêkneanîna van têkiliyan wekî pirsgirêkeke girîng tê jiyîn. Di avakirina civaka demokratîk de rehendên cuda cuda yên civakê jî di asta sazîbûnê de rêxistinbûna xwe çêkirine. Erka her rehendê ye ku pêwîstiyên qada xwe pêşwazî bike û dîsa ji bo ku hemû beşên civakê jê sûdê bigirin derfetên perwerdeyê pêk bîne. Her rehend li ser navê rehenda xwe bi şiklê ku akademiyan bi rêxistin bikin vê erka xwe pêk tînin. Lê belê ji ber ku têkiliyên akademiyên civaka demokratîk û akademiyên rehendan nagihîjin asteke sazîbûyî, pirsgirêka belavbûn-parçeparçebûna akademiyan derdikeve holê. Akademiyên Civaka Demokratîk wekî rêxistina sîwan a hemû akademiyan xwe bi rêxistin kiriye. Lê belê nêzîkbûna sazîperestî û xwetengkirina her saziyê, pirsgirêka li pêşiya akademiyên civaka demokratîk e û erka wan a herî girîng e ku vê rewşê derbas bikin. Fonksiyona bingehîn a akademiyên boyûtan (rehend), boyûta pê re eleqadar û pîşeya wê ye. Li ser beşekê ye, nabe ku ji bo giştî be. Mînak; rola akademiya ekonomiyê, li ser mijara ekonomiya komînal zanebûna xwe kûr bike, civatên ekonomiyê bi rêxistin bike yan jî zanebûna xwe ya li ser kooperatîfan kûr bike. Yan jî rola akademiyên ewlekariya hindûrîn, dayina perwerdeya li ser esasê ewlekariyê ye. Lê rola bingehîn a akademiyên civaka demokratîk ew e ku hemû yan jî beşeke civakê bîne cem hev û her wisa feraset û fêmkirina civaka yekpare çêbike. Di rêxistinkirina pratîkê de hê jî ev ast nehatiye girtin. Bi taybetî di xebatên birêxistinkirina boyûtan de li şûna perwerdeya bi giranî mijarên pîşeyî digire dest, heman mifredata akademiyên civakî tê dayin. Di vê mijarê de nêzîkbûna bi israr û feraseta "qada min, ez ê pêk bînim, kes nikare dest lê werde", rola akademiyên civaka demokratîk zeîf dikin. Dîsa ji ber bêrêkûpêkiya têkiliyên di navbera saziyan de pirsgirêka her ders ji aliyê her kesî dayinê, bi xwe re pirsgirêka li gorî xwe fêmkirinê jî tîne. Mirov dikare bêje di vê mijarê de jî pirsgirêkek heye. Her çendî li gorî ferasata rêgeza pirrengiyê hebûna ji yekê zêdetir fikran wekî dewlemendî

were nirxandin jî, di akademiyan de li cihên ku nebesiyên nîqaşê hene xetereya nêzîkbûna dogmatîk, bi xwe re pirsgirêkan diafirîne. Bêyî ku ji belavbûn-parçebûnê re bibe sedem, hewce dike zemîna ku her parçe di heman demê de karibe wekî hemûyê-parçeyê mezin xwe ava bike were afirandin. Ji bo ku perspektîfa bingehîn a paradigmaya neteweya demokratîk "li ber siya darekê jî be lidarxistina perwerdeyê" pratîze bibe, pêwîst e têkîliya beden û cewher were çêkirin.

Di avabûna civaka demokratîk de fonksiyoneke cuda ya akademiyên civakî jî perspektîfa exlaqî-polîtîk li hemû qadan wekî referansa bingehîn jiyanî bibe. Ji bo vê yekê hewce ye analîza sosyolojîk, dîrokî û zanistî ya pirsgirêkên bingehîn ên civak dijî bike û tevkarî bike ku mekanîzmayên birêvebirinê li gorî vê werin birêxistinkirin. Li Rojava akademiyên civakî hê xwe negihandine vê astê. Sedema vê ya herî bingehîn, parçebûna di feraseta avakirina xweseriya demokratîk de ye. Xebata avabûnê ya parçeparçeyî ji navendîbûnê çavkaniya xwe digire. Di jiyanê de çînîbûn ji beriya her tiştî, di plana pêş de ye. Di qada bazirganiyê de hatina asteke hakim a çîna navîn, nêzîkbûna wê ya israra bêîdeolojîbûnê, hewce dike bi şiklekî cidî were bidestgirtin. Di perwerdeyên akademiyan de beşa civakî ya ku di asta herî kêm de cihê xwe tê de digire çîna navîn e. Di perwerdeyên tên dîtin de di her mijarê de nîqaşên li ser exlaqê li pêş in. Kesekî ku bi karê bazirganiyê re mijûl dibe, mexezeyekê dide bikaranîn, tevlî ders û semînerên li akademiya civakî tên dayin yan jî ji aliyê akademiyên civakî ve tên organîzekirin nabe. Wateya vê tevlînebûnê ew e ku fikaran dike jiyana wî/ê bikeve ber lêpirsînê. Ligel ku fikara lêpirsînkirina xwe dike jî, divê mirov tesbît bike ku sedema bingehîn a tevlînebûnê dûrbûna ji qada polîtîk e.

Tê zanîn ku rastiya gel a heyî dûrî qadên polîtîk e yan jî qadên polîtîk ji bo her beşa civakî ne vekirî ye, yanî civak ji raboriyeke wisa tê. Tam jî di vê mijarê de yek ji rola herî girîng a ku akademiyên civakî pê rabe, dana qezenckirina feraseta jiyana polîtîk e. Yek ji rola herî girîng a akademiyên civakî li Rojava jî, xebata tevlîbûna polîtîk e. Di dewreyên girtî yên tên meşandin de jiyan bi temamî ji bo pêşxistina zanebûna tevlîbûna polîtîk tê biplankirin. Dîsa ji bo beşdarvanên xwendin û nivîsandina wan nebe di saetên êvarê de saetekê, ji aliyê kesekî/e beşdarvan ve perwerde tê dayin. Di akademiyên civakî de astengdar yan jî gaziyên şer ên bi şiklekî bêdeng ji derveyê civakê hatine hiştin jî cihê xwe digirin. Ji bo wan di hin kar û xebatên rojane de cudakariya pozîtîf tê naskirin. Bi qasî ku derfet hebe bi awayekî hesas tevger çêdibe ku tevlîbûna wan di asteke herî bilind de be. Ji bo beşdarvanên astengiya wan a dîtinê, bihîstinê, meşê yan jî cuda cuda hebin, nêzîkbûnên ku wan kategorîze bikin û ji derveyê civakê dibînin nayên qebûlkirin.

Hebûna têkîliya parçe-hemû di

çarçoveya têkiliya demokratîk de qebûlkirin û pêşxistina pêkhateyên optîmal, fonksiyoneke din a akademiyên civakî ye. Di pêkanîna vê fonsiyonê de jî tengavî tên jiyîn. Nêzîkbûna navendîkirina xwe ya her boyûtê yan jî her saziyê, tenê bi dersdayinê tenggirtina dest a fonksiyenelbûna akademiyan, nêzîkbûneke înduksiyoner (di çarçoveyeke pir teng de bidestgirtina tiştekî) e. Wekî ku me di destpêka vê nivîsê de jî diyar kir, di avakirina hişmendiya herêmî-gerdûnî yan jî parçe-hemû de, akademiyên civakî hê jî ji aliyê rola xwe ve di asteke pir kêm de ne. Çêkirina têkiliya di navbera akademiyan de, di xebata avakirina civakeke demokratîk a nû de wê bihêle ku hişekî hevpar derkeve holê.

Akademiyên civaka demokratîk bi şiklekî xweser xwe bi rêxistin dikin. Parastina vê xweseriyê bi xwegihandina hişmendiya azad dibe. Ji ber vê yekê şert û merc ew e; hewce ye li ser esasê ku hişmendiya desthilatîperest û koledar were derbaskirin têkoşîna xwegihandina hişmendiya azad were meşandin. Ev şert jî pêwîst dike ku mirov li derveyî sîstemê be, bibe parazvanê jiyana li derveyî dewletê, agahiyê ji destê sîstema yekdestdar bigire û mîna Prometeus bide gel. Berevajiya hişmendiya pergala ku ferqa di navbera agahî û zanînê de bi pereyan bi qasî dikare berfireh dike, hemû agahî û zanista xwe bi qasî dikare bi civakê re parvekirin, ji bo xebatên akademiyên civakî bi qasî ku bêyî wê nebe girîng e. Bi armanca ku ev rêgez ji bo jiyanê bibe jêneger, ne mijara nîqaşê ye ku di pêşberî pereyan de perwerde were dîtin. Îdeolojiya modernîteya demokratîk, xwe dispêre rêxistinbûna civaka ji derveyî kapîtalê. Û agahî û zanîn di pêşberî pereyan de nayê kirîn yan jî nayê firotin. Têkoşîna li beramberê desthilatîperestiya agahiyê (zanist) ya kapîtalîst ku bi esasgirtina rêbaza perwerdeyê ya Sofîzma Yewnan hatiye afirandin, li ser vê bingehê tê meşandin. Endamên komîte ku di komîteyên perwerdeyê de ders didin yan jî her kesê/a dixwaze li ser mijarekê ders bibîne, nîqaş bike, lêkolîn bike, dixwaze ji lêkolînan sûd bigire, bêyî ku ti şert hebin dikare tevlî xebatan bibe û ji hemû xebatan sûdê bigire. Pirsgirêka di vê mijarê de tê jiyîn, pêşwazîkirina pêdiviyên neçar e hebin ên endamên perwerdeyê ne. Hewce dike keda fikir û lêkolînê bi rêya kooperatîfên pêdiviyên jiyanê yên neçar e hebin were pêşwazîkirin, ya rast jî ev e. Di rewşa heyî de ev rexistinbûn nehatiye afirandin.

Akademiyên civaka demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di nava civakê de mohra xwe li gelek tiştên 'destpêkê' daye. Lê belê em dikarin bêjin, di mijara ku hin demên diyar de li ser hin mijaran sempozyûman li dar bixe û ezmûn û pratîka jiyanê ya derbas kiriye bi cîhanê re parve bike çênebûye, xebatên bingehîn ên entelektuel hê wekî hedef daneniye pêşiya xwe. Ji vî alî ve teng dimîne, xwe sînordar dihêle. Li şûna ku di vê mijarê de xebateke cidî ya entelektuel hebe,

carina bi pirsgirêkên ne bingehîn dema xwe wenda dike. Di pergala Xweseriya Demokratîk a heyî de pêşwazîkirina pêdiviyên hemû endam û xebatkaran, wekî xebata bingehîn hatiye meşandin û tê meşandin. Pêwîst e were diyarkirin ku her çendî rêxistinbûna xwe dispêre van xebatan hatibe asteke diyar jî nebûna xebatên entellektuel, teng û herêmîbûna yên hene xebatên li ser hişmendiyê piralî xetimandiye û di encama vê xetimînê de xetereya paşve vegerînê heye. Lê belê di cih de ye ku mirov bîne ziman, ev hişmendî hê jî çênebûye.

Pêşwazîkirina pêdiviyên xebatkarên rêveberiya herêmî yên pergala Xweseriya Demokratîk ji aliyê perwerdeyên akademiyên civakî ve, bi roleke girîng rabûye ku şoreşa Rojava di demeke kurt de ji bo gelên cîhane yên bindest bibe mînak. Dema em li pişta xwe dizîvirin û li van deh salên derbas bûne dinêrin di nava bi her awayê êrîş û şer de hêza kadro ya xebatên civakî ya li hemû qadan, dikare were dîtin ku bi derxistina holê ya rola civakî ya akademiyan re têkiliya rêjeyeke rast çêdike.

Di demokratîzebûna civakê de akademiyên civakî xwediyê roleke diyar in. Pirsgirêkên van ên çêkirina têkiliya herêmî-gerdûnî, ji pirsgirêkên salên piştre derketine holê hatine fêmkirin. Ferasetên ku giraniyê didin ser ya herêmî derketine holê. Lêgera çareseriyê ya teng û herêmî, jênerev e ku ji bo pirsgirêkên dixetimînin rê veke. Di heman demê de pêwîst e were diyarkirin ku ferasetên wekî biyanîbûna li hev, her kes xwe derdixe pêş, herêma ku ew lê cih digire derdixe pêş û yekparebûna ferq û cudahiyan tine dihesibîne di nav pergalê de derketine holê. Dema bi îdeolojiya demokrasiya pirrengî, bandora qutbûna ji hev hate derbaskirin, li ser pêwîstiya rêxistinbûneke nû nîqaş hatin meşandin, dest pê dike bingeha van ferasetan ji holê radibe.

Akademiyên civakî ku di civakîbûnê de gaveke li pêş in bi gelek zor û zehmetî û tengasiyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji dayik bûne û qonaxa xwe ya pitikbûnê jiyane. Em dikarin bêjin niha jî qonaxa zarokatiya xwe dijîn. Rastiyek wisa li holê ye hê di gelek mijaran de zor û zehmetî li ber derî ne. Derbaskirina van zehmetiyan xebatên gihandina hev a jiyana komunan a li gundan û meclisên bajaran dê bihêle ku jiyan bi hişmendiya azad were avakirin.

# BI ŞOREŞA ROJAVA RE DERIYÊ ŞOREŞA CÎHANÊ HAT VEKIRIN

**Grûbeke biçûk a Aşûrî hat cem me. Ew jî êdî mezintir bûn. Hevalên Tirk jî li vir in. We herhal ew dîtin. Bi vî rengî xweştir e, ne wilo? Tevgereke wisa ye ku hemû gelan tîne ba hev. Ereb jî li vir in. Tevgereke enternasyonalîst û bi vî rengî pir bi nirx e. Tiştekî pir xweşik e.**

**HEVALA DÎROK**

"Ev şoreş firina herî bi agirê geş a şoreşa cîhanê ye. Firineke wisa ye ku bi awayekî herî zindî dişewite. Şoreşa li Kurdistanê ji nav hemû şoreşên hêyî ya herî enternasyonalîst e. Ji bo ve yekê bi sebir xwe bixe navê, wekî ev şoreş şoreşa te be." **(Ji diyaloga Rêbertî bi şehîd Ronahî Alman re)**

Em dikarin ji gelek aliyan li şoreşa Rojava binêrin ji ber ku aliyên wê yên girîng pir in. Yek ji wan bê guman aliyê wê yê enternasyonalîst e. Ji ber ku bi şoreşa Rojava re êdî paradîgma me û hebûna me wekî rexistin zêdetir li seranserî cîhanê hat naskirin. Bi rastî şoreşa Rojava ji bo me û ji bo paradîgma Rêbertî ji bo bibe çareseriya pirsgirekên hêyî firsendeke mezin ava kir. Gelo me ev firsend çiqasî nirxand û rola enternasyonalîzmê di Rojava de çi ye? Em dixwazin vê yekê bi vê nivîsê zêdetir bidine fêmkirin û em hêvî dikin ku bi kûrtir fêmkirina nêzîkatiya me ya enternasyonalîst, mîrasa wê û erk û bepirsyartî ku

dikeve ser milê me were fêmkirin ji bo em di pratîka xwe de li ser vî esasî tevbigerin. Di nav de em hem li ser têgîna enternasyonalîzm, dîroka enternasyonalîzm û enternasyonalîzm di nava tevgera azadî de bisekinin.

Enternasyonalîzm wekî têgîn ji kevneşopiyeke sosyalîst tê. 'Enter' ji zimanê Latînî tê û maneya wê 'di navberê de', 'nasyon' tê maneya netewê û 'îzm' jî îdeolojiyekê nîşan dide. Bêhtir em dikarin wekî fikrê xwîşk û biratiya gelan û piştgiriya di navbera gelan de pênase bikin. Bê guman fikrê enternasyonalîzm mirov ji sosyalîzm qut nikare bigre dest. Eger em baş binêrin wekî têgîn jî di dema derketina hareketên sosyalîst de derdikeve. Zaten pênaseya Marks û Engels di sala 1848'an de di manîfestoya komunîst de dibêje hemû karkerên cîhanê pêwîst e bibin yek û ev fikir vê yekê îfade dike. Diyar e ku em tenê wekî mirovatî bi hev re dikarin pirsgirekên kapîtalîzmê çareser bikin. Yek welat ku bibe sosyalîst yan tenê cihekî ku ji kapîtalîzmê rizgar bibe demdirêjî nikare xwe li ser lingan bigre.

Em behsa sala 1864 dikin. Rexistina 'enternasyonala yekemîn' li bajarê Londra tê avakirin. Di gelek welatên de bi pêşketina endustriyalîzmê jiyana karkeran hîn bêhtir zehmet dibe û naxwazin vê yekê ji bo xwe qebûl bikin. Fikrê sosyalîzmê ku di wan salan de roj bi roj zêdetir belav dibe û hêviyeke mezin di nav karkeran de çêdike, di heman demê de wisa tê fêmkirin ku ji bo vê yekê rexistinbûnekî ku sînora dewletan derbas bike pewîst e. Lê, di hêla rê û rêbaza gihiştina vê armancê de fikrên pir dijber hene. Li milekî bi taybetî ji bo Komunîstan fikrê dewletê pir li pêş bû û zaten li ser esasê vê nakokiyê ew û Anarşîstan li hev nakin û di dawiyê de piştî tenê heşt salan enternasyonala yekemîn ji hev belav bû, lê pêşketina wê bi xwe hewldaneke girîng bû. Ji vê demê û şûn de êdî gelek rexistinên Anarşîst xwe di bin navê 'enternasyonala dij otorîtê' de bi rêxistin dikin. Di sala 1889'an de careke din gelek insanên komunîst û sosyalîst tên gel hev û enternasyonala duyemîn îlan dikin. Enternasyonala duyemîn jî heta Şerê Cîhanê yê Yekemîn didome, lê ji ber ku hemû partiyên sosyal demokrat ku di nava enternasyonala duyemîn de cihê xwe digirin, di wextê şer de piştgirî didin hikumeta xwe û bi vê yekê karkerên wan welatan di nav şer de tînin hemberî hevdû û lewma jî ti wateya wê rêxistinê nahêlin û di 1916'an de belav dibe.

Dema ku di sala 1917'an de li Rûsyayê Şoreşa Cotmehê pêk tê, bandoreke mezin çêdike. Tenê du sal şûnde li peytaxta Rûsya, li Moskova, bi hedefa ku li welatên din ên cîhanê şoreşê bi rê xîne enternasyonala sêyemîn ango Komîntern (enternasyonala Komunîst) tê lidarxistin. Lê, di dema Stalîn de rola enternasyonala sêyemîn êdî kêm

dibe û zêdetir wekî amûrekî piştgiriya Yekîtiya Sovyetê û bi taybetî Rûsya tê bikaranîn.

Dema ku em li dîroka Tevgera Azadiyê binêrin em dikarin vê yekê pir zelal bibînin: Rexistina PKK'ê û fikrê Rêbertî ji destpêke ve di nava xwe de enternasyonalîzmê dihewîne. Dema ku Rêbertî di sala 1972'yan de ji hepsa Mamakê derdikeve ewilî diçe mala hevalê Hakî Karer û hevalê Kemal Pîr û rêxistinbûna destpêkê bi van hevalan re pêş dixîne. Herdu heval jî ne Kurd in, lê herdu jî sosyalîst in, herdu jî şoreşger in. Ne Rêbertî û ne jî van hevalan bi awayekî teng li şoreşê mêze kirin, negotin gerek tenê Kurd di doza azadiya Kurdistanê de cihê xwe bigirin. Eger em bi hinek têkoşînên rizgariya neteweyî yên wê demê re hevrû bikin, bi piranî ji yek neteweyê, bi taybet jî ji neteweya bindest pêk hatin. Bi taybetî di gavên destpêkê de. Ev, di têkoşîna Tevgera Azadiyê de nuqteyeke gelekî girîng e. Ji salên destpêke ve gelek hevalên ku bi xwe ne Kurd in tevlî rexistinê dibin. Zaten di gelek herêmên Kurdistanê de gel di nav hev de bi aramî dijîn, lê hemû jî di bin dargirkeriya dewleta faşîst a Tirk de gelek êşan dikşînin. Di paradîgmaya me ya kevn de dema ku behsa armancê tê kirin ti carî di çarçoveya teng a netewperestî de nehatiye bidestgirtin. Rêbertî, dema ku armanca şoreşê pênase kir her tim Kurdistaneke azad û sosyalîst diyar kir. Kurdistaneke wisa ye ku di nav de gelên cur bi cur pêkve dijîn.

Rêbertî li gel şehîd Rojbîn Ereb diaxive û jê re dibêje: "Temam, PKK'yîbûn ne tiştekî xerab e. Lê belê, divê neyê kaşkirin. Erebekî/e baş divê çawa be, ev pirs jî divê were pirsîn. Lê, ya herî girîng ew e ku divê pirsa çawa bibim mirovekî/e baş, were pirsîn. Ez ji bo xwe tu carî napirsim gelo Kurdekî baş çawa dibe, bi ya min APO tenê mirovekî baş e. […] Ez neketim doza Kurdîtiyê. Ji ber ku Kurd bûm. Ji bo bibim mirovekî baş ketim vê dozê." Careke din jî Rêbertî ji sê enternasyonalîstên Ermen re dibêje: "Grûbeke biçûk a Aşûrî hat cem me. Ew jî êdî mezintir bûn. Hevalên Tirk jî li vir in. We herhal ew dîtin. Bi vî rengî xweştir e, ne wilo? Tevgereke wisa ye ku hemû gelan tîne ba hev. Ereb jî li vir in. Tevgereke enternasyonalîst û bi vî rengî pir bi nirx e. Tiştekî pir xweşik e."

Tê zanîn, di duyemîn nîvê sedsala 20'emîn de li her derê cîhanê gelek rexistinên şoreşgerî ji bo azadiya gelê xwe û li hemberî sîstema dagirker û kapîtalîst şer kirin. Ji wan gelekan jî bi ruhê enternasyonalîzmê têkoşîn meşandin. Di heman demê de jî di çarçoveya têkoşîna wan de piştgiriya navneteweyî ango enternasyonalîst gelekî bandor kir. Yek ji mînakên berçav jî Vîetnam e. Ji bo piştgiriya gelê Vîetnamê li hemberî dagirkeriya DYE bi mîlyonan însan li gelek welatan daketin qadan. Her wiha ji bo piştevaniya têkoşîna Sandînîstan a li Nîkaragûayê gelek çalakî çebûn. Em dikarin li mînaka başûrê Afrîkayê jî mêze bikin. Yek ji sedema serketina

têkoşîna wan jî kampanyayên navneteweyî ye ku li dijî sîstema Apartheîd ya Başûrê Afrîkayê pêş ket.

Di salên 1970-80'yan de şoreşgerên Filistînî li başûrê Lubnanê bi hejmareke mezin kampên xwe vekirin. Di nav van kampan de ji bo gelek rexistin û şoreşgerên cîhanê derfet dan ku perwerdeya çekdarî bibînin û xwe wekî rexistin pêş bixin. Ev, mînakeke pir girîng a enternasyonalîzmê ye. Rexistinên şoreşger ên mîna RAF (Alman), şoreşgerên mîna Denîz Gezmîş wan hatin vir û perwerde dîtin. Dema ku Tevgera Azadiya Kurdistanê jî li vir perwerde didît, di sala 1982'yan de, li dijî rexistinên Filistînî êrîşa Îsraîlê çêbû. Li dijî vê êrîşê endamên Tevgera Azadiyê jî di êniyên herî pêş de cihê xwe girtin. Di vê êrîşa Îsraîlê de 12 heval bi ruhê enternasyonalîst di parastina gelê Filîstîn de cihê xwe digirin û şehîd dibin. 15 kadroyên Tevgera Azadiyê dîl ketin destê Îsraîlê û gelek kadro jî di nava dorpêçê de man.

Di dîrokê de ya ku ev kiriye, yanî ji bo şoreşgeran derfet vekiriye ne tenê Filistînî ne. Piştî ku Cezayîrê xwe ji dagirkeriya Fransayê rizgar kir, di salên 1960'î de gelek rêxistinên şoreşger li Cezayîrê kom bûn, perwerde dîtin, xwe rêxistin kirin, hem jî li cem rêxistinên din peywendî danîn û peywendiyên heyî jî pêş xistin. Li ser esasê berfirehkirina peywendiyan rêxistinên şoreşger xwestin ku bi armanca piştevaniya gelên têkoşer ên li Efrîka û Asyayê di sala 1965'an de li Cezayîrê konferanseke mezin li dar bixin. Piştre ev yek ji ber rewşa ewlekariyê li Cezayîrê çênabe, li ser qadê destwerdanên derve çêdibin. Li ser vê yekê konferans bi navê Trîkontinental (Konferansa Sê Parzemînan, ango Asya, Efrîka û Latîn Emerîka) ji 82 welatan bi tevlîbûna nêzî 500 delegeyî di sala 1966'an de li Kubayê tê lidarxistin. Kuba jî beriya heft salan bi pêşengiya Che Guevara û Fîdel Kastro ve hatiye rizgarkirin. Che, di vê demê de tevlî konferansê nabe, ji ber ku li Bolîvyayê têkoşîna şoreşgerî dimeşîne. Che Guevara bi xwe doktorekî ji welatê Arjantînê ye. Ji bo ku gelê Kubayê ji zilmê rizgar bikin tevî hinek şoreşgerên Kubayî di sala 1953'yan de bi keştiyekê ji Meksîka derbasî Kubayê bûn. Şoreşa wan a li Kubayê di sala 1959'an de bi ser ket. Piştî şoreş bi ser ket, Che wekî şoreşgerekî qîma xwe bi wezîrtî yan jî mezextina derfetên şoreşê neanî. Pêwîstî dît ku alîkariyê bide gelên bindest ên cîhanê. Ji ber vê yekê derbasî Bolîvya bû û li wir şehîd bû. Ji ber vê karakter û pratîka xwe ya têkoşer Che Guevara di cîhanê de wekî sembola enternasyonalîzmê hat naskirin.

Di dawiya sala 1980'yan de dîwarê Berlînê tê hilweşandin, Yekîtiya Sovyetê ji hev belav dibe û ev di cîhanê giştî de dibin bingehê gelek guhertinan. Ev yek bû sedem ku têkoşîna gelek rêxistinên şoreşger jî bi dawî bibe. Ji ber vê yekê sîstema

modernîteya kapîtalîst zafera xwe îlan kir, bi navê qaşo "Careke din sosyalîzm çênabe" ev pêvajo jî wekî "serdema bidawîbûna îdeolojiyan" bi nav kir. Bi rastî jî vê yekê bi awayekî neyênî bandor li tevgerên têkoşer kiribû. Lê, bi saya mêzekirina berfireh û tehlîlên baş ên Rêbertiyê ji bo ku nêrînên nû jî pêş bikevin derfet çêbûn. Pir eşkere bû ku pirsgirêk ne di sosyalîzmê de bû, pirsgirêk di pratîka wê de bû, di hin tez û teoriyan de bû ku bingehê Sosyalîzma Pêkhatî pêk dianîn. Ji ber vê yekê Rêbertiyê di sala 1995'an de pirtûka bi navê "Di Sosyalîzmê De Israr, Di Mirovbûnê De Israr E" derxist. Li gel ku Sosyalîzma Pêkhatî belav dibû jî di heman salan de, di salên 1990'î de li Botanê serhildanên gel çêdibûn, Tevgera Azadiya Kurdistanê mezin dibû, gelek keç û xortên Kurdistanê tevlî nav refên gerîlayên azadiya Kurdistanê dibûn. Di heman salan de ji welatên derveyî Kurdistanê jî ber bi Rojhilata Navîn, sehaya Rêbertî ve enternasyonalîst tên û tevlî nav refên gerîla dibin. Yek ji van mînakan jî hevala Ronahî Alman e, ku di sala 1998'an de li Botanê ji aliyê dewleta Tirk ve tê şehîdkirin.

Rêbertiyê, ji ber nêzîkatiya enternasyonalîstî nirxekî mezin daye van hevalan, hewl daye ji bo wan hemû derfetên pêwîst veke. Dema ku li gel van hevalan diyalogan dike jî hewl dide gelek perspektîf û fikrên nû bide wan. Dixwaze ku karibin bi hêzeke mezin û baweriyeke xurt hem li Kurdistanê hem jî hîn zêdetir li welatê xwe kar bikin, têkoşînê xurt bikin. Rêbertî di diyalogekê de ji hevalekî Alman re wisa dibêje: "Ez vê yekê pir zelal bibêjim; li cem me mîna li Almanyayê dibe xwe biyanî dîtin, xwe biyanî hiskirin tine ye. Em li vir ne tenê behsa meseleyeke Kurdan dikin. Em behsa meseleyeke mirovahiyê dikin. Ev, meseleyeke mirovahiyê ye. Em ê hevaltiya herî zindî biafirînin. Hûn ê ji me bêhtir feydeyê ji vê têkoşînê bibînin."

Li dijî Rêber Apo Komploya Navneteweyî di sala 1998'an de dest pê dike, Rêber Apo ji Sûrî tê derxistin û di 15'ê Sibata 1999'an de li Kenyayê tê girtin û teslîmî dewleta Tirk tê kirin. Ev pêvajo di Kronolojiya PKK'ê de wisa tê diyarkirin: "Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan di encama lihevkirina CIA- û bi 'erê'kirina Rêveberiya TC'yê li balafirgeha Naîrobiyê teslîmî kontrgerîlayê Tirk tê kirin. Li vir lihevkirina herî esasî ew e ku dema ku DYE ji bo rûxandina Rêveberiya Sedam Huseyîn MÎT êrîş kir dewleta Tirk jî piştgirî bide. Rêber Apo bi balafireke ku ji hêla dewleta Tirk ve hatibû kirêkirin ji Kenyayê girtin û di ser Misrê re birin Stenbolê. Bûyer ji aliyê Serokwezîrê Dewleta Tirk Bulent Ecevît ve roja 16'ê Sibatê di saet 9'an de bi civîna çapemeniyê ji raya giştî re hate ragihandin. Gelê Kurd dema ku bûyer bihîst li çar parçeyên Kurdistanê û li çar aliyên dinyayê rabû ser piyan…"

Piştî kompoloyê yekser tasfiyekariya navxweyî serî hildide û dixwaze li ser

Tevgera Azadiyê bi bandor be. Hem pêvajoya Komploya Navneteweyî û hem jî pêvajoya tasfiyekariyê di aliyê enternasyonalîst ê tevgerê de bi xwe re gelek zehmetî anîn. Ruxmî ku di salên 90'î de ji bo Tevgera Azadiyê piştevaniya enteryasyonalîst pir zêde ye jî têrê nake ku karibe pêşiyê li Komploya Navneteweyî bigire. Di heman demê de tasfiyekariya di heman pêvajoyê de xwe darîçav kir jî rêxistin gelekî bi xwe re mijûl kir.

Di heman demê de, Rêber Apo piştî dahûrandinên berfireh ên têkildarî modernîteya kapîtalîst û bi giştî şaristaniya dewletdar pêwîst dibîne ku paradîgmaya Tevgera Azadiyê biguhere. Di warê fêmkirina paradîgmaya nû de û her wiha di warê belavkirina wê de lawazî çêdibin û pratîka vê bi derengî tê pêşxistin. Lewma jî di vê pêvajoyê de gelek enternasyonalîstan ji guhertina paradîgmayê baş fêm nekirin. Di wergerandina paraznameyên Rêbertî de lawazî çêbûn, bi zimanên din ên cîhanê nehatibûn wergerandin. Ev hemû jî dibin sebeb ku piştgiriya enternasyonalîstan a ji bo Tevgera Azadiyê li gorî salên 90'î kêmtir bibe. Her wiha, di heman demê de rewşa tevgerên şoreşgerî yên cîhanê jî pir zêde ne baş e, wekî hejmar kêmtir bûne. Modernîteya kapîtalîst bi awayekî zêde bi îdeolojiya lîberalîzmê êrîş kir û fikrên ezeztiyê li ser gelek çepgiran bi bandor kir. Yanî hêzên çepgir û li dijî sîstemê li gorî salên 1960-70'yî lawaz dibin. Carina ji bo hin çalakiyan yan jî civînên mezin li hev kom dibin, lê belê ev yek bi xwe jî bi rengekî domdar pêk nayê.

Bi Şoreşa Rojava re êdî ji bo xebatên enternasyonalîzmê rûpeleke nû vedibû. Şoreşa Rojava ne tenê di çarçoveya Kurdistanê de, bi awayekî pirmilî û berfireh firsendan pêşkêş dike. Di sala 2014'an de dema ku çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kirin û bi taybet dema ku li dijî çeteyên DAÎŞ'ê berxwedana Kobanê pêk dihat, çavê hemû dinyayê li ser Rojavayê Kurdistanê û bi giştî Kurdistanê bû. Vê yekê rê vekir piştgirî û piştevaniyeke mezin çêbibe. Ne tenê ev, di heman demê de gelek hevalên enternasyonalîst ji çar aliyên cîhanê bi rê ketin, berê xwe dan Kurdistanê û tevlî nav refên YPG-YPJ'ê bûn. Ji van hevalan gelekan bi qehremanî li ber xwe dan û şehîd bûn.

Rast e, dema ku mirov li şerê antî-faşîst ê li Îspanyayê dinêre, hejmara enternasyonalîstên hatine Rojava li gorî hejmara şoreşger û enternasyonalîstên di sala 1936-39'an de çûne Îspanyayê kêm e. Wê çaxê derdora 50 hezar însanî tevlî tûgayên enternasyonalîst bûn, ji van nêzî deh hezarî şehîd bûn. Lê belê, şert û mercên wê demê û vê demê ne eynî ne, ji hev gelekî cudatir bûne. Ev şert bi milekî girêdayî rêxistin û rêxistinbûna hêzên çepgir e. Di dema sala 1936'an de enternasyonala sêyemîn gelekî mezin û xurt bû. Gelek însan rêxistin kirin û şandin Îspanya/Katalonyayê. Di heman demê de hêzên anarşîst ên

wekî sendîkayên mîna CNT'ê jî piştgirî dan, û ne kêm bûn. Yek jî ev şer li nîvê Ewropayê çêdibû, xwe gihandina wê siviktir bû. Ne tenê ev, di heman demê de li Ewropayê tirseke pir mezin hebû ku heger Franko, dîktatorê faşîst ê Îspanyayê bi ser bikeve wê faşîzm li giştî Ewropayê û cîhanê belav bibe. Di roja me ya îro de mînaka Ûkraynayê heye. Ji ber ku li Ewropa ye ewqas însan diçin wir û lê şer dikin. Di aliyê erdnîgarî de Kurdistan li gorî van deveran dûrtir dikeve. Ne tenê ev e, bi mêzekirineke oryantalîst, wisa tê fêmkirin ku li Kurdistanê her tim şer heye. Her wiha, di giştî de jî li ser Kurdistanê bi her aliyî ve tecrîdeke pir hişk heye. Ruxmî vê jî heta roja me ya îro ji welatên cur bi cur, ji Katalonya/ Îspanyayê însan tên Kurdistanê û tevlî nav têkoşîna li dijî faşîzmê dibin. Ev yek jî mînakeke bi heybet a enternasyonalîst e.

Li gel van hemûyan, ji bo Şoreşa Rojava di warê rehendê enternasyonalîst de rewşeke din jî heye û girîng e. Gelek enternasyonalîst hatin û tevlî berxwedanê bûn. Armanca sereke ew bû ku li dijî faşîzmê şer bikin û faşîzmê têk bibin. Lê belê, bi taybet jî di van salên dawî de ji nav enternasyonalîstên ku tên Rojava, însan tevlî xebatên civakî yên li Rojava dibin û beşek ji wan jî tevlî nav xebatên hêzên parastinê dibin. Li gel vê, ji aliyê enternasyonalîstan ve daxwazeke pir mezin heye ku Şoreşa Rojava nas bikin, fikrên di bingeha vê şoreşê de nas bikin û dawerivînin hinavên xwe. Yanî wekî çawa li hemberî faşîzmê xwedîderketina li nirxan mirovahiyê çêdibe, her wiha xwedîderketineke li paradîgmayê jî heye. Ango, têkildarî xebatên enternasyonalîst û enternasyonalîzmê rewşeke wisa girîng jî çêbûye.

Paradîgmaya nû ya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê dixwaze qadeke pir berfireh digire nava xwe û lewma jî dikare bê gotin ku vê yekê pêwîstiya pêşxistina xebatên enternasyonalîst û her wiha girîngiya vê xebatê zêdetir kiriye û erk û berpirsiyartiyên wê girantir kiriye. Di çarçoveya paradîgmaya kevn de, gelê Kurd û Kurdistanê rizgariya xwe ya neteweyî dixwest, li ser vî bingehî gelek enternasyonalîstan ji ber mêtingerî û dagirkeriya li ser Kurdistanê piştgirî didan têkoşîna rizgariya neteweyî ya Tevgera Azadiya Kurdistanê. Di salên 1990'î de hevalên enternasyonalîst hatin cem Rêbertiyê, dibe ku nêzîkatiya wan ji vê tespîta me ya li jor cudatir be, daxwaza wan zêdetir ew bû ku rêxistinê fêm bikin, li gorî vê yekê têkoşînekê bimeşînin. Lê, di vê demê de xebatên enternasyonalîzmê bi gelemperî bi piştgirîdayînê sînordar ma. Yanî bi yek milî sînordar ma, yekalî ma. Ev rewş di roja me de hatiye guhertin. Bêguman, piştgirîdayîn jî girîng e. Îro ewqas însan tên, ewqas însan û rêxistin ji derve peyaman didin, çalakiyan li dar dixin, ev hemû jî bi daxwaza piştgiriyê ne û helbet

girîng in, bi qîmet in. Feqet rewşeke cudatir jî derketiye holê. Ji bo ku ev bê dîtin bi taybet tê destnîşankirin. Însan tên nava şoreşê û dixwazin ji vê şoreşê fêr bibin, fikir û tecrûbeyên wê bigirin û di vê çarçoveyê de tevbigerin. Yanî, ne tenê fêrî paradîgmayê dibin, ne tenê dikevin nava pratîka heyî, erê ev hene, lê li gel van dixwazin vî fikrî dawerivînin hinavên xwe, jê îlhamê bigirin û di vê çarçoveyê de li welatê xwe jî rêxistinbûna vê paradîgmayê pêş bixin.

Ev yek baş hatiye fêmkirin, yan jî divê bê fêmkirin, di roja me ya îro de israra di rê û rêbazên klasîk ên têkoşînê de, israra di avakirina dewletê de yan jî destdanîna ser dewletê yan jî desthilatdariyê ne xwedî siberojekê ye. Ev yek, wekî mînakên wê yên dîrokî jî ispat kirine ku nikare bibe azadiya gelan. Li gel vê, modernîteya kapîtalîst jî xwe zehf berfireh û kûr kiriye, di hemû hucreyên însanan de hatiye bicihkirin. Bi taybet li metropolan û li welatên li bakurê cîhanê, ku wekî navenda kapîtalîzmê tên zanîn, nêrîneke li pêş heye û tê gotin ku li van deveran şoreş çênabe. Ev rewş jî girêdayî rewşa karkeran e, girêdayî rewşa proleterya ye. Di rewşa niha de gelek rêxistin hene ku hewl didin mîna gotinên Marks û Engels tevbigerin û pêwîstiyê tenê di rêxistinkirina karkeran de dibînin. Lê rewşa karkeran a di nava modernîteya kapîtalîst de rewşeke pir cuda ye û hêja ye di gelek milan de were lêkolînkirin. Bêguman karker ne azad in, bindest in. Pênaseya Lenîn a ji bo proleterya xuya dibe ku behsa arîstokratîkbûna proleterya dike. Maneya vê ew e ku proleterya di navendên kapîtalîzmê de di bin bandora kapîtalîzmê de maye, ji rastiya xwe dûr ketiye, rewşa wê li gorî karkerên li welatên başûrê cîhanê hinekî din baştir bûye û têkoşîna wê tenê li ser esasê meaşekî hinekî zêdetir e.

Helbet di roja me ya îro de ne ku pêwîstî bi têkoşîn û rizgarkirina ji kapîtalîzmê tine ye, lê belê diyar e ku bi rê û rêbazên berê yên klasîk rizgariya ji kapîtalîzmê ne mimkun e. Jixwe piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî gelek rêxistin û tevger derketin, fêm kirin ku bi rê û rêbazên klasîk ên rizgariya neteweyî rizgarî pêk nayê, lewma jî di aliyê terz û taktîk de bi rengekî cudatir tevgeriyan. Yek ji mînakên vê yên baş jî Tevgera Zapatîsta ye, ku li Başûrê Meksîka pêş ket. Di vê tevgerê de jî girîngiya ji bo mijarên wekî demokrasî û jinê li pêş e. Xwe bi rengê meclîsan rêxistin dikin û her wiha hêza wan a parastinê jî heye. Ev xala xwerêveberî û xweparastinê ne tenê xweserî vê tevgerê ye. Di gelek deverên cîhanê de dema ku gel radibin ewilî girîng dibînin ku li ser mijarên xwerêveberî û xweparastinê bigihêjin encamekê. Fikrên Rêbertiyê jî li ser esasê konfederalîzma demokratîk e û xwe dispêre pêwîstiyên esasî yên gelan. Ji ber vê yekê dema ku însan tên û nû bi nû vê paradîgmayê nas

dikin, ji ber ku fikrên jiyanî ne, zû tê digihêjin û ev fikir li gel van însanan hêviyeke pir mezin diafirîne. Ev fikir ne ji bo gelên bindest ên cîhanê bi tenê, her wiha ji bo deverên ku wekî navendên kapîtalîzmê tên binavkirin jî xwedî hêza çareseriyê ye. Jixwe yek ji nivîskarên navdar Murray Bookchin di nivîsên xwe de li ser vê babetê disekine, li ser rêxistinbûna li DYE hewl dide vê fikrê bide fêmkirin, diyar dike ku di navendên kapîtalîzmê de encax bi tevlîbûna gel û bi rengekî federal dikare di nav polîtîkayên rojane de guhertineke mezin çêbibe.

Serketina sereke ya modernîteya kapîtalîst çi bû? Ji bo vê pirsê dikare were gotin di nava gelan de hêviya ji bo jiyaneke azad û wekhev kêm kir, daxist asteke herî jêr. Di roja me de gelek însanên wisa hene ku di kapîtalîzmê û sîstema heyî de pirsgirêkan dibînin, dixwazin jê xelas bibin, lê belê bawer nakin ku di navendên kapîtalîzmê de yên wekî DYE û Ewropayê şoreş gengaz in. Bi awayekî xwezayî, mirovekî/e bêhêvî jî nikare hêviyan ava bike. Heger mirov bi mimkunbûna şoreşê bawer nake nikare şoreşê pêk bîne. Di vê babetê de cihê Şoreşa Rojava pir girîng e. Ji bo hemû dinyayê tiştên pir girîng gotin, gelek tiştên wekî qeder dihatin bidestgirtin hişt ku dîsa di ber çav re bên derbaskirin. Di demeke wisa de, ku kapîtalîzmê bi israr digot "dema îdeolojiyan derbas bû, îdeolojî bi dawî bûn", ji ber vê yekê gelek kesan bendewariya xwe ya şoreşan ji dest dabûn, Şoreşa Rojava pêk hat. Piştî demeke ewqas dirêj careke din li gel însanan hêvî ava kir. Hêvî çêkir. Şoreşa Rojava ji însanan re got ku mirov dikare azad bijî, ji bo jiyana azad alternatîf hene, ji bo jiyana azad rê û rêbazên cuda hene û şoreş gengaz e. Tenê ev yek negot. Tenê bi dîmenekî, bi maneyekê, bi gotinekê jî sînordar nema. Di heman demê de bi pratîkî jî nîşan da û nîşan dide. Rojavayê Kurdistanê niha bi rola navendên Şoreşên Cîhanê radibe. Di roja me de ji welatên cur bi cur însan tên Rojavayê Kurdistanê, dixwazin şoreşê bibînin, nas bikin, jê fêr bibin, tecrûbeyan bigirin. Li gel van tiştekî din jî heye. Ev xal dibe ku ji bo şoreşên din ne ewqasî hêsan be. Di nava Şoreşa Rojava de her kes dikare erk û berpirsiyariyê rake, tê de kar bike û Şoreşê ava bike. Ev yek xaleke girîng e û ji bo hemû cîhanê firsendeke dîrokî ye. Hemtayê vê yekê di cîhanê de belkî pir kêm be, belkî jî tine be.

Nuqteyeke din a ku lazim e ji dersên dîrokê bên derxistin jî ew e: Şoreş tenê di cihekî de pêk nayê, tenê bi cihekî nayê sînordarkirin. Di vê mijarê de bi taybet ji tecrûbeya Yekîtiya Sovyetan dikarin ders bên derxistin û tijî dersên bi vî rengî ye. Nêzîkatiya ku dibêje "sosyalîzm li yek welatî dibe" herî zêde di dema Stalîn de pêş ket û vê yekê dem bi dem rola esasî ya enternasyonalîzmê teng kir. Tişta ku ji vir bê fêmkirin ew e ku parastina esasî ya şoreşê û rêbaza esasî ya lawazkirina êrîşên li

ser herêmên rizgarkirî yên şoreşê bi pêşxistina şoreşan dibe. Şoreş karibe çiqasî li cîhanê belav bibe û xwe rêxistin bike, hem parastina şoreşê jî mimkun dibe hem jî asta dijwariya êrîşên li ser şoreşê kêmtir dibe. Şoreş di nuqteyekê de, di nava hin sînorên diyar de hiştin, tê wê maneyê ku ji bo dijminên şoreşê hedef tê biçûkkirin. Gelên cîhanê çiqasî li welatên xwe şoreşê pêş bixin, xwe rêxistin bikin di vê astê de wê bala dijmin jî belav bibe û nêzîkatiyên dijmin jî li gorî vê biguhere. Dibe ku armanca dijmin neguhere, lê herî kêm wê neçar bimîne ku terz û taktîkên xwe dubare dubare di ber çav re derbas bike. Di rewşa heyî de rastiyeke wisa heye ku rewşên şoreşê kêm in. Şoreşên heyî jî di bin êrîşên pir dijwar de ne. Ji ber vê yekê bi awayekî xwezayî û girêdayî şert û mercan nêzîkatiyeke bi rengê "parastina destketiyên şoreşê" derdikeve holê. "Parastina destketiyên şoreşê" bi giştî ne şaş e, lê belê kêm e, nebes e. Dema ku dersên dîrokê tên derxistin û fikrandineke demdirêjî çêdibe tê dîtin ku heger însanên tên nava şoreşê karibin bi rengekî rast û têrker tecrûbeya şoreşê bigirin û ev hêz karibe baş bê kanalîzekirin ev rewş wê di siberojê de karibe bi roleke mezin rabe.

Şoreşa Rojava, ji bo tecrubegirtinê û fêmkirina rastiya şoreşê pir girîng e. Bûyereke şênber e, diyardeyeke şênber e û didome. Gelek însan hene, şoreşê wekî tiştekî xeyalî dibînin, dema ku bi pirsgirêkên şoreşê re rû bi rû dibin jî zehmetiyan dikşînin, nikarin maneyê bidinê. Şoreş, ti carî ne pêvajoyên rehet in. Şoreş, ji ber ku hem guhertin hem jî veguhertinê didin ber xwe pêvajoyên gelekî zehmet in û hewldanên mezin pêwîst dikin. Dema ku şoreş bi vî çavî bên nirxandin mirov dikare bi awayekî baştir maneyê bidiyê. Li gel vê, divê em karibin Şoreşa Rojava di warê cîh de jî li ser esasê enternasyonalîzmê baş fêm bikin. Di rewşa niha de li giştî cihanê deverên ku şoreşgerên cîhanê karibin li hev kom bibin kêm in. Ji van deverên kêm yek jî, ku derfeta kombûyînê dide şoreşgerên cîhanê, Rojavayê Kurdistanê ye. Di dema xwe de kampên şoreşgerên Filistînî bi çi rolê rabibûn, di vê demê de Şoreşa Rojava jî atmosfer û zemînekî wisa ava kiriye ku dikare bi roleke ji vê jî mezintir rabe.

Dîsa ji bo hemû mirovatiyê perspektîfeke pir zelal derketiye holê: Konfederalîzma Demokratîk a Gelên Cîhanê û Konfederalîzma Demokratîk a Jinên Cîhanê. Li ser esasê vê perspektîfê girîng e ku li hemû cîhanê rêxistinbûn pêş bikevin. Wek mînak; beriya çend salan li Almanyayê Însiyatîfa Konfederalîzma Demokratîk hatiye îlankirin û li ser vî hîmî xebat tên meşandin. Her wiha, di sala 2022'yan de li Katalonyayê konferansa yekemîn a enternasyonalîst a Katalonyayê hat lidarxistin. Rojeva wê jî wisa bû; "Li Katalonyayê Konfederalîzma Demokratîk Çawa Dikare Bê Avakirin?" di sala 2022'yan

de li Rojava jî konferansa yekemîn a enternasyonalîst hat lidarxistin. Tê de ji gelek welatên cuda hejmareke zêde enternasyonalîst amade bûn. Ji vir jî diyar dibe ku her diçe meraqa gelan a li beramberî mijara Konfederalîzma Demokratîk û çareseriya ku Rêbertiyê bi paraznameyên xwe ve pêşkêşî mirovahiyê kiriye zêdetir dibe. Wekî xebata enternasyonalîst pêwîst dike ku em karibin tovên Şoreşa Rojava li hemû welatên cîhanê biçînin û bi vê rêkê hêviyên di nava gelên bidest de jî careke din şîn bikin. Ji xebatên me jî diyar e, ruxmî ku ji welatên Asya, Afrîka û Latîn Emerîkayê ewqas însan tevlî dibin jî em hêna negihiştine wê astê ku karibin konferansa sê parzemînan li dar bixin.

Di çarçoveya xebatên enternasyonalîst de tê dîtin ku tenê meraqkirin têrê nake. Tenê xwendina pirtûkan jî têrê nake. Gelekî girîng e ku şoreşa Rojava, destketî û kêmasiyên çêbûne li gel şoreşgerên cîhanê bên parvekirin. Şoreşa Rojava, qada Bakur-Rojhilatê Sûrî karibe ji bo hemû cîhanê bi rola mektebekê rabe. Jixwe di rewşa heyî de jî Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûrî ji bo şoreşgeriyeke rasteqînî bi rola dibistanekê radibe. Bi taybet jî dema ku li ser vî esasî mijûlbûn û kontekstualîzekirin hebe. Ev jî roleke esasî ye ku dikeve ser milê şoreşgerên Şoreşa Rojava.

Çiqasî tê zanîn, yan jî em çiqasî di ferqê de ne tam ne diyar e, lê ji bo pêşketina şoreşên cîhanî û piştevaniya şoreşên cîhanê em xwedî erk û berpirsiyariyeke mezin in. Li Rojavayê Kurdistanê gelek rêxistin û tevgerên wisa hene, dikarin vê yekê bikin û xwedî tecrûbeya 50 salan e. PKK'ê di daxuyaniya xwe de, ku wekî danezana sala 50'yemîn hat weşandin wisa got; "Em bang li hemû hêzên sosyalîst, şoreşger û demokratîk, rêxistinên jin û ciwanan, tevgerên ekolojîst, derdorên karker û kedkar, hemû rêxistin û partiyên antîkapîtalîst û antîemperyalîst, derdorên demokratîk ên antîfaşîst ên dinyayê dikin, li dijî pergala desthilat û dewletê û nîzama modernîteya kapîtalîst ku wextê xwe tijî kiriye û her tim nexweşiyê çêdike, em têkoşîna azadî, demokrasî, xwişk û biratiyê bi hev re bimeşînin, Konfederalîzma Demokratîk a Cîhanê biafirînin, ku di navê de herkes bi azadane û demokratîk dijî!"

Li ser vî esasî, pir girîng e û erk û berpirsiyariya me ye ku em xwedî li mîrasa xwe ya enternasyonalîst derkevin, em bi ruhê enternasyonalîzmê ji bo ku li cîhanê fikrê sosyalîzmê yê bi pêşengiya Tevgera Azadiyê pêş bikeve xwedî israr bin. Ji ber ku di cîhanê de pêşketina sosyalîzmê encax bi ruhê enternasyonalîzmê gengaz e.

# ROLA DÎROKÎ YA PÊŞENGİYÊ YA CİWANÊN KU Dİ ŞOREŞA ROJAVA DE MOHRA XWE Lİ SERKEFTİNÊ DANE

**Ciwanên Rojava jî bi ruhê ji tevgera Apocî wergirtine, bi hemû dînamîzma ruhê ciwantiyê re kiriye yek û li Rojava li her derê cihê xwe girtiye, ji xebatan re pêşengî kiriye, pêşiya pêşketinên şoreşgerî vekiriye.**

**TEVGERA CİWANÊN ROJAVA**

Tê zanîn ku ciwan di têkoşîna Şoreşa Rojava de bi roleke dîrokî rabûne. Gava ku ji aliyê pêşketinên civakî ve ji hemû aliyan ve qonaxeke dîrokê dest pê dike, eger gotin di cihê xwe de be tişta hewce dike were kirin ew e ku mirov fitîlê pêxe. Ji bo ku ev di nava ciwanan de were birêxistinkirin jî hewce bû pêşî li pêşketinên ku îro em nikaribin bifikirin vebûya. Divê em bizanin ku pêşketinên civakî yên mezin, eger di qonaxeke her tişt amade de guleya destpêkê were avêtin, dê teqandineke mezintir çêbibe. Pêwîst e hemû beşên civakî gava ku di qonaxên bi vî şiklî yên şoreşê de bi rola xwe radibin, hewldana xwe ya xweser raber bikin, rengê xwe yê xweser tevlî vê pêvajoya şoreşê bikin.

Tecrûbe û ezmûnên pencî salî yên têkoşîna demokratîk, ji bo ku bi rola xwe rabe mîrateyeke mezin ji ciwanan re hiştiye û û derfet amade

kiriye. Bi eslê xwe tevgera Apocî , tevgereke ciwanan e. Ev di her tiştî de wisa ye. Ciwanan ew ava kiribûn, ciwanan ew meşandibûn. Ji aliyê ruh ve, ji aliyê armanc û hedefan ve, ji aliyê pîvanên jiyanê ve, ji aliyê hêz û dînamîzma çalakiyê ve bi taybetmendiyên ciwantiyê xwe xemilandiye; tevgereke wisa ye ku bi temamî taybetmendiyên ciwantiyê ji xwe re kiriye terz û rêgez. Nêzîkbûna wan a îdeolojîk, pîvanên wan ên jiyanê û pîvanên paqij, saf, kolektîf û evîndarê azadiyê bi temamî bi pîvanên ciwantiyê dagirtî ye. Ev nîşan dide ku teza dibêje 'tevgera Apocî timî tevgereke ciwan e, timî tevgereke ciwantî ye' rast e. Di encamê de ciwan li derûdora tevgera Apocî kom bûne, ji bo xetimîna heyî ya li beramberî bûna hêzeke navpergalî rêya çareseriyê peyda kirine. Tevgera Apocî ji bo ku rola dikeve li ser milê xwe bi layiqî bi cih bîne, zaniye çavkaniya îlhamê ya herî mezin çi ye.

Ciwanên Rojava jî bi ruhê ji tevgera Apocî wergirtine, bi hemû dînamîzma ruhê ciwantiyê re kiriye yek û li Rojava li her derê cihê xwe girtiye, ji xebatan re pêşengî kiriye, pêşiya pêşketinên şoreşgerî vekiriye. Dîsa tevgera ciwanan ji bo gelên Rojhilata Navîn di têkoşîna wan a demokrasî û azadiyê de bûye pêşeng. Ciwanan bi rastî jî di asteke dîrokî de, ku her ku diçe xwe bi rêxistin dikirin, dibûn xwediyê zanebûn, di nava têkoşînê de xwe mezin dikirin, bi helwest, daxwaz û biryardariyeke ku her kesî matmayî bihêlin têkoşîn û rêxistinbûna xwe bi pêş dixistin.

Tevgera ciwanên Apocî beşeke pêşengiya têkoşîna demokrasî û azadiyê ye. Ji biryardariya wê ya têkoşîn û lidarxistina şoreşê tê fêmkirin ku vê tevgerê di pêvajoya şoreşa Rojava de pêngaveke mezin avêtiye, hewl daye pêşengiya ciwanan di têkoşîna demokrasî û azadiyê de baş bi cih bike û tevger bi pêngavên mezin bi pêşde biçe, hemleyekê bike.

Di nav civakê de her tim tê nîqaşkirin; ciwan kî ne, rola wan çi ye, di polîtîka û şoreşê de bi roleke çawa radibin? Modernîteya kapîtalîst yan jî ya netew-dewletên ku qereqolbaregehên wan ên îhtiyadî (yedek) ne, erk û wezîfeya destpêkê ya ji bo ku desthilatdariya xwe bi şiklekî saxlem û bi ewlehî bimeşînin, hewce dike di demeke zûtirîn de ciwanan bi pergalên xwe ve girêbidin, bikin yek. Her pergala xwediyê hişmendiya desthilatdariyê hewl dide ciwanan li gorî daxwazên xwe bixe şiklekî, li gorî xwe ferasetê bide qezenckirin. Hewl didin di asta herî bilind de ciwanan bi dînamîzma wan, bi enerjiya wan a têr û tije, ji bo ewlehî û domdariya pergala xwe, ji bo qezenca xwe ya madî wekî karkerên erzan kar dikin, wekî amûrekî herî girîng ku civakê di bin kontrolê de bigirin, wekî hêzeke timî hewce dike were perwerdekirin, were eciqandin, were kedîkirin bi kar bînin. Dem bi dem ji aliyê çandî, sosyolojik û psîkolojîk ve ji bo ku wan li pergalên xwe yên peritî entegre

bikin, dixwazin bi polîtîkayên piralî ciwanan beralî bikin.

Pênaseyên herî dawî tê pêşxistîn jî ji bo vê yekê delîlên herî baş in. Bi taybetî dema ku em ji beriya li Kurdistanê şoreş dest pê bike bi mêyzandineke lêkolîner li raboriyê dinêrin, wan deman her kesî bi çavekî cûda li ciwanan mêyze dikir: ciwan bê disîplîn in, hêza wan têra polîtîkayê nake, bê rêbaz in, ecemî, cahil û serserî ne, beredayî ne. Ev nêzîkbûn û feraset nîşan didin ku bi hewldanên heyî ciwanên hêza herî dînamîk, zindî û enerjîk a civakê dixwazin bixin kîjan qaliban. Heta li hin cihan tê gotin ciwan ji bo desthilatiyê şer dikin, agirê şer in û li hemû welatan jî ji bo ku desthilatiyên heyî xwe biparêzin wekî mertal ciwanan bi kar tînin. Bi taybetî rejîma BAAS'ê ya li Sûriyeyê ji bo ku karibe desthilatdariya xwe bidomîne li dijî civakê ciwan bi kar anîne. Dewletê tenê wekî çavkaniya leşkerxaneyê ciwan bi kar dianîn. Saziyên bi navê 'Zarokên BAAS'ê' dihatin çêkirin. Lê encamên ku di pêvajoya şoreşê de li Rojavayê Kurdistanê derketine holê, nêrînên der barê ciwanan de guhertin. Heta li hin welatên Ereban, li hin cihên wekî Tûnis û Misir nêrînên çewt ên derbarê ciwanan de dikarîbûn werin guhertin. Dewletên hegemonîk careke din fêm kirin ku hêza karibe guherînê pêk bîne ciwan in û hewl dan ciwanan li cem xwe ragirin.

Eger em bala xwe bidinê li Tûnisê ciwanan çirûska azadiyê pêxistin. Li Sûriyeyê destpêkê ciwan ketin tevgerê û serî hildan. Li Humusê û Dera'yê Koordînasyonên Ciwanan hatin çêkirin, lê belê ji ber ku ev ciwan der barê polîtîka û têkoşînê de kêm ezmûn bûn ketin xizmeta rejîmê. Dewletê ji bo berjewendiya xwe ew bi kar anîn. Ciwanên Rojavayê Kurdistanê, wekî tevgera ciwanan di nava van pêşketinên derketine holê de xwediyê ferq û cudahiyan bûn. Ji bo asta ku hewce dikir xebata şoreşgerî-demokratîk xwe bigihînê, yanî asta tevlîbûnê ya ciwanan, di meşandina pêşengiya têkoşîna şoreşgerî-demokratîk de xwediyê rol û berpirsiyarî bû. Rêxistinbûna wê, ast û zanebûna wê ya ku karibe ji şoreşê re pêşengî bike, aliyê herî girîng bû ku ew ji yên din cuda dikir. Di têkoşîna şoreşa Rojavayê de ciwanan bi xeta pêşengiya xwe ya rêxistinbûn û çalakvaniyê berê pêşketinan diyar kirine û hiştine ku beşeke mezin a civakê tevlî vê pêvajoya şoreşê bibe.

Dewletên hegemonîk hewl dan ku ciwanên Rojavayê Kurdistanê li gelên xwe, li welatê xwe û li berpirsiyariyên xwe, li erkên xwe yên demê xwedî dernekevin. Nexwestin ku destûrê bidin ew ji bo ciwanên Rojhilata Navîn pêşengî bikin. Bi giştî li beramberê civaka Kurd gelek êrîş dihate pêkanîn. Gelê Kurd ji du sed sal e pê de bi rastiya nijadkujiya fîzîkî û çandî re rû bi rû bû. Dixwazin bi hemû aliyan ve wekî ku careke din navê wî jî neyê li ser ziman tine bikin û ji dîrokê rakin. Bi taybetî komploya navneteweyî ku di

şexsê Rêber Apo de hatiye pêşxistin, bi hemû aliyên xwe ve raxistiye ber çavan ku ew hêz dixwazin çi ji Kurdan bikin. Bi êrîşên nijadkujiyê li ser ciwanên Rojavayê Kurdistanê bi terzê Ereb û Tirk bandoreke zêde ya çanda kapîtalîst bi pêş xistiye. Tê zanîn ku armanca dewletên Tirk û Sûriyê yên ku dijminê Kurdan in armanca çanda ku ew belav dikin ew e ku gelê Kurd xelas bikin, asimile bikin û biqedînin. Dewleta Tirk, dewleta Sûriye dewletên dagirker in. Divê mirov baş bizane ku gelek xweziya xwe bi dewleteke dagirker bîne, ew gel gihaştiye asteke herî xeter. Armanca nijadkujiya çandî ew e ku bi mirovekê/î, bi gelekî re hestên hezkirina ji dijminê xwe bi pêş bixe. Divê ti car neyê jibîrkirin ku rêbaza herî xeter a nijadkujiya ku li ser civakekê were pêkanîn, nijadkujiya çandî ye. Li ser vê esasê dixwazin li Kurdistanê nijadkujiyê timî di dewreyê de bihêlin. Ji ber vê yekê, ciwanên gelekî ku hewl tê dayin were tinekirin, di qirkirinê re were derbaskirin ji beriya her tiştî neçar bûn ku bizanin gelo ew bi pêvajoyeke çawa ya tinebûnê re rû bi rû ne. Ji ber vê yekê jî rola ciwanên şoreşger ew bû ku li beramberî pêvajoyeke tinebûnê ya wisa, civakê bi rêxistin bike û pê zanebûnê bide qezenckirin. Ev roleke ciwanan a pir dîrokî û girîng bû.

Ciwanan li pêşberî êrîşên paşverûtiya navneteweyî û piştre li dijî komploya navneteweyî pêşengiya berxwedana fedaî ya gel kirin. Û ya hê girîngtir jî ciwanan li pêşberî Rêber Apo û şehîdan, mezinkirina têkoşîn û pêkanîna şoreşê ji bo xwe wekî deynekî dîrokî didîtin. Her wiha pêşengiya ciwanan wekî ku hemû Rojavayê bigire nava xwe, karibe li hemû qadên şoreşê cihê xwe bigire û xwe bigihîne hemû ciwanên herêmê, bi şiklekî bi hêz xwe bi rêxistin kiriye, xwe bi rêgezên şoreşgerî, demokratîk û azadîxwaz xemilandiye û xwediyê berpirsiyariyeke pir girîng bûye. Teqez xuya bû ku pêşengiya ciwanan encax karîbû bi berpirsiyariyeke şoreşgerî ya wisa pêk were. Li ser nîqaş nedibû ku hewce ye ciwan bi rengê xwe tevlî şoreşa Rojava bibin; ew ê karibin bi bernameyên xwe, bi rêgezên xwe û bi terza xwe derkevin holê, vê bi şiklê ku xwe bi rêxistin bikin pratîze bikin û her wiha erka xwe ya pêşengiyê pêk bînin. Ji ber vê yekê jî dê ev rol û misyon, ciwanan bi moral û coşeke mezin bixe nava têkoşînê. Bi vî şiklî valahî û kêmasiya pêşengiya rêxistinî ku tevgerê hewce dîtiye bi rengekî xurt were derbaskirin.

Pêvajoya bihara gelan di sala 2010'an de dest pê kir. Ji Tûnisê dest pê kir û heya bi welatên din berbelav bû. Bi vê pêvajoyê re li cem gelan hêviyek peyda bû. Ji ber ku guhertin dibûn wan dê karîbûna rêjîmên xwe biguhartana. Êdî her tişt berevajî dibû. Vê rewşê li gorî demên derbasbûyî hin guhertin derxistin holê. Bi gelan re hêviyên wisa peyda bûn ku ew ê karibin ji bin nîrê serdestan rizgar bibin û pergalên xwe ava bikin. Belê,

bihara gelan bi pêş ket; lê belê ti kesê ji gel re pêşengiyê bike, gel bi rê bixe û bi projeyên xwe yên demokratîk karibe ji bo daxwazên gelan bibe bersiv derneket holê. Hêviya gelan bi pêş ket, gel rabûn serhildanan, gelek rejîm têk çûn, li Tûnis, Lîbya û Misrê guherîn çêbûn. Lê belê piştî van guherînan ti tişt bi pêş neket. Rejîm hilweşiyan, lê belê li şûnê bedîl nehate bicihkirin. Ji ber ku projeyeke demokratîk tine bû. Tenê sehmek, hewayek çêkiribû. Pêşketinên paşê hatine jiyîn tên zanîn. Tevgera Azadiyê bi pêşengiya tevgera ciwanan û tevgera jinan têkoşîna civaka demokratîk û azad meşandiye. Vê jî hêviyek daye gelên ku li ber xwe didin, xwe ji her awayê hêzên zalim, çewisîner û desthilatdar rizgar bikin. Wekî projeya pêkve xwebirêvebirinê ya herî girîng a civaka demokratîk û azad dibû alternatîf. Ev proje ne tenê bi salên dawî bi sînor bû, di bingeha xwe de ji beriya salên dûr û dirêj xebata ji bo avakirina civakeke demokratîk û azad bû. Jixwe girîng û watedar bû ku di hatina pêvajoyeke bi vî awayî de ciwan bi rola xwe ya pêşengiyê rabûna. Û hêza ku ji bo pêvajoyê pêşengî dikir ciwan bûn.

Heya bi sala 2011'an jî xebat bi şiklekî îlegal dihatin meşandin. Di nava gel de xebatên rêxistinbûnê veşartî dimeşiya. Dema ku derfet bi pêş ketin û xebat berfireh bûn ciwanên Kurd, Ereb û Suryanî dest pê kirin xwe bi rêxistin bikin. Di çalakî û xebatên birêxistinbûnê de ciwan bi rola pêşengiyê radibûn. Hem dema gel dihate birêxistinkirin hem di avakirina YPG'ê de û di hemû saziyên dema xebatên şoreşê de hatine avakirin de ciwanan pêşengî kir. Ji ber ku projeyeke demokratîk hebû û hêzeke ku pêşengî ji vê re bike hebû.

Li herêmên din ên Sûriyê gel tenê derdiket kolanan û digot “bila rejîm biçe”. Lê ti kesî çareserî nedigot. Ji bo ku wekî herêmên din ên Sûriyê nebe, li Rojavê Kurdistanê xebatên rêxistinbûnê hatin meşandin. Ji ber ku ji beriya wê jî herêmên ku ciwan herî zêde lê bi rêxistin bûn ew herêm bûn ku niştecihên wê zêdetir Kurd bûn. Yanî di van pêvajoyan de di nava gelê Kurd de rêxistinbûnek hebû. Lê rêwşa rêxistinbûnê ya pêkhate û hwd. lawaz bû. Ciwanan şiklê çalakvaniya xwe guherîn. Di vê pêvajoyê de ciwanan xwe gihandin her deverê. Di xwepêşandan û rêxistinbûnên dihatin kirin de hedef û armancên wan timî cuda bûn. Doza wan a azadiyê li qadan, li kolanan dest pê kir. Hemû gel jî tevlî bû. Ciwan li hemû qadan bi rola pêşengiyê rabûn. Di pêvajoyên azadkirinê de bi pêşengiya ciwanan tevî hêzên gel qadên cur bi cur ji rejîmê dihatin rizgarkirin. Her kes, ciwan, extiyar, jin, zarok, radibûn li ser piyan û berê xwe didan cihên rejîm lê û ew dever ji rejîmê rizgar dikirin. Hêzên Xweparastinê yên Gel û tevgerên ciwanan di van pêvajoyan de li cem xebata rêxistinkirinê, hêzên YXK çêkirin. Vê jî piştre xwe wekî YPG, Yêkîneyên Parastina Gel bi rêxistin

kir. Di vê pêvajoyê de bi gel re tevlî çalakiyan dibûn, gava ku rejîmê hewl dida li ser gel zilm û zorê pêk bîne wan rasterast dest werdida. Dema rejîmê dît ku gel xwe bi rêxistin kiriye, xwe diparêze wê demê neçar ma cihê lê dimîne vala bike û bi vî şiklî dest pê kir herêm rizgar bibin. Piştî vê, karê ewlekariyê û avakirina herêman ji binî de bû xebateke tevgerê.

Di vê pêvajoyê de hêzên tarî yên ku dixwestin şoreşê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin, bi rêya polîtîkayên şerê taybet pir leyistok leyistin. Dixwestin bi pereyan ciwanan ber bi xwe ve bikişînin û bixin nava tora çalakiyên xwe yên qirêj. Tevgera ciwanan piştî ku li Rojavayê bi rêxistinbûn pêk anî, bi terzê xwe yê çalakiyê ve, bi rêbazên xwe ve guherîn û veguherîn afirand. Bi saya serê rêxistinbûn û pêşengiyeke xurt di 19'ê Tîrmeha 2012'an de Şoreşa Rojava pêk hat. Tevgera ciwanan bi ruhekî paqij ê ciwantiyê şoreş araste kir û jê re pêşengî kir, ew ruhê paqij, hesreta mezin a ji bo şoreşê, enerjî û dînamîzma pir mezin xiste tevgerê û tevlî têkoşîna demokrasî û azadiyê kir. Ev, ne encama xebateke serasera bû, ciwanan xwe bi rêxistin kiribûn û di asta pêşengiyê de tevlî şoreşê bibûn. Vê jî helwesta rast a tevgereke rêxistî ya ciwanan nîşan dida. Li Rojava, Ciwanên Şoreşger, wekî xeteke pêşeng a şoreşger wisa derdiket holê. Bi vî şiklî, ji bo Tevgera Ciwanên Şoreşger Şoreşa Rojava dibû ezmûna herî girîng a dîrokî ku berpirsiyariya xwe ya dîrokî bi cih dianî.

Ciwanên Şoreşger, pêşengên xebata birêxistinkirina şoreşê, Şehîd Jiyan, Şehîd Serhed, Şehîd Lewend, Şehîd Rênas û Şehîd Çekdar ku xeta wan fedaîtiya Apocî ye, di şoreşa Rojava de şehîd dane. Ev şehîdên mezin ku bi berxwedana xwe ya destanwarî cihê xwe yê di nava lehengên nayên jibîrkirin de girtine, bi hewldanên xwe yên wekî hemû ciwan û civak bi rêxistinê, bi xeta berxwedêr a Apocîtiya fedaî ji bo hemû ciwanên şoreşger bûne mînakên mezin.

Dîsa di vê pêvajoyê de şehîd û fermandarê mezin ê Ciwanên Şoreşger Şehîd Baran Mawa, wekî her timî bûye bi rola mezin rabûye û ji bo ku ciwanan û gel bikişîne nava şoreşê bûye xwediyê ked û hewldaneke mezin. Ciwanên Şoreşger, li ser vê xeta bingehîn ku van şehîdên leheng daniye hemû xebatên şoreşê bi pêş xistin.

Gel û pêkhateyên din jî tevlî şoreşê bûn û çanda Neteweya Demokratîk berbelav bû. Ev delîla wê ya bingehîn bû ku Ciwanên Şoreşger, bi hêza xwe ya îdeolojîk, rêxistinî, çalak bi roleke girîng rabûne, çanda Şoreşê hem di nava gel de û hem di nava civakê de berbelav kirine. Ciwan êdî ji wê rewşa ku tenê ji êxtiyaran, ji siyasetmedaran perspektîf distînin derketin.

Li beramberî vê ciwanan ji bo karibin bi rola xwe ya pêşengiyê rabin asta xwe ya rêxistinî bi pêş

xistin. Ciwanên Şoreşger ne tenê ji aliyê leşkerî ve, di pêvajoya avakirina neteweya demokratîk de jî bi rol û misyona xwe derdiketin pêş. Ciwanan bi vî şiklî feraset û nêzîkatiyên ku tenê aliyê leşkerî derdixin pêş vala derxistin. Ji ber vê yekê li her qadê cihê xwe girtin. Ciwanan di nava rêveberiyan de, di nava meclîsan de, di nava komunan de, di qada leşkerî de cihê xwe digirtin. Di xebatên birêxistina gel de bi taybetî, di rêxistinkirina meclîs û komunan de bi roleke girîng radibûn. Xebatên ciwanan di vê pêvajoyê de bi navê Ciwanên Şoreşger derdiketin pêş.

Dîsa ciwanên şoreşger ku rola mezinkirina hêzên xweparastina gel jî girtibûn li ser milên xwe, ji bo xwe wekî erk û wezîfeyeke esasî dizanîn ku ji bo YPJ û YPG timî tevlîbûnan bidin çêkirin. Ji bo ku berê hemû ciwanan bidin YPG û YPJ ku hêza xweparastinê ya gel e, xebateke mezin a rêxistinkirinê dimeşandin û encamên girîng derdiketin holê. Ji vî aliyî ve tevlîbûneke mezin dihate çêkirin. Bi derketina tevgera Apocî re, rastiya Kurd ku li welatê xwe yan jî ji derveyî welatê xwe ji derveyî ku ji hin kesên din re bibe xizmetkar nekariye derfetê jiyanê ji xwe re peyda bike û pê re wekî mirovan danûstandin nehatiye kirin, ji xewa mirinê şiyar bûye; ketiye nav têkoşîna mirin û mayinê, bi pêvajoya şoreşa Rojava re bi taybetî di şexsê ciwanan de dê bibe lehengên gelê xwe û xwe bigihîne derfeta guherandina dîrokê. Sekna bi serbilindî nîşanî hemû cîhanê daye, şoreşa Rojava ku bi berxwedana jin û ciwanên leheng ên gelekî ku navê wî jî nayê li ser zimanan, ji bo hemû gelên bindest bûye hêviya rizgariyê, bi pergala neteweya demokratîk nîşanî hemû gelên cîhanê daye ku jiyaneke azad û demokratîk gengaz e. Ev şoreş bû şoreşeke wisa ku hemû pêkhate karibin di nav de cihê xwe bigirin. Vê şoreşê sînorên Rojavayê Kurdistanê derbas kir û Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê jî xiste nav rêxistinbûna xwe.

Her wiha ji aliyê leşkerî ve dikarîbû her deverê biparêze. Bi taybetî bi pêşengiya ciwanan DAIŞ'a ku ti hêz nikarîbûn li pêşberî wê bisekinin têk bir. Vê jî hişt ku Şoreşa Rojava li her derê cîhanê were bihîstin û dostên wê zêde bibin, ji welatên cuda yên cîhanê ciwanên enternasyonal tevlî şoreşê bibin. Îro gelek jê şehîd bûn, û yên mane jî di nava xebatê de pêşengiyê dikin. Bi vî aliyê xwe ve jî Şoreşa Rojava girêdaneke girîng bi rêxistinên cîhanê yên şoreşger, demokratîk, ekolojîk û gelparêz, civakparêz re bi pêş xist û xeta enternasyonalîst a şoreşê derxist holê. Xebatên girîng ên Ciwanên Şoreşger ên li Rojava di vê çarçoveyê de ye û ji bo ku xeteke wisa hê jî bi hêztir bibe bi roleke pêşeng radibe.

Tevgera ciwanan di pêvajoya avakirina çandî ya şoreşê de di asteke pêşeng de tevlî xebatên rêxistinbûnê bûye.

Tevgera Ciwanên Şoreşger, wekî

parçeyekî ji pergala neteweya demokratîk li Rojava li derdora ciwanan têkoşîna civakî bi pêş dixe, taybetmendiyên xwezayî yên ciwanbûnê vedide li hemû qadên têkoşînê; di serî de ji bo ciwanên Rojavayê Kurdistanê yekîtiya konfederal a ciwanên gelên Ereb, Suryanî, Aşûrî û gelên cûda yên li Sûriyê dijîn diafirîne; li ser vî esasî ji xwe re kiriye hedef ku pirsgirêkên di çarçoveya civakî, neteweyî, olî û cinsî de di çarçoveya çareseriya bi paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê de bi roleke pêşeng rabe.

Ji bo ku komun û meclîsên ciwanan werin çêkirin xebateke zêde hate meşandin. Ev, li gund, kolan yan jî li dibistanan sekna birexistinî ya ciwanan bû. Ciwan jî di qadên wekî ekonomî, civakî, çandî, tendirustî, perwerde û xweparastinê de di pêvajoya biryargirtinê de bûn îrade û di asta pêşengiyê de tevlî bûn. Ji bo ku hemû ciwan û gel tevlî jiyana çandî ya şoreşa Rojava bibin meşandina xebateke girîng a zanebûn û perwerdeyê bûyereke dîrokî bû. Tevgera Ciwanên Şoreşger, li gorî vê rolê û berpirsiyariyê, akademiyên perwerdeyê yên pir girîng ava kirine, wekî hedefekê timî ji xwe re diyar kiriye ku ciwanên Rojavayê Kurdistanê bi zanebûna neteweya demokratîk perwerde bibin û pêşengiya şoreşê bi her alî ve bigirin li ser milên xwe. Li hemû kantonan gavên girîng ku perwerdeya ciwanan didin li ser milên xwe bi vî şiklî hatine avêtin. Rola di avakirina hemû navendên ciwanan de ew bû, bi temamî şoreşê ji aliyê çandî ve derbasî nav ciwanan bike û bi vî şiklî hemû civakê bi çanda şoreşê bi rexistin bike. Ji bo ku ciwan bi çanda şoreşê re hev bibînin, perwerde di vê astê de xwediyê roleke girîng bûn.

Bi taybetî beşa ciwanan ku ji aliyê bêçandîtiya kapîtalîzmê ve ji aliyê zanebûn û jiyanê ve bi bandor bûye, beşa herî biyaniyê civakê bibû, ji rastiya civakê qutbûyî bû. Ji bo ku hemû enerjiya wan, hêza wan nekeve bin xizmeta gelê wan, ti polîtîkayên şerê taybet nemaye ku li ser wan nehatiye meşandin. Beşa ciwanan, ku li pêşiya mekanizmaya şerê taybet dibe asteng, ji bo pergala kapîtalîst ew beş e ku teqez hewce dike were teslîmgirtin. Hedefa wan ew e ku ruh û mejiyê ciwanan teslîm bigirin û her wiha bi temamî civakê bixin bin kontrolê. Li beramberî vê, lingê herî girîng ê di şoreşa Rojava de ew e ku bi xebata rêxistinbûn û perwerdeyê, li dijî bêçandiya kapîtalîst û hemû polîtîkayên pergalê afirandine, neçar e ku ciwan ji aliyê hişmendî û jiyanê ve xwe bigihînin xeteke rast. Ev pêvajoya şoreşê ji bo ciwanan aliyê têkoşînê yê pir girîng ê îdeolojîk e. Ji ber ku ciwan hêza jêneveger a veguherîn û nûbûna civakî ne. Pergal jî di vê wateyê de timî di nav êrîşeke cidî de ye. Bi şoreşa Rojava re li cem ciwanan karektereke girîng bi pêş ket û derfetek peyda kir ku taybetmendiyên xwe yên pergalê baş pênase bike. Ciwanên ku berê bi

pergalê re rû bi rû diman û ji jiyanê dihatin qutkirin, wekî kombûna taybetmendiyên ku li cem wan jiyîn zehmet e lê kiribûn. Lê karîbûye bi şoreşa Rojava re di derketina holê û dîtina taybetmendiyên bingehîn ku ciwantiyê pênase dikin û hebûna wê piştrast dikin de pêşketinên girîng hatine jiyîn. Ruh û çalakvaniya şoreşgerî yê ciwanan bi şoreşa Rojava re şênber bûye.

Her wiha rola girîng a dikeve li ser milê tevgera ciwanên cîhanê ew e ku vê rewşa dîrokî ya şoreşgerî di milê wate û naveroka wê de rast fêm bikin û derxin zanebûnê. Ji ber ku ev ji aliyê veguherîn, guherîn û nûbûna civakî ve rewşeke girîng îfade dike. Eger ne ji ciwanan be, ciwan bi rola xwe ranebin, -lê dê ji aliyê madî ve timî hebin- eger bi taybetmendiyên xwe yên bingehîn neyên pênasekirin, ev taybetmendî di jiyana civakê de karîger û fonksiyonel nebin, ew civak nikare bi lez bi pêş bikeve. Ji ber vê yekê erk û berpirsiyariya ciwanan ew e ku şoreşê bigirin bin ewlehiyê, mezin bikin û di vê pêvajoyê de bi rola pêşengiyê rabin. Di pêvajoyên avabûna civakî de heya ku xebatên ciwanên şoreşger neyên asta tê xwestin, di nava civakê de guhertin bi gavên pir hêdî bi pêş de diçe. Ji vê re tê gotin civaka ji aliyê guherîn û veguherînê ve herî lewaz. Ji bo civakên ku dînamîkên wan ên guherînê lewaz bûne re civakên êxtiyar tê gotin. Ev tê wateya ku ew civak têra xwe di hindurê xwe de taybetmendiyên ciwantiyê nahewîne. Ji bo civakekê hêza herî mezin ew e ku ew di hindurê xwe de taybetmendiyên ciwantiyê temsîl bikin, yanî dînamîka veguherînê zindî bigirin. Eger di nava civakekê de ev taybetmendî ev çendî zindî û li ser xwe bin, veguherîn jî ew çend bi lez dibe. Ew civak dibe civakeke şoreşger. Lê belê ev taybetmendî çendî lawaz bin, pêşketin jî ew çend lawaz û paşketî dibe.

Ya ku veguherîna civakî dide domandin têkoşîna ciwanên şoreşger e. Têkoşîna ciwanan, di guherîna civakî de û bi taybetî jî li dijî bêçandiya kapîtalîst hat warê têkoşîneke girîng. Bû têkoşîneke ku di sedsala 21. de jî derketiye pêş. Me ev yek di têkoşîna hemû gelên bindest ên Rojhilata Navîn û cîhanê de dît. Têkoşîna şoreşgerî ya ciwanan çawa ku guherîn û veguherîna civakî bi lez dike, di heman demê de derbeyên mezin li dagirkeriyê jî dide. Her wiha di her pêvajoya civakê de dînamîka ciwantiyê, dînamîka heyî ya guherîn û veguherînê ye, li dijî pergala kapîtalîst jî faktora herî mezin a têkoşînê ye . Di bingeha xwe de di şoreşa Rojava de asta têkoşîna ku ciwanan meşandiye-dimeşînin hêza jêneger a guherîn û nûbûna civakî ye, diyarker e. Roleke wisa ya dîrokî eşkere li holê ye. Fonksiyona vê bi taybetmendiyên jiyana şoreşgerî yên ciwanan tê diyarkirin. Şoreşa Rojava, bi qasî ku ji bo çîn û beşên din ên civakî bûye, ji bo ciwanan jî şert û

mercên pir girîng ên rêxistinbûn û çalakiyên hevpar afirand. Bi tevgera ciwanên şoreşger re ji ya her tim hê zêdetir wekî hêzeke rêxistinkirî pêşketinek hate jiyîn. Şoreşa Rojava rêya vê vekir. Ciwan, wekî tevgerekê bûn hêzek ku ji demên borî hê zêdetir rol digirin li ser milên xwe. Ciwanan di guherînên civakî de timî rol leyistine. Lê, Şoreşa Rojava şert û mercên wisa afirandin, ciwanan zêdetir derfet peyda kirin ku xwe bi rêxistin bikin, taybetmendiyên xwe yên bingehîn veguherînin rêxistin û çalakiyê. Ev, di salên dawî de hê jî ber bi çav bû. Tevgera ciwanan jî bi çêbûna zemînekî bi vî şiklî hêza rol û mîsyona xwe ferq kir. Dema ku em rol û mîsyona tevgera ciwanan di şoreşê de dinirxînin, helbet divê em vê rewşa derketiye holê jî bibînin. Bi şoreşê re di civakê de guherîn û pêşketineke girîng pêk hatiye. Hêza ku ev guherî, pêşketin û nûbûn bi civakê daye jiyîn jî bûye ciwanên şoreşger.

Di şerê bi her aliyê wê ve ciwanan jê re pêşengî kiriye DAIŞ hatiye têkbirin, faşîstên DAIŞ'ê teslîm hatine girtin. Bi vî awayî Şoreşa Rojava bi qadên rizgarkirî hatiye serbilindkirin. Bi pey re bi xebatên girîng ên rêxistinkirinê gelê Ereb û ciwanên wan tevlî pêvajoya şoreşê hatine kirin. Bi vî şiklî tevgera ciwanan ku rola avakirina pergala neteweya demokratîk daye li ser milê xwe, ji vê rojê pê de bi pêşengiya ciwanên Ereb li qadên hatine rizgarkirin xebatên girîng ên şoreşê bi pêş dixin. Ji bo ku pergala neteweya demokratîk li van herêman were jiyîn, hewl dide rola xwe ya pêşengiyê bi vî şiklî bîne cih. Ciwanên Ereb jî di asta pêşengiyê de tevlî şoreşê bûne û şehîdên mezin dane, hê jî di nav refên şoreşê de di asta pêşengiyê de bi rola xwe radibin. Dîsa ciwanên Tirkmen, Aşûrî, Suryanî jî tevlî pêvajoya şoreşê bûne. Bi awayekî bi hêz hem tevlî xebata xweparastinê ya şoreşê û hem jî tevlî xebata civakî ya şoreşê bûne. Bi temsiliyeteke guncav her tim tevlî modela rêveberiya xweseriya demokratîk bûne. Ji aliyê ciwanan ve di nava pergala rêveberiya xweseriya demokratîk de tevlîbûna bi şiklekî guncav a li gorî rola pêşengiya ciwanan, xebatên mezinkirin û bipêşxistina pergalê tê meşandin. Ciwan bi vî awayî dibin îrade û xwedî biryar.

Li cem van hemû destkeftan di xebatên avakirinê yên civakî de di qadên wekî ekonomî, civakî, polîtîk, çandî, hunerî, tendirustî, perwerdeyî, xweparastin û werzîşê de ciwanan hebûna xwe piştrast kirin û pêşengî kirin. Li gel xebatên birêxistinkirina komun û meclîsan li hemû van qadan di çarçoveya hişmendiya neteweya demokratîk de pêşketinên girîng hatine jiyîn. Beşên herî dînamîk ên civakê ev qad bi rêxistin kirin û bi rê ve birin. Ev, ji bo ciwanên şoreşger erk û qadeke berpirsiyariyê ya girîng bû.

Di şoreşa Rojava de pêşketinên bi vî awayî yên girîng pêk tên û her roja derbas dibe ji aliyê guherîn û

veguherîna civakî ve pêşketinên bi lez çêdibin. Her ku pêvajoya şoreşê van pêşketinên bi lez dijî hê zêdetir dibe hedef û timî tasfiyekirina şoreşê dixin rojevê. Ev pêvajoya bi dagiriya li ser Efrînê dest pê kiriye, bi dagirkirina li ser Girê Spî û Serêkaniyê hate domandin. Li beramberî van dagirkeriyan helbet berxwedaneke bi serbilindî hate bipêşxistin. Xeta têkoşîna şoreşgerî timî di dewreyê de hate ragirtin. Ciwanan di hemû pêvajoyên van berxwedanan de di refên herî pêş de cihê xwe girtine û rehm li dagirkeran nekirine. Di xeta fedaî ya Apocî de li beramberî dagirker û kedxwaran timî di nava têkoşîn de bûne. Helbet xeta berxwedanê, ku hewl dide şoreşê bigire bin ewlehiyê û wê mezin bike, dê bi stratejiya şerê gel ê şoreşgerî bi awayekî rast bê rêxistinkirin û jiyanîkirin. Rol û berpirsiyariya ciwanên şoreşger ew e ku di çarçoveya şerê gel ê şoreşgerî de şoreşê bi pêş bixin û xurtir bikin. Di deh salên pêvajoya şoreşê de erk û berpirsiyarî, hemû xebat di çarçoveya şerê gel ê şoreşgerî de ji bo birêxistinkirin û mezinkirina şoreşê, li beramberî dagirker û kedxwaran parastin û rizgarkirina gel û welatê xwe hatine meşandin. Bi taybetî ji bo qonaxa ku em tê de ne aşkere ye pêşketinên pir girîng tên jiyîn. Ev pêvajoyên bi her aliyê xwe ve bi gelek pêşketinan barkirî ne, çawa ku dikarin bi xwe re pêvajoyên erênî yên dîrokî biafirînin her wiha dibe ku me bi xetereyên mezin û wendakirinan re jî rû bi rû bihêlin. Jênerev e ku ciwanên şoreşger bi rêxistinbûna xwe, bi çalakvaniya xwe, bi zanebûna xwe, bi hêza xwe ya guherîn û veguherînê dê ji pêvajoyeke wisa re pêşengiyê bike.

Ji vî aliyî ve jî ev qonaxa niha em tê de qonaxa dawî ya têkoşîna dîrokî ya nîv qirnê ye, fînala wê ye. Di têkoşîneke wisa 48 salan de ciwan timî bûne pêşeng. Bûne hêza herî dînamîk. Bi wêrekî û fedakariya xwe ya mezin ji bo hemû bindestan, ji bo beşên civakê bûye mînak, pêşengî kiriye. Her wiha xwedî girîngiyeke mezin e ku tevî van pêngavên şoreşgerî, îro, ev erk û berpirsiyarî, misyon, ev têkoşîna dîrokî were gihandin encamê û bi serkeftinê were tacîdarkirin. Rol û misyon bi zêdebûnê berdewam dike. Erk û berpirsiyariya ciwanan a di têkoşîneke wisa de bûna pêşeng û bingeh didome. Ciwanan heya bi niha di xebata qutkirina pêşiya faşîzmê de, di hincirandin û derbelêdana wî de wekî hêzeke bingehîn û pêşeng a têkoşîna antî-faşîst û şoreşa demokratîk rol lîstine. Çawa ku wisa bûye, niha, di qonaxa fînalê de, dê di qonaxa şoreşa demokratîk gihandina serkeftinê de jî ew ê vê rola xwe ya pêşeng, bi awayekî herî dînamîk û herî birêxistinî bileyize. Bi serkeftinê bi encambûna fînalê, girêdayî wê ye ku ciwan rola xwe bi şiklekî bi rêxistinî û bi nêzîkbûnên afirîner û bi serkeftî bileyizin. Ciwan li ser vî esasî hem erkdar in û hem jî berpirsiyar in. Bi misyona hilweşandina faşîzmê, bi erk û berpirsiyariyeke şoreşgerî ya wekî rizgarkirin û

azadkirina Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê ji dagirkeran, bi misyona girtina ewlehî û mezinkirina şoreşa Rojava wezîfedar in. Wê demê divê ji bo vê erkê çi pêwîst be bi şiklekî serkeftî were pêkanîn.

Girîng e ku erk û berpirsiyariya dîrokî bi kûranî were fêmkirin. Pêwîst e ev yek bê nirxandin ka wê bi rêxistinbûn, çalakvaniyeke çawa were bicihanîn; zanebûn, rêxistinbûn û sekneke ku di pratîkê de bi ser dixe çawa were nîşandan. Hem ji bo ku ji têkoşîna şoreşa demokratîk re, ku faşîzmê hilweşîne pêşengî were kirin, hem jî ji bo ku pêşî lê were girtin ku faşîzm nikaribe beşên cuda yên ciwanan bixapîne, bişehitîne, mejiyên wan bişo û bike amûrên pergalên xwe yên çewisîner, teror û dagirker; xebata ciwanan, rêxistinbûna ciwanên şoreşger, çalakvaniya wan, tevgera wan di asta herî pêş de bipêşxistin hewce dike û divê ev bibe xebateke esasî. Di roja me ya îro de her tişt ji aliyê xebata ciwanan ve tê diyarkirin. Ji bo tengavkirina faşîzmê jî, ji bo bi piralî bipêşxistina têkoşîna antî-faşîst a şoreşa demokratîk jî, ji bo ku têkoşîna Kurdistana Azad û Rojhilata Navîn a Demokratîk li ser xeta serkeftinê bimeşe rê û rêbaz û amûra bingehîn e. Wê demê ji vê raboriya dîrokî derxistina dersên hewce pêwîst dike; bi taybetî jî nirxandina şert û mercên roja me ya îro bi şiklekî rast û di asteke têrê bike de, derxistina holê ya rastiyan, xwedîderketina li erk û berpirsiyariyên vê hewce dike. Tevgera ciwanên şoreşger ji aliyê dîrokî ve xwediyê misyoneke wisa ye û di bin berpirsiyariyeke wisa de ye ku ji ber vê yekê neçar e xebatên xwe yên wekî zanebûn dana qezenckirinê, rêxistinkirinê û çalakvaniyê hewce dike hê xurtir û bi bandor bi pêş bixe. Lewra em fînala şoreşê dijîn. Pêşengê tevgereke wisa ya şoreşê ya antî-faşîst, ciwantî ye. Rêber Apo ev wekî "Ciwanên Demê" yan jî "Dema Ciwanan" îfade kir. Ji beriya pêncî salî, çil salî ji îro pir zêdetir diyar kir ku îro dema ciwanan e, wê demê divê pêşengiya ciwanan zêdetir safî be, zêdetir zelal be, hê şênber be. Ji bo ku ciwan pêşengiyeke wisa bînin cih jî hewce ye sê tişt hebin. Yek, Rêxistinbûneke bi hêz, du; yekîtiyeke mezin, sê; berxwedêriyeke mezin a şoreşgerî, çalakvanî, radîkalîzm, şerkerî. Eger ev sê tişt bi cih werin tê wateya ku ciwanên şoreşger bi rola xwe ya pêşengîkirina ji bo têkoşîna antî-faşîst rabûne.

Şoreşa azadiya Kurdistanê diçe serkeftinê, gel bi ser dikevin. Ciwan jî gel jî xwediyê wê hêzê ne ku vê pêk bînin. Berxwedan dê teqez serkeftinê bîne. Berxwedan jiyan û serkeftin e. Eger bi vê rêgezê tevgerîn çêbe, teqez dê ciwan jî, gel jî, tevgera şoreşa antî-faşîst jî bi ser bikeve. Li ser vê bingehê hemû ciwanên ku li dijî hêzên dagirker û kedxwar li ber xwe didin, eger li erkên xwe yên rojane bi şiklekî di asta herî dawî de xwediyê zanebûn, biryardar û li ser xeteke rast xwedî derkevin, pêşengî ji serkeftina şoreşê re bikin, dê wê demê were wateya ku erk û berpirsiyariya dîrokî ya ketiye li ser milên xwe pêk anîne.

# ŞOREŞA ÇAND Û HUNERÊ YA ROJAVA

**Bêyî em ji ruhê amator qut bibin em xebatan bikişînin zemîneke profesyonal û fêrker û kadroyên hunerê ava bikin.**

AKADEMİYA ŞEHÎD SEFQAN

Destpêkê, pêwîst e em çanda Kurdî nas bikin û pênase bikin. Ji ber ku rastiyeke Kurdî hebû ku ji ber siyasetên bişaftin û qirkirina çandî gihabû asteke ku nedihat nasîn. Kurd di demên nûjen de, di derdoreke çandî de dijîn ku ne ji encama guhertina çandî ya xweber de hatiye, lê belê di encama siyasetên tunekirin, xirabkirin, qedexekirin û ferzkirinê de hatiye.

Ji hemû belgeyên dîrokî û nirxên arkeolojî-çandî, em dizanin ku; mirovê Kurd xwedî nasnameyeke çandî ya resen e. Mirovê Kurd; gundî, cotkar, koçer, bi xwedîkirina ajalan re mijûl dibe, ji jiyana çiya hez dike û aliyên çanda eşîretê û çanda manewî

di vê nasnameya çandî de li pêş in.

Alî û taybetmendiyên xweser ên her gelekî heye. Ev aliyên xweser wî gelî ji gelên dîtir vediqetîne. Ev cudahiyeke çandî ye. Nasnameyên çandî yên ku bi bandora erdnîgariyê çêbûne, nasnameyên civakî yên xwezayî ne. Bi vî awayî avaniya hişmendiya Kurdan, şêwazê ramana wan û zimanê wan ji yên gelên dîtir cudatir e. Lê di cîhana nûjen de çanda Kurdî pêrgî pergaleke tuneker a qirkirina cewherê çandî hatiye.

Çand, avakirina mirov e. Mirov, nasnameya xwe bi awayekî çandî ava dike. Avaniya mirov a civakî wiha ye: Mirov, dema xwedî çand be mirov e. Her kes bi qasî ku xwedî nasnameyeke xwe ya resen û xweser be, wê xwedî çand be. Dema ku Kurd pirsa “Ez kî me?” ji xwe kir, wê demê ket nav lêpirsîna “Gelo çi yên me ne?” û “Gelo em em in?” Dema ku em bi rastiya bişaftin û qirkirina çandî re rû bi rû man em serwext bûn bê çi qasî em ji xwe hatine dûrxistin. Jibîrkirina nasnameya çandî, di asta windakirina bîr û mêjûyê civakî de mijara gotinê bû. Jibîrkirin û windakirina bîr û mêjûyî bûye sebeb ku pirsên ez kî me, welatên min ku der e, malbata min a civakî li ku derê ye bê bersiv bimînin.

Li şûna jiyana zindî, bi kelecan, helbestane, tijî hêvî û bi kêferat, belavbûneke civakî ya bê vîn, bê çare û her bendewariyê ji derve dike, derket holê. Rizandineke ji aliyên hişmendî û ramanan ve pêk hat. Nasnameya çandî ya ku winda bûye dihat wateya bêzimanî-bêdengiyê.

Nasname û çanda Kurdî qedexe bûn. Ev siyasetek bû ku li tevayî Kurdistanê dihat pêkanîn. Pergala heyî, hebûna xwe li ser tunebûna çanda Kurd ava kiribû. Her kesê ku bi çanda Kurdî dijiya yan jî diparast, sûcdar dihat dîtin. Mirovê ku raboriya xwe ji bîr kiriye dihat pejirandin. Ji bo gelê Kurd, nûjentî bi jibîrkirina çanda Kurdî ve gengaz bû. Di cîhana nûjen de cihê Kurdan tune bû.

Sermayedartiya nûjen dixwest ku nirxên gund, hilberîn, parvekirin û welatparêziyê tune bike. Her wiha, da ku pergala mêtîngeriyê li Rojhilata Navîn ava bike, Kurdistan kir çar parçe û xwest ku her kesî bi xwe ve girê bide. Pergala mêtîngeriyê ya ku bi dewletên Tirkiye û Îran ve li ser Kurdistanê ava kiribû, bi dagirkeriya Îngilîzan a Iraqê û Fransiyan a Sûriyeyê hat domandin. Şûnwar, petrol, daristan û her tiştên wê hatin talankirin.

Cîhaneke çandî ya oryantalîst bi zorê li şûna çanda rastîn a Rojhilata Navîn hat avakirin û hemû nirxên arîşî û çandî yan hatin tunekirin an jî dewletên serwerger mîna ku yên wan bin dan xuyakirin. Rojava bi çavekî biçûk û paşketî li Rojhilat dinêrî; zarok xwe ji dayika xwe bêrî kir; nûjentiya Ewrûpa ya îrojê, xiyanet li raboriya xwe kir.

Piştî şerê yekemîn ê parvekirina cîhanê, bi mebesteke veşartî ya tolhildana dîrokî, Rojhilata Navîn

bindest ket, pergaleke mêtîngeriya çandî-aborî lê hat avakirin û biryara înkarê der heqê gelê Kurd de hat girtin. Serwerê her parçeyekî welat, li parçeyên din temaşe kir û ket nav hevkariyê û siyasetên qirêj ên qirkirina çandî dewam kir. Geşedanên li her parçeyekî bi kûranî bandor li parçeyên dîtir jî dikir. Serhildanên 1920'an, geşedanên ku salên 1946 û 1960'î qewimîn, salên 1980, Komploya Navneteweyî ku li hemberî Rêber Apo pêk hat û geşedanên paşê hatin jiyandin, nîşaneyên wê yekê ne ku serwer li dijî gelê Kurd di nava dijbertiyeke hevpar de ne.

Dijminê Kurd nêzîkatiyên yek ziman, yek çand û yek nasnameyê ferz kirin û li beramberî hewldanên dijber ên Kurdan jî, ku dixwestin ziman, çand û nasnameya xwe zindî bihêlin, her bi komkujiyan bersiv dane. Ev siyasetên han heta roja îro jî dewam dikin. Siyasetên Tirkkirinê, Erebkirinê, Fariskirinê, dana koçkirinê, afirandina nakokiyên hundirîn, qedexekirina ziman û muzîk û hemû xebatên çandî xistin meriyetê, deverên xwedî taybetmendiyên dîrokî-aborî wekî baregehên leşkerî bi kar anîn û têketina wê qedexe kirin û gelê li wir bê çek hiştin. Van polîtîkayan bênavber dewam kirin. Tevayî rêyên êrîşan ceribandin; mîna tunekirina çandinî û xwedîkirina sewalan, mişextkirin, tirsandin, reşkujî, teqîn û hwd.

Wekî hemû dewletên serwer Sûriye jî her siyasetên qirkirina çandî û bişavtinê pêk aniye. Di serdema dagirkeriya Fransayê de, ku 26 salan dirêj kir, di sala 1928'an de dema ku Kurdan mafê xweseriya çandî xwestin (ev maf ji bo bawerî û neteweyên dîtir hatibû dayîn) ev maf nehat qebûlkirin. Ev siyasetên han di bin bandora nakokiyên Fransa-Îngilîstan û têkiliyên Tirkiye-Fransa de heta şerê parvekirina cîhanê yê duyemîn jî ku Fransa ji Sûriyeyê vekişiyabû, nehate guhertin.

Kesên ku xwestin çand û hunera Kurdî zindî bikin jî her di bin zext û zoriyê de man. Jiyana Cegerxwîn, Yûsif Berazî (Bêbuhar) û Mihemed Şêxo, ji bo ku em van zextan bêhtir fêm bikin mînakên herî baş in. Li gel girtin û binçavkirinê, penabertî jî li ser hunermendên Kurd dihat ferzkirin. Bi taybetî jî kesên ku dixwestin muzîk û helbesta Kurdî bidin jiyandin dikirin hedef û nedihiştin ku ew li wê derê bijîn. Bi zorê ew dersînor dikirin. Mebesta wan nêzîkatiyan ew bû ku hunermendan ji gel û axa wan qut bikin û wan penaber bikin.

Pêwîst e em hunerê ji çandê, ango ji şêweyê jiyanê cuda negirin dest. Şêweyên jiyana Kurdan, çandeke civakî ye ku aliyên arîşî tê de li pêş in. Pêşketina muzîk û helbestê jî vê yekê dide diyarkirin. Qadên hunerê yên girêdayî navgîn û amûrên maddî pir bi pêş neketine. Bi awayekî giştî, muzîk û helbest bi rista mayîndekirina çandê rabûne.

Bi siyasetên kemera Erebî, erdên Kurdan ji wan stendin û dan hin

kesên ji neteweya Ereb. Li axa Kurdan çandina darekê jî qedexe kirin. Xwestin ku hezkirina welat û axê ji holê rakin. Derketina ji welat bûbû mîna modayekê. Wekî çawa di komkujiyên sînema Amûdê, zîndana Hesekê, Newroza Qamişlo de hat xuyakirin, siyasetên tirsandin, kuştin û tunekirinê her di rojevê de bûn. Di hundirê vî parçeyê Kurdistanê de, li sê parçeyên cuda, siyasetên cuda dihatin pêkanîn. Li Efrînê rêbazên tunekirinê yên nerm dihatin bikaranîn. Projeyên mezin ên xirabkirinê li ser ziman û sincên civakî dihatin meşandin û hewldanên kişandina jiyana bajêrê Helebê û bişavtinê her dihatin kirin. Kobanê her di bin gefan de bû. Gundên Serêkaniyê hatin valakirin. Koçerên herêma Dêrikê piştî salên 1970, neçarî koçkirina Şamê hatin kirin û li şûna nasnameya Kurd, şêwazê jiyan û zimanê Erebî hat ferzkirin û hatin bişavtin.

Piştî sala 1979'an, ku Serokatî derbasî Kobanê û paşê Sûriyê bû, çarenûsa Kurdên li Rojava û bajêrên dîtir ên Sûriyeyê guherî. Xebatên yekemîn ên li Rojava xebatên gel bûn ku têkildarî çand û hunerê dihatin meşandin. Xebatên çand û hunerê ji wê rojê ve bûn xebatên zindîkirina çandê û bidestxistina nasname û ruhekî nû. Çanda welatparêzî bi lez mezin bû. Pir kom hatin damezrandin, wekî komên Agirî, Tolhildan, Cûdî, Botan û Engîzek. Xebatên hunerî hatin meşandin û bi taybetî muzîk, govend û şano. Ji van koman bi sedan hunermend tevlî têkoşîna şoreşê bûn û têkoşîna gerîla mezin kirin. Ev xebatên ku ji ber qedexeyan pir bi pêş neketibûn, bi pîrozbahiyên Newrozê re mezintir bûn û bi pêş ketin. Ji ber ku qedexe her dem dewam dikirin, ev xebat bi piranî di asteke amator de man.

Çanda Kurdî û bi taybetî jî muzîk û govend, wekî çawa li parçeyên din bi temamî nehatin rakirin, li Rojava jî nikarîbûn ji holê rakin. Li Efrînê di qada muzîkê de, kesên hêja yên mîna Cemîl Horo, Reşîdê Mam Çuçanê, Elî Tico, Hasanazî û Bavê Selah, her muzîka Kurdî gotine. Destanên Mem û Zîn û Dewrêşê Evdî bi versiyonên 3-4 saetan qeyd kirine. Li Kobanê jî Baqî Xido û Hafizê kor di warê muzîk û dengbêjiyê de xizmetên mezin ji çanda Kurdî re kirine. Ji aliyê cil û bergan jî, Kobanê çanda Kurdan da jiyankirin û bi avaniya xwe ya xurt a eşîretê her dem taybetmendiyên çanda berxwedêr di nav xwe de hewand.

Dema em behsa dîroka Rojavayê Kurdistanê bikin, pêwîst e em behsa xebatên wêjeyê jî bikin. Ji ber ku em nikarin çand û hunereke bê wêje bifikirin. Girîng e ku em ronakbîr û nivîskarên mîna Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn û Qedrî Can, nas bikin. Xebatên weşan û çapemeniyê ku di 1932'yan de bi Hewarê dest pê kir û bi kovara Ronahî dewam kir, di zimanê Kurdî de ta salên 1945'an jî xwedî ristek sereke û

behremendiyeke mezin bûn. Jixwe di roja me ya îro de, dîroka roja destpêka weşana kovara Hewarê, 15' ê Gulanê, wekî cejna zimanê Kurdî tê pîrozkirin.

Bi derketina Rêber Apo û PKK'ê ya ber bi başûrrojavayê welat ve, ji aliyê çandî ve vejînek çêbû. Xebatên çand û hunerê gihiştin asteke baş a rêxistinbûnê û heta dawiya salên 1990'î jî di mercên pir zor de dewam kirin. Kevneşopiya koman a li vê derê hem bi stranên xwe yên ku behsa têkoşînê dikin, hem jî bi hunermendên ji Rojava, binesaziya koma Berxwedan jî xurt kir.

Xebatên Newrozê, li Rojava bi salan xebatên sereke yên çandê bûn. Koman, provayên xwe bi dizî û dûrî çavan dikirin. Di saetên şevê de bi awayekî "bêdeng" xebatên xwe yên muzîkê dimeşandin. Bi vî awayî kevineşopiyeke berxwedanê jî di xebatên çandê de çêbûn. Wekî din, xebata fîlmekî jî li Rojava çêbûbû. Fîlmê bi navê "Soro" pir bal kişandibû.

Dema em behsa xebatên hunerê yên li Rojava dikin, mirovekî ku pêwîst e em behs bikin jî Şehîd Erdogan Qehreman ê ji Dersîmê ye. Di sala 2004'an de, piştî komkujiyên li Qamişlo û Efrînê, di roja cîhanî ya şanoyê de, 27'ê Adarê, agir berda laşê xwe û jiyana xwe bidawî kir. Bi vê çalakiyê, hem êrîşên li ser Serokatî û gel protesto kirin, hem jî hemû hunermend û ronakbîr vexwendin ser erkên wan.

Piştî Komploya Navneteweyî, bi taybetî jî piştî mirina Hafiz El-Esed, helwesteke tundtir û hişktir a qedexekirinê ji aliyê dewletê ve hat xuyakirin. Siyasetên sereke tirsandin, vemirandin û radest girtibûn. Li beramberî vê yekê, bi şoreşa Rojava re, şiyarbûneke mezin û vejîneke civakî pêk hat. Têkoşîna çil salan, dorpêça li ser Kurdan di axa Sûriyeyê de şikand. Pêla azadiyê ya ku ji Kobanê dest pê kir, li tevayî xaknîgariya Kurdan belav bû. Li gel pêşveçûnên siyasî-leşkerî, şoreşeke civakî çêbû. Kesên ku bi salan karê çand û hunerê meşandibûn, ji roja destpêkê ve bûn hêzeke mezin a şoreşê. Gelek hunermend di vê pêvajoyê de tevlî nav YPG'ê bûn û di bereyên şer ên pêş de jiyana xwe ji dest dan. Ş. Merwan, Ş. Osman û endamê rêveberiya TEV-ÇAND'ê Ş.Welat hin ji van hunermendên hêja ne. Viyan Peyman ku di 6'ê Nîsana 2015'an de di şerekî li Serêkaniyê de gihişt şehadetê. Û herî dawî fermandarê mezin Şehîd Rûbar Qamişlo, ku di fîlmê Bêrîtan de jî lîstibû, ji şehîdên me yên hêja yên şoreşê ne.

Em di pêvajoyekê de ne ku em ketina çandî ya ev sed sal in ji aliyê rejîmên kedxwar ên Rojhilata Navîn ve dimeşe, bidawî dikin û çandeke nû ku xwe dispêre civak û ferdên azad û demokrat, ava dikin. Her çi qasî civakeke bê perwerde û amator jî be, dîsa jî bi şoreşê re rê li ber xebatên hêja vebûye. Her çi qasî rastiya şer hebe jî, lê dîsa jî em şanaziya çêkirina hunerê di devereke azad û demokrat de jiyan

dikin. Ji bo ku hînbûnên maddî werin derbaskirin, manewiyat ji nû ve were avakirin û xebatên çand û hunerê bi ruhê şoreşê bigihîjin rêxistinbûneke civakî ya mezin, ji sala 2011'an û pê ve, bi hewldaneke bêdawî xebatên sazîkirinê didomin. Mijarên sereke yên li pêş me ne ew in ku; bêyî em ji ruhê amator qut bibin em xebatan bikişînin zemîneke profesyonal û fêrker û kadroyên hunerê ava bikin.

Piştî sala 2011'an, bi germahiya şoreşê ve, xebatên muzîkê ji nû ve hatin bidestgirtin û hilbirîneke xurt dest pê bû.

Xebatên şanoyê, yên ku ji ber siyasetên dijmin biçûk dihat dîtin û bi qedexeyan qels ketibû, ji nû ve dest pê bû. Bi alîkarî û behremendiyên mamosteyên ku ji parçeyên din ên welat hatin jî, di warê govendê de pêşketinên girîng çêbûn. Niha jî di qada sînema de, rêxistineke kokdar çêdibe. Pir fîlmên kurt û dirêj jî hatin çêkirin.

Rojava, hem di demên nêz de, hem jî di dîrokê de, erdnîgariyeke xweser e ku li ser pir dewlemendiyan hatiye avakirin. Her çi qasî sînor di navbera deşt û çiya de hatibin danîn û derbeyeke mezin li şêweyê jiyanê ketibe jî, her çi qasî berhem û şûnwarên wê bi rêya trênê hatibin dizîn û çûbin Ewrupa jî, lê dîsa bi çandeke zengîn a Hûrî û Mîtaniyan, a Orkêş û Til Xelefê, hatiye hûnandin û bi heyvana şoreşê ya bi rêbertiya PKK'ê hatiye meyandin.

Îroj, ku li Rojava çandeke şoreşgerî tê avakirin, hunermend û kedkarên çandê roj û şev di nav xebatê de ne. Nêzî pêncî saziyên çandê li vê deverê hatine birêxistin û li gorî pêdiviyan li piranî bajêr û herêman dest bi xebatan bûye. Di salên dawî de gelek saziyên nû jî vebûn. Akademiya çand-perwerdeyê ya Şehîd Welat, Hunergeh û Komîna Fîlm a Rojava, Pargîn hin ji van saziyan in. Li bajarên Qamişlo, Til Temir, Dirbêsiyê, Amûdê, Hesekê, Tirbespiyê, Girkêlegê, Koçeran, Dêrikê, Kobanê, Şehba û gelek deveran navendên çand û hunerê hene û bi awayekî sereke xebatên muzîk, şano, govend û resimê tên meşandin. Piştre xebatên bi dehan klîban, festîvalên govend û yên şanoyê jî li dar ketin. Wekî din, Akademiya Hunerê ya Ş.Yekta Herekol jî 2 salan perwerdeyê hunerî meşandiye.

Li Rojava, avakirina çanda jiyaneke azad, bi lezeke mezin didome ...